

Şêx Muşerref Xinûkî di serê sedsala XXan da hatiye dinyayê û di serê sedsala XXIan da wefat kiriye. Xinûkî li pişt xwe gelek berhemên watedar hiştine û bi taybetî jî dîwana wî ya bi çar zimanî ji bo Edebiyata Kurdî ya Klasîk gelek muhim e, lê belê heta vê demê zêde nehatiye naskirin. Me xwest ku em li ser vê berhemê bixebitin û bala lêkolîner û xoşewîstên edebiyatê bikişînin serê. Di vê xebatê da em bi tenê li ser helbestên Şêx Muşerref Xinûkî yên Kurmancî sekinîne û me vekolaye. Di xebata xwe da me transkirîpsiyona helbestan çêkiriye, ji aliyê ruxsarî û naverokê va tehlîla wan çêkiriye.

Dr.
Nesim Sönmez

Dîwana
Şêx Muşerrefê Xinûkî

Dîwana Şêx Muşerrefê Xinûkî

-Metn û Lêkolîn-

Dr. Nesim Sönmez



SEYDA YAYINLARI 0 412 224 54 40
Ali Emiri Cad No:58/C 0537 240 78 40
(Eskitrafik Çay Bahçesi Karşısı) www.seydayayinlari.com
Yenişehir/ DİYARBAKIR seydakitavebi@hotmail.com



Dîwana
Şêx Muşerrefê Xinûkî
-Metn û Lêkolîn-

Dr. Nesim SÖNMEZ



ISBN: 978-605-2226-31-5

Kitabın Adı

Dîwana Şêx Muşerrefê Xinûkî

-Metn û Lêkolîn-

Yazar

Dr. Nesim SÖNMEZ

Baskı/cilt

Kalkan Matbaacılık

Ekim 2018

"Bu eserin bütün yayın/telif hakkı yazara aittir."

Seyda Kitabevi

Ali Emiri Cad. No:58/C (Eski Trafik Çay Bahçesi Karşısı)

Yenişehir/Diyarbakır

+90 412 224 54 40 - Gsm: +90 537 240 78 40

seydakitabevi@hotmail.com

<http://www.seydayayinlari.com>

Nesim SÖNMEZ

Di sala 1971ê da li bajarê Erziromê li navçeya Tekmanê li gundê Altûnan (Toptepe) hatiye dinyayê. Di sala 1989an da li Erziromê lîseya Îmam-Xetîbê qedandiye. Li gorî kevneşopiya medreseyên Rojhilat di medreseya bavê xwe da, di heman demê da xwendiyê. Ji sala 1991ê hetanî sala 2003yan li navenda bajarê Erzirom û bajarê Îzmîrê melatî kiriye û ji sala 2003yan hetanî 2014an li bajarê Erzirom û bajarê Rîzeyê di lîseyên Îmam-Xetîban da mamostetiya zimanê ‘Erebî û mudûrtiya wan dibistanan kiriye. Di navbera salên 2009-2014an da, li bajarê Erziromê di Zanîngeha Ataturkê da di Fakulteya Edebiyatê da di beşa ‘‘Ziman û Çanda Erebî’’ da bi mijara ‘‘*Cahiliye Döneminde ve Sadru'l-İslam Döneminde Hitabet*’’ teza xwe ya doktorayê qedandiye. Di sala 2014an da li Zanîngeha Van Yüzüncü Yil’ê di Enstîtuya Zimanên Zindî da weke Dr. Mamoste dest bi wezîfeyê kiriye. Hetanî vê gavê, di heman zanîngehê da serokatiya Beşa Ziman û Çanda Kurdî dike. Nivîskar; Kurdî, Tirkî û Erebî dizane, zewiciye û bavê du kur û keçekê ye.

Berhemên Nivîskar:

- Karşılaştırmalı Hitabet -Cahiliye Dönemi ile İslam’ın İlk Dönemi- Rağbet Yay. Çapa Yekem, İstanbul 2018.
- İlmihala Şafîî, Weşanên Sîtav, Wan 2014.

Ez vê pirtûkê diyarî dayîka xwe ya qedirbilind û ezîz
dikim ku ew di 10ê Tebaxa 1983yan da çû ber rehma Xwedê û
ez bi hesreta wî dilbirîn, dilşewitî û dilperitî mame.

NAVEROK

NAVEROK	III
PÊŞGOTIN	1
DESTPÊK	3
I. Rewşa Bajarê Sêrtê Ya Siyasî	3
II. Navçeya Berwariyê	5
III. Gundê Xinûkê	5
IV. Rewşa Medreseyên Herê mê	5

BEŞA YEKEM

ŞÊX MUŞERREFÊ XINÛKÎ

1.1. JIYANA ŞÊX MUŞERREFÊ XINÛKÎ	8
1.1.1. Navê Wî û Malbata Wî	8
1.1.2. Xwendina Wî	8
1.1.3. Zewaca Wî û Zarokên Wî	9
1.1.4. Melatî û Seydatiya Wî.....	9
1.1.5. Terîqeta Wî	10
1.1.6. Wefata Wî	11
1.2. BERHEMÊN WÎ	12
1.2.1. Dîwan.....	13
1.2.2. Kitêba Hacî Ehmedî	13
1.2.3. Kitêba Mela Eledînî	13
1.2.4. Tehiyetu'l-Etfal.....	13
1.2.5. Şerha Luccetu'l-Esrarê.....	13
1.2.6. Mektûbat	14
1.2.7. Eyyuhe'l-Weled	14
1.3. KESAYETIYA WÎ YA EDEBÎ	14
1.3.1. Zimanê Wî	14
1.3.1.1. Tesîra Devoka Botan û Hekariyê	15
1.3.1.2. Unsûrên Erebi	17
1.3.1.3. Unsûrên Farisî	21
1.3.2. Mexlesa Wî	22
1.3.3. Edîbên Ku Li Ser Tesîr Kirine	23
1.3.3.1. Melayê Cizîrî	23
1.3.3.2. Ehmedê Xanî.....	24
1.3.3.3. Melayê Bateyî	25

1.3.3.4. Seyîd Eliyê Findikî	26
------------------------------------	----

**BEŞA DUYEM
LÊKOLÎNA DÎWANÊ**

2. JI ALÎYÊ RUXSARÎ Û NAVEROKÊ VA.....	27
---	-----------

2.1. JI ALIYÊ RUXSARÎ VA.....	27
--------------------------------------	-----------

2.1.1. Şiklê Tertîbê.....	27
2.1.2. Cureyên Helbestan	29
2.1.2.1. Qeşîde	29
2.1.2.2. Xezel	30
2.1.2.3. Mesnewî.....	31
2.1.2.4. Murebbe‘	32
2.1.2.5. Muxemmes.....	32
2.1.2.6. Yekmalik.....	33
2.1.3. Kêş (Wezn)	33
2.1.4. Serwa (Qafiye).....	36
2.1.4.1. Serwaya Mucerred	36
2.1.4.2. Serwaya Murdef	37
2.1.4.3. Serwaya Muqeyyed.....	37
2.1.5. Bi Kar Anîna Hunerên Edebî	38
2.1.5.1. Îstî‘are	38
2.1.5.2. Teşxîs (Kesandin)	38
2.1.5.3. Teşbîh (Wekandin/Şibandin)	39
2.1.5.4. Tezad (Dijberî).....	40
2.1.5.5. Îstîfham (Pirskirin).....	41
2.1.5.6. Nîda (Bang).....	41
2.1.5.7. Tenasub.....	41
2.1.5.8. Tekrîr (Dubare).....	42
2.1.5.9. Telmîh.....	43
2.1.5.10. Leff û Neşr	44
2.1.5.11. Cînas	44
2.1.5.12. Mubalexe	44
2.1.5.13. Întaq	45
2.1.5.14. Tecahu‘l-Arîf	45
2.1.5.15. Husn û Talîl	46
2.1.5.16. Alîterasyon.....	46
2.1.5.17. Asonans.....	46
2.1.5.18. Tewriye	47
2.1.5.19. Mulemme‘	47
2.1.5.20. Îqtibas.....	49
2.1.5.20.1. Îqtibasên Ji Ayetan	49
2.1.5.20.2. Îqtibasên Ji Hedîsan	54

2.2. JI ALIYÊ NAVEROKÊ VA.....	56
---------------------------------------	-----------

2.2.1. Unsûrên Dînî.....	56
2.2.1.1. Navên Xwedê.....	56
2.2.1.2. Navên Pêxemberan û Kesayetiyên Dînî.....	61
2.2.1.3. Navên Melayîketan	70
2.2.1.4. Navên Quranê û Sûreyên Wê.....	71
2.2.1.5. Navên Şehabîyan	72
2.2.2. Unsûrên Uxrewî	78
2.2.3. Têgehên Tesewufê	81
2.2.4. Kesayetên Tesewufî	87
2.2.5. Nav û Sifetên Ku Ji Bo Evîndaran Hatine Bikaranîn	96

2.2.6.	Unsûrên Xweşikbûnê Ji Bo Evîndar	99
2.2.7.	Çar Unsûr	101
2.2.8.	Unsûrên Kozmîk	107
2.2.9.	Heywanat	110
2.2.10.	Çiçek	114
2.2.11.	Unsûrên Di Derbareyê Jiyana Rojane Da	119
2.2.11.1.	Xwarin û Vexwarin	119
2.2.11.2.	Mêwe	121
2.2.12.	Maddeyên Giranbûha	121
2.2.13.	Navên Milet û Dewletan	123
2.2.14.	Cih û Kesayetên Çîrokî û Dîrokî	125
2.2.15.	Bajar û Warên Taybet	132
2.2.16.	Rojên Dînî	137
2.2.17.	Dem û Zeman/Wext	138
2.2.18.	Amûrên Muzîkê	141

BEŞA SÊYEM

METNÊ HELBESTAN

3.	LATÎNÎZEKIRINA METNÊ NAHELBESTAN.....	143
3.1.	Danasîna Nusxeyan	143
3.1.1.	Nusxeya Mela Osmanî	143
3.1.2.	Nusxeya Heşerî	143
3.1.3.	Xebata M. Xalid Sadinî û Tehsîn Doskî	144
3.1.4.	Xebata Ebdusselam Kartal (Bêcirmanî)	144
3.2.	Rê û Rêbaza Amadekirina Helbestan	144
	METNÊ HELBESTAN.....	146
	Qesîde	146
	Xezel.....	197
	Mesnewî.....	210
	Murebbe‘	238
	Muxemmes	279
	Yekmalîk	281
	ENCAM.....	283
	ÇAVKANÎ.....	284
	ÎNDEKSA NAV Ê CIHAN.....	289
	PÊVEK	294
	ÇEND NIMÛNE JI NUSXEYÊN DÎWANÊ	294

PÊŞGOTIN

Di vî welatê kevnare da gelek helbestvanên Kurd, di warê edebiyatê da bi zimanê dayîka xwe berhem dane. Şa'irên Kurdan, ji ber ku perçeyek ji şaristaniya Îslamê ne, wan jî li gorî kevneşopiya bisilmanan eşqa îlahî û evîndarî di berhemên xwe da bi zimanekî şîrîn û bi şêwazeke nerm hûnandine.

Şêx Muşerrefê Xinûkî jî yek ji alim û şa'irên qada vê çandê ye û ew bi avdana medreseyên Kurdan perwerde bûye, bi berhemên xwe derdora xwe ronî kiriye. Wî, bi helbestên xwe jî gel hînê eşqa Xwedê û hezkirina ji mexlûqan kiriye; aramîbûn, bêqîmetiya dinyayê û girîngiya dostaniyê jî bi şêwaza xwe ya taybet û bi helbestên xwe yên herikbar nivîsandiye. Xinûkî bi zimanê gel gotinên xwe yên watedar gotine û xwestiye peyamên xwe li gorî hestên xwe bigihîne ehlê dilan.

Xinûkî dîwana xwe bi çar zimanan, yanê bi Kurdî, Erebî, Farisî û Tirkî nivîsandiye. Di dîwanê da 78 helbestên Kurdî, ji 200î zêdetir helbestên bi Erebî, 10 helbestên Farisî û helbesteke Tirkî hene. Dema em ji dîwanê haydar bûn û me xwend, em gelek kêfxweş bûn û me biryar da ku li ser vê dîwanê xebatekê bikin. Lewra, em têgihiştin ku Seyda evîndarê Xwedê ye, mirovekî nefspiçûk e, kesayetekî rast û dirust e û hewce ye di nava gel da were naskirin û ji berhem û helbestên wî bi sedan kes sûd wergerin.

Dîwan, dîwaneke miretteb nîne yanê li gorî herfên Erebî bi qafiyeya “elîf”ê hetanî “ye”yê helbest nehatine nivîsandin û cureyên helbestan jî nîzami nînin. Me li gorî cureyên wan ew weke şeş (6) cure yanê: Qesîde, xezel, mesnewî, murebbe‘ muxemmes û yekmalik senifandin û li gorî kêşa ‘erûzê behr û qalibê helbestan di serî da daye. Di vekolîna helbestan da, me di nav kevanekê da qesîde bi (Q)yê, Xezel bi (X)yê, mesnewî bi (MS)yê, murebbe‘ bi (M)yê muxemmes bi (MX)yê û yekmalik jî bi (YM)yê daye nîşandan û paşê jî hejmara beytê daye.

Xebata me, ji destpêkek û sê beşan pêk tê: Di destpêkê da li ser rewşa siyasî ya bajarê Sertê, li ser navçeya Xesxêrê, li ser gundê Xinûkê û li ser medreseyên herêmê hatiye sekinîn. Ji bo ku kesayeta Şêx Muşerref û şert û mercên herêmê yên di dema jiyana wî da baş were zanîn, dayîna van agahiyan wek elzem hate dîtin.

Di beşa yekem da, der bareyî jiyana Şêx Muşerrefê Xinûkî da, terîqeta wî da, kesayeta wî ya edebî da, edîbên ku bandora wan li ser wî çêbûne da û berhemên wî yên hetanî vê gavê weke destxet mane, hatine danasîn.

Di beşa duyem da, ji aliyê ruxsarî va; şiklê tertîbê, cureyên helbestan, kêşa erûzê û serwa û hunerên edebî yên ku di helbestên xwe da emilandine bi awayekî berfireh agahî hatine dayîn, ji aliyê naverokê va; unsûrên dînî, unsûrên uxrewî, têgehên tesewufê, kesayetên tesewufî, nav û sifetên ji bo evîndaran hatine bikaranîn, unsûrên xweşikbûnê ji bo evîndar, çar unsûr, unsûrên kozmîk, heywanat, unsûrên der bareyî jiyana rojane da, mêwe, madeyên giranbuha, millet û dewlet, cih, bûyer û kesayetên çîrokî û dîrokî, cihên taybet, rojên dînî, dem û zeman û amûrên muzîkê yên ku navê wan di helbestên Seyda da derbaz dibin, hatine vekolandin.

Di beşa sêyem da berê, nusxeyên helbestan hatine danasîn, der heqê xebatên ku li ser wan hatine kirin, der bareyî rê û rêbaza amadekirina wan da agahî hatine dayîn û paşê jî metna helbestan li gorî rê û rêbazên alfabeya navneteweyî hatiye latînîzekirin.

Bi vê xebatê me xwest ku em li helbestvanên Kurdî yên klasîk hejmareke din jî zêde bikin û wî ji nav pelên dîrokê derxînin û bi gel bidin nasîn. Ev cara ewil e ku bi rê û rêbazên akademîk, li ser Şêx Muşerrefî xebat tê kirin. Em hêvîdarin ku di paşerojê da li ser vî seydayê nefspiçûk, xebatên berfirehtir werine kirin û kursiya ku wî heq kiriye, were dayîn. Em bi tenê li ser helbestên Seyda yên Kurdî xebitîn, helbestên wî yên Erebi û Farisî jî li benda xebata pisporan in. Eger bi awayekî akademîk li ser van helbestên Xinûkî jî xebat werine kirin, wê kesayeta wî ya edebî baştir derkeve holê.

Em spasdar û deyndarê lêkolîner û nivîskar birêz M. Xalid Sadî û Tehsîn Îbrahîm Doskî ne, ji bo ku wan ji me ra pêşniyaz kirin ku em li ser helbestên Seyda bixebitin û di pêvajoya xebata me da û bi destxistina nusxeyên dîwanê û çavkaniyan da alîkariyeke mezin dane me. Her wiha em spasdarê Prof. Dr. Îhsan Sureyya Sırma ne ji bo ku wî di derheqê Seyda da bîranînên xwe bi me ra parva kirin û qopyayek ji nusxeya dîwanê da me. Em spasdarê kurên Şêx Muşerref, birêz Mela Mihemmed Wefa û Abdullah Özcanî ne ku wan agahiyên ku li cem wan hebûn bi me ra parve kirin, beşa yekem xwendin û sererastkirin. Dîsa em minedarê birêz Miradxan Şemzînî ne ku wî pirtûk ji serî heta binî bi awayekî hûrgilî xwend û pêşniyazên xwe bi me ra parva kirin.

Dr. Nesim SÖNMEZ

2018-WAN

DESTPÊK

I. Rewşa Bajarê Sêrtê Ya Siyasî

Sêrt, bajarekî kevnare ye û di nexşeya Tirkîyeyê da dikeve herêma başûrê rojhilata Anatoliyayê. Ji aliyê rojhilat va; Şirnex, ji aliyê bakur va; Êlih (Batman) û Bidlîs, ji aliyê başûr va jî Mêrdîn cîranê vî bajarî ne.

Li ser koka navê Sêrtê, fikr û ramanên cuda cuda hene. Tê gotin ku di tabletên Asûriyan da peyva “Serîrî” weke navê Sêrtê yê ewil derbaz dibe. Li gorî hinekên din jî navê Sêrtê ji peyva Keldaniyan “keert”(ka’art) ê tê û wateya wî jî “kent” e û hinek jî dibêjin peyva “kent”ê di zimanê Ermenîyan da weke “gerd” tê bilêvkirin û îhtîmal heye ku ev peyva bi koka xwe ji zimanê Ermenîyan hatibe girtin. Peyva Sêrtê, di çavkaniyên Ereban da weke “Îs’îrd” an jî “Us’îrd”, di metnên Suryaniyan yê kevn da “Se’erd” û di çavkaniyên Rojavayîyan da jî “Si’îrd”, “Sa’îrd” û “Sert” derbaz dibe¹. Navê bajêr di serdema mîrekiyên Kurdan da û di serdema Osmaniyan da jî weke “Sêrt” hatiye binavkirin.

Tê gotin ku bajarê Sertê beriya zayînê di devdora 3000an da ji aliyê qewmên Ariyan va hatiye avakirin. Lê belê bi teqez nayê zanîn ku cara yekem ji aliyê kîjan komarê va hatiye avakirin. Li herêmê Hûriyan, Hîfîtan, Êrtartûyîyan, Asûriyan, Medan û Persan hukim kirine. Bajar, bi pêvajoya dîrokê va dikeve bin desthilatdariya Romayîyan, Sasaniyan û Bîzansiyan².

Di serdema belavbûna Îslamiyetê da di sala 17/639an da bi daxwaza Hizretî Umer, Sêrt tê fetihkirin û dikeve bin qontrola bisilmanan³. Wê demê piraniya xwecîhên vî bajarî Asûrî/Suryanî bûne. Piştî hilweşandina Komara Emewîyan desthilatdarî dikeve destê Dewleta Ebbasiyan. Piştî bidawîbûna vî komarê îjar desthilatdarî berê dikeve destê Komara Merwaniyan û di sala 1085an vir da Dewleta Selçûqîyan li vî heremê dibe desthilatdar. Di sala 1131ê da piştî mirina Melîk Şahê Sultanê Selçûqîyan, tevlihevî çêdibe, bajarê Sêrtê û devdora wê dikeve destê Artûqlîyan⁴.

Piştî şerê Kosedaxê ku sala 1243yan diqewime Moxol, Diyarbekir (Amed), Farqîn û devdora wan dagir dikin û xwe digîhînin Sêrtê û bajêr dorpêç dikin. Piştî pênc rojan bajêr dikeve destê Moxolan û di wir da qetlîam û talaneke pir mezin dikin⁵.

¹ Bekir Sami Seçkin, *Başlangıçtan Günümüze Siirt Tarihi*, Siirtliler Derneği Yay., İstanbul 2005, r. 1.

² Mehmet Zeydin Yıldız-Hüseyin Saraçoğlu, “19. Yüzyıldan Günümüze Siirt İlinin İdari ve Demografik Yapısında Meydana Gelen Değişimler”, *Uluslararası Siirt Sempozyumu*, İzmir 2007, r. 620.

³ İbrahim Yılmazçelik, *XIX. Yüzyılın İlk Yarısında Diyarbakır (1790-1840)*, TDK Yayınları, Ankara 1995, r. 8.

⁴ Şerif Demir, *Cumhuriyet Döneminde Siirt*, Düzey Yayınları, İstanbul 2016, r. 12.

⁵ Metin Tuncel, “Geçmişten Günümüze Siirt Şehri”, *Uluslararası Siirt Sempozyumu*, İzmir 2007, r. 27.

Di sala 1336an da piştî hilweşandina Dewleta Îlhaniyan, bajarê Sêrtê demekê dûr û dirêj di navbera dagirkeran da dibe cih û warê şer û pevçûnan. Di serê sedsala XVan da herêm dikeve bin qontrola Karaqoyûnluyan û Akqoyûnluyandi sala 1501ê da jî dikeve bin bandora Sefewiyan û Şah Îsmailî. Rêveberê bajarê Sêrtê û Heskêfê, Melîk Xelîl tê destegîrkirin û wî dişînin Tebrîzê û dikin zîndanê. Piştî şerê Çaldêranê ku di sala 1514an da di navbera Sefewiyan û Dewleta Osmaniyan da qewimîbû, sultanê Osmaniyan, Yavûz Sultan Selîm bi ser dikeve û Melîk Xelîlî jî zîndanê derdixîne, Sêrt û Heskêfê dixê bin qontrola wî⁶.

Kurd, di şerê ku di navbera Sefewiyan û Dewleta Osmaniyan da diqewime da, bi piranî piştgiriya Osmaniyan dikin. Yavûz Sultan Selîm jî mîrekiyên Kurdan weke mîrekiyên serbixwe dipejirîne û rêveberiya herêmê bi gelemperî dide destê wan⁷. Ji bo ku wê demê Sêrt, navçeyêke piçûk û bi serê xwe bûye bi Diyarbekirê va hatiye girêdan. Sêrt, demeke kurt ango di navbera salên 1630-1653yan da bi Wanê vahatiye girêdan û hetanî dawiya çarîna sedsala XIXemîn weke navçeyêke girêdayî bi Diyarbekirê va bûye⁸ û ev rewşa hanê hetanî Tenzîmatê berdewam kiriye.

Di serdema Tenzîmatê da Dewleta Osmaniyan, di warê rêveberiyê da guhertinên radîkal pêk anîne. Di sala 1846an da asta Sêrtê hinek dane jorê, bajarkirine bajarok û ji aliyê qaymeqamekî va rêveberiya bajarokîhatiye kirin. Di sala 1884an da guhertineke nû hatiye çêkirin û vê carê jî Sêrt, bi bajarê Bidlîsê va hatiye girêdan. Li gorî salnameya dewletê ya sala 1871an Sêrt, xwediyê pênc navçeyan bûye û ew navçe jî; navend, Şîrwan, Dih (Erûh), Perwarî (Berwarî-Xezxêr) û Garzan (Zok) bûne⁹.

Di sedsala XIXemîn da Dewleta Osmaniyan di bajarê Sêrtê da gelek caran rêveberiyê diguherîne û ew kesên ku dibin rêveber bi edaletî tevnagerin. Ji ber van sedeman gelê vê herêmê gelek caran li hember rêveberan raperînan didin destpêkirin.

Dewleta Osmaniyan di Şerê Cihanê yê yekemin da têk diçe û gel zêdetir dikeve nav şert û mercên zor û zehmet. Êris, hetanî bajarê Bidlîsê tên û bajarî tevda girêdikin. Sêrt nayê dagirkerin, lê rastî gelek tengasiyantê. Ji ber ku Bidlîs jî aliyê Êrisan va tete dagirkerin, karê rêveberiya Bidlîsê jî dikeve ser milê Sêrtê.

Sêrt, di serdema Tenzîmatê da weke senceq tê qebûl kirin û berê bi Diyarbekirê va, paşê jî bi Bidlîsê va tê girêdan. Lê Sêrt him jî aliyê erdnîgariya xwe va him jî bi aborî û civaka xwe va êdî digêhêje asta bajartiyê. Ji ber van sedeman gelê Sêrtê dixwaze Sêrt bibe bajar. Li Enqereyê meclis, ev daxwaza gelê Sêrtê dipejirîne û Wezaretê Karê Hundir dest bi amadehiyên pejirandina vê daxwazê dike û di 22.08.1920an da pêşniyazê pêşkêşî li jineya wezîran dike. Lijneya wezîran jî di 09.09.1920an da vê pêşniyazê dipejirîne û dişîne meclisê¹⁰. Meclis, di rûniştandina 23.09.1920an da vê daxwazê dipejirîne û biryara bajarbûyîna jî bo Sêrtê dide û di biryara 27ê meha Îlonê da di rojnameya fermî da têweşandin. Qanûn di 28ê Sibata 1921ê da di rojnameya ‘‘Cerîdeî Resmîye’’ yê da tê weşandin û Sêrt bi awayekî fermî

⁶ Mehmet Salih Erpolat, ‘‘Tapu-Tahrir defterlerine Göre XV. Yüzyılda Midyat’’, *Makalelerle Mardin, Tarih-Coğrafya*, Haz. İbrahim Özcoşar, Mardin Tarihi İhtisas Kütüphanesi Yayınları, -IV, İstanbul 2007, I, 383.

⁷ Ali Boran-Abdülhamit Tüfekçioğlu, Zekai Erdal, ‘‘Siirt ve İlçelerindeki 2000 Yılı Yüzey Araştırması’’, *XIX. Araştırma Sonuçları Toplantısı*, I-II, Yay. Haz. Komisyon, T.C. Kültür Bakanlığı Yay. Ankara, I, 17-32.

⁸ Yıldız- Saraçoğlu, r. 620.

⁹ Yıldız- Saraçoğlu, r. 623

¹⁰ TBMM, zc, b. IV, Î.73 (26.09.1936), r. 354.

dibe bajar¹¹. Navçeyên ku îro bi bajarên Sêrtê va girêdayîne evin: Tillo/Aydinlar, Hawêl/Baykan, Dih/Eruh, Zok/Garzan, Misirc/Kurtalan, Berwarî-Xesxêr/Perwarî, Kufra/Şirvan.

II. Navçeya Berwariyê

Ji bo ku Şêx Muşerref ji navçeya Berwariyê ye hewceye ku bi kurtasî ev navçe were nasandin.

Navê navçeyê yê kevin Berwarî an jî Xesxêr e. Piştî avakirina Komara Cumhûriyetê dibe navçe û navê wê yê fermî tê guherandin û dibe Perwarî. Xesxêr 96km ji navenda Sêrtê dûr e. Navçe, di devereke çiyayî da ye û çiyayê Herekolê li vê derê ye. Vê demê 50 gund girêdayî bi vê navçeyê va ne.

Xesxêr, navçeyek ji navçeyên bajarê Sêrtê ye û di nexşeya Tirkîyeyê da dikeve herêma rojhilatê Anatolyayê. Ji aliye bakur va; navçeya Hîzan û Miksê (Bahçesaray), ji aliye rojhilat va; navçeya Şaxê (Çatak) û Êlk (Beytuşebab), ji aliye başûr va; bajarê Şirnexê û navçeya Dihê/Eruh û ji aliye rojava jî Tillo/Aydinlar û Kufra/Şirvan cinarên vê navçeyê ne.

Avûhewayaya navçeyê îqlimeka bejayî ye û havînan zêde germ e, baran jî pir kêr e, di zivistanan da jî zêde hişkayî û serma heye û serdem bi baranê derbaz dibe. Ava çemê Botan û Miksê di vê navçeyê ra diherikin û xwe digîhînine çemê Xabûrê û ji wir jî diherikin ser çemê Dîcleyê. Li navçeyê zêdetirîn darên fistiqên çolê hene. Navçe, bi hinar, gûz û hêjîrên xwe navdar e. Ji aliye din va jî navçe xwedî taybetmendiyekê pez û dewar xwedîkirinê ye. Li navçeyê mêşên hingiv jî tene xwedîkirin û hingivê navçeyê jî navdar e.

III. Gundê Xinûkê

Xinûk; gundê Şêx Muşerrefîye û bi Tirkî jê ra dibêjin Güleçler. Şêx Muşerrefî li vî gundî çavên xwe li dinyayê vekirine. Gund, girêdayî navçeya Xesxêrê ye û 6 km ji navçeyê dûr e û li ber perê çemê Botanê hatiye avakirin.

Niştecihên gund bi temamî Kurdî û bi zaravayê Kurmancî qise dikin. Gundî giştik bisilmanên Sunnî ne û peyrevên mezhebê Şafî'î ne. Di gund da du 'eşîret hene, navê van eşîretan: Eşîreta Adiyân û eşîreta Şukriyan e. Lê bi qasî ku agahiyên ku gundiyan dane me, li vî gundî hejmara kesên êla Adiyân gelek zêde ne, weke êla Şukriyan.

Xinûk, gundekî mezin û bi darûber e. Gundî, bi pîranî bi xwedîkirina heywanan û bi cotkariyê ra mijûl in. Mirov dikare bibêje hemû gundî têkiliya wan bi malbata Şêx Es'ed ra heye û xwe weke endamê malbatê dibînin.

IV. Rewşa Medreseyên Herêmê

Medrese, peyveke 'Erebî ye û ji lêkera "de-re-se" yê hatiye dariştin û tê wateya cihên ku têda ders tên dayîn.¹² Bingeha medreseyê bi teqez kengê destpê kiriye hetanî vê gavê diyar

¹¹ Ceride-i Havadis, Sene: 1No: 4, 28 Şubat 1337.

nebûye, lê mirov dikare bibêje bingeha medreseyê xwe digîhîne serdema destpêkirina dînê Îslamê. Bi awayekî rêkûpêk cara yekem di serdema Dewleta Selçûqiyana da li Bexdayê ji aliyê Nîzamu'l-Mulk va Medreseya Nîzamiyeyê (1066–1067) tê avakirin ûperwerde destpê dike têda¹³. Medreseyên ku di herêmên Kurdan da hatine avakirin, binyada xwe ji serdema destpêkirina Îslamê va digirin.

Di medreseyên Kurdan da zimanê perwerdehiyê zimanê Kurdî bû. Ew kitêbên ku di medreseyên Kurdan da dihatin xwendin piraniya wan bi Erebî, hinekên wan jî bi Kurdî bûn, lê xwendin û şîrovekirina dersan ji sedî sed bi Kurdî bû. Seyda, kitêb bi Kurdî ji feqîyan ra şîrove dikirin û feqîyan jî bi Kurdî dixwendin û dersên xwe ji seydayên xwe ra vedigotin. Şêx Muşerref jî di medreseyan da bi Kurdî xwendiyê û bi Kurdî ders daye.

Mirov dema berê xwe dide rewşa medreseyên herêma Kurdan dibîne ku medrese di nava sê merheleyan da derbaz bûne û ev merhele jî ji evxalên jêrî ne:

- ✓ Medrese bi alîkariya rêveberên dewletê, xizmeta perwerdehiyê berdewam kirine.
- ✓ Alîkariya rêveberên dewletê ji bona medreseyan roj bi roj kêmtir bûye.
- ✓ Alîkariya rêveberên dewletê bi temamî xilas bûye û medrese hatine qedexekirin¹⁴.

Dema ku medrese azad bûne û bi alîkariya rêveberên dewletê û mîrektiyên Kurdan derketine, berhemên giranbuha diyarî dinyayê û Kurdan kirine. Bo nimûne; Îbn'l-Esîr (1160-1233) û Îbn'u'l-'Îz Îsamîl Îbn Rezzaz el-Cezerî (?- 1206) ji van kesanin.

Medreseyên herêmê bi alîkariya rêveberên mîrektiyên Kurdanxebatên xwe berdewam kirine. Lê belê dema ku dever dikeve destê Dewleta Osmanîyan, karûbarên perwerdehiyê ji aliyê hikûmeta navendî vatête domandin û bi piranî deverên ku nêzîkî paytext bûne, wan zêdetir alîkarî ji hikûmetê girtine. Bo nimûne herêmên Rojava û Anatolyaya Navîn para herî mezin girtine. Ji aliyê din va di serdema Osmanîyan da ew kesên ku li herêmê desthilatdar bûne wan jî ji bo medreseyan û perwerdehiyê, alîkariyên xwe roj bi roj kêmtir kirine. Ji ber van sedeman medreseyan êdî, hêdî hêdî xwe ji bajaran vekişandine û berê xwe dane gundan. Mirov ji ber van sedeman ji bona vê serdemê jî dikare bibêje serdema paşdamayîna medreseyan ev e¹⁵.

Li Tirkiyeyê, piştî îlankirina Cumhûriyetê di warê perwerdehiyê da gelek gavên hişktêne avêtin. Dev ji fikra azîneya rojhilatîyê tê berdan û azîneya rojavayîyan têtê pejirandin. Mirov dikare bibêje dev ji fikr û ramana dîndariyê têtê berdan û azîneyeke laîk û netewetî têtê pejirandin. 3yê Adara 1924an da qanûnek bi navê “Tevhid-i Tedrisat/Yekserkirina Perwerdehiyê” tê derxistin û bi vê qanûnê Şer'iyye û Ewqaf Wekaletî/Wezareta Karûbarê Dîn û Weqfan û medreseyên têda perwerde dihatine kirin, têtê girtin. Sedema girtina medreseyan ew bûye ku rêvebirên Cumhûriyetê digotin perwerdehiya di medreseyan da perwerdehiyekedînî ye û li dijî fikra rojavayî û Laîsîzmê ye. Wezareteke bi

¹² Îbn Manzûr, Cemaluddîn Muhammed b. Mukerrem, *Lisanu'l-Arab*, (nşr. Abdullah Alî Kebîr, Muhammed Ahmed Hesbullah, Haşîm Muhammed eş-Şazilî), Daru'l-Mearîf, Qahîre, XV, 1360.

¹³ M. Halil Çiçek, *Doğu Medreselerinin Serencamı*, Beyan Yayınları, İstanbul, 2009, r. 15; Ziya Kazıcı, *İslam Eğitimi Tarihi*, MÜİF Vakfı Yayınları, Çapa 4an, İstanbul 2016, r. 18.

¹⁴ Çiçek, “es-Si'irdî, Molla Halil b. Hüseyin b. Halid el-Ömerî”, *Uluslararası Siirt Sempozyumu*, İzmir 2007, r. 372.

¹⁵ Çiçek, “es-Si'irdî, Molla Halil b. Hüseyin b. Halid el-Ömerî”, *Uluslararası Siirt Sempozyumu*, İzmir 2007, r. 372-373.

navê Wezaretê Perwerdehiya Neteweyî tê sazîkirin û bi tevahî sazîyên perwerdehiyê bi vê wezaretê va têne girêdan.

Bi derxistina qanûna “Tewhid-i Tedrisat”ê û bi awayekî fermî girtin û qedexekirina medreseyan li herêma Kurdistan zirareke mezin dide pergala perwerdehiyê. Li bajarê Sêrtê xwendina di medreseyan da gelek pêş ketibû û li her deverê belav bûbû. Bi vê qanûnê çawa ku herêma zirarêdibîne, were jî bajarê Sêrtê zirarêdibîne. Hukûmeta Enqereyê, bi şiklekî taybet, medreseyên vî bajarî dişopîne û mufetişên ku ji aliyê Enqereyê va hatibûn wezîfedarkirin, bi raporên xwe herdem wan agahdar dikin. Lê belê her çiqas ev zorûzêmetî hebûn jî perwerdehiya di medreseyan da bi temamî xelas nebû. Hinek medreseyan guhertin di nav xwe da çêkirin û karên xwe berdewam kirin û hinekê wan jî li ser formata berê perwerdehiya xwe domandin¹⁶. Mirov dikare bibêje ev merheleya hanê jî merheleya sisêyan bû ji bona medreseyên Kurdistan.

Êdî medrese nikarîbûn pergala xwe taze bikirana û di warê ilm û zanistê da tiştên di dinyayê da diqewimîn kêma xebera wan jê çêdibûn. Medrese êdî bi tenê mabûn cihê serf û nehwa zimanê Erebbî yanê ilmên fennî nedihatîn xwendin. Ev jî ji aliyê perwerdehiyê va bû sedema paşdemayîna herêma Kurdistan.

Ev guhertinên ku ji aliyê hukûmeta Enqereyê va di aliyê perwerdehiyê da têne çêkirin, di derbareyî medreseyan da, li ser gelê herêma û Sêrtê tesîreke neyînî çênake; berevajî hezkirina medreseyan her diçe zêdetir dibe. Medreseyan di nav van zor û zextên dijwar da bi hezkirin û alîkariya gel karûbarên xwe hinek caran bi dizî û hinek caran jî bi aşkere berdewam kirine. Bi qasî ku me tespît kiriye, îro halê hazir li Sêrtê 9-10 medrese perwerdehiya xwe berdewam dikin. Ji van medreseyan her yekî bi şiklekî fermiyet bi dest xistiye û karûbarên xwe didomîne. Sazgehên ku ji bona perwerdehiyê bi terza rojavayê û bi azîneya laîk hatin avakirin, ji hêla gel va zû zû nehatine qebûlkirin û rexbeteke biqîmet nedîtine. Ev nêrîna hanê gelek salan berdewam kiriye û zirareke mezin daye zarokên Kurdistan. Lewra ew zarokên diçûn medreseyan dixwendin û ji seydayên xwe îcazet distandin û diketin qada kar û xebatê, didîtin ku ew îcazeta di destê wan da li cem dewletê tu tiştêkî wê tune ye. Êdî gel ev salên dawiyê zarokên xwe hindik dişînin medreseyan ji bo ku di warê fermiyetê da tu qîmetek ji bona wan nemaye. Ev yek jî li gelek deveran bû sedema girtina medreseyan. Helbestvan û rewşenbîrên mijara me Şêx Muşerref jî yek ji wan kesan e ku di bin şert û mercên evqas giran da di medreseyan da xwendiyê û bûye yek ji seyda û alimê herêma.

¹⁶ M. Edîp Çağlayan, “Siirt ve Çevresindeki Medrese Eğitimi”, *Uluslararası Siirt Sempozyumu*, İzmir 2007, r. 669.

BEŞA YEKEM ŞÊX MUŞERREFÊ XINÛKÎ

1.1. JIYANA ŞÊX MUŞERREFÊ XINÛKÎ

1.1.1. Navê Wî û Malbata Wî

Şêx Muşerrefê Xinûkî, di sala 1926an da li bajarê Sêrtê li qezaya Berwarî/Xesxêrê (Pervarî) li gundê Xinûkê (Güleçler) tê dinê. Dayîka wî navê wî lê dike Muşerref. Navê bavê wî Şêx Es'edê Sanî (duduyan) ye, ew jî kurê Şêx Ebdullah, ew jî kurê Şêx Es'edê Ewwel (yekem), ew jî kurê Hecî, ew jî kurê Faris e û Faris jî tehsîldarê Bedirxan Begê Botanê bûye.

Tê gotin ku Mirê Botanê, ji bo ku Faris tehsîldarê wî bûye û emr û fermanên wî bi awayekî rast û durust bi cî anîne, wî jî li muqabilî ev ked û xebata wî, ev gund diyariyê wî kiriye. Ji yana malbata Şêx Muşerref, bi vî rengî li ber çemê ava Botanê, di navbera çiya û baniyan da û li gundê bi hinaran bûye meşhûr, destpê dike. Dayîka Şêx Muşerref, keça Şêx Mihemmed Emînê kurê Şêx Fehmiyê Arvasî ye. Bavê Şêx Muşerref, du caran zewiciye û ji wan herdu jinan Xwedê şeş kur û pênc keçan didê. Navê zarokên Şêx Es'edê Sanî evin: Muşerref, Munewwer, Muhemmed Nûrî, Bedreddîn, Ubeydullah, Hifzullah, Zemzeme, Maşellah, Amîne û Effîfe ne. Navê damariya Şêx Muşerref, Behiye Xanim e ku ew jî keça Şêx Muhemmed Emînê kurê Şêx Husênê Basiretî ye.

Li gorî hin riwayêtan neseba malbata Şêx Muşerref, digêhêje malbata Xalid bîn Welîd. Lê di derbareyê vê agahiyê da em rastî tu belgeyê nehatine û di destê malbata wî da jî tu belgeyek li ser vê mijarê tune ye.

Şêx Es'edê Ewwel, di warê ilmê şerî'et û tesewufê da alimek mezin bûye û ehlê terîqeta Neqşûbendiyan bûye. Wî, xîlafet ji Şêx Salihê Sîpkî wergirtiye û piştî wî demek li Basretê postnişînî kiriye.

1.1.2. Xwendina Wî

Şêx Muşerref, li cem bavê xwe Şêx Es'edê Sanî dest bi xwendina xwe dike. Li gorî medreseyên Kurdan piştî xitimkirina Quranê, Mewlûda Melayê Bateyî, Nûbihara Piçûkan ya Şêx Ehmedê Xanî û Nehcu'l-Enama Mela Xelîlê Sêrtî ya bi Kurdî, dest bi kitêba bi navê 'Izziyeyê dike û li cem bavê xwe hetanî digêhêje kitêba bi navê Camiyeyê dixwîne. Lê di vê navberê da hinek caran li cem seydayê Mela Ebdullahê Saruhî jî dixwîne û paşê diçe gundê 'Eynikê û ev gund girêdayî bi navçeya Gurdilanê (Kurtalanê) ye, li cem seydayê Mela Teyyîbî, ku ji malbata seydayê Mela Xelîlê Sêrtî ye, dixwîne.

Di 16 saliya xwe da diçe gundê Helenzeyê, di medreseya Mela Ebdulhekîmê Helenzî, xwendina xwe berdewam dike. Mela Ebdulhekîmê Helenzî, kurê Mela Hesenîye; ew jî kurê Mela Mustefa ye, ew jî kurê Mela Xelîlê Sêrtî ye. Helenze, gundek girêdayî bi Sêrtê va bûye û aniha jî bûye taxek ji taxên bajêr û bi Tirkî jê ra dibêjin Bağtepe. Şêx Muşerref û birayê xwe Şêx Munewwer û kurmetê xwe Mela Tahayê Saruhî, bi hev ra di sala 1942an da têne Helenzeyê û li cem Mela Ebdulhekîmê Helenzî dibine feqî û wê demê Mela Bedreddînê Tilloyî jî li wê derê feqî bûye.

Şêx Muşerref, hinek dersên cem‘u’l-cewamî‘ê li cem Şêx Mustefayê Hemzewîdixwîne. Şêx Mustefayê Hemzewî ji Seyyidê Hemzewiyan e û ji Şêx Hemze el- Kebîr Tilloyî hatiye nîsbetkirin.

Şêx Muşerref, xwendina xwe ya dawî, hinekî li cem seydayê Mela Ebdulhekîmî û hinekî jî li cem babê xwe Şêx Es‘edî xwendiyê û ji herduyan jî icazet wergirtiye.

Şêx, kitêbên rêzê yên ku di medreseyên Kurdan da têne xwendin, bi temamî bi dersinî neqedandine, lê seydayên wî gotinê ku tu mutale‘eyê bike bes e û êdî nehewceye tu bi awayê dersxwendinê van kitêban bixwînê û îcazeta wî danê.

1.1.3. Zewaca Wî û Zarokên Wî

Şêx Muşerref du caran zewiciye. Jina wî ya ewil; keça Şêx Muhemmed Salihê Arvasî û neviyê Şêx Fehmî Arvasî, Safiye Xanim e. Şêx Muşerref kurê xwarziya Şêx Muhemmed Salihê Arvasî ye; yanê Safiye Xanim keça xalê wî tê hesibandin. Daweta wan di sala 1946an da dibe û ji ev zewaca wan Xwedê bi navê Muhemmed Nazim û Muhemmed Asim du kur û keçek bi navê Cennetî Xanim danê.

Şêx Muşerref di sala 1961ê da cara duduyan dizewice û keça Mela Xelîlê Tillowî Ebbasî ji malbata Feqîrullah tîne. Ji vê zewacê jî bi navê Muhemmed Şifa, Muhemmed Wefa, Ebdullah, Muhemmed Seîd û Muhemmed Samî pênc kur û pênc keç dibin.

Ew, piştî qedandina xwendina xwe û zewaca xwe bi qederê 3-4 salan firar dike û ji Sêrtê derdikeve, diçe Başûrê Kurdistanê li gundekî bajarê Zaxoyê bi navê Berzûran bi cih dibe. Sedema çûyîna wî ya Başûrê Kurdistanê herî baş Xwedê dizane bi armanca dîtina murşidekê ye.

Lê ev xerîbiya wî zêde berdewam nake; ji ber ku xerîbî jiyaneke bi zor û zehmet e, ew jî him bêriya dayîk û bavên xwe dike, him jî bêriya dost û yarên xwe dike. Bavê wî Şêx Esedê Sanî, diçe deşta Silopiya û çend kesan dişîne pey wî û ew jî him naxwaze bavê xwe bişkêne û him jî zêde bêriya dost û hevalên xwe weke Mela Bedreddîn dike û vedigere war û welatê xwe.

1.1.4. Melatî û Seydatiya Wî

Şêx Muşerref, piştî ku leşkeriya xwe diqedîne, li Berwariyê li gundê Rubarê (Yeniaydin) dest bi melatîyê dike. Li vî gundî medreseyekê vedike û têda dest bi dersdayîna feqîyan dike. Şêx, li Rubarê di navbera dîroka 1953-1977an da melatî û seydatiyê dike. Bavê

wî, Şêx Esedê Sanî, li gundê Xinûkê karûbarên irşada miletî dikir û di sala 1967an da wefat dîke û li dewsa wî kurê wî, Şêx Munewwer rûdine û karê bavê xwe berdewam dîke û di sala 1977an da ew jî wefat dîke. Piştî wefata birayê wî, Şêx Munewwer, ew ji gundê Rubarê vedigere gundê xwe Xinûkê û li wir di şûna bavê xwe da, dest bi melatî û seydatiyê dîke û hetanî diçe ber rihma Xwedê li gundê xwe jiyana xwe ya mayîdidomîne.

1.1.5. Terîqeta Wî

Şêx Muşerref, ji ehlê terîqeta Neqşebendiyan ji şaxa Xalidiyan e û peyrewê Şêx Mustefa Kemaleddînê Erbîlî ye. Li vê derê em dixwazin bi kurtasî behsa tesewufê û terîqeta Neqşebendiyan bikin.

Tesewuf, peyveke ‘Erebî ye û koka xwe ji lêkera “şe-we-fe”yê digire û tê wateya lixwekirina cilûbergên hirî¹⁷. Weke têgeh jî tê wateya di navbera Xwedê û evdê wî da pêkhatina bûyera ihsanê¹⁸.

Fikra tesewufê, ew fikre ku di reseniya xwe da ‘eşqa Xwedê di xwe da dihevine û tetbîqkirina ew esasên bingehîn yên ku ji Hizretê Adem hetanî Hizretê Muhemmed bi tevahî pêxemberan anîne û dûrketina ji hemû rengên şirk û kufrê ye¹⁹.

Armanca me li vir ne ew e ku em dûr û dirêj qala mijara tesewufê bikin. Ji ber ku Şêx Muşerref neqşebendî ye me xwest em bi kurtasî behsa terîqeta Neqşebendîtiyê, Mewlana Xalidê Şehrezorî û Şêx Mustefa Kemaleddînê Erbîlî bikin. Ka gelo Şêx Muşerref çawa bûye peyrewê vê terîqetê.

Terîqeta Neqşebendiyan, navê terîqeta ku ji aliyê Bahauddîn Muhemmed el-Buxarî va hatiye sazkirinê ye. Ev terîqeta hanê bi awayekî misoger, girêdayî Qur’anê û Sunetên Hizretê Muhemmed bûye, lewra, di navbera bisilmanan da bi awayekî berfireh belav bûye. Şahê Neqşebend vê terîqatê wiha pênase dîke: “Rêya me, rêyeke were ye ku zor tê dîtin, xelekeke zexm e, armanc bi tenê destgirtina sunetên Resûlê Xwedê ye û şopandina rêya sehabiyên wî ye. Selat û selam li ser Resûlê Xwedê û sehabiyên wî be²⁰.

Ji serê sedsala XIXan vir da li herêma Kurdistan û di dewleta Osmaniyan da şaxa terîqeta Neqşebendiyan ya Xalidîtiyê her diçe berbelav dibe. Ev jî bi alîkariya Mewlana Xalidê Bexdadî Şehrezorî, bûye. Ew damezirînerê şaxa Xalidiyan e û di sala 1193/1779an da li Senceqa Şehrezorê li bajarokê Qeredaxê hatiye dinyayê. Di sala 1805an da diçe heca xwe dîke û li wir eleqeyê wî bi tesewufê ra çêdibe û bi vê wesîleyê diçe Hindistanê, bajarê Dilhê, cem Şêxê Neqşebendiyan; Şêx Ebdullah Dilhewî û dibe murîdê wî. Piştî vegera ji Dilhê, tê bajarê Silêmaniyê û Bexdayê, karê îrşadê berdewam dîke. Şehrezorî, di sala 1823yan da koç dîke, diçe Şamê û karê xwe li wê derê berdewam dîke û di sala 1827an da emrê Xwedê bi cih tîne û li ser girê Kasîyûnê, tê veşartin²¹.

¹⁷ İbn Manzûr, XXVIII, r. 2527.

¹⁸ Ethem Cebecioğlu, *Tasavvuf Terimleri ve Değimleri Sözlüğü*, Rehber Yayıncılık, Ankara 1997, r. 690.

¹⁹ Kavak, r. 2-3.

²⁰ Kavak, r. 2-3.

²¹ Ebdulkerim Muhammed el-Muderrîs, *Ulemauna fi xizmeti’l-îlîm ve’-d-dîn*, (nşr. Muhammed Alî el-Qeredaxî, Bexdad 1983, Daru’l-Hurriye, r. 185-187.

Di derbareyî jiyana Şêx Muşerref da çawa li jor derbaz dibe. Ev, ji bo ku ji xwe ra murşîdekî bibîne, ji Sêrtê derdikeve û diçe Başûrê Kurdistanê, li gundekî bajarê Zaxoyê bi navê Berzûrî bi cî dibe. Ew di dema çûyîna xwe ya Zaxoyê da diçe Hewlêrê/Erbîlê û li wir Mustefa Kemaleddînê Erbîlî jî dibîne û wî ji nêz va nas dike.

Çawa li jorê jî derbaz dibe Şêx Muşerref, îcazeta xwe ya ilmî ji Mela Ebdulhekîm, ji bavê xwe û ji hin alimên din girtiye û were jî îcazeta xwe ya terîqetê jî ji du kesan wergirtiye. Wî, cara ewil ji Şêx Mustefa Kemaleddînê Erbîlî, wî jî ji bavê xwe Şêx Ebabekir Xiyaseddîn, wî jî ji Şêx Osmanê Tiwîleyê û wî jî ji Mewlana Xalidê Şehrezorî/Bexdadî wergirtiye. Xinûkî, cara duyem ji bavê xwe Es'edê Sanî îcazeta terîqetê wergirtiye, bavê wî jî îcazeta xwe ya terîqetê ji bavê xwe Şêx Ebdullah wergirtiye. Bavê wî jî bi rêya Baseretê digêhêje Mewlana Xalidê Neqşebendî²².

1.1.6. Wefata Wî

Şêx, di dawiya temenê xwe da bi nexweşiya kezebnetêrêkirinê (penceşêra kezebê) dikeve û demekê di nexweşxaneyê Sêrtê da radizê û tedawî dibe. Di wesiyeta xwe da dixwaze ku wî, di goristana Şêx Silêmanê ku têda Mela Xelîlê Sêrtê metfûn e, were definkirin. Şêx Muşerref, di 83 saliya xwe da di 19ê Adara 2008an da emrê Xwedê bi cih tîne û di 20ê Adara 2008an da li Mizgefta Sukê ya Sêrtê Mela Bedreddîn Sancar limêja cenazeyê wî dike û bi girseyeke gelek mezin cenazeyî dibin û di goristana Şêx Silêman da, li nêzîkî gora Mela Xelîlê Sêrtî defindikin.

Şêx Muşerrefî, jiyana xwe di xizmeta dînê xwe û milletê xwe da borandiye û bi sedan feqî dane xwendin û li pey xwe bi dehan berhem hiştine. Şêx Muşerref, mirovekî zana, ronakbîr, edîp, muderis, şêxê terîqetê, piştî bavê xwe mezinê malbata xwe û gundê xwe, aqilmend û rihspiyê herêma Berwarî û Sêrtê bûye. Ew; mirovekî bi edeb, ciwanmerd, dîlnizm û nefspiçûk, dilsoz û sozdar bûye. Wî gelek zêde ji ilm û zanistiyê hez kiriye. Bo nimûne di vê malikêda di derheqê zanistiyê da evha dibêje:

Ferqa însanî ji heywanî xwendin û edeb

Mirovê xwenda şîrîn e çî 'ecem bî çî 'ereb

(YM: 6)

Şêx Muşerref, kêfxweş û rûgeş bûye. Mirov dema berê xwe dide helbestên wî vê yekê bi awayekî zelal dibîne. Weke mînak:

Tû gihan e sêv xuyan e vê bizane ey lebîb

Derdê zik derdek giran e pir gêrîb û pir 'ecîb

(YM: 4)

Şêx Muşerrefê Xinûkî, di malikekî dinda jî evha dibêje:

²² M. Xalid Sadîmî û Tehsîn Doskî, *Şêx Muşerrefê Xinûkî û Şairên Malbata Wî*, Çapxana Parêzgeha Dihokê, Çapa Êkê, Dihok 2013, r. 16-24; Sırma, Ihsan Sureyya, *Pervariden Parîse*, Weş. Beyan, İstanbul 2018, r. 59-61.

Dilê min çayekê mehbûb û taze
Li ser kehniya rezaan îşev dixwaze

(YM: 7)

Şêx Muşerref, rewşenbîrekî piralî bûye. Wî li gel zimanê Kurdî; zimanê Erebî, Farisî û Tirkî jî zanibûye. Lewra wî bi çar zimanan helbest nivîsandine û agahiya wî ji edebiyata klasîk baş hebûye. Dema mirov li dîwana wî ya çarzimanî dinihêre, bi awayekî aşkere vê yekê dibîne.

Agahiyên ku me li jorê di derheqê jiyana Şêx Muşerrefê Xinûkî da dane, me ji van kesan û jêderan wergirtine.

1. Kurê Şêx Muşerrefê Xinûkî, Mela Muhemmed Wefa ku ev vê gavê li Sêrtê melatiyê dike.
2. Kurê Şêx Muşerrefê Xinûkî, Abdullah Özcan ku ew niha di Zanîngeha Sêrtê da di Fakulteya Îlahiyatê da weke mamoste dixebite.
3. M. Xalid Sadîni û Tehsîn Doskî, *Şêx Muşerrefê Xinûkî û Şairên Malbata Wî*, Çapxaneya Parêzgeha Dihokê, Çapa Êkê, Dihok 2013.
4. Adnan Demircan *Îhsan Süreyya Sirma, Pervariden Parîse*, Weş. Beyan, İstanbul 2018.

1.2. BERHEMÊN WÎ

Şêx Muşerref, ji warê siyasî va di demeke dijwar da ji dayîk dibe. Lewra Komara Cumhûriyeta Tirkiyeyê, nû hatiye damezrandin û gujiguj û qîjîqîjqa bayê nijadperestiyê di temamê welêt da deng vedide. Rêvebirên Cumhûriyetê, ew kesên ku di komarê da jiyana xwe berdewam dikin, giştikan weke Tirk dihesibînin û dibêjin ev welatê hanê bi tenê welatê Tirkan e. Çawa wezîrê perwerdehiyê Mahmut Esat Bozkurt dibêje “Ew kesên ku dibêjin em ne Tirk in mafê wan tenê koletî ye.” Zimanê Kurdî tê qedexekirin, ew kesên ku bi zimanê dayîka xwe qise dikin û dinivîsin, tene cezakirin û wan dikine heps û zîndan. Her weha medrese tene girtin û xwendina dînî jî tê qedexekirin.

Di nav ev şert û mercên dijwar da Şêx Muşerrefî, hinek caran bi dizî, hinek caran jî bi aşkere berhemên xwe nivîsandine. Xinûkî, zimanê Kurdî, Erebî û Farisî bi awayekî baş zanibûye û bi van zimanan berhem dane. Şêx, bi zimanê Tirkî jî zanibûye, lê çawa Îhsan Sureyya Sirma jî dibêje wî zêde bi Tirkî qise nekiriye; ango baş nizanibûye²³. Dema kesên tenê bi zimanê Tirkî zanibûne û hatine ziyareta Xinûkî, wî bi Kurdî qise kiriye û yê devdora wî jî wergerandine Tirkî. Kurê wî Abdullah Ozcan dibêje: “Tirkiya bavê min pir hindik bû û axaftina wî bi zimanê Tirkî, ji wî ra gelek zehmet bû.”

²³Adnan Demircan, *Îhsan Sureyya Sirma, Pervariden Parise*, Weş. Beyan, İstanbul 2018, r. 26.

1.2.1. Dîwan

Dîwana Şêx Muşerrefî, li gorî nusxeya ku me ji xwe ra weke bingeş girtiye ji 456 wereqeyan pêk tê û bi çar zimanan e. Têda helbestên Kurdî, Farisî, Erebi û Tirkî hene. Di dîwanê da ji 200î zêdetir helbestên Erebi, 78 helbest Kurdî, 10 helbest Farisî û helbestek jî bi Tirkî ye. Gelek helbestên wî jî wenda bûne û hetanî vê gavê nehatine dîtin.

Cureyên helbestan; qesîde, xezel, murebbe‘, muxemmes û mufred in. Ev berhema mijara me ye û em ê bi hûrgilî li serê bisekinin. Destxeta vê berhemê li cem malbata Şêx Muşerrefê Xinûkî ye.

1.2.2. Kitêba Hacî Ehmedî

Berhem, bi zimanê Kurdî ye, bi destxeta nivîskarî hatiye nivîsandin û ji 105 wereqeyan pêk tê. Şêx, di vê berhemê da qala şêxên terîqeta xwe dike û ya herî muhim ev e ku Şêx Muşerref, kesê yekem e ku silsileya şêxên terîqeta xwe bi Kurdiya zaravayê Kurmancî nivîsandiye. Lewra hetanî vê gavê nehatiye tesbîtkirin ku di nava şêxên Kurdan da kesekî silsileya şêxên terîqeta xwe bi Kurdî nivîsandiye, yan bi Erebi yan jî bi Farisî nivîsandine.

Şêx, di vê berhemê da çend bîranîn û zanînen xwe di derheqê bavê xwe û birayê xwe Şêx Munewwer da tîne zimên. Destxeta vê berhemê li cem malbata Şêx Muşerrefê Xinûkî ye.

1.2.3. Kitêba Mela Eledînî

Ev berhema hanê weke nameyekê ye, ji 117 wereqeyan pêk tê û destnivîsa Şêxî bixwe ye. Naveroka berhemê li ser îtiqad û eqîdeyê ye. Şêx, di berhemê da, ji bona ehl û merivên xwe û peyrewê xwe Mela Eledînî, bi awayekî şîretî/dîdaktîk nivîsandiye. Destxeta vê berhemê li cem malbata Şêx Muşerrefê Xinûkî ye.

1.2.4. Tehiyyetu'l-Etfal

Berhem, bi awayekî menzûm hatiye nivîsandin û ji 64 beytan pêk tê. Berhem, bi eslê xwe berhema Mela Yûnisê Herqetênî ye û navê wî jî Zurûf e. Weke ku tê zanîn mijara zurûfê, li ser Nehwê ye. Şêx, ji bo ku feqî vê kitêbê bi awayekî hêsan ji bere bikin, ev mijar bi têşeya nezmê nivîsandiye. Destxeta vê berhemê li cem malbata Şêx Muşerrefê Xinûkî ye.

1.2.5. Şerha Luccetu'l-Esrarê

Berhem, bi eslê xwe berhema Mewlana Camî ye û bi zimanê Farisî ye. Şêx Muşerrefî şerha berhemê kiriye. Şêx, şerha xwe bi awayê kevneşopiya klasîk nivîsandiye, yanê, li binê her beytekê şerha wê bi Erebi nivîsandiye. Destxeta vê berhemê li cem malbata Şêx Muşerrefê Xinûkî ye.

1.2.6. Mektûbat

Ev berhem bi tevahî ji nameyan pêk tê û destnivîs ji 217 wereqeyan pêk tê. Şêxî, ev name ji bona dost û hevalên xwe nivîsandine. Destxeta vê berhemê li cem malbata Şêx Muşerrefê Xinûkî ye.

1.2.7. Eyyuhe'l-Weled

Şêx Muşerrefî, ev berhem ji bo kurê xwe Muhemmed Wefa nivîsandiyê. Naveroka vê berhemê şîret in.

1.3.KESAYETIYA WÎ YA EDEBÎ

Şêx Muşerref, di gelek medreseyan herêmê da xwendiyê û ji gelek alim û zanayan herêmê ders girtiye. Wî, him di warê ilmê îlahiyatê da û him jî di warê ilmê edebiyatê da cihêkî gelek girîng girtiye. Gelek alim û zana li ber çoka wî rûniştine, xwendine û wî gelek berhem li dûv xwe hiştine. Berhemên wî bi piranî bi Erebî ne û ji wana çend heb jî bi Kurdî ne. Berhemên wî hinek bi têşeya nesrê û hinek jî bi têşeya nezmê hatine ristin.

Şêx Muşerref, ehlê tesewufê ye û peyrewê Mewlana Xalidê Şehrezorî ye. Ji aliyê zimanî va wî zimanekî xwerû û zelal bi kar aniye. Mirov, berhemên wî bi awayekî hêsan fêm dike.

Kesayeta Şêx Muşerrefê Xinûkî ya edebî, bêguman bi dîwana wî ya çarzimanî da derdikeve holê. Mirov, dikare Dîwana Şêx Muşerrefê Xinûkî ji hinek aliyan va girîngitirîn diwanên edebiyata Kurdî ya Kurmancîbîhesibîne. Lewra dîwan, bi çar zimanan hatiye nivîsandin. Ev yeka hanê ji bo edebiyata Kurmancî tiştekî gelek muhim e. Ji aliyê cureyan helbestan va yê ku di dîwanê da bi zaravayê Kurmancî cih girtine jî mesnewî, xezel, qesîde, murebbe, muxemmes û yekmalikan pêk tên. Bi rastî bi vî rengî dîwanên ku bi zaravayê Kurmancî hatine nivîsandin zêde nînin. Naveroka helbestan bi piranî ne, munaceat û nisîhetin. Nusxeya dîwanê ya eslî di destê me da tune ye; yanê destxeta helbestvanî wendaye. Lê belê du nusxeyên dîwanê hene û herdu nusxe jî di bin qontrola muellîf ra derbaz bûne. Ev agahiya hanê ji bo lêkolîneran gelek muhim e. Şêx Muşerrefê Xinûkî, dema helbestên xwe nivîsandine, li derkenarên wan da di derheqê helbestên xwe da hinek agahî dane. Ev agahî ji bo têgihîştina helbestan karekî gelek girîng e. Weke mînak; di serê hinek helbestan da ew helbest ji bo kê nivîsandibe di derkenarê rûpelê da agahî dane. Bi vê rê û rêbazê em têdigêhêjin ku ev helbest ji bo filankesî-bêvankesî hatiye nivîsandinê.

1.3.1. Zimanê Wî

Şêx Muşerrefê Xinûkî, di helbestên xwe da zimanekî sivik û zelal bi kar aniye. Mirov, dema berê xwe dide helbestên wî, dibîne ku him peyvên gel him jî peyvên edebiyata klasîk cih girtine. Ev jî dide xuyakirin ku agahiya Şêx, him ji çanda gel heye him jî ji edebiyata klasîk heye.

Xinûkî, ji bo ku ehlê medreseyê ye, ew jî weke alim û zanayên medreseyê di warê zimanî da şareza bûye. Lewra, wî di dîwana xwe da bi çar zimanan; yanê bi zimanê Kurdî, Erebi, Farişî û Tirkî helbest nivîsandine. Mirov, dema li helbestên wî dinihêre bi awayekî aşkere dibîne ku di bikaranîna zimanê Kurdî, Erebi û Farişî da gelek serkeftî ye, lê di zimanê Tirkî da ewqas serkeftî nîne. Ji bo ku Şêx Muşerref, perwerdehî di medreseyê da dîtiye, têda ders daye û zimanê pirtûkên dersê jî piranî bi Erebi û Farişî bûne, zimanê wî di bin bandora Erebi û Farişî da maye. Di dîwanê da jî 200î zêdetir helbest bi Erebi ne û pirê wan jî ji qesîdeyan, xezelan, murebbe'an, muxemmesan û yekmalikan pêk tên û bi qasî 10 helbestên wî jî bi Farişî ne. Ev agahiya hanê jî dide xuyakirin ku Şêx, zêde zêde di bin tesîra Erebi û Farişî da maye.

Di helbestên Kurdî da unsûrên Erebi û Farişî hin caran weke beytekê, weke risteyekê, hin caran jî weke nav, sifet û terkîban derdikevine pêşberî me. Zimanê Şêx Muşerrefê Xinûkî, di helbestên Kurdî da zêde zêde bi peyv û têgehên Erebi hatine xemilandin.

Di helbestên Şêx Muşerref da unsûrên Erebi û Farişî jibêje, têgeh, biwêj û îqtibasên ji ayêt û hedîsan û ji hinek telmîhên bûyerên dîrokî pêk tên. Digel vê yekê di helbestan da hinek caran mulemmê'ên ku risteyeke wan bi Kurdî ya din bi Erebi û Farişî, yan jî du riste bi Kurdî û yên din jî hinek caran bi Erebi û hinek caran jî bi Farişî hatine bilêvkirin hene. Ev tesîra unsûrên Erebi û Farişî û îqtibasên ji ayêt û hedîsan taybetiyeke Xinûkî nîne, kevneşopiyeye edebiyata klasîkê ye. Lewra, Şêx Muşerref jî ev kevneşopiya hanê şopandiye. Lê hewceyê gotinê ye ku mirov, bibêje Şêx Muşerrefê Xinûkî, di bikaranîna zimanê Kurdî da serkeftî ye û ziman baş emilandiye. Eger mirov ji bona helbestên wî yên Kurdî rêjeyekê daye, bi awayekî hêsan dikare bibêje di helbestan da tesîra Erebi û Farişî ji sedî bîst û pêncan zêdetir nîne.

1.3.1.1. Tesîra Devoka Botan û Hekariyê

Zimanê Şêx Muşerref, zimanekîservekirî û zelal e. Her çiqasî zimanekî klasîk bi kar anîbe jî peyvên ku di helbestên xwe da emilandiye, wateya wan hêsan e. Yanê weke zimanê Melayê Cizîrî giran nîne.

Mirov dema helbestên wî di ber çavan ra derbaz dike, dibîne ku bandora devoka Botan û Hekariyê bi awayekî aşkere xwe nîşan dide.

✓ Di devoka Botan û Hekariyê da herfa “t” yê dikeve dawîya lêkeran. Weke nimûne: **bibit**, **dibit**, **nabit**, **diket**, **naket**, **divêt**, **bivêt**, **navêt** û hwd. Di van malikên jêrî da ew lêkerên ku hatine bikaranîn herfa “t”yê hatiye dawîya wan.

Ji vê fikrê me dil daim dibit hey

Nehin têda birin û dağ û hem key

(MS: 6/15)

Ji bo te afiyet bit ew şeraba

Vexarî te eya dostê Girafê

(X: 10/3)

Wê dema dî weqtê mirnê rû li ser axê nihî
Ey birader ferqê **naket** Sanihî bî ya Nûhî

(YM: 1)

✓ Di devoka Botan û Hekariyê da peyva “şol” bi wateya hal, hereket rewş, fi’l û ‘emel tê bikaranîn. Şêx Muşerref, di malika jêrî da peyva “şol” di wateya fi’l û ‘emel da bi kar aniye.

Xweda mebrûr biket hecca te çêket
Hemî **şolê** te ey dostê Girafê

(X: 10/2)

✓ Di devoka Botan û Hekariyê da navê “Xwedê/Xweda” bi formata Xudê/Xuda hatiye emilandin. Çawa di malikên jêrî da jî tê xuyakirin, Xinûkî jî navê “Xwedê/Xweda” bi formata Xudê/Xuda bi kar aniye.

Hemdê bê hed bo **Xuda** yê bê zewal û bê fena
Malikê her nî‘metan û mu‘tiyê her qenciyan

(X: 25/11)

Ey **Xuda** ya dil bişîne ya me jî waşil bike
Min ji bo hicran nîne taqeta hilgirtinê

(Q: 8/11)

Ya babê Îzzeddîn, **Xuda**
Zanî ji te nabim cuda
Ne li ser xetan ne li bin xetan
Bê tuca naşebirim

(M: 15/9)

✓ Di devoka Botan û Hekariyê da bi taybetî peyva “digel” û “nik” tê bikaranîn. Mirov dema li helbestên Şêx Muşerref mêze dike, gelek caran peyva “digel” û “nik” hatiye bikaranîn. Bo nimûne:

Cumle sadatê li ho destê ewan maçu dikem
Hem selaman rêdikem her ez **digel** baê nesîm

(Q: 10/10)

Ey Muşerref bes bibêj yeksane lew kurt û dirêj
Yê ku zana bî li **nik** wî wek yekin lew tişt û teşt

(X: 1/5)

✓ Di devoka Botan û Hekariyê da qertafên weke “key, dey, ey” têne dawiya lêkeran. Xinûkî jî ev qertafana zêde zêde emilandine. Weke nimûne:

Ji vê fikrê me dil daim dibit hey
Nehin têda birin û dağ û hem key

(M: 6/15)

Kehniya sipî çemek feqyan û newala xwey cemed
Deşt û hem çirnê tennûr qeb qeb dikin em her em in

(Q: 19/21)

1.3.1.2. Unsûrên Erebî

Şêx Muşerref, seydayê medreseyan e û bi dehan salan di medreseyan da dersa feqîyan daye û bi awayekî aşkere tê xuyakirin ku ew, pisporê zimanê Erebî ye. Mirov, dema dîwana wî dide pêşiya xwe û lê dinêre, dibîne ku Şêx, gelek di bin tesîra zimanê Erebî da maye. Sedema herî mezin jî ew e ku dema Kurd, dîne Îslamê qebûl dikin û dibin bisilman, zimanê wan jî dikeve bin bandora zimanê Erebî. Lewra Quranî zimanê Erebî hatiye nazil kirin û Hz. Pêxember jî Ereb e.

Ji aliyê din va di nava Kurdan da zimanê Kurdî, bi awayekî fermî nebûye zimanê perwerdehiyê. Her çiqasî di medreseyan da şîroveya dersan bi zimanê Kurdî be jî kitêbên dersan çar-pênc heb netêda, bi tevahî bi Erebî ne. Vê yekê jî tesîreke gelek mezin li ser feqî û seydayên wan kiriye.

Ji bo ku Şêx Muşerref jî kesekî ji ehlê medreseyê ye, ev tesîra hanê zêde zêde li ser wî jî çêbûye. Di edebiyata klasîk da ev tesîra hanê bandorekehevpar e; yanê li ser hemû helbestvan û edebiyatnasên klasîk kiriye. Lê hewceye were gotin ku helbestvan û edebiyatnasên Kurdan, dema peyvên Erebî bi kar anîne, bi piranî ew rasterast negirtine; yanê dema peyvên Erebî bikar anîne, berê xistina formata zimanê Kurdî, paşê jî di hevok û helbestên xwe da bikaranîne. Em ê nimûneyan li jêrî bidin.

Hinek nimûne ji peyvên Erebî yên ku Şêx Muşerref di helbestên xwe yên Kurdî da bi kar anîne.

Erebî	Kurdiya Wê	Erebî	Kurdiya Wê
Şehîh	Durust	Durr	Încî
Tekellum	Axaftin	Teellum	Pê êşandin
Lîqa	Hevûdin dîtin	Welakîn	Lê belê
Fîlheqîqet	Bi rastî	Lasiyyema	Bi taybetî
Ewraq û eşcar	Pel û dar	Fîraq	Cudayî
Îhtiraq	Şewitandin	Weşlet	Gîhandina hevûdin
Hîdayet	Rastî	‘Elîlim	Nesaxim
Muşkîl	Pirsgirêk	Teqşîr	Îhmalkirin

Hinek nimûne ji ravekên Erebî yên ku Şêx Muşerref di helbestên xwe yên Kurdî da bi kar anîne.

Erebî	Kurdiya Wê
Nef’e tekellüm	Fayde ye axaftin
Mehellê ‘ewn û hem neşrê	Cihê alîkarî û serkeftinê
Serrafê qulûban	Pisporê dilan
Deffa‘ê kurûban	Tunekirinê derdan
Narê cehîm	Agirê dojhê
Xîtamû’l-qewlî	Gotina herî dawî
‘Ellameê qewman	Pisporê miletan
Îstîğfarê eşharan	Tobekirina di şevan da
Zu’l-cenaheyn	Xwedanê per û baskan

Hinek nimûne ji malikên Erebî ku di nava helbestan da derbaz dibin:

Leke’l-hemdu îlahî we’ş-şelatu
‘Ela zatî lehu kemulet şifatu

(MS:6/20)

We şelle’l-lahu ‘ela xeyrî’l-beraya
Fe mîn enwarîhî qed ðae ‘urfe

(Q:18/13)

We alî şumme eşhabu'l-mezaya
We men mîn hîzbîhî qed cae 'urfe

(Q:18/14)

Îlahî qed teheyyertu we 'en geyrîke rece'tu
Bîke emrî tefewweđtu fe xuz mîmmame'elfaî

(X:6/9)

Eberre'n-nase fi'l-qewlî
We muncîhîm lede'l-hewlî
We îñ tes'el 'enî'l-fedlî
Fehaza leyletu'l-qedrî

(M:9/3)

Yunacî'l-lahe fi'l-ğeybî
We ma fi zake mîn reybî
Se'a 'edwen île'ş-şîbî
Lî xewfî'l-lahî we'z-ze'rî

(M:9/7)

Şêx Muşerrefêb Xinûkî, di bikaranîna terza mulemmê'ê da xwe weke pisporek nîşan dide. Hinek caran risteya Erebi, di dawiya malikê da, hinek caran di navenda malikê da, hinek caran di serê malikê da û hinek caran jî di herdu risteyên dawiyê da bikar tîne. Ev yeka hanê di nimûneyên jêrda bi awayekî zelal têne xuyakirin.

Mîne'l-lahî, île'l-lahî; me'e'l-lahî, we fi'l-lahî

Feya lî'l-lahî mîn ze'l-halî ya reb çî lezzet bû

(Q:27/10)

Ya Eba Selman Suleyman ey bira û ey çira
Bo çî mektûban birê nakî ji bo dostan çira
Hel tera înnî erakum qeble mewtî hel tera
Yan evan derd û geman dê bibne qebrê bi xwe ra
Ah ser û patêk helan ji vê firqetê ah firqetê

(MX:1/4)

Eya Şêxê ‘Îraqî min tu yî ruh
 Tu yî ruh û rewan Şêxê ‘Îraqî
Îleykum eştekî we’l-qelbu mecrûh
Bînarî’l-hubbî bu ‘dî we’f-tîraqî

(M:4 /11)

Qelbê ehlê dilan û çeyera ehlê dinî
 Quwweta wî ji şehînsahê resûlê medenî
 Ruhniya qelb û ciger sani’ê burdê yemenî
Înnehu’l-quṭbu bîhî’r-rîbḥu fe mînhu’îtenem

(M:6/2)

Weke li jorê jî derbazbû, di helbestên Xinûkî yên Kurdî da, unsûrên Erebi gelek zêde ne. Bo nimûne, me li jêrî çend mînak ji bo terkîb û hevokên Erebi û Kurdiya wan jî li hember wan dan.

Terkîb û Hevokên Erebi

Derd û gem û huzn û cefa
 Def’a gem û huzn û teillum
 (MS:6/9)
 Keza al we eşhab cemî’en
 (MS:6/21)
 Ehlen we sehlen (M:4/7)
 Huwe ‘Uşmanu mîne’l -hîlmî
 ‘Eliyyu’ş-şiyem (M:6/3)
 Înnehu’ş-şeyxu lî ehlî’l-lahî ḥaccu’l-herem (M:6/4)
 Men yerum muntehîyen yuġfer lehu ma selefa (M:6/5)
 Es’edu’l-kewnî îmamu melîkîn zû hîmem (M:6/5)
 Hebbeza en-nûḥu lî men yetbe’u ‘inde’l-fehem (M:6/6)
 Zehebe’l-kullu île’l-kellî²⁴ we lew bî’l-qelem (M:6/7)

Kurdiya Wan

Derd û xem û xemgînî û êş
 Defkirina xem û xemgînî û pê eşandin
 Keza malbat û hevalên wî bi tevahî
 Bi xêr û xweşî hatî
 Ew Osman e xûyê rûnermiyeke mezin e.
 Ji bo Xwedê ew kalê hecu’l-heremê ye.
 Kesê/a ku dev ji gunehan berdide û gunehên wî/ê tîn bexşandin.
 Ew herî bextewar e pêşeng e û xwedî armanc e
 Şîn û girî çî xweş e ji bo kesê/a serwest
 Welew bi pênuşê be jî gişt çû tengezariyê

²⁴ “el-Kellu” bi zebera kafe yanê westandin û ‘eziyet

Înne men yedrî ledeyhî zake e'le'n-nî'emî (M:6/8)	Xwediyê nimetê herî qenc e kesê/a xwedî îdraq
Exlîşû et-tewbete lillahî we za bi'n-nedem (M:6/9)	Ji dil û bi poşmanî tobe bikin ji bo Xwedê
We edîm 'eyşuhu we'c'elna lehu mîn xedem (M:6/10)	Berdewam bike jiyana wî û me bike xizmetkarê wî
Estegfîru'l-lahe'l-'ezîm (M:8/10)	Ji Xwedê lêborîna xwe dixwazim
Bîla îza bîla 'esrê (M:9/16)	Bêzor û bêzehmetî
Ke qemqamîn bîla qe'rê (M:9/17)	Weke kuffîna nekûr
We ente bî'r-rehîmî (M:14/14)	Û tu bi rehma xwe
Serrafê qulûban (M:11/9)	Pisporê dilan
Deffa'ê kurûban (M:11/9)	Tunekirinê derdan
Tehte'l-emrî (Q:7/8)	Ser seran
Narê cehîm (Q:35/15)	Agirê dojhê
We şelle'l-lahu 'ela xeyrî'l-beraya (Q:18/13)	Selat û hem selam li ser xêrtirînê mexlûqan
Fe mîn enwarîhî qed dae urfe (Q:18/13)	Urfe bi ronahiya wê ronî dibe
We alî şumme e şhabu'l-mezaya (Q:18/14)	Û li ser malbata wî paşê li ser eshabên bifezîlet
We men mîn hîzbîhî qed cae urfe (Q:18/14)	Û li ser wan kesên ku ji hîzba wî ne û hatine Urfê
Def'u'l-gem (Q:19/20)	Def'a xeman
Şedeq'r-rusul (Q:25/8)	Pêxemberan rast gotin
Hel tera înnî erakum qeble mewtî hel tera(MX:1/4)	Tu nabînê bêguman berî mirinê ez te dibinim tu nabînê
Cerîhê firqetîm (MX:1/5)	Birîndarê xerîbiyan im
Ehebbu'l-eqrîba (X:2/1)	Eqrebayê (mervê) herî hezkirî

1.3.1.3. Unsûrên Farisî

Şêx Muşerref, di helbestên xwe da di bin tesîra zimanê Farisî da jî maye. Wî, peyvên Farisî bikar anîne, lê gelek hindik. Li jêrî jî hinek peyvên ku wî di helbestên xwe yên Kurdî da bi kar anîne, weke nimûne hatine nîşandan.

Peyva Farisî	Kurdiya Wê	Peyva Farisî	Kurdiya Wê
Naşehîh	Nedurust	Dibosim	Paçî dikim
Nalezîz	Bêtahm	Mewlayê ma	Mewlayê Me
Bûsedar	Ramûsanvan	Bîm	Tirs
Xer	Ker	Xûb	Xweşik
Destê ma	Destê me	Nemî ayed	Nayê

1.3.2. Mexlesa Wî

Di edebiyata klasîk da weke kevneşopiyekê, helbestvan di helbestên xwe da gelek caran navên xwe yên rasteqînî bikar naînin, di dewsa navên xwe da ji xwe ra mexlesan bi kar tînin. Weke mînak; di edebiyata Kurdî da Melayê Cizîrî mexlesa “Nîşanî û Mela” zêdetir bi kar aniye û Feqîyê Teyran jî “Mîm Hê û Feqî” bikar aniye.

Em dema li dîwana Şêx Muşerref mêze dikin, dibînin ku wî jî ev kevneşopiya edebiyata klasîk bikar aniye û di helbestên xwe yên Kurdî da ji xwe ra mexlesa “Mîm Fa” û hinek caran jî mexlesa “Muşerref” bi kar aniye. Weke nimûne:

Îlahî bike meskenê **Mîm Fa**

Ewî bağê pir lezzet û hem şefa

(MS: 2/26)

Ya îlahî **mîm** û **fa** ye

Yê ji xelqê bêrica ye

Heviya zatê te maye

Pê ve ez hêviya hebîbim

(M: 5/6)

Ey **Muşerref** bes bibêj yeksane lew kurt û dirêj

Yê ku zana bî li nik wî wek yekin lew tişt û teşt

(X: 1/5)

Ey **Muşerref** beske (x)garan were rahet rûne tu

Qore hespê te xelas nake ewê deşta ‘ezîm

(Q: 10/4)

Di malikeke Erebî da jî Şêx Muşerref mexlesa “mîm fa” yê bikar tîne.

Îlahî qed teheyyertu we ‘en geyrîke recce‘tu
Bîke emrî tefewwedtu fe xuz **mîm** ma me‘el **faî**

(X: 6/9)

1.3.3. Edîbên Ku Li Ser Tesîr Kirine

Şêx Muşerrefê Xinûkî, di helbestên xwe da herî zêde di bin tesîra Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî, Melayê Bateyî, Mela Xelîlê Sêrtî û Seyîd Elî Findikî da maye û ji wan sûd wergirtiye. Li jêrî em dê li ser ew helbestvanên ku li ser Şêx Muşerrefê Xinûkî bûne xwedî bandor, bisekinin.

1.3.3.1. Melayê Cizîrî

Bandora Melayê Cizîrî him ji aliyê ziman va him jî ji aliyê naverokê va li ser Şêx Muşerrefî gelek zêde çêbûye. Weke mînak, helbesta Şêx Muşerrefî ya bi navê “*Derdê Bêderman Fîraq e*” dişibihe helbesta Melayê Cizîrî ya bi navê “*Bi Narê Fîrquetê Şohtim*”. Ji aliyê naverokê va zêde di bin bandora helbesta Cizîrî da maye, lê ji aliyê lefzî va riste newekhev in. Çarîna serî û ya dawiyê ya helbesta Cizîrî û ya Xinûkî evha ne:

Helbesta Melayê Cizîrî ya bi navê “*Narê Fîrquetê Şohtim*” benda serî û ya dawiyê.

Bi narê fîrquetê şohtim
Ji ferqê heta ser pê da
Xedenga xefletê Nûhtin
Ji berqa lami‘a tê da²⁵

Mela bêqameta yekta
Qiyamet min çehvan dî
Fîrquetê rûsiyan bin te
Ji min canê şîrîn cê da²⁶

Helbesta Şêx Muşerrefê Xinûkî ya bi navê “*Derdê Bêderman Fîraq e*” benda serî û ya dawiyê.

²⁵ Mela Ehmedê Zivingî, *Gerdeniya Gewherî Şerha Dîwana Melayê Cizîrî*, (Amadekarî û Wergera ji Erebi: Emîn Narozî), Weş., Avesta, Çapa 1ê, 2013 İstanbul, r. 123

²⁶ Mela Ehmedê Zivingî, r. 139.

Derdê bêderman fîraq e
 Ew bi mişlê ihtiraq e
 Ew didit xelqê filaq e
 Raĥetî vê ra fena ye

(M:1/1)

Her kesê dîtî bi şewket
 Ew dizanî ew we naket
 Heta ser tilyan bi zer ket
 Yek ji wan jî **mim fa** ye

(M:1/10)

1.3.3.2. Ehmedê Xanî

Şêx Muşerrefê Xinûkî gelek zêde di bin tesîra Ehmedê Xanî da maye û hinek caran jî rasterast bi helbesta Xanî dest bi helbestên xwe kiriye. Weke nimûne di xezela xwe ya bi navê “Di Fesla Nûbiharê” da bi vê malika ku di Nûbihara Piçûkan da derbaz dibe destpê dike:

Di fesla nûbiharê da digel dîlber biçim geştê
 Ji ew xweştir ‘umur nayê li min hal qewî xweş tê²⁷

(X:9/1)

Şêx Muşerrefê Xinûkî, bi taybetî di bin bandora berhema Ehmedê Xanî ya bi navê ‘Nûbihara Piçûkan’ da maye. Ehmedê Xanî di berhema xwe da di serê her beşê da weke şîretê, gotinek gotiye. Xinûkî jî di serê helbestên xwe yê Kurdî da bi navê “Gûz û Miwîj” beşek nivîsandiye û têda şîretan li xwendekaran dike. Dema mirov vê beşê dixwîne, dibêje her wekî ku ez Nûbihara Piçûkan dixwînim:

Di serê beşa yekem da Ehmedê Xanî evha dibêje:

Heta tu dewr û dersan nekî tekrar û mesrûf
 Di dinyayê tu nabî ne meşhûr û ne me‘rûf²⁸

Şêx Muşerrefê Xinûkî di serê beşa “Gûz û Miwîj”an da evha dibêje:

Bixûnin hûn nekin teqşîr û sistî
 Emanet se‘î û teşîl û durustî

(MS: 1-1/1)

²⁷ Ehmedê Xanî, *Nûbar*, (Berhevkar, Zeynelabîdîn Kaya), Weşanên Roja Nû, Stockholm 1986, r. 31

²⁸ Ehmedê Xanî, r. 9.

Bixûnin hûn di havîn û zivistan
Nebî çêbî ji we yek roj û westan

(MS: 1-1/3)

Bi dîqqet hûn bikin daim mişal e
Muşale malekî qet bêzewal e

(MS: 1-1/5)

1.3.3.3.Melayê Bateyî

Melayê Bateyî, helbesta xwe ya bi navê “*Ya Îlahî Ez Xerîbim*” li ser xerîbî û xurbetiyê nivîsandiye û her weha Şêx Muşerref jî bi rengê Melayê Bateyî û bi heman navê, helbestek nivîsandiye.

Ya îlahî ez gerîbim
Daima her dilkebîb im
Bêhebîb û bêtebîbim
Mam dinav qewmê xerîb²⁹

Şêx Muşerrefê Xinûkî jî di qesîdeya xwe ya bi navê “*Ya Îlahî Ez Xerîbim*” da evha dibêje:

Ya îlahî ez gerîbim
Bênewa me bêdelîl im
Ya îlahî ez ‘elîlim
Bêdewa me bêtebîbim

(M:9/10)

Melayê Bateyî evha dest bi mewlûda xwe dike:

Hemdê bêhed bo Xudayê ‘alemîn
Ew Xudayê daye me dînê mubîn³⁰

Şêx Muşerrefê Xinûkî jî di qesîdeya xwe ya bi navê “*Ey Muzeffer Ey ‘Ezîz Ey Çîçeka ‘Ebbasiyan*” da evha dibêje:

²⁹ M. Xalid Sadînî, *Mela Huseynê Bateyî- (Jiyan, Berhem û Helbestên Wî)*, Weş. Nûbiharê, Çapa 3yan, İstanbul 2013, r. 68.

³⁰ Melayê Bateyî, *Mewlûd*, , Amadekar Huseyn Şemrexî, Weş. Nûbiharê, Çapa 2yan, İstanbul 2012 r. 9.

Hemdê bê hed bo Xudayê bêzewal û bêfena
Malikê her nî‘metan û mu‘tîyê her qenciyan

(Q:25/11)

1.3.3.4.Seyîd Eliyê Findikî

Şêx Muşerref li ser şêxê terîqeta xwe bi navê “Gelek Îro Birîndarim” û “Gelî Berwariyan Beskin” du helbest nivîsandine û Seyîd Eliyê Findikî jî bi navê “Meded Seyda Meded Seyda” helbestek nivîsandiye. Li xwarê, me jî helbesta Findikî û Xinûkî çarîna yekemîn daye:

Meded Seyda meded Seyda
Mi etrafê dinê tek da
Yekî wek te nebû peyda
Meded Seyda meded Seyda³¹

Helbesta Şêx Muşerrefê Xinûkî ya bi navê “Gelek Îro Birîndarim” jî evha destpê dike:

Gelek îro birîndarim
Medet ya Şahê Erbîlê
Gelek îro gunehkarim
Medet ya şahê Erbîlê

(M:3/1)

Helbesta Şêx Muşerrefê Xinûkî ya bi navê “Gelî Berwariyan Beskin” jî evha destpê dike:

Gelî Berwariyan beskin
Bikin tewbê ji ‘îsyanan
Bi hawar û ji dil bêjin
Meded şêx Es‘edê Sanî

(M:10/1)

³¹ Seyîd Elî Findikî, *Dîwana*, Amadekar, Selman Dilovan-Huseyn Şemrexî, Çapa 7an, İstanbul 2014, 83.

**BEŞA DUYEM
LÊKOLÎNA DÎWANÊ**

2. JI ALÎYÊ RUXSARÎ Û NAVEROKÊ VA

2.1. JI ALIYÊ RUXSARÎ VA

2.1.1. Şiklê Tertîbê

Dîwana Şêx Muşerrefê Xinûkî, pirzimanî ye. Di dîwanê da ji 200î zêdetir bi ‘Erebî, 78 helbest bi Kurdî, 10 helbest bi Farisî û helbestek jî bi Tirkî ye. Helbestên bi ‘Erebî di dawiyê da ne, yên Kurdî, Farisî û Tirkî jî di serê dîwanê da ne û tevlihevin. Dîwana Şêx Muşerref, dîwaneke murettib nîne; yanê li gorî rêza qafiyeyê nehatiye nivîsandin.


Ji bo ku mijara me bi tenê li ser helbestên Xinûkî yên bi Kurdî ne, me agahî bi tenê di derbareyê helbestên wî yên Kurdî da dane. Şêx Muşerref, helbestên xwe li gorî elîfbêya Erebi bi temamê herfan nenivîsandine û bi sêzdeh (13) herfên Erebi û bi herfeke (1) Kurdî (ع/ه) nivîsandine û hejmara helbestên ku bi herfa Kurdî hatine nivîsandin jî şeş in. Me di tabloya jêrî da helbestên Kurdî ji aliyê herfa qafiyeyê, ji aliyê hejmara helbestên ku bi heman qafiyeyê hatine nivîsandin û ji aliyê hejmara wan va dane.

CUREYÊN HELBESTAN								
Herfa Qafiyeyê		Rêza Qesideyê	Rêza Xezelê	Rêza Mesnewiyê	Rêza Murebbe'ê	Rêza Muxemmesê	Rêza Yekmalikê	Hejmara Helbestan
ا-A	---	---	---	---	2, 11, 16.	---	---	3
ب-B	---	---	---	---	---	---	4, 6	2
ت-T	---	---	1.	---	---	---	---	1
د-D	9, 21.	---	---	9.	---	---	---	3
ر-R	3, 14.	---	---	7.	---	---	3.	4
س-S	---	---	---	---	---	---	5.	1
ف-F	4, 15.	---	---	---	---	---	---	2
ك-K	17.	---	---	1-4.	---	---	---	2
ل-L	---	---	---	2.	---	---	---	1
م-M	10.	---	---	1-2, 3, 5.	5, 6.	---	---	6
ن-N	1, 6, 7, 11, 13, 16, 19, 20, 22, 24, 25, 26.	2, 3, 4.	1, 1-5, 6, 8.	8, 15.	---	---	---	21
و-W	27.	5.	---	---	12	---	---	3
ه-H	18.	---	---	4.	1.	---	7.	4
ي-Y	2, 5, 12, 23.	6, 7, 8.	1-1, 1-3, 1-6.	4, 7, 10, 13, 14, 17.	---	---	1, 2.	18
ئ-Ê	8.	9, 10, 11.	---	---	3, 9.	1.	---	7
Tevahî	27	11	15	17	1	7	78	

Çawa ku di tabloya jorê da jî tê xuyakirin Şêx Muşerrefî, helbestên xwe yên Kurdî bi herfên ‘Erebî yên“ ق، غ، ع، ظ، ط، ص، ض، ز، ش، س، ح، خ، ذ، ز، ش، ص، ض، ط، ظ، ع، غ، ق ‘e, ğ, q” û bi herfa “گ/g” yê ya Kurdî nenivîsandine. Dema mirov tabloyê di ber çavan ra derbaz dike, dibîne ku Xinûkî, herî zêde bi herfa “ن-n”yê û bi herfa “ي-y”yê helbest nivîsandine û bi herfa “ن”yê bîst û yek (21) û bi herfa “y” yê jî hijdêh (18) helbest nivîsandine. Herfên ku herî kêr pê helbest nivîsandine jî “ت-t” û “ل-l” nin û bi herfa “t”yê yek helbestek û bi herfa “l”yê jî du (2) helbest nivîsandine.

2.1.2. Cureyên Helbestan

Şêx Muşerrefê Xinûkî, helbestên xwe yên Kurdî bi şeş (6) cureyan nivîsandine. Helbestên ku di dîwanê da cih girtine ne bi nîzamî ne, tevlihev in. Cureyên helbestan bi vî şiklî cih digirin: 27 qesîde, 11 xezel, 15 mesnewî, 17 murebbe', 1 muxemmes û 7 yekmalik in.



2.1.2.1. Qesîde

Peyva qesîdeyê ji lêkera “qe-se-de”yê hatiye dariştin û lêker tê wateya “çûyîna ber bi tişteki va, pêşdaçûyîn, armanckirin, qestkîrin û nêzîkbûyînê”³². Weke pênase di wêjeyê da tê wateya ji bona pesindayîna kesekî/ê û ji bona di nivîsandina helbestan da alîkarîgirtin. Qesîde, ji edebiyata Ereban hatiye afirandin û di edebiyata Îraniyan da xurt bûye û Kurdan jî tevli wêjeya xwe kirine.

Qesîde ji 9 malikan destpê dike hetanî 100malikan jî diçe û ji serî hetanî binî bi heman wezna ‘erûzê va tê nivîsandin. Qafiyeya wê aa / xa / xa ...ye û ji malika wê ya serî ra “metle” û ji ya dawiyê ra jî “meqte” tê gotin. Ji malika herî xweşik ra “şah-beyt” an jî “beytu’l-qeşîd” tê gotin û ji beyta ku mexlesa helbestvan têda derbaz dibe ra jî “taç beyit” tê gotin. Qesîdeyeke kemilî ji beşên nesîb/teşbîb, gîrîzga, medhiye/pesin, texazul, fexriye û duayê pêk tê û ev taybetî ji bona qesîdeyeke kemilî ye, di qesîdeyeke nekemilî da dibe ku ji van beşan hinek tunebin jî. Mijarên ku di qesîdeyan da cih digirin jî ev in: Tewhîd, munaceat, ne’t, pesindayîn, rexne û şîn. Di cedwela jêrî da hejmarên qesîdeyan û hejmarên malikên wan hatine dayîn.

														Yekûn
Rêza	1,	2	3,	4,	5,	8, 11,	9,	10	13	15,	16,	21	23,	27
Qesîdeyê	19		6,	7	14	25,	12			17,	18,		27	
			24			26				20	22			
Hejmara Malikan	23	22	6	10	13	11	15	16	15	9	14	5	17	176

³²el-Qamûsu’l-Muhît, r. 1328.

Di helbestên Şêx Muşerrefê Xinûkî da, hejmara herî zêde ya qesîdeyan e. Çawa ku di cedwela jorê da jî tê xuyakirin hejmara qesîdeyan 27 e û bi tevahî hejmara malikan jî 176 e. Xinûkî, di van qesîdeyan da di qesîdeya bi hejmara 10an di malika 4an da û di qesîdeya bi hejmara 23yan di malika 8an da mexlesa xwe ya “*Muşerref*” bi kar aniye.

2.1.2.2. Xezel

Peyva xezelê, ji aliyê ferhengê va tê wateya, bi gotinên xweş, destxistina hezkirina jinan, suhbetkirina li ser eşqa bi jinan ra û bi helbestî bi lêvkirina hestên xweş ji bo jinan³³. Xezel weke pênase di edebiyatê da navê nezma ku malika wî ya destpêkê di nav xwe da bi qafiye ye û malikên din jî risteya duyemîn bi malika detpêkê ra bi qafiye ye û rista yekemîn jî bi serê xwe ye; yanê bi şiklê xa / xa / xa ... yê ra tê gotin.

Mijara xezelan jî bi gelemperî evîn, tesewuf, şerab, felsefe, hîkmet, şîret û... hwd in. Ji aliyê mijarê va bi gelemperî bi navên xezelên rind û xezelên zuhd, du celeb xezel hene. Rind, peyveke Farisî ye û pirjimariya wî jî rindane ye, tê wateya kesê ku bi awayekî baş li karûbarê dinyayê mêze dike. Rind, li şîrînahiyê û talayiyê, li başî û nebaşiyê bi çavekî baş dinêre. Li cem wî kêfxweşî û derd û kul û keder yek in. Yê ku felsefeya wan ya jiyane wiha ye ji wan re rind tê gotin û zuhd jî peyveke Erebi ye û tê wateya li gel bicîanîna emr û fermana Xwedê, xwe parastina tiştên ku têda guman hene ne. Wateya wî a têgehî jî ew e ku mirov meyla xwe nede ser dinyayê û jê bikerixe. Ebû Suleyman ed-Daranî hemû cureyên zuhdê di hevokekê de bi cih dike û wiha dibêje: “Zuhd ew e ku, dev jê berdana wan tiştên ku te ji Xwedê dîr dixê.”³⁴

Di edebiyata klasîk da hejmara malikan di navbera 5 û 15an da tê guhertin û ji malika yekem ra “*metle*” ji ya dawiyê ra jî “*meqte*” tê gotin. Helbestvan bi gelemperî mexlasên xwe di malika meqte’yê da dinivîsînin. Di cedwela jêrî da hejmarên xezelan û hejmarên malikên wan hatine dayîn.

						Yekûn
Rêza Xezelê						
	1	2,3,5,9	4	6,7,8	10,11	11
Hejmara Malikan						
	5	6	10	9	3	33

Şêx Muşerref, di helbestên xwe da zêde cih nedaye xezelan, bi tevahî 11 xezel nivîsandine û tevahiya malikên wan jî 33 hebin. Xinûkî, li gorî kevneşopiya edebiyata klasîk hejmara xezelan nivîsandiye. Lê hejmara malikên du xezelên wî di bin hejmara pêncanda ye. Ev yeka hanê jî li dijî kevneşopiya edebiyatê ye. Şêx Muşerref, di malika dawiyê ya xezela bi hejmara 1ê da mexlesa xwe ya “*Muşerref*” û di malika dawiyê ya xezela 6an da jî mexlesa xwe ya “*Mîm Fa*”yê bikar aniye.

³³ *el-Qamûsu'l-Muhîf*, r. 1186.

³⁴ Nesim Sönmez, Hafız-ı Şirazi-Melayê Cizîrî Karşılaştırması (Aşk, Gül, Bülbül, Rinde, Züht ve Dini Semboller Açısından), *Uluslararası Sosyal Araştırmalar Dergisi*, Cilt: 8, Sayı: 40, Ekim 2015, r. 142.

2.1.2.3. Mesnewî

Mesnewî, peyveke Erebi ye û ji lêkera “se -na”yê hatiye dariştin û tê wateya ducarîkirinê³⁵. Weke têgeheke edebiyatê mesnewî hem navê teşeyeke nezmê ye, him jî navê cureyek ji berhemên klasîkêye. Her malika mesnewiyê di nav xwe da bi qafiye ye; yanê bi şiklê aa / bb / cc / ... yê ye û wateya her malikê di navxwe da temam dibe, lê hewceye ku di nav malikan da yekîtiya mijarê hebe. Hejmara malikan ji du beytan hetanî bi hezaran diçe; yanê bêsinor e. Ji ber ku qafiyeya beytên mesnewiyan bi serê xwe ne, mirov dikare çîrokên dirêj bi vê teşeyê binivîsîne.

Mesnewî, bi kêşa ‘erûzê û bi qalibên kurt û ji serî hetanî binî bi yek qalib tê nivîsandin. Di navbera mesnewiyan da cih nayê dayîn teşeyên weke xezel û qesîdeyan yanê mesnewî teşeyeke bi serê xwe ye. Mijarên wî bi piranî dîn, tesewuf, destan, menqibe, dîrok, ilim, dîdaktîk/şîret, ‘eşq, şer, qehremanî û... hwd nin û ji beşên destpêk, mijara sereke û dawiyê yanê ji sê beşan pêk tên. Di beşa destpêkê da besmele, tehmîd, tewhîd, munaceat, ne‘t, mî‘rac, mu‘cizat, pesnê her çar xelîfeyan, medha/pesna rêveberan yan jî ya ku mesnewî jê ra hatiye diyarkirinê tê kirin û sedema nivîsandina mesnewiyê cih digire. Di beşa mijara sereke da mijar, bi awayekî berfireh tê hûnandin. Di beşa dawiyê da bi piranî di bin navê xatimeyê da dua, pesindayîn, navê berhemê, dîroka nivîsandinê, ji kesên ku berhemê dixwînin xwestina duakirinê û agahiyên di derheqê kêşa ‘erûzê ya ku berhem pê hatiye nivîsandinê da têne dayîn³⁶.

Mesnewî di edebiyata Farisan da hatiye afirandin û ji vir jî di nava edebiyata Ereb, Kurd û Tirkî da belav bûye.

Di cedwela jêrî da hejmarên mesnewiyan û hejmarên malikên wan hatine dayîn.

												Yekûn
Rêza	1,1-	1-1,1-2	1-3,9	1-4,1-5	2	3	4	5	6	7	8	15
Mesnewiyê	6											
Hejmara	4	8	10	6	26	40	9	12	21	14	7	153
Malikan												

Di helbestên Şêx Muşerref da, teşeya mesnewiyê ji aliyê bikaranîna teşeyê va bi hejmara helbestan di rêza sêyem da û bi hêjmara malikan jî di rêza duyem da cih digire. Mesnewiya herî dirêj ji 40 malikan pêk tê û di nav cureyê mesnewiyê da di rêza sisêyan (3yan) da ye. Xinûkî, di vê celebê da zêdetir dixwaze şîretan li xwendevanan bike, bang li feqîyan dike û dibêje guh bidin nesîhetên min, pir bixwînin û hindik qise bikin, qedrê seydayên xwe bizanin, bi liv û tevgerên baş bi hevalên xwe ra tevbigerin, xwediyê exlaqê baş bin û ji bo serkeftinê ji feqîyan ra duayan dike. Di mesnewiya ku di rêza çaran (4an) da ye û bi navê “Îlahî Tu Bi Heqqê Îsmê E‘zem” e da behsa şêxên terîqeta xwe dike û di malikan da rêza silsileyê wan dide. Ev mesnewiya hanê bi eslê xwe ya Mewlana Xalidê Şehrezorî ye û wî wergerandiye Kurmanciyê.

³⁵ *el-Qamûsu ‘l-Muhîf*, r. 225.

³⁶ Haluk İpekten, r. 61.

Xinûkî, di mesnewiya di rêza duduyan (2yan) da di malika wê ya dawiyê damexlesa xwe ya “*Mîm Fa*”yê bikar tîne.

2.1.2.4.Murebbe‘

Murebbe‘, di ferhengê da tê wateya çarkoşe û çarînê³⁷ û di edebiyatê da jî weke pênase ew teşeyê nezmê ye ku her bendeke wê, ji çar risteyan pêk tê. Bi piranî murebbe‘ bi 5-7 bendan tê nivîsandin û qafiyeya wê jî evha ye: Benda çarîna destpêkê di nav xwe da bi qafiye ye û bendên dinê jî hersê risteyên serî di nav xwe da bi qafiye ne û risteya dawiyê jî bi benda destpêkê ra bi qafiye ye.

Eger rista dawiyê ya bendan bi tenê bi qafiyeyê bihev ra hatibe girêdan, jê ra “murebbe‘a muzdewîc” tê gotin û şiklê qafiyeyê evha ye: aaaa, bbba, ccca,...Eger rista di dawiya bendan da bi heman şiklî were dubarekirin jê ra “murebbe‘a mutekerrîr” tê gotin û şiklê qafiyeya wê jî evha ye: aaaA, bbbA, cccA,... Di vir da hewce ye risteya ku tê dubarekirin bi hersê risteyên din ra ji aliyê wateyê va bihev ra werine kelandin. Di edebiyata klasîk da herî zêde murebbe‘a mutekerrîr hatiye bikaranîn³⁸

Di cedwela jêrî da hejmarên murebbe‘an û hejmarên malikên wan hatine dayîn.

	Yekûn									
Rêza	1,2,6,8	3	4,7,11,15	5	9	10,12	13	14	16,17	17
Murebbe‘ê										
Hejmara	10	11	12	6	19	15	9	14	3	99
Malikan										

Di helbestên Xinûkî da, teşeya murebbe‘ê ji aliyê bikaranîna teşeyê va di rêza duduyan da û bi hejmara malikan jî di rêza sisêyan da cih digire. Şêx Muşerref, murebbe‘ên xwe yên ku di rêza 3, 7, 10, 14 û 17an da cih girtine bi şiklê murebbe‘ên mutekerrîr hûnandiye û yên din jî bi şiklê murebbe‘ên muzdewîc hûnandiye. Xinûkî, di murebbe‘a 1/6, 5/6 û 14/3yan da mexlesa xwe ya “*Mîm Fa*”yê bi kar aniye. Weke di cedwela li jorê da jî tê xuyakirin murebbe‘a ku bendên wî herî dirêj di rêza 9an da ne û bi nozdeh bendan cih digirin û yên herî kin jî bi 3 bendanin û di rêza 16an û 17an dacih digirin.

2.1.2.5.Muxemmes

Muxemmes peyvekeErebî ye û tê wateya pêncbend û pêncbareyê³⁹ di edebiyatê da weke pênase, ew menzûmeye ku her bendeke wê ji 5 risteyan pêk tê. Bi piranî di navbera 4-8 bendan da tê nivîsandin û qafiyeya wê ji bona celeba muxemmesa muzdewîc aaaaa / bbba / ccca / ... ye û ji bo muxemmesa mutekerrîr jî du cure ne: aaaA / bbbA / cccA / ... ye yan jî aaaAA / bbbAA / cccAA / ... ye.

³⁷ *el-Qamûsu‘l-Muhît*, r. 611.

³⁸ İpekten, r. 85-86.

³⁹ *el-Qamûsu‘l-Muhît*, r. 499.

Çawa di cedwela jêrîda jî tê xuyakirin di nav helbestên Şêx Muşerrefî da, helbestek tenê bi şiklê muxemmesê hatiye nivîsandin heye û ew jî 8 bend e û bi terza muxemmesa mutekerrîr hatiye hûnandin.

		Yekûn
Rêza Muxemmesê	1	1
Hejmara Bendan	8	8

2.1.2.6. Yekmalik

Yekmalik, di ferhengê da tê wateya yek û bitenê⁴⁰, di edebiyatê da weke pênase, tê wateya helbesta yekmalika ku pêşiya wê û dawiya wê tune ye, yanê bi serê xwe hatiye nivîsandin û têkiliya wê bi malikên din ra tune ye, tê gotin. Di nezma yekmalikê da lihevhatina qafiyeyê neşert e.

Di cedwela jêrî da hejmarên yekmalikan û hejmara malikên wan hatine dayîn.

								Yekûn
Rêza Yekmalikê	1	2	3	4	5	6	7	7
Hejmara Malikan	1	1	1	1	1	1	1	7

Çawa di cedwela jorê da jî tê xuyakirin di nav helbestên Xinûkî da, bi terza yekmalikê 7 heb helbest hatine nivîsandin û her malikek jî di nav xwe da bi qafiye ye.

2.1.3. Kêş (Wezn)

Kêş (wezn) ew pîvan e ku di nezmê da tê bikaranîn. Lê şert e ku nezm bi kîjan pîvanê destpê kiribe, bi wî jî biqede. Di edebiyata Kurdî da kêşa xwemalî (kîteyî/birgeyî), kêşa ‘erûzê û kêşa azad hatiye bikaranîn. Kêşa xwemalî, li ser lihevkirina hejmarên kîteyan ava dibe û zêdetir di edebiyata gelêrî da, kêşa ‘erûzê di edebiyata klasîk da û kêşa azad jî di edebiyata modern da hatiye bikaranîn.

‘Erûz, tê wateya bajarê Mekkeyê, bajarê Medîneyê, hêştira serkêş, hustûna ku di navenda kon da tê tîkkirî û pîvana helbestê⁴¹. Kêşa ‘Erûzê, di çarçoveya edebiyata klasîk da ji rêbaza ku yeksanbûna rêzên kîteyên kurt û dirêj yan jî girtî û vekirî ra tê gotin.

Binyada kêşa ‘erûzê ji edebiyata Ereban di serdema Cahiliyeyê da derketiye û di dewra Emewiyan da Xelîlê Kurê Ehmedî (m. 792) bi berhema xwe ya bi navê Kîtabu’l-‘Erûzê bingeha wê daniye.

Piştî ku Kurddînê Îslamê dipejirînin, ew jî kêşa ‘erûzê bi kar tînin. Kurd, ji vê weznê ra him weke Ereban dibêjin “‘erûz” him jî dibêjin “kêşnasî” û kêşsazî”⁴². Di nava Kurdan da dîroka bikaranîna kêşa ‘erûzê’ gelek kevn e. Mînak, Baba Tahîrê Uryan di sedsala Xan da Dubeytiyên xwe bi kêşa ‘erûzê nivîsandine. Mirov dikare bibêje temamê helbestavanên Kurd

⁴⁰ *el-Qamûsu’l-Muhît*, r. 1230.

⁴¹ *el-Qamûsu’l-Muhît*, r. 1073.

⁴² Mesûd Cemîl Reşîd, *Kêş û Serwa di Hozana Kurdî da*, Dezgehê Nalbend, Duhok 2017, r.14-15.

yên klasîk bi kêşa ‘erûzê helbestên xwe nivîsandine. Şêx Muşerrefê Xinûkî jî li ser şopa helbestvanên klasîk çûye û wî jî helbestên xwe li gorî pîvanên kêşa ‘erûzê nivîsandine.

Şêx Muşerref di bikaranîna kêşa ‘erûzê da her çiqasîserkeftûbe jî di hinek helbestên wî da gelek pirsgirêk hene. Weke mînak, helbestvan qesîdeya heyştan (8an) bi behra er-remel el-musemmen es-meħzûf yanê bi qalibê “*Fa’îlatûnFa’îlatûnFa’îlatûnFa’îlun*”ê nivîsandiye. Lê di vê qesîdeyê da malika jêrî li vê qalibê nayê.

Şerha eħwalê fîraqê muxteşer nînin bizan

Belkî sed eṭwel muṭewwel qet nika şerh dinê

(Q: 8/3)

Dîsa xezela dehan (10an) bi behra el-hezec el-museddes el-meħzûf yanê bi qalibê “*Mefa’îlunMefa’îlun fe’ûlun*”ê hatiye nivîsandin lê malika sisêyan (3an) li qalibî nayê.

Ji bo te afiyet bit ew şeraba

Vexarî te eya dostê Giravê

(X:10/3)

Xinûkî, gelek caran qisûrên ‘erûzê jî bi kar aniye. Bo nimûne, helbestvanî, qesîdeya xwe ya dehan (10an) da bi behra er-remel el-musemmen es-meħzûf bi qalibê “*Fa’îlatûnFa’îlatûnFa’îlatûnFa’îlun*” nivîsandiye. Lê ji bo ku misreya li weznê weredi malika çaran (4an) da wesl bi kar aniye.

Ey **Muşerref** beske ğaran were rahet rûne tu

Qore hespê te xelas nake ewê deşta ‘ezîm

(Q:10/4)

Helbestvanî mesnewiya duduyan (2yan) bi behra el-muteqarib el-musemmen el-meħzûf yanê bi qalibê “*Fe’ûlun fe’ûlun fe’ûlun fe’ûl*”ê nivîsandiye. Di malika jêrî da ji bo ku li qalib were, zihaf hatiye emilandin.

Hebûn têda tûṭî û çûkê xerîb

Û şehlûl û bilbil digel ‘endelîb

(MS: 2/2)

Şêx Muşerref, murebbe‘a yekem (1em)ê bi behra er-remel el-musemmen es-salim bi qalibê “*Fa’îlatûnFa’îlatûnFa’îlatûnFa’îlatûn*”ê nivîsandiye. Lê ji bo ku misreya li weznê rûnê di benda duduyan (2’an) da îmale bi kar aniye.

Diçte xelqê bi kulab e
 Ew diket sîne qelab e
 Kes niza ew çi ‘îtab e
 Rehm û însaf cem gela ye

(M: 1/2)

Xinûkî, di helbestên Kurmancî da behra remelê, behra recezê, behra hezecê û bi behra muteqaribê bi kar aniye. Çawa ku di cedwela jêrî da jî tê xuyakirin Şêx Muşerref helbestên xwe bi piranî bi qalibên salim nivîsandine. Bi tenê heft (7) qesîde bi behra hezecê ya nesalim û murebbe‘ek (1) bi behra remelê ya nesalim nivîsandine. Xinûkî, bi behra hezecê sî(sih)û penc (35), bi behra remelê sî û yek (31), bi behra hezecê şeş (6) û bi behra muteqaribê jî du (2) helbest nivîsandine.

Wer tê xuyakirin ku Xinûkî, zêde ji behra hezecê hez kiriye. Lewra wî 35 helbest bi behra hezecê nivîsandine. Herî kêr jî bi behra muteqaribê helbest nivîsandine. Dema mirov li helbestên wî mêze dike dibîne ku du (2) helbest tenê bi vê behrê nivîsandine.

Cureya Helbestê	Rêza Helbestê	Hejmara Helbesta	Behra ‘Erûzê	Qalibê Behrê
Qesîde				
	1, 2, 4, 6, 8, 9, 10, 14, 15, 16, 17, 19, 21, 22, 25.	15	Remel	Fa’îlatûnFa’îlatûnFa’îlatûnFa’îlun
	12.	1	Recez	Mustef’îlun mustef’îlun mustef’îlun mustef’îlun
	3, 7, 11, 20, 23, 26, 27.	7	Hezec	Mefa’îlunMefa’îlunMefa’îlunMefa’îlun
	5, 13, 18, 24.	4		Mefa’îlunMefa’îlun fe‘ûlun
Mesnewî				
	1, 1-1, 1-2, 1-3, 1-4, 1- 5, 1-6, 3, 4, 5, 6, 7, 8, 9.	14	Hezec	Mefa’îlunMefa’îlun fe‘ûlun
	2.	1	Muteqarib	Fe‘ûlun fe‘ûlun fe‘ûlun fe‘ûl
Muxemmes				
	1.	1	Remel	Fa’îlatun fa’îlatun fa’îlatun fa’îlun

Xezel

1, 3, 5, 7, 8, 11.	6	Remel	Fa'îlatûnFa'îlatûnFa'îlatûnFa'îlun
4.	1	Muteqarib	Fe'ûlun fe'ûlun fe'ûlun fe'ûl
6.	1	Hezec	Mefa'îlunMefa'îlunMefa'îlunMefa'îlun
9.10	2	Hezec	Mefa'îlunMefa'îlun fe'ûlun
2.	1	Recez	Mustef'îlun mustef'îlun mustef'îlun mustef'îlun

Murebbe'

1, 5.	2	Remel	Fa'îlatûnFa'îlatûnFa'îlatûnFa'îlatûn
6	1	Remel	Fe'îlatun fe'îlatun fe'îlatun fe'îlun
2, 3, 7, 9, 10, 11, 12, 13, 17.	9	Hezec	Mefa'îlunMefa'îlunMefa'îlunMefa'îlun
4	1	Hezec	Mefa'îlunMefa'îlun fe'ûlun
8, 14, 15, 16	4	Recez	Mustef'îlun mustef'îlun mustef'îlun mustef'îlun

Yekmalik

1, 2, 3, 4, 5, 6.	6	Remel	Fa'îlatûnFa'îlatûnFa'îlatûnFa'îlun
7.	1	Hezec	Mefa'îlunMefa'îlun fe'ûlun

Xiştaya Helbestan ya 'Erûzê**2.1.4. Serwa (Qafiye)**

Di edebiyata klasîk da ji serwa ra deng û ji paşserwa ra jî bi awayekî sistematîk di dawiya malikan da ji dubarekirina dengên ra tê gotin. Bi Erebi ji serwayê ra qafiye tê gotin. Weke têgeh serwa (qafiye) tê wateya di dawiya beytan da yan jî di cihê ku weke dawiya beytan tê qebûl kirin da, dubarekirina dengên ku di navbera peyvên cihêwate da⁴³. Di helbestê da ji herfên ku têne dubarekirin ra herfên "rewî"yê tê gotin. Hevbeşiya serwayê hewceye di koka peyvên da çêbe.

2.1.4.1. Serwaya Mucerrred

Serwaya Mucerrred ji dubarekirina herfa rewiye pêk tê, herfa rewiye bêhereke ye û berî wê jî herfeke bihereke tê. Di elifbêya Latinî da herfa bideng beriya herfa rewiye tê. Şêx Muşerref, ev cure di helbestên xwe da bi kar aniye. Bo nimûne:

⁴³ Abdurrahman Adak, *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, Weş. Nûbihar, Çapa 1em, İstanbul 2013, r. 358-363.

Ûtîyek rengîn nekir her jê dihat qend û şeker
Daima derman dikir wî derd û êşanê cîger

(Q: 14/2)

Ferqa însanî ji heywanî xwendin û edeb
Mirovê xwenda şîrîn e çi ‘ecem bî çi ‘ereb

(YM: 6)

2.1.4.2. Serwaya Murdef

Serwaya Murdef, di xwe da herfa “rîdf”ê dihewîne. Herfên rîdfê “elîf, waw û yê” ne. Ji van hersê herfan, herfek bêhereke ye û beriya herfa rewiye di serwayê da dubare bibe ev dibe serwaya murdef. Xinûkî, ev cure serwa çawa bi kar aniye, di malikên jêrî da jî tê xuyakirin ku di helbestên xwe da emilandiye.

Ezê rojekê çûme bagê wişal
Geram ez di wêda bi mişlê gezal

(MS: 2/1)

Ela ey saqiyê gulrengê şêrîn
Emekdarê wefakarî li bîrîn

(MS: 8/1)

‘Efû kin min ji dergahan nekin dûr
Bicebrînin bi rehmê qelbê meksûr

(MS: 7/14)

2.1.4.3. Serwaya Muqeyyed

Serwaya Muqeyyed, tê wateya dubarekirina herfên hemcîns ên ku bêhereke ne û beriya herfa rewiye tîn. Şêx Muşerref, ev serwaya hanê di gelek helbestên xwe da bi kar aniye.

Wê dema çavê me ronî kir wî mubarek nod û heşt
Pêkve ev dinya tamamî bo me bû her wek beheşt

(X: 1/1)

Bi Mewlanayê Xalid zîlcenaheyn
Kû ew bû qutbê weqtê xwe di ‘ilmeyn

(MS: 3/32)

2.1.5. Bi Kar Anîna Hunerên Edebî

2.1.5.1. Îstî'are

Îstî'are weke pênase tê wateya bi armanca şibandinê, bikaranîna peyvek di şûna peyveke din da. Ji bo ku îstî'are çêbe hewce ye peyv di dewsa wateya xwe ya eslî da neyê bikaranîn û ne pêkan e ku peyv, di wateya xwe ya eslî da were bikaranîn û hewce ye armanca şibandinê jî hebe⁴⁴. Di malikên jêrî da Şêx Muşerref hunera îstî'areyê bi kar aniyê.

Heçî hudhud ew beşaret dike
Ji mehbûb û yaran hikayet dike

(MS: 2/11)

Ey **Muşerref** bes ke garan were rahet rûne tu
Qore hespê te xelas nake ewê deşta 'ezîm

(Q: 10/4)

Min hebû xweş tûtiyek şîrîn kelam û xweş xeber
Her dema ku qîşse bikra xweş dikir yûz bîn zerer

(Q: 14/1)

2.1.5.2. Teşxîs (Kesandin)

Teşxîs, weke pênase ew e ku kesek taybetmendiye mirovan bide tiştan û wan bi rewş û tîtalên mirovan bide nîşandanê û wek mirovan raber bike. Di ciwankariyê da teşxîs, ji îstî'areyê sûd wergirtiye. Di malika jêrî da tinazkirin, taybetmendiyeke mirovan e, lê Xinûkî ev taybetmendiya hanê daye tûtiyan û hunera teşxîsê bi kar aniyê.

Heçî tûtî ye ew tinazan dike
Welêdana 'erbanê jî ew dike

(MS: 2/9)

Hudhud, nikare çîrokan bibêje ev kar taybetmendiya mirovan e. lê Şêx, daye teyrê hudhud.

Heçî hudhud ew beşaret dike
Ji mehbûb û yaran hikayet dike

(MS: 2/9)

Razandin karê însanan e lê li vir bext razaye û hunera teşxîsê hatiye bikaranîn.

⁴⁴ Numan Külekçi, *Açıklamalar ve Örneklerle Edebi Sanatlar*, Weşanên Akçağ, Çapa 2yan, Ankara 1999, r. 46.

Bi meqşûd her kesek şay e
Tenê halê me îza ye
Dibêm bextê me razaye
Meded ya Gewsê Geylanî

(M: 7/8)

2.1.5.3. Teşbîh (Wekandin/Şibandin)

Teşbîh, bi du tiştên ku di navbera wan da ji hin aliyan va şibandin hebe tê çêkirin. Ji wan herdu tiştan ê lawaz ji hin aliyan (bedewî, zîrekî, fênekî, tiralî... hwd.) va bi yê/a bihêz va tê şibandin.

Di şibandineke berfireh de çar unsûr hene. Ji wan unsûran du heb unsûrên bingehîn in û dudu jî unsûrên alîkar in. Unsûrên “şibandî” (ên lawaz) û “pê şibandî” (ên bihêz) bingeh in, unsûrên “aliyê şibandinê” (ji aliyê wekandinê) û “daçeka şibandinê” (mîna, weke, hindî, tu dibêjî, qasî... hwd.) jî yên alîkar in⁴⁵.

Di malika jêrî da kesê/a nexwenda li sîr û pîvazê hatiye şibandin. Di vê malikê da peyva “nexwenda” unsûra şibandinê, “sîr û pîvaz” unsûra pêşibandî, “wekî” daçeka şibandinê û “bîhna sîr û pîvazê” jî unsûrê aliyê şibandinê ye.

Kesê xwenda muheqqeq her emîr e
Nexwenda her wekî pîvaz û sîr e

(MS: 1-1/4)

Li xwarê çend mînakên din jî hatine dayîn.

Di pê van ‘ecêban ve çûme derek
Eva çadirek têda mişlê felek

(MS: 2/22)

Ya îlahî vê dikim ez
Zarî û hawar dikim ez
Hêviya ‘efû dikim ez
Mişlê çûka ‘endelîb im

(M: 5/5)

Ya Eba Selman ricakar in ji rebbê ‘alemê
Ew ji bo me dîtî û şohbetkerem ket her demê
Xweş biket cumle birînan def’e ket (x)gemê

⁴⁵ Perwîz Cîhanî, *Mem û Zîn*, Weş. Nûbihar, Çapa 1ê, İstanbul 2010, r. 45.

Ma neket wek bilbilê şeyda wekî Zîn û Memê

Ah ser û patêk helan ji vê firqetê ah firqetê

(MX: 1/8)

Radimûsim herdu çavan jê gulavan bêhn dikim

Radimûsim pir bi şewq wan destê wek armûşên sîm

(Q: 10/8)

Ey birayê min ‘Ubeyd ey raşeta qelb û dilan

Ey binefş û wey rihan wey nûgula bagê gulan

(Q: 16/1)

2.1.5.4. Tezad (Dijberî)

Di riste yan jî malikan da du bêjeyên ji aliyê wateyî va dijberî hevûdû bin jê ra tezat tê gotin. Dijberî hem di navbera wateyên eslî da dibe û him jî di navbera wateyên mecazî da dibe⁴⁶.

Di malika jêrî da zahir û batin bi hev ra hatiye bikaranîn.

Cumle eczaê beden ger zahirî ger baînî

Da bi ah û naleê ‘umre hemî şeyqel bibî

(Q: 2/11)

Di vê malikê da jî dûr û nêzîk bihev ra hatiye bikaranîn.

Ya Resûlellah meded destê bigir û min bikêş

Ger tu himmet kî kesê çendan ku dûr nêzîk dibî

(Q: 2/20)

Xuda navê te rehman e

Bike derdê me derman e

Derîne me ji behran e

Meded ya Ğewsê Geylanî

(Q: 7/11)

Ey **Muşerref** bes bibêj yeksan e lew kurt û dirêj

Yê ku zana bî li nik wî wek yek in lew tişt û teşt

(X: 1/5)

⁴⁶ Külekçi, r. 71.

2.1.5.5. Îstîfham (Pirskirin)

Wateya îstîfhamê pirskirin e. Di hunera îstîfhamê da mebest ne bersivgirtin e û jixwe helbestvan pirsra ku di helbesta xwe da dike, bersiva wê jî dizane. Di îstîfhamê da armanca helbestvanî perçînkirina hest û wateyê ye.

Helbestvan di malika xwarê da pirsra dema vekirina dergehê Xwedê dike, lê ew dizane ku dergehê Xwedê her dem vekiriye.

Kengê ya Reb dê bibînim ku dergeh vebî

Em jî her wek van heccacan ji bo me jî ev rê vebî

(Q: 2/1)

Kengê ya Reb wê derîzana mezin dê bêhn bikim

Ev dil bêhaşil min ta ebed serxweş bibî

(Q: 2/16)

Eya weşlet çira naê

Gelo ma qey tu razaê

Tu seş nakî ‘uweylaê

Te ez kirime di caşkê da

(M: 2/6)

2.1.5.6. Nîda (Bang)

Di zimanê Erebi da nîda tê wateya bangkirinê. Nîda, nîşaneyê hestiyarbûna helbestvanî ye.

Xinûkî, di malika jêrî da gazî Resûlê Xwedê dike û bi vî rengî hunera nîdayê bi kar tîne.

Ya Resûlellah tu yî meqşûd ji hecca hacîyan

Ya Resûlellah tu yî heq dergehê muhtacîyan

(Q: 1/1)

Ey Behaeddîn ey ronhiya çavêd min

Ey bira û wey çira dermanê êşanêd min

(Q: 19/1)

2.1.5.7. Tenasub

Tenasub, ji peyvên ku di navbera wan da ji hin aliyan va têkilî û pêwendî hebin, tê çêkirin. Peyvên ku hatine nivîsîn an jî hatine gotin, di bin babet û pêwendiyekê da tên civandin.

Di malika jêrî da Xinûkî, peyva xemgîn, mehzûn, dilkul û diltijî bi hevra emilandine. Ji bo vê sedemê hunera tenasubê çêbûye.

Her kesê xemgîn û mehzûn dilkul û her diltijê
Weqtê ku bigrî rikaba te digehte şahiyân

(Q: 1/3)

Hebûn têda tûtî û çûkê xerîb
Û şehîlûl û bilbil digel ‘endelîb

(MS: 2/2)

Dil û mîlak li min sohtin
Evan derdan û êşanan
Hekîmek nîne derman kit
Medet ya şahê Erbilê

(M: 3/5)

Ji me ra daye Xudayê me ji behra keremê
Murşidek mişlê semaê di ‘elaê ‘ezemê
Dafî‘ê derd û belan û kederan û elemê
Kullu men yeşlubuhu mu ‘teqîden fel yenem

(M: 6/1)

Ya Eba Selman Xweda zanê gelek ez xeste me
Hemnişînê min dewamî derd û êşan û (x)gem e
‘Îlleta min qet ne sefra û xûn û belgem e
*Ez cerîhê firqet im*⁴⁷ muştaqê dîdara te me

(M: 1/6)

2.1.5.8. Tekrîr (Dubare)

Di tekrîrê da, ji bo ku wate were şidandin, di nivîseke pexşanî yan jî helbestekê da dubarekirina heman peyv an jî peyvên e.

Di malika xwarê da peyvên gelî feqyan, gelî feqyan hatine dubarekirin, ji ber vê sedemê hunera tekrîrê çêbûye.

⁴⁷ Birîndarê xerîbiyê me

Gelî feqyan gelî feqyan nezer kin
Heçî bêjim bizanin hem ji ber kin

(MS: 1/1)

Emanet sed emanet sed emanet
Ji bona hev bikin daim şiyamet

(MS: 1-3/3)

Bi hev ra xeş biborînin bi hev ra
Bixun qend û nebat û hingivînan

(MS: 1-4/5)

Ey gula Arwasiyan wey zadeê Seyyîd Fehîm
Ey kerîm îbnu'l-kerîm îbnu'l-kerîm îbnu'l-kerîm

(Q: 10/1)

2.1.5.9. Telmîh

Di hunera telmîhê da, bi bikaranîna hin peyvên ra helbestvan, bûyereke ku di rabirdûyê da hatiye jiyîn tîne bîra xwendevanan. Mijar; menqîbe, mucîzeyên pêxemberan, efsane, evînên navdar... û hwd nin⁴⁸.

Di van malikan da helbestvan, hinek çîrokên dîrokî bi bîra xwendevanan dixîne.

Bi we şahî dibit qelbê hezînan
Dikim gohrê we Şîrînan û Zînan

(MS: 1-5/3)

Çira çimkî 'îşqek bi wî ra hebû
Ne Ferhad ne Mecnûn wekî wî nebû

(MS: 2/6)

Sed wekî Weyselqerenî ku li dergahê te ne
Bûsedarê wî derî ne Neqşî û Geylaniyan

(Q: 1/14)

Yê ku Geylanî û Rifa'î û Weyselqerenî
Ji xizmeta dergahê wî her yek tekê 'alem dibî

(Q: 6/16)

⁴⁸ Cem Dilçin, *Örneklerle Türk Şiir Bilgisi*, Weş. TDK, Çapa 1ê, Ankara 2004, r. 461.

2.1.5.10. Leff û Neşr

Hunera leff û neşrê, ji du parçeyan pêk tê. Parçeya pêşîn leff e, ku wateya wê “berhevkerin” an jî “rapêçan” e û parçeya duduyan jî neşr e, ku wateya wê “weşandin û belavkerin” e. Leff, di risteya pêşîn da, neşr jî di risteya duyan da cih digire.

Ji bo vê hunerê ya pêwîst ew e ku peyvên di leffê da hatine dayîn pêwendiyên wan bi peyvên ku di neşrê de hatine dayîn ra jî hebin. Leff û neşr herî kêr bi çar peyvên pêk tên, du du ji wan leffê û du du ji wan jî di neşrê da cih digirin.

Gelek Zînan vexarin firqeta Mem

Gelek Leylan ji bo Mecnûn kirin gem

(MS: 6/1)

2.1.5.11. Cînas

Cînas, peyveke Erebi ye û tê wateya hevrêgeziyê⁴⁹. Ji aliyê ciwankariyê va cînas; ji du an jî zêdetir peyvên ku xwendina wan yek; lê wateya wan ji hev cihêreng, tê çêkirin.

Di malika xwarê da di risteya duduyan da peyva “şefa” du caran hatiye emilandin. Cara ewil di wateya cih da û cara duduyan jî di wateya kêf û şahiyê da hatiye bikaranîn. Ji bo vê sedemê hunera cînasê çêbûye.

Derd û êşan û birîn xweş bin bi ava zemzemê

Ji Şefa û Merweê ji bo min şefa hasil bibî

(Q: 2/7)

2.1.5.12. Mubalexe

Ev peyva Erebi di Kurdî da tê wateya “fişal”ê. Di ciwankariyê da kesek li wekandin an jî şîroveya tiştê gelek zêderewiyê bike mirov dikare bibêje di vir da mubalexe heye⁵⁰. Di mubalexeyê da tiştên ku mirov jê bawer neke û li dûrî aqilê mirovan tê dîtin û ew tiştên ku tên bilêvkerin tu caran pêk nayên.

Di ev malika jêrî da helbestvan, bi hêstirên çavên xwe dixwaze qirêjî û gemariyê paqij bike. Em dizanin ku bi hêstirên çavan nepêkan e ku qirêjî were paqijkirin. Ji bo vê sedemê, di vê malikê da hunera mubalexeyê çêbûye.

Heftê caran çar kenarê Ke‘be ê serxweş bibim

Hêstiran ez pir birêjim ca qirêj zaîl bibî

(Q: 2/4)

⁴⁹ Cîhanî, b.n.b., r. 53.

⁵⁰ Cîhanî, r. 55

Mislê dojê ew ‘ezab e
Ew diket cergan kebab e
Her diket qehr û şitab e
Ruh diket ji qalib cuda ye

(M: 1/3)

Di behrek bêbinî mane
Gemî qayîk nepeyda ne
Ne zana ne ne hostan e
Meded ya Ğewsê Geylanî

(Q: 7/9)

Herin cem wî şehîşahî
Bibin ‘ebdalê dergahî
Bi hawar û du sed ahî
Bikin çavan wekî ‘ewrê

(M: 9/13)

2.1.5.13. Întaq

Helbestvan, di helbesta xwe da dema ku heyberên ji bilî mirovan dide peyivandin di wir da hunera întaqê pêk tê. Weke tê zanîn axiftin taybetiyeke mirovan e. Di ev malika xwarê da helbestvanî, gul daye axaftin.

Gulê gote nêrgiz ez im pir ‘ezîm
Qesem jî dikim ez bi şahê ‘elîm

(MS: 2/16)

2.1.5.14. Tecahu’l-Arif

Tecahu’l-Arif tê wateya xwe bi nezaniyê va danînê. Di tecahu’l-arîfê da helbestvan ne dibêje ez tiştêkî nizamim û ne jî dibêje tiştê ku ez dizanim, vedişêrim. Helbestvan, di ev cureya hunerê da ji mubalexe û îstîfhamê îstîfade dike⁵¹.

Nê ji nûra te munewwer bûne ev roj û heyiv
Fîlheqîqet her tu yî ronahiya ronahiyan

(Q: 1/7)

⁵¹ Dilçin, r. 441.

Hezretî Yûsif jî te ew husnê bêhed girtibû
 Hezretî Mûsa ji te bû fexrê Îsraîliyan

(Q: 1/11)

2.1.5.15. Husn û Talîl

Husnu Talîl ew huner e ku eger helbestvan bixwaze helbesta xwe xweş bike û bixemilîne, bûyîna bûyereke rasteqînî bi bûyereke ji eslê wê cudatir û xeyalî ra, bi pisporbûyîna helbestvaniya xwe bi sedemeke xweş ra girê dide û sedema rastiye jî înkâr dike ra tê gotin.

Çû giha dostan li ser cisrê wefatê pir bilez
 Bi asansora wefatê çû giha ruhaniyan

(Q: 22/4)

2.1.5.16. Alîterasyon

Alîterasyon hunera dengana e. Ev huner bi rêya herfên bêdeng tê durustkirin, heman deng di nav risteyê da sê-çar caran xwe dubare dike û hevdengiyekê saz dike.

Vê bizanin ê nezan bit jê tê bihnek pir genî
 Ê kû zana jê difurî bihneka wek ya bihê

(YM: 2)

Diyauddîn Sîraceddîn Ğiyaseddîn Kemaleddîn
 Bi heqqê wan dilê min ke îlahî Tahir û Meşhûr

(Q: 3/6)

2.1.5.17. Asonans

Asonans jî weke hunera alîterasyonê hunera dengana e. Lê ev huner bi rêya herfên bideng tê durustkirin, heman deng di nav risteyê de sê-çar caran xwe dubare dike û hevdengiyekê saz dike.

Digel rehetmet digel ni‘met selahet
 Digel bab û diyan hev ra se‘adet

(Q: 9/6)

Ey feqîrê sist û bêsermaye destvala hilû
 Ma tu me‘na “qum” nizanî ya fihêt nakî gelo

(X: 9/6)

2.1.5.18. Tewriye

Tewriye, ew huner e ku di risteyekê da yan di malikekê da yan jî di çarînekê da bikaranîna peyveke hevdeng di wateya nêzîk û di wateya dûr da ye. Lê hewce ye wateya nêzîk were nivîsandin û armanc jî wateya dûr be:

Dibû sîn herdu reş çavan me tu li birî hemî gavan

Digel maî sih û çavan çî der Misir û çî der *Şaman*

(Q:7/3)

Xaşşeten Şedîqê Ekber wî şehê şahîb huner

Hezretî Farûq e fettağê ‘Îraq û *Şamiyan*

(Q:1/19)

Şam, paytexta dewleta Sûriyeyê ye û navê wî yê eslî Dimeşq e. Peyva “şam”ê, bi Farisî ye û tê wateya êvarê û xwarina şîvê⁵². Gelek caran bi hunera tewriyeyê ra hatiye bikaranîn. Bi peyvên Misir, Bexda, Rûm û... hwd. ra di hunera tenasubê da tê bikaranîn.

2.1.5.19. Mulemme‘

Di ferhengê da mulemme‘ tê wateya birqonekbûnê û rengînbûnê⁵³. Di edebiyata klasîk da “mulemme‘” weke têgeheke ji helbesta ku bi pirzimanî hatiye nivîsandin ra tê gotin. Yanê; di mulemme‘ê da şert e ku herî kêr helbest bi du zimanan hatibe nivîsandin. Bo nimûne, eger helbestek bi Kurdî, Farisî û Erebî hatibe nivîsandin, jê ra mulemme‘ tê gotin⁵⁴. Di mulemme‘ê da risteyek bi Kurdî ya din jî bi Farisî, Erebî yan jî bi Tirkî tê nivîsandin⁵⁵. Ji çêkirina wê ra telmî‘ û ji berhemên ku bi vî rengî hatine hûnandin ra jî mulemme‘ tê gotin. Mulemme‘ cureyeke hunerane ye ku weke şiklê nezmê zêdetir di xezelan da derdikeve pêşberî me.

Di edebiyata Farisan da di warê mulemme‘ê da Mewlana Celaleddînê Romî, Hafîzê Şîrazî û Şêx Se‘diyê Şîrazî navdar in û di edebiyata Tirkan da jî di vî warî da kesê herî navdar, Fizûlî ye.

Di edebiyata Kurdî da kesên weke Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî, Seydayê Lîcî û Mela Ehmedê Xasî bi terza mulemme‘ê helbest bi awayekî serkeftî nivîsandine. Mirov, bi awayekî zelal dikare bibêje ku di warê hûnandina helbestên bi terza mulemme‘ê da Kurd, di asta yekemîn da serkeftî ne. Ev rastiya hanê jî ji zanîna wan ya pirzimanî ye. Lewra Kurd, di kîjan komarê da jiyabûne him hînî zimanê dayîka xwe bûne û him jî hînî zimanê dewletê yê fermî bûne. Ev rewşa hanê jî derfeteke bi vî rengî daye wan.

⁵² Hesên Enwerî, *Ferhengê Kîneyatê Suxen*, I-II, Weş. Kîtabxanê Millî Îran, Tehran 1383, II, 993.

⁵³ *el-Qamûsu’l-Muhît*, r. 1488

⁵⁴ Abdurrahman Adak, “Şewqiyê Xanî li Pey Şopa Ehmedê Xanî: Berawirdkirinek li Ser Mulemma’ên Wan ên Çarzimanî”, *Nûbihara Akademî*, Cild: 2, Jimar: 5, Sal: 3, İstanbul 2016, r. 37.

⁵⁵ Rıza Kurtuluş –İskender Pala, “Mulemme”, *DİA*, İstanbul 2006, XXXI, r. 539.

Şêx Muşerref Xinûki jî di şopa helbestvanên klasîk da çûye û wî jî bi terza mulemme'ê helbest nivîsandine. Lê dema mirov mulemme'ên wî û yên Melayê Cizîrî û Ehmedê Xanî dide ber hev, hinek lawaz dimîne û ne di asta mulemme'ên wan da ye. Ji ber ku tu helbesteke Xinûkî ji serî hetanî binî bi terza mulemme'ê nehatiye nivîsandin. Di nava hinek helbestên wî da bi terza mulemme'ê hinek malik an jî bend derbaz dibin. Weke nimûne me lê jêrî çend mînakên mulemme'ê yên Xinûkî dane:

Eya Şêxê 'Îraqî min tu yî ruḥ
 Tu yî ruḥ û rewan Şêxê 'Îraqî
Îleykum eştekî we'l-qelbu mecrûh
Bînarî'l-hubbî bu'dî we'f-tîraqî

(M: 4/11)

Ew e Şêx Es'edê Şanî
 Ew e Sulṭanê Rebbanî
 Di 'ilm û hîlm û serkanî
Mehellê 'ewn û hem neşrê

(M: 9/4)

Di dil da ew feqîran e
 Bizahir mişlê şahan e
 Biquwwet şibhê Sehlan e
Ke qemqamîn bîla qe'rê

(M: 9/17)

E'enî bîhî Miḥemmeden
 Şîrîn kelam nazik beden
 Şebra ecîllaê weten
 Ax 'eskerî ax 'eskerî

(M: 14/9)

Destan dibosim daimen
 Du'an bikin her daimen
 Du'a dikin def'a geman
Wellahu xeyr'l-gafirîn

(M: 15/11)

2.1.5.20. Îqtibas

Peyva îqtibasê, peyveke Erebî ye û ji lêkera “qe-be-se”yê hatiye dariştin û tê wateya wergirtina tişteki ji tişteki yan jî girtina kozeke agirî⁵⁶. Di edebiyatê da tê wateya helbestvanek yan jî nivîskarek bi armanca ku wateya gotina xwe xurttir û xweşiktir bike hildana ayêtan û hedîsan bi tevahî yan jî hinek perçeyên wan. Di îqtibasê da şert ew e ku, ew ayêt an jî hedîsên weke îqtibas hatine hildan tu îşaretek di derheqê ku ew ayêt e an jî hedîs e tunebe. Bo nimûne, eger were gotin ku Xwedê evha dibêje, di ayêtê da ewha derbaz dibe yan jî Hz. Muhemmed ewha gotiye wê demê hunera îqtibasê çênabe.

Ew gotina ku ji bona îqtibasê hatiye hildan ji ber hin sedemên kêşa erûzê têda kinkirin û dirêjkirin yan jî teqdim û texîrkirin mimkun e. Îqtibas du cure ne:

Îqtibasa Tam: Eger ew ayêt an jî hedîsa ku ji bona îqtibasê hatiye hildan wateyeke bêkêmasî îfade bike, jê ra îqtibasa tam tê gotin.

Îqtibasa Kêm: Ji ber hinek pirsgirêkên kêşeya erûzê di peyvên îqtibasê da zêdekirin, kêmkirin an jî ji guhertina cihê wan ra tê gotin. Lê bi şertê ku neyê dûrketin ji wateya wê ya eslî û têngihîştina wateyê jî bêkêmasî be.

Quran û hedîsên Pêxemberî du histûnên bîngehîn yên dîne Îslamê ne. Ev herdu histûnên bêhempa di jiyana bawermendan da tesîreke mezin çêkirine û her weha edebiyatnasan jî bi têra xwe ji wan av vexwarine. Mirov dema berê xwe dide edebiyata Ereb, Faris, Kurd û Tirkan, vê mijarê bi awayekî zelal dibîne. Bi taybetî di edebiyata klasîk da îqtibasên ji ayêt û hedîsan hatine girtin, gelek zêde ne. Di edebiyata Kurdî ya klasîk da bikaranîna hunera îqtibasê gelek zêde ye.

Ji ber ku Şêx Muşerref jî rewşenbîr û helbestvanekî klasîk e, her weha wî jî ev hunera hanê di helbestên xwe da bi kar aniyê. Armanca Şêx ew e ku wateya helbestên xwe bi rêya îqtibasê kurttir û berfirehtir bike. Helbestên Şêx Muşerrefî yên Kurdî, ji ber ku piraniya wan ji ne‘t û munacatan pêk tînin, helbestvan, hestên xwe, fikr û ramanên xwe, gazî û lavayên xwe bi destgiriya ayêt û hedîsan bi lêv dike. Li xwarê em ê hinek nimûneyên îqtibasên ku ji ayêtan hatine wergirtin bidin.

2.1.5.20.1. Îqtibasên Ji Ayetan

2.1.5.20.1.1. Sûreya Beqereyê Ayêta 256an

Di Quranê da du caran gotina “*urwetu’l-wuşqa*”yê derbaz dibe. Cara ewil di Sûreya Beqereyê da:

*“Di dînê da zordarî tune ye! Bi rastî serwestî (ya di dînê da) ji rêşayîyê hatiye kifşkirin. Naxwe kî taxûtî înkâr bike û bi Xwedê baweriyê bîne, bi teqez wî xwe bi qulpê saxlem va girtiye ku qetandin jê ra tune ye. Xwedê bihizr e, zana ye.”*⁵⁷

Cara duduyan jî di Sûreyê Luqman da ewha derbaz dibe:

⁵⁶ Mecdudîn Muhemmed Bîn Yeqûb lî Fîrûz Abadî, *Qamûsu’l-Muhît*, (Taîq: Enes Muhemmed eş-Şamî û Zekerîya Cabîr Muhemmed), Çapa Yekê, Daru’l-Hedîs, Qahîre 2008, r. 1281.

⁵⁷ Sûreya Beqereyê: 2/256

“*Kî kû xwe bispêre Xwedê û rast û durust be, vêca teqez wî xwe bi qulpê saxlem girtiye û encama kar û baran her bi bal Xwedê va ye.*”⁵⁸

Gotina ‘*urwetu’l-wuşqa yê* yanê “qulpê saxlem ku qetandin jê ra tune ye” bi gotina Quranê tê wateya bi fikr û ramanê rast û durust xwe avêtina dergehê Xwedê.

Bi du çavan ji bo vî şêxê merhûm

Se‘îd û ‘*urwetu’l-wuşqa* ê me‘şûm

(MS: 3/28)

Xinûkî jî di malika jorê da dixwaze bibêje rêya rast û durust, rêya ku Xwedê nîşan daye û ev gotina xwe jî bi bikaranîna hunera îqtibasê dixwaze pişt rast bike. Şêx, di vê malikê da îqtibasê kêm bi kar anîye. Lewra ayêt ne bi tevahî, perçeyek jê hatiye hildan.

2.1.5.20.1.2. Sûreya Nîsayê Ayêta 106an

“*Ji Xwedê lêborîna xwe jî bixwazin, bêguman Xwedê; gunehbexş e û dilovîn e.*”⁵⁹

Xwedê emr û ferman dike, dibêje, dema hûn li dijî fermanên min derketin û we guneh kirin, bêhêvî nebin, ji min lêborînê bixwazin, ez we dibexşînim. Xinûkî jî di benda jêrî da lêborîna xwe ji Xwedê dixwaze û ayêta 106an ya Sûreya Nîsayê tîne bîra xwe û jê îqtibas werdigire.

Estegfîru’l-lahe’l-‘ezîm

Ya Reb tu rehman û rehîm

Qencî ‘efûkarê kerîm

‘Efûke cumle qîşsetan

(M:8/10)

2.1.5.20.1.3. Sûreya E’rafê Ayêta 155an

“*...Tu yî xwedî û alîkarê me, vêca li me were rehmê û Tu yî çêtirînê bexşîneran.*”⁶⁰

Xwedê, dixwaze her daim evdên wî, jê ra îbadetê bikin û bexşandina xwe jê bixwazin. Ew mizgîniyê dide ku dema evdeke/î wî, gazî wî dike, ew, gelek nêzîkî evdê xwe ye û wî dibihîze.

Xinûkî jî di benda jêrî da dibêje her dem ji Xwedê ra dua bikin. Lewra duakirin derd û xemên mirovan dibe û wan derdixîne selametiye.

⁵⁸ Sûreya Luqmanî: 31/22

⁵⁹ Sûreya Nîsayê: 4/106.

⁶⁰ Sûreya E’rafê: 7/155.

Destan dibosim daimen

Du'an bikin her daimen

Du'a dikin def'a geman

Wellahu xeyr'l-ğafirîn

(M:15/11)

2.1.5.20.1.4. Sûreya Enfalê Ayêta 38an

“(Resûlê min!) Ji kafîran ra bibêje: Eger ew dev (ji neyartiya Xwedê û Pêxemberî) berdîn (û bawerî bînin), tiştê borî li wan nayê girtin. Na, eger dîsa ew veşerin (şerê Pêxember û dijminatîya wî), vêca sond be, adetê Xwedê derbareyî yên beriya wan derbaz bûye, (ka çawa Xwedê yên berê ji holê rakirin, her were dê wan jî ji holê rake).”⁶¹

Di vê ayêtê da Xwedê, emr û ferman dike ku di dema borî da ew kesên ku veşeriyane bi bal kufrê va çawa hatine cezakirin ew ê wan kesên ku aniha vedigerin bi bal kufrê va jî bi wî awayî bide cezakirin.

Ji ewî bûye xûnek menbe'ê îrşad û şifa

Cihê quşban û murîdan û erbabê sefa

Men yerum muntehîyen yuğfer lehu ma selefa

Es'edu'l-kewnî îmamû melîkîn zû hîmem

(M:6/5)

Xinûkî di çarîna jorê da qala şêxê xwe dike û dibêje eger kesek were wê dergahê û ji gunehên xwe poşman bibe, ew, ji qirêjî û gemariyê paqij dibe. Şêx Muşerref xwestiye vê yekê bi bîr bîne. Ji bo ku gotina xwe bi hê ztir bike, delîlek ji Quranê aniyê.

2.1.5.20.1.5. Sûreya Kehfê Ayêta 60î

“Dema Mûsa ji xortê ligel xwe ra got: Ez nawestim û ranawestim hetanî negihêjim cihê ku herdu derya digêhêjine hev an jî ezê demeke dirêj bi rê va herim.”⁶²

Di ayêtê da li gorî rîwayetê qala Hz. Mûsa û Hz. Xizir 'eleyhîssalam li cihê ku herdu derya xwe digêhînin hev, têne cem hev û rêwîtiya ku dikin tê kirin. Li gorî agahiyên ku Hz. Muhemmed dane, rojekê Hz. Mûsa bi Benîsraîliyan ra diaxive û ji wî ev pirsê hanê tê kirin: “Di nava mirovan da yê herî zana kî ye? Hewce bû wî di bersiva xwe da bigota “Xwedê” lê dibêje “ez im”. Li ser vê gotinê Xwedê jê ra evha wehî dike: “Li cihê ku herdu derya xwe digêhînin hevûdin evdekî min heye û ew jî te zanatir e.” Hz. Musa dibêje “Xwedayê min ez çawa dikarim wî bibînim?” Xwedê dibêje “Masiyekê bigire û têxe zembilekê û te li ku derê ew wenda kir teqez evdê min li wê derê ye.”⁶³

Di edebiyata klasîk da bi piranî ji Sûreya Kehfê ayêta 60î beşa ku tê wateya cihê herdu derya xwe digêhînin hevûdin; yanê “mecme'u'l-behreyin” weke îqtibas hatiye wergirtin. Gelek

⁶¹ Sûreya Enfalê: 8/38.

⁶² Sûreya Kehfê: 18/60.

⁶³ Sûreya Kehfê: 18/60-82.

helbestvanên Kurdan ev ayêt îqtbas wergirtine. Xinûkî di malika jêrî da ji vê ayêtê îqtbas wergirtiye.

Şeraba şaf digel yaranê ebrar

Diket dil *mecme* ‘u’-*beḥreynê* esrar

(MS: 8/12)

Şêx Muşerref, di vê malikê da jî îqtbasa kêr bi kar aniye. Lewra ayêt ne bi tevahî, perçeyek jê hildaye.

2.1.5.20.1.6. Sûreya Mu’minûnê Ayêta 14an

“...*Vêca Xwedê pîroz û bilind e ku ew xweşiktirînê afirîneran e.*”⁶⁴

Di sere ayêtê da Xwedê, agahiyan dide ku wî bi çî awayî mirov afirandiye. Şêx Muşerref jî ji afirandina Xwedê, şaş û metal dimîne û wî gelekî diecibîne, mezinahiya wî tîne bîra xwe, bejna xwe li ber ditewîne û jê ra evha dibêje:

Ehsene’l-lahu tebareke ji sirra vê tûtiyê

Zahirî ger çî qemer bû baṭinî bû wek qemer⁶⁵

(Q:14/4)

2.1.5.20.1.7. Sûreya Nûrê Ayêta 37an

“*Hin merivên were (di wan da hene) ku ne bazirganî ne jî danûstandin nikare ji bîranîna (navê) Xwedê, ji kirina nimêjê û dayîna zikatê wan mijûl bike. Ew kes, ji rojê were ditirsîn ku têda dil û çav ser û binê hev dibin.*”⁶⁶

Xinûkî di vê beytê da ji Sûreya Nûrê îqtbas werdigire û dibêje ez û hevalên xwe her tim mijûlî zikrê Xwedê ne.

Rîcalun leyse tulhîhîm wela yeşqa mudanîhîm

Îlahî şukr û zikr û fikrê wan heqquen ‘elamet bû

(Q:27/3)

2.1.5.20.1.8. Sûreya Muddessîrê Ayêta 2yan

“*Rabe, karê xwe bike, êdî hişyar bike.*”⁶⁷

Ev sûre û ayêta hanê wezîfeyeke gelek muhim dide ser milê Pêxember û jê ra dibêje êdî rabe û miletî ji bona rêya rast agahdar bike û rêya rast û durust nîşanî miletî bide.

⁶⁴ Sûreya Mu’minûnê: 23/14.

⁶⁵ Qemer navê rengê ji rengan e.

⁶⁶ Sûreya Nûrê: 24/37.

⁶⁷ Sûreya Muddessîrê: 74/2.

Di edebiyata klasîk da gelek helbestvanan ev ayêt weke îqtibas wergirtine, ji wan helbestvanan jî yek Şêx Muşerref e. Ew gazî li nefsa xwe dike û dibêje êdî bese tu razayî, rabe di rêya Xwedayê xwe da kar û xebatan bike.

Ey feqîrê sist û bêsermaye destvala hilû
Ma tu me'na *qum* nizanî ya fihêt nakî gelo

(X:5/1)

Sûreya Şemsê Ayêta 1ê

“*Sond bi rojê û ronahiya wê.*”⁶⁸

Di edebiyata klasîk da sondxwarina bi rojê, zêdetir ji bona yarê hatiye fêmkirin, rûyê yarê yek ji taybetiyên bedewtiya yarê hatiye hesibandin û li rojê hatiye şibandin. Xinûkî di vê malikê da *Şemsu'd-duha* di şûna yara xwe da yanê di dewsa Hz. Pêxemberî da bi kar aniye.

Pir şelat û selam dibêjim ji bo *Şemsu'd-duha*
Al û eşhab hem digel bin hakeza ustadê min

(Q:19/23)

2.1.5.20.1.9. Sûreya Kewserê Ayêta 1ê

“*(Resûlê min) bi rastî me kewser daye te.*”⁶⁹

Ji ber ku zarokên Hz. Pêxemberî nejiyane muşrîkan jê ra digotin warkor. Di vê ayêtê da Xwedê mizgîniyê dide wî û dibêje me, kewser û nîmetên bêdawî dane te. Xinûkî jî di vê bendê da nîmetên Xwedê tîne bîra mirovan.

Ya Eba Selman eger binvîsim ez sed defteran
Pir di wêdan ez xelaskem ez gelek reş kem pelan
Ev dilê min dê bidet min sed hucûm û sed şeran
Bêje ey lal û nezano bes neke ji van *kewseran*
Ah ser û patêk helan ji vê firqetê ah firqetê

(MX:1/7)

2.1.5.20.1.10. Sûreya Îxlasê

Esasê hêmana Îslamê tewhîd e û Sûreya Îxlasê jî vê hêmanê bi awayekî puxtedar tîne zimên. Lewra, Hz. Pêxemberî jî gotiye ev Sûreya hanê miqabilî ji sê pişkên Quranê pişkek e. Aliman gotine di xwendina vê sûreyê da xêreke mezin heye. Xinûkî di vê malikê da navê Sûreya Îxlasê weke îqtibas wergirtiye û bala bawermendan kişandiye ser xwendina fezîleta wê.

⁶⁸ Sûreya Şemsê: 91/1.

⁶⁹ Sûreya Kewserê: 103/1.

Kî du sê îxlas û laḥewlan û hem û him ummu'l-kîtab
Hedye kit bo tûtiya min rebbê heq lê kit nezer

(Q:14/13)

2.1.5.20.2. Îqtibasên Ji Hedîsan

Şêx Muşerrefê Xinûkî di helbestên xwe yên Kurdî da hinek hedîsên Hz. Pêxemberî jî weke îqtibas wergirtine. Armanca wî ew e ku helbestên xwe bi hedîsan bixemilîne û uslûba xwe xweşiktir bike. Hedîsên ku weke îqtibas hatine hildan di helbestên Xinûkî da wek ayêtan ewqas zêde nînin.

2.1.5.20.2.1. Hedîsa Lewlakeyê

Hedîsa ku Xinûkî herî zêde weke îqtibas hildaye, ew e ya ku bi navê “*lewlake*”yê navdar bûye. Hedîs bi tevahî evha ye:

“*Lewlake lewlake lemma xeletu'l-eflak*” Yanê Xwedê ferman dike ku “(Ey Muhammed!), eger ku ne ji bo te ba min ev gerdûn nedîfirand.” Ev hedîsa hanê di edebiyata klasîk da bi rêya telmîhê weke “*lewlake*”yê derbaz dibe.

Hz. Pêxember, şêst û sê sal jiyaye, lê ji xeynî jiyana wî ya cîsmanî, hebûneke wî ya din jî heye û ew jî ew e ku ji xeynî Xwedê berî afirandina her tiştî Xwedê cara ewil rastiya Hz. Pêxemberî afirandiye û her tişt ji bona rastiya Hz. Pêxemberî hatine afirandin. Sedemê afirandina gerdûnê ev heqîqeta hanê ye.

Di warê tesewufê da ev hedîs gelek caran hatiye bikaranîn û weke hedîseke qudsî hatiye rîwayetkirin. Di nivê sedsala VIIIan da li Besrayê bi serokatiya Rabîatu'l-‘Adewiyeyê va komeke sofîyan zêdetir li ser evîna îlahî disekinîn û vê yekê derdixin pêş. Sofî, vê hedîsê weke hedîseke pîroz dipejirînin û her dem didin pêşîya xwe û girîngiyeke mezin didinê.

Di edebiyata klasîk da jî ev hedîs, cihekî girîng digire û helbestvanan ev hedîsa hanê pirê caran di qesîdeyên xwe da weke îqtibas hildane. Şêx Muşerref jî di helbestên xwe yên Kurdî da sê caran ev hedîs bi kar anîye û ew jî ev in:

Ey şehê *lewlake* men hacet di dilda bê hed in

Pir feqîr im pir dixwazim ey reîsê egnîyan

(Q:1/22)

Pir şelat û pir selamê bêxilasî bêhîsab

Bide şahê ‘erşê *lewlake* fexrê enbiyan

(Q:22/13)

Belê yê kû şehî *lewlake* îstîqbal bike lazim

Kû ‘eqî û hiş biçin yekcar ji vê dinyaê rahet bû

(Q:27/16)

2.1.5.20.2.2. Hedîsa La Hewleyê

“*Ji bilî hêz û quwweta Xwedê tu hêz û quwwet tune ye. (Ev) xezîneyek/gencîneyek ji xezîneyên cinnetê ne.*”⁷⁰

Hedîs, bi navê “*la hewle*”yê navdar bûye û bi lefza “*Laḥewle we la quwwete illa bi’l-lahî*” di edebiyata klasîk da ji aliyê gelek helbestvanan va weke îqtibas hatiye hildan.

Ev hedîsa hanê dema mirov rastî tengasiyek, belayek an jî xetereyekê tê û dixwaze bibêje sebra min êdî nemaye vê hedîsê bideng dibêje. Mirovek dema rastî rewşeke xerab tê û bi piranî dixwaze sebr û aramiyê li xwe telqîn bike yan jî bi armanca ji xwe dûrxistina talûkeyekê yan jî ji cin û şeytanan vê gotinê dibêje. Ji van helbestvanan yek jî Şêx Muşerref e û wî jî ev hedîs bi wateya jorê wergirtiye:

Kî du sê îxlas û *laḥewlan* û hem û him ummu’l-kîtab

Hedye kit bo tûtiya min rebbê heq lê kit nezer

(Q:14/13)

2.1.5.20.2.3. Fî Rîqâillahî Tebareke

Resûlê Xwedê dibêje: “*Eger kesek bixwaze daxwaza Xwedê bi dest bixe, hewce ye ew berî her tiştî riza dê û bavê xwe bi dest bixe.*” Xinûkî jî ji bo ku bal bikişîne ser vê rastiyê ev hedîsa hanê weke îqtibas wergirtiye.

Hedîs, bi eslê xwe ewha ye: “*Rizaya Xwedê di rizaya dayîk û bavan da ye.*” Helbestvanî, hedîs bi xwe wernegirtiye û wateya wê bi vî rengî bi kar aniye.

Sed mubarek sed mubarek ey Mela ‘Ebdulhemîd

*Fî rîqâillahî tebarek*⁷¹ ey Mela ‘Ebdulhemîd

(Q:21/1)

2.1.5.20.2.4. Kelama Meşhûr/Navdar

Gotina “*E’zeme’l-lahu’l-‘Ezîm Ecrekum*” ne hedîs e, lê di nava gel da gotineke gelek navdar e û dema serxweşiyek çêdibe di nava Kurdan da zêdetir ev gotina hanê weke dua tê xwendin. Şêx Muşerref jî ev dua weke îqtibasê wergirtiye nava helbestên xwe. Bi tevahî dua evha ye: “*E’zeme’l-lahu ecrekum we eḥsene ‘ezaekum we ğefere lî meyyîtikum.*” Yanê, “*Xwedê sebra we mezintir bike, xelata we baştir bike û miriyê we jî bibexşîne.*”

Sed hezar car *e’zeme’l-lahu’l-‘ezîm ecrekum*

Heq bidet we şebrekî kamil di pê ra şahiyân

(Q:25/2)

⁷⁰el-Buxarî: 1086; Sehîhî Muslîm: 578.

⁷¹Di rizaya Xwedayê pak û pîroz da

2.2. JI ALİYÊ NAVEROKÊ VA

2.2.1. Unsûrên Dînî

2.2.1.1. Navên Xwedê

Navên Xwedê, navên herî xweşik. Ji sehabiyên Pêxemberî, Ebû Hureyre rîwayet dike ku Resûlê Xwedê evha gotiye: “*Nod û neh navên Xwedê hene, ji sedî yek kêm. Heke kesek vana bi lêv bike û pê bawer bike, diçe bihuştê.*”⁷² Ji van navan ra Esmâu'l-Husna” tê gotin. Esmâu'l-Husna, bi Erebi ye û tê wateya navên herî xweşik. Di Quranê da Xwedê ewha ferman dike: “*Ji bo Xwedê Esmâu'l-Husna hene. Nexwe bi wan navan ji Xwedê daxwazê bikin û ew ên ku derbareyî navên Xwedê da ne rast in wan bihêlin (ji Xwedê ra); ew ê bigihên cezayê kar û kiryarên ku dikin.*”⁷³

Di edebiyata klasîk da gelek helbestvanan navên Xwedê di helbestên xwe da bi kar anîne. Mirov dema bala xwe dide helbestên Şêx Muşerref, dibîne ku wî jî ev kevneşopiya klasîk bi kar anîye. Şêx, di helbestên xwe yê Kurdî da ev navên Xwedê bi kar anîne:

2.2.1.1.1. Îsmê E'zem

Îsmê E'zem, nod û neh navên Xwedêdi xwe da dihewîne û tê maneya navê herî mezin. Bi teqez nayê zanîn ku ji nod û neh navên Xwedê kîjan Îsmê E'zem e. Hikmeta nediyarkirina Îsmê E'zem, bi ihtîmaleke mezin dibe ku navên Xwedê giştik jî bibin Îsmê E'zem. Lê di hinek hedîsan da derbaz dibe ku ihtimal heye Ellah, er-Rehman, er-Rehîm, el-Heÿu'l-Qeyyûm, Bedîû's-Semawâtî we'l-Erdî û Zu'l-Celal we'l-Îkram bibin Îsmê E'zem. Lê ya rast ew e ku zanistiya herî rast û durust li bal Xwedê ye.

Şêx Muşerref, di helbestên xwe da bi navê Xwedê yê herî mezin ewha lava û gazî dike:

Îlahî tu biheqqê *îsmê e'zem*

Bi nûra seyyîd ewladê Adem

(MS:3/1)

2.2.1.1.2. Ellah/Xweda

Ellah, navekî taybet e ji bo Xwedêû ev navê hanê, maneya navên wî yê Kemal, Cemal û Celalî bi temamî di xwe da dihewîne. Navên Xwedê yê din Xwedê teswîr dike.

Beramberiya navê Ellah, di tu zimanî da bi temamî tune ye. Di Erebi da ‘îlah’, di Tirkî da ‘tanri’, di Farisî da ‘xuda’, di Kurdî da ‘xweda’, di Îngilîzî da ‘god’ û di Almanî da jî ‘gott’ tê gotin, lê tu wextekî cihê navê Xwedê yê Ellah nagirin û weke navê “Ellah” navek taybet nînin. Dubendî û pirjimariya vî navî nîne û nêrtî û mêtiya wî jî tune ye.⁷⁴

⁷² Buxarî, Tewhid, 12; Muslîm, Zikîr, 5.

⁷³ Sûreya E'rafê: 7/180

⁷⁴ Muhammed Muxtar Umer, *el-Esmâu'l-Husna*, en-Naşir: ‘Alema'l-Kutub, Çapa Yekem, Qahire 1997, r. 42; İsmail Karagöz, Fikret Karaman, İbrahim Paçacı, Mehmet Canbulat, Ahmet Gelişgen, İbrahim Ural, *Dini Kavramlar Sözlüğü*, Weş. Diyanet İşleri Başkanlığı, Ankara 2010, r. 23.

Şêx, navê Xwedê gelek caran di dêlva/dewsa navê Ellah da bi kar aniye û di helbestên xwe yê Kurdî da du caran navê “Ellah” û neh caran jî navê “Xwedê” bi kar aniye. Cihê ku navê Ellah û Xwedê derbaz dibin ev malikên jêrî ne:

Li nik *Ellahê* rutba wî bilind bû
Ji lew navê wî Şahê Neqşebend bû

(MS:3/20)

*Ellah*hez biket bixêr û şahîti tu bê
Geştan û seyranan bikîn di heyva nîsan û gulan

(X:2/6)

*Xwedane*bire ji me ‘ilm û şelaḥî
Ji me nestîne ya reb wî silaḥî

(MS:9/7)

Ya Eba Selman *Xweda* zanî gelek ez xeste me
Hemnişînê min dewamî derd û êşan û gem e
‘Îlleta min qet ne sefra û xûn û belgem e
Ez *cerîhê firqetim* muştqaqê didara te me
Ah ser û patêk helan ji vê firqetê ah firqetê

(MX:1/6)

2.2.1.1.3. Îlah

Binyada peyva “îlah”ê bi Erebi ye, ji lêkera “e-le-he”yê hatiye dariştin, peyveke yekjimar e û pirjimariya wî jî “alîhe” ye. Peyva “îlah”ê tê wateya ew kesê ku jê ra bi heqqî îbadet tê kirin. Çi heq be, çi batil be ji her me‘bûdî ra îlah tê gotin. Peyva “îlah”ê, di Quranê da 111 caran yekjimar, 2 caran dubendî û 15 caran jî weke pirjimarî derbaz dibe⁷⁵.

Xînûkî jî di helbestên xwe da ev navê Xwedê di formata yekjimarîyê da gelek caran bi kar aniye:

Menêre ya *Îlahî* van gunehan
Tu seḥke Rebbena nalîn û ahan

(MS:6/18)

Îlahî bike meskenê Mîm Fa
Ewî baḡê pir lezzet û hem şefa

(MS:2/26)

⁷⁵ Muhemmed Muxtar Umer, r. 43.

Bisetrîne li min ‘eyban *îlahî*
‘Efûke cumle van barên gunehan

(MS:3/36)

2.2.1.1.4. Rebb

Rebb, ji lêkera “re-be-be”yê hatiye dariştin û tê wateya efendî, xwedî, perwerdekar, berpirsîyar, rêvebir, nîmetdayende, serok, bijarte, xwedanotorîte û melîk e û pirjimariya wî jî “erbab” e. Weke navê Xwedê tê maneya ew ê ku mexlûqên xwe bi qencyên xwe perwerde dike û wan roj bi roj mezin dike. Ew ê ku bendeyên xwe yên bawermend bi ya ku dilê wan çaksaz dike, perwerde dike. Her ew e yê afirîner yê ku xwediyê her tiştî û yê ku şehînsah e. Navê Xwedê yê Rebb, di Quranê da 969 caran derbaz dibe⁷⁶. Şêxî, navê Xwedê yê Rebb evha bi kar aniye:

Li ser îman ruhî bistîne ya *Reb*
Di qebrê da tu arî min be ya *Reb*

(MS:3/38)

Xweda nebire ji me ‘ilm û şelaî
Ji me nestîne ya *Reb* wî silaî

(MS:9/7)

Piştî *Rebbu*’l-‘alemîn methê te gotî der qidem
Dê çî bêjin hadîsan bêzeban û bêbeyan

(Q:1/16)

2.2.1.1.5. Şemed

Şemed, ji lêkera “se-me-de”yê hatiye dariştin û tê wateya serok, kesê herî bişeref û binavûdeng, kesê ku ji wî mezintir nîne, rêzdar û bêkêmasî. Weke navê Xwedê, wateya wî ew e kûew, xwedayekî were ye ku di xwedatiya xwe da kemiliye. Ên ku hatine afirandin bi tevahî hewcedariyên xwe da vedigerin cem wî. Ji ber ku hewcedariya wan bi bal wî va mezin e. Lewra ew, xwarinê dîde û ji wî ra xwarin û vexwarin tune ye⁷⁷. Navê Şemedî, yek ji navên Xwedê yên herî xweşik e û di Quranê da carekê tenê derbaz dibe ew jî di Sûreya Îxlasê di ayêta 2an da ye. Şêxî, navê Xwedê yê Şemedî carekê tenê di helbestên xwe da bi kar aniye:

Li me ferz e bi dewamî şukr û hemdê *şemedî*
Û bibêjin ya îlahî tu bikî vî ebedî
Û bixwazin ji ewî rehîm û dewa û mededî
Înne men yedrî ledeyhî zake e ‘le’n-nî‘emî

(M:6/8)

⁷⁶ Muhemmed Muxtar Umer 55.

⁷⁷ Muhemmed Muxtar Umer, 61.

2.2.1.1.6. Reḥman

Reḥman, ji lêkera “re-he-me”yê hatiye dariştin û tê wateya merhemetkirin, dilpêşewitandin, parastin, bexşandin, dayîna nîmetan, niştecîbûn, gazindkirina jinê ji rehma xwe û ew kesê ku xwedan rehmeke pîrzêde.

Weke navê Xwedê amajeyî bal ferahiya rehma Xwedê va dike û ev rehmet şamilî ser mexlûqatan bi tevahî ye. Di Quranê da 57 caran derbaz dibe û navekî tenê bi xasî Xwedê ye û dudanî û pîrjimariya vî navî nîne⁷⁸.

Helbestvanî, di helbestên xwe da çawa ku li jêr jî tê xuyakirin, gelek caran navê Xwedêyê Reḥman bi kar aniye:

Xuda navê te **Reḥman** e
Bike derdê me derman e
Derîne me ji beḥran e
Meded ya Ğewsê Geylanî

(M:7/11)

Esteğfiru 'l-lahe 'l- 'ezîm
Ya Reb tu **Reḥman** û reḥîm
Qencî 'efûkarê kerîm
'Efûke cumle qîşsetan

(M:8/10)

Ev mexzenê 'îlman e
'Ellameê qewman e
Ev naibê **Reḥman** e
Pir rehmet e Mewlana

(M:11/8)

2.2.1.1.7. Şebûr

Şebûr, ji lêkera “şe-be-re”yê hatiye dariştin û tê wateya tebatkirin, xwegirtin û gazindkirinê. Şebûr weke sifetê mubalexe di wateya xwediyê sebra mezintir da hatiye bikaranîn. Şebûr, navek ji navên Xwedê ye⁷⁹. Xinûkî ev navê hanê carekêtenêdi helbestên xwe da bi kar aniye. Ew jî ev murebbe‘a jêrî ye:

⁷⁸ Muhemmed Muxtar Umer, r. 61.

⁷⁹ Muhemmed Muxtar Umer, 61.

Ya îlahî tu *Şebûrî*
 Hatime ‘efwa Ğefûrî
 Çimkî zanim tu Şekûrî
 Nê ji tirsan dilkebînim

(M:5/3)

2.2.1.1.8. Ğefûr/Ğeffar

Ğefûr û Ğeffar, ji lêkera “ge-fe-re”yê hatine dariştin û ev lêker jî tê wateya veşartinan jî nixumandina tiştêkî, bexşandina kesekî û zêdebûna birînê. Ğefûr û Ğeffar, weke mubalexe hatine bikaranîn û wateya wan bexşendetirîn e. Ğefûr û Ğeffar, herdu jî navên Xwedê ne⁸⁰. Xinûkî ev navên hanê di helbestên xwe da ewha bi kar aniye:

Ya îlahî tu Şebûrî
 Hatime ‘efwa *Ğefûrî*
 Çimkî zanim tu Şekûrî
 Nê ji tirsan dilkebînim

(M:5/3)

Xuda ya xaliqê barî
 Tu yî Hadî tu yî *Ğeffar î*
 Tu çêke xelqê Berwarî
 Ji bo Şêx Es‘edê Sanî

(M:10/3)

2.2.1.1.9. Şekûr

Binyada peyva “Şekûr”ê, ji lêkera “şe-ke-re”yê hatiye dariştin û wateya lêkerê, zanîna xwediyê nîmetê, hizirkirin û pesindayîna wî, jê ra spaskirin, dayîna mikafata xebatê, tijîbûn û merdbûn e. Şekûr, navek ji navên Xwedê ye û tê maneya ew evdên ku jê ra îbadetê dikin û jî wî ra dibin bende mikafat û xelata wan zêde zêde dide û nîmet û ihsanên wî jî bi berdewamî ye. Navê Xwedê yê Şekûrdi Quranê da 4 caran derbaz dibe⁸¹. Şêx Muşerref, hêvî dike ku Xwedê bi navê xwe yê Şekûr li wî were rehmê vî navî di helbestên xwe da bi kar tîne.

⁸⁰ Muhemmed Muxtar Umer, r. 67.

⁸¹ Muhemmed Muxtar Umer, r. 611-612.

Ya îlahî tu Şebûrî
Hatime ‘efwa Ğefûrî
Çimkî zanim tu *Şekûrî*
Nê ji tirsan dilkebînim

(M:5/3)

2.2.1.1.10. Zulcelal

Celal, tê wateya ew kesê ku mafê dayîna fermanan û qedexekirina wan di destê wî da ye. Celal, sifateke taybet e bi tenê ji Xwedê ra. Zulcelal jî sifetek ji sifetên Xwedê ye û tê wateya xwediyê celal⁸². Xinûkî jî ev navê Xwedê, bi vî rengî bi kar aniye:

Bi heqqê Xace Baqî xweş delal bû
Gelek nasê terîqa *zulcelal* bû

(MS:3/26)

2.2.1.2. Navên Pêxemberan û Kesayetiyan Dînî

2.2.1.2.1. Pêxember

Peyva pêxemberî, peyveke Farisî ye û tê maneya qasid yanê ji ew kesên ku peyamên Xwedê tînin ra tê gotin. Xwedê, di Quranê da dibeje ku min, mirov ji bona ku bibin bendeyên min û ji min ra îbadetê bikin min ew afirandine⁸³. Ji bo vê sedemê Xwedê, peyamên xwe bi rêya pêxemberan şandiye û di wan peyaman da agahiyên di derheqê jê ra çawa bendetî tê kirin û îbadet tê kirin, daye.

Ji Hz. Ademî hetanî Hz. Muhemmedî gelek pêxember hatine şandin. Di hinek çavkaniyan da derbaz dibe ku hejmara pêxemberan digêhêje 124 hezaran, lê ev agahî bi teqez nîne. Navê 25 pêxemberan di Quranê da derbaz dibe. Helbestvanî jî peyva pêxemberiyê gelek caran di helbestên xwe da bi kar aniye:

Û hem ‘endelîb xweş rîwayet çî ye
Ji exbarê *pêxemberan* hakî ye

(MS:2/10)

Bifikire lefza ewî Şêx Sîbgetullahê berî
Ku dike bi heq ra xîtabê ew gula *pêxemberî*

(X:7/8)

⁸² Sureyê Rehman: 55/78; Muhemmed Muxtar Umer, 48.

⁸³ Sûreya Zariyatê: 5/56.

Îlahî feth û îqbalî
 Îlahî medh û îclalî
 Rıza *pêxember* û alî
 Bide Şêx Es‘edê Sanî

M:10/14)

2.2.1.2.2. Hz. Mihemmed

Hz. Muhemmed, pêxemberê dînê Îslamê ye û pêxemberê herîdawiyê ye. Di sala 571ê mîladî da li bajarê Mekkeyê hatiyê dinê. Berî hatina wî ya dinyayê, bavê wî Ebdullah emrê Xwedê bi cih tîne. Hz. Muhemmed, dema temenê wî dibe 6 salî dayîka wî Amîne jî diçe ber rihma Xwedê û ew dimîne êtîm û sêwî. Kalikê wî Ebdulmutelîb hetanî mirina xwe, wî xwedî dîke û piştî mirina wî, apê Hz. Pêxember, Ebû Talib li wî xwedî derdikeve û wî mezin dîke. Di 25 saliya xwe da bi Hz. Xatîceyê ra dizewice û di 40 saliya xwe da jî bi wezîfeya pêxembertiyê tê wezîfedarkirin. Di sala 632an da li Medîneyê ruhê xwe teslîm dîke û diçe cem Rebbu’l-alemîn⁸⁴.

Di edebiyata gelê Îslamê da cihê Hz. Pêxemberî gelek girîng û muhim e. Mirov dema berê xwe dide dîwanan, piştî Tewhîd û Munacatê helbestên ku mijara wan ne‘tin cih digirin. Di helbestên edebiyata klasîk da gelek navên Hz. Pêxemberî derbaz dibin. Navên herî zêde têne bikaranîn: Muhemmed û Ehmed in.

Mirov dikare bibêje di edebiyata klasîk da hema hema helbestvanan bi tevahî di derheqê Hz. Pêxemberî da helbest nivîsandine. Jiyan û têkoşîna wî bûye mijara helbestvanan. Ji ber ku her bisilman, hewceye kê-m-zêde di derheqê jiyana wî da agahiyên bizanibe, ji aliyê gelek helbestvanan va wek berhemên edebî hatine nivîsandin. Mirov dikare bibêje bi vî şiklî, edebiyata dînî-tesewufî saz bûye.

Şêx Muşerrefê Xinûkî jî weke helbestvanên klasîk, wî jî li ser cenabê Pêxemberî ne‘t nivîsandine. Şêxî, di helbestên xwe da navên Hz. Pêxemberî weke Muhemmedî, MuhemmedMustefa, Hebîbullah û Babê Faţimayê bi kar aniye. Di ev mînakên jêrî da navên Hz. Pêxemberî evha derbaz dibin:

Semî‘î tu ‘efûkar î muheqqeq

Mihemmed jî şefa‘etkar e el-heq

(MS:6/19)

⁸⁴ el-Îmam el-Hafîz Ebî Muhemmed ‘Ebdul‘ezîz Bîn ‘Ebdulwehîd el-Meqdîsî, *Muxteşeru’s-sîreti’n-nebîyyîe we sîretu eşhabîhi’l-‘eş‘ere*, (Tahqîq: Xalid b. Ebdurrehman b. Hemdî Sayî‘), Weş. Daru’l-belensiyê, Çapa 2yan, Riyad 2003, r. 38-71.

Jibona zuryeta seyda
Xuda derdan nekit peyda
Bikit haval ji bo Seyda
Mihemmed Mustefa îro

(M:12/14)

Bi Seyfeddînê Seyyîd NûrMihemmed
Hebîbullahê mezher şemsê ewhed

(MS:3/30)

Şelat û hem selam her dem li ruhê **Babê Fatmayê**
Digel al û eşhaban digel yar û emekdaran

(Q:11/11)

2.2.1.2.3. Hz. Adem

Li gorî dînê Îslamê Hz. Adem, yekem însan û yekem pêxember e ku ji aliyê Xwedêva hatiye afirandin. Ji ber ku ceddê bi tevahî mirovan e; jê ra “Ebu’l-beşer” yanê bavê beşerî jî tê gotin. Xwedê, ji çar kenarê dinyayê ax wergirtiye li hev xistiye û ew afirandiye. Di Quranê da derbaz dibe ku Adem ji axê⁸⁵, ji heriyê⁸⁶, ji heriyeke sefandî⁸⁷, ji heriyeke zeliqonek⁸⁸ û ji avê⁸⁹ hatiye afirandin. Ji ayêtên ku di Quranê da derbaz dibin tê fêmkirin ku Xwedê, bedena Hz. Adem ji ax û avê afirandiye, şikl dayê û ji bo ku zindî bibe ji ruhê xwe ruh pifî wî kiriye⁹⁰.

Li gorî baweriya Îslamê Xwedê, Adem li ser rûyê erdê weke xelîfe wezîfedar kiriye, ew kiriye xwedan ilm û zanistê û ji melayîketan xwestiye ku ji bo wî biçin secdeyê. Şeytan yanê Îblîs, emr û fermana Xwedê bi cî naîne û ji ber vê sedemê Xwedê, leneta xwe li wî dibarîne û wî ji bihuştê dike der. Dema ku Adem di bihuştê da jiyana xwe berdewam dikir, Xwedê ji wî, xanima wî Hewwayê diafirîne⁹¹.

Xwedêdi biheştê da ji bilî fêkiya qedexe, xwarin û vexwarina her tiştî ji bona wan serbest dike. Lê şeytan, wan dixapîne û fêkiya qedexe bi wan dide xwarinê. Ji ber vî sûcî ew ji biheştê ber bi dinyayê va têne derxistin. Adem û Hewwa bi alîkariya melayîketê wehyê Cêbraîl, li Girê Erefê xwe digihînîn hevûdin. Adem û Hewwa ji ber xeletiya ku kirine, tobe dikin û lêborîna xwe ji Xwedê dixwazin û Xwedê jî tobeya wan qebûl dike⁹². Piştî ev bûyerên

⁸⁵ Sûreya Alî İmranî: 3/59.

⁸⁶ Sûreya Secdeyê: 32/7.

⁸⁷ Sûreya Mu'mînê: 23/12.

⁸⁸ Sûreya Saffetê: 37/11.

⁸⁹ Sûreya Nûrê: 24/45.

⁹⁰ Sûreya Sadê: 38/71-72.

⁹¹ Sûreya ‘Erafê: 7/189.

⁹² Sûreya Beqereyê:2/30-37.

ku diqewimin ji Adem ra “Sihûf” têne şandin. Mirovayetî jî ji zarokên Adem û Hewwayê zêde dibin. Bo nimûne Habîl, Qabîl û Şît ji zarokên Adem û Hewwayê ne⁹³.

Di ferhengê da peyva “adem”î tê wateya tunebûnê. Di warê tesewufê da jî tê wateya masîwa yanê ji bilî Xwedêher tişt⁹⁴, zilmê û batil e. Di warê tesewufê da adem du cure ne:

- Ademî Mutleq (Ademî Mehz): Tê wateya bitenê û tunebûnê. Di vir da adem, tê wateya tunebûna ku heyîn ji bo wî ne mimkun e.
- Ademî Mimkun: Tê wateya ew tunebûna ku a niha tune, lê hebûna wî dibe ku bibe. Ademî mimkun, ew neynike ku Xwedê tecelliya xwe têda nîşan dide ye⁹⁵.

Ji ber ku Adem bavê mirovatiyê ye, di wateya însan da jî tê bikaranîn. Di edebiyata klasîk da çîroka afirandina Adem û zarokên wî gelek helbestvanan ji xwe ra weke mijar hîlbijartine û li ser vê mijarê gelek helbest nivîsandine. Bo nimûne afirandina wî ya ji heriyê, beriya ku pifkirina ruh li bedena wî, di navbera av û heriyê da mayîna wî, secdebirina melayîketan ji bo wî, xapandina şeytan, derkirina wî ji biheştê û ji bona cardin vegere axîn û nalîna wî û... hwd di helbesta klasîk da bi rêya hunera telmihê û bi rêya hunerên din gelek caran derbaz dibe⁹⁶.

Şêx Muşerrefê Xinûkî navê Ademî him di wateya Adem Pêxemberî da him jî di wateya mirovatiyê da bi kar aniye.

Îlahî tu biheqqê îsmê e‘zê

Bi nûra seyyîd ewladê *Adem*

(MS:1/3)

Hezretê *Adem* ji cennet derket û bêçare bû

Ya Miħemmed wî bilind got heq gerande ji eşfiyan

(Q:1/9)

2.2.1.2.4. Hz. Nûh

Piştî ku Idrîs Pêxember ji aliyê Xwedê va bi asîmanan va tê kişandin, benîadem ji rêya rast derdikevin û ji pûtan ra îbadetê dikin. Xwedê careke din pêxemberekî bi navê Nûh dişîne. Nûh, bi salan rêya rast nîşanî mirovan dide. Mixabin bi tenê kurên wî “Sam, Ham, Yasef û xanimên wî û hejmareke pir hindik bi wî bawer dikin û bi wî ra tevdigerin. Heta kurekî wî bi navê “Yam” jî pê bawer nake. Hz. Nûh bi salan ji milletê xwe ra şîretan dike, lê milletê wî bi xebera wî nake û berevajî, zilm û zordariyê li wî dikin. Di dawiyê da Hz. Nûh, nifiran li milletê xwe dike, nifirên wî tîn qebûl kirin û Xwedê, jê ra wehî dike ku keştiyekê çêbike. Nûh Pêxember, dest bi çêkirina keştiyê dike, gelê wî dema di ber wî ra derbaz dibû henekên xwe bi wî dikir.

⁹³ el-Xeŕîb el-Bexdadî, Ebî Bekr Ehmed b. Elî b. Sabit b. Ehmed b. Mehrî, *Tarîxu’l-Enbiya*, (Tehqîq; Asya Kuleyban Elî el-Barîh), Daru’l-Kutubî’l-‘Îlmîyye, Çapa 1ê, Beyrut 2003, r. 31-40.

⁹⁴ Ethem Cebecioğlu, *Tasavvuf Terimleri ve Deyimleri Sözlüğü*, Weş. İnka, Çapa 3yan, 2009 İstanbul, Xala Masîwa.

⁹⁵ *Dini Kavramlar Sözlüğü*, r. 7.

⁹⁶ İskender Pala, *Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü*, Weş. Kapı, Çapa 23yan, İstanbul 2013, r. 6-7.

Keştî tê tamamkirin û elametên tofanê hêdî hêdî têne xuyakirin. Nûh û bawermendên ku pêxembertiya wî qebûl dikin, li keştiyê siwar dibin û ji her cure heywanan jî cotekê dikin keştiyê. Ava tofanê hêdî hêdî bilind dibe û milletê wî bi tevahî dixeniqin. Piştî şeş mehan av vedikişe, keştî disekine û Nûh û ewên di keştiyê da peyayî ser erdê dibin.⁹⁷ Ji bona van sedeman ji Nûh ra Ademê duyemîn tê gotin⁹⁸.

Di edebiyata klasîk da keştî û Tofana Nûh Pêxemberî bi hev ra têne zikirkirin. Tofan tê wateya hêstirên çavên evîndariyê û Hz. Nûh jî di vê tofanê da temsîla evîndarê ku hewl dide di bin avê nekeve, dike⁹⁹.

Şêx Muşerref jî di helbestên xwe da navê Hz. Nûh û tofana wî çawa ku di malika jêr da xuya dike bi hev ra bi kar aniye.

Hem bi yumna te ji tofan **HezretêNûh** bû xelaş

Hem bi te ji agir xilaş bû ew reîsê enbiyan

(Q:1/10)

2.2.1.2.5. Hz. Îsmâil

Îsmâil, pêxember e û kurê Hz. Îbrahîm û Hacerêyê mezin e. Ji ber ku Sarê, di derheqê Hacer û Îsmâilî da çavnebariyê dike, Îbrahîm Pêxember, wan dibe bajarê Mekkeyê. Li Mekkeyê bi sedema tîbûna Îsmâil, dayîka wî li avê digere, di wê hewldanê da li ber lingê dayîka wî, ava zezemê dipijiqe û derdikeve. Îbrahîm Pêxember û kurê wî Îsmâil, bi hev ra Ke'beyê çêdikin.

Ji ber ku di wê wextê da zarokên Îbrahîm Pêxemberî yên law tunebûn, ew, destên xwe bilind dike û lava û dexaletê ji Xwedê dike û dibêje: *'Xwedayê min, ger tu kurekî bidî min ez ê wî di rêya te da bikim qurban.'* Xwedê jî duaya wî qebûl dike û bi navê Îsmâilî, lawekî wî çêdibe. Jê ber ku Îbrahîm Pêxember soza xwe bi cih bîne, Îsmâilî dixemilîne û jê ra armanca xwe vedibêje. Lê Îsmâil, tu nerazîbûnekê nîşan nade û xwe radestî bavê xwe dike û bavê wî, herdu çavên wî digire û wî datîne erdê. Dema dixwaze kêrê bavêje qirika kurê xwe, Cêbraîlberanekîjê ra tîne û jê dixwaze ku di şûna lawê xwe da vê qurbanê ser jê bike¹⁰⁰. Di Quranê da di derbareyî Îsmâil Pêxemberî da gelek ayêt hene¹⁰¹. Weke ku em dizanin ku îbadeta serjêkirina qurbanê, diyariya vê bûyerê ye.

Di edebiyata klasîk da ev mijara hanê zêdetir bi hunera telmîhê hatiye bikaranîn û bi çêkirina Ke'beyê, serjêkirina boraqî û bi dîtina ava zezemê xwe nîşan dide¹⁰². Şêx Muşerrefî jî ev bûyera bi navê Zebîhullah di nav helbestên xwe da aniye zimên:

⁹⁷ *Tarîxu'l-Enbiya*, r. 43-65.

⁹⁸ Sûreya 'Erafê:7/59-64; Sûreya Yûnusî: 10/71-73; Sûreya Hûdî:11/36-49; Sûreya Nûhî:71/1-28.

⁹⁹ Pala, 361.

¹⁰⁰ *Tarîxu'l-Enbiya*, r. 86-94.

¹⁰¹ Sûreya En'amê: 6/86-87; Sûreya Meryemê: 19/54-55; Sûreya Sadê: 38/48.

¹⁰² Pala, 238.

Nuqtetek bêtin li ser min da ji şirka rehetê

Daxilî hicra *Zebîhullah* me jî cihkek hebî

(Q:2/6)

2.2.1.2.6. Hz. Yûsif

Yûsif, pêxemberek ji pêxemberên Cihûyan e û kurê Hz. Yeqûbî ye. Donzdeh kurên Yeqûbî hebûne, lê wî herî zêde hez ji kurê xwe yê bi navê Yûsifî kiriye. Ev çîroka herî xweşiktirîn e ku di Quranê da bi kurtasî wiha hatiye hibirkirin:

Yûsif rojekê ji bavê xwe ra dibêje ku “*Min di xewna xwe da dît ku yanzdeh stêrk, roj û hîv/heyv ji min ra diçûne secdeyê*”. Hz. Yeqûb, tê digihijê ku yanzdeh stêrk nîşaneyeke bi bal yanzdeh birayên Yûsifî ne û ew li cem Xwedê ji birayên xwe bi qîmettir e. Ew, ji kurê xwe dixwaze ku ev xewna xwe ya biwate ji tu kesî/ê ra nebêje. Lewra şeytan, dijminê mirovan e û wan dixapîne. Dibe ku hinek weswese têkevin dilê birayên wî û zirarê bidine wî. Lewra ew, têdigihêje ku di pêşerojê da Yûsif, dê bibe pêxember. Gotina bavê wî rast derdikeve û birayên Yûsif, wî dibin, diavêjine binê bîrekê û dema vedigerin mala xwe ji bavê xwe ra dibêjin mixabin guran, Yûsif xwar. Bavê wan, bi wan bawer nake, lê ji destê bavî, tu tişt nayê ku li dijî vê yekê nerazîbûnê nîşan bide.

Karwanek di ber bîrê ra derbaz dibe û Yûsifî dibîne, wî ji bîrê derdixîne, bi xwe ra dibe Misrê û li wir weke xulamekî, bi qîmeteke giranbuha difiroşe ‘Ezîzê Misrê. Yûsif, kesekî pir bedew bûye. Jina ‘Ezîzî, Zuleyxa, dibe evîndarê Yûsifî û daxwaza pêraşabûne lê dike. Lê Yûsif vê daxwazê napejirîne û ji bo vê sedemê wî diavêjin zîndanê. Rojekê ‘Ezîzê Misrê xewnekê dibîne û dixwaze Yûsif, xewna wî derbirîn bike ku bê ka xewna wî tê çi wateyê. Yûsif, te’bîra xewna wî rast dide û ‘Ezîz jî weke diyariyekê, wî ji zîndanê azad dike û dike wezîrê darayiyê. Bi borandina demê ra ew û malbata wî xwe digihînin hevûdin¹⁰³. Ev çîroka hanê di Quranê da weke” ehsenu’l-qîses” yanê çîroka herî xweşik hatiye binavkirin.

Di edebiyata klasîk da, ji ew pêxemberên ku navê wan herî zêde derbaz dibe, yek jî Yûsif pêxember e. Ji ber ku bedewtiya wî bi nav û deng bûye, helbestvanan bi piranî evîndar şibandine wî. Heta mirov dikare bibêje evîndar, weke Yûsifê duyemîn dane nîşandan.

Bi sedema ku roj û hîv jê ra çûne secdeyê, avêtina wî ya bîrê, di dema firotina wî da xistina wî ya mêzînê û bi qasî giraniya wî dayîna zêran, serpêhatiya wî ya bi Zuleyxayê ra, avêtina wî ya zîndanê, pisporbûna wî ya derbirînkirina xewnan, dûrketina wî ji bavê wî Yeqûb pêxemberî, piştî koletiyê, bûyîna wî ya wezîrê Misrê û... hwd bûye mijara gelek helbest û beytan¹⁰⁴.

Weke her helbestvanê klasîk, çîroka Yûsif pêxemberî, bûye mijara helbestên Xinûkî jî. Wî di helbestên xwe da gelek caran navê Yûsif pêxemberî bi kar aniye:

¹⁰³ Sûreya Yûsifî: 12/1-104; *Tarîxu’l-Enbiya*, r. 105-141.

¹⁰⁴ Pala, 484.

Kanê Suleymanê delal
Kanê *Yûsifê* bi husn û cemal
Ew hudhuda mizgîn li bal
Ax ‘eskerî ax ‘eskerî

(M:14/4)

Hezretî Yûsif jî te ew husnê bêhed girtibû
Hezretî Mûsa ji te bû fexrê Îsraîliyan

(Q:1/11)

2.2.1.2.7. Hz. Eyûb

Eyûb Pêxember, remz û nîşaneyê sebrê ye, ji Cihûyan e û neviyê Îshaq Pêxemberî ye. Ew, ji aliyê mal û milkû samanê dinyayê va, kesekî zêde dewlemend bûye, li aliyê herêma Şamê gelek zêde avahiyên wî hebûne, bi navê Rehme, jineke wî hebûye û bavê gelek zarokan bûye. Bi kurtasî mirov dikare bibêje Eyyûb Pêxember, ji aliyê bextewariya dinyayê va hal û wextê wî zêde zêde xweş bûye. Ji ber vê sedemê Xwedê, xwestiye ku wî îmtihan bike ka ew kesekî şikirdar e yan na. Mal û milkê wî ji destê wî diçe, ew şikir dike. Zarokên wî yek bi yek dimirin, ew dîsa sebir dike. Nexweş dikeve û di bedena wî da birînên bêderman derdikevin, heta di hinek rîwayetan da derbaz dibe ku kurm ketine birînên wî, lê ew cardin sebir dike. Bi ev halê xwe dîsan jî terka îbadet û ta’eta ji bona Xwedê nake. Xanima wî Rehme, jê ra xizmetê dike û ew jî îbadetên xwe berdewam dike. Di encamê da bi emr û fermana Xwedê, lingê xwe li erdê dixê, ji erdê avek dipijiqe, ew ji vê avê vedixwe, xwe pê dişo û bi izna Xwedê bi tevahî ji derd û kul û nexweşiyên xelas dibe û birînên wî jî dikewin.

Êdî Eyûb Pêxember, bi awayekî serkeftî ji îmtîhana sebrê derdikeve. Xwedê, cara duduyan wî dike xwediyê mal, milk û zarokan, tendurustiya wî, ji berê baştir dibe. Xwedê, wî ji gelê Heranê ra weke pêxember wezîfedar dike û ew jî li ser hîmê şîrîeta Îbrahîm Pêxemberî emel dike¹⁰⁵. Di Quranê da şeş caran behsa Eyûb Pêxemberî kirin¹⁰⁶ û di derheqê wî da “çi xweş ‘evd e ew, bêguman ew pir tobekar bû”¹⁰⁷ hatiye gotin.

Eyyûb Pêxember, di edebiyatê da sembola sebrê ye û ji bo sebrê mînakeke pir muhim e. Şêx Muşerref jî ji bona sebra Eyyûb Pêxember bi bîr bîne, di helbestên xwe da bi kar aniyê.

Hezretî Eyyûb bi te heq da ji bo wî ‘afiyet
Hezretî Îsa bi te ew bû mesîhek bêziyan

(X:6/2)

2.2.1.2.8. Hz. Mûsa

Piştî Yûsif Pêxember, li Misrê, Cihû, gelek zêde dibin û li ser hîmê şîrîeta Yaqûb Pêxember û Yûsif Pêxemberî disekin. Qibtî jî niştecihên Misrê yên kevn bûn, ji stêrkan û

¹⁰⁵ *Tarîxu'l-Enbiya*, r. 142.

¹⁰⁶ Sûreya En‘amê: 6/84; Sûreya Enbiyayê: 21/83; Sûreya Sadê: 41-44.

¹⁰⁷ Sûreya Sadê: 44.

pûtan ra îbadet dikirin û Cihû jî weke kesên bêqîmet dihesibandin. Fîrewnên Misrê jî ew weke bende qebûl dikirin û di karên giran da dixebitandin. Cihûyan jî dixwestin ji vê zilm û zoriyê rizgar bibin û biçin welatên xwe yê kevnare yanê Ken'anê.

Di wê demê da pêşgoyek/kahînek ji Firewn ra dibêje ku ji nifşê Cihûyan kurek dê biwelide û dê textê te hilweşîne. Firewn, gelek ditirse û biryarê dide ku kurên Cihûyan yên ku nû diwelidin, bikujin û dest bi kuştina wan jî dikin. Di heman demê da jineke bi navê Îmran, kurekî tînê dinê û navê wî dike Mûsa. Dayîka wî, ji bo ku ew neyê kuştin, wî dike sindoqekê û diavêje çemê Nîlê. Jina Firewnî, Asiye Xanim, dibîne ku sindoqek li ser avê diçe, hema destên xwe dirêj dike pê digire û wî ji avê derdixîne. Gava devê sindoqê vedike, dinihêre, çî bibîne, kurekî pir bedew têda ye û wî ji sindoqê derdixîne, kêfa wî gelekî jê ra tê û nahêle Firewn wî bikuje.

Hiz. Mûsa, rojekê li sûkê, bêhemdê xwe mirovekî Qiptiyan dikuje. Ji ber ku zêde ji zilma Firewnî ditirse, direve û diçe Medyenê. Li wir bi keça Şueyb Pêxemberî ra dizewice. Piştî deh salan ew û zarûzêçên wî vedigerin Misrê. Di rêyê da, li Çiyayê Tûrê, Xwedê bi wî ra diaxive û erka pêxembertiyê dide ser milên wî. Dema vedigere Misrê, daxwaza baweriya bi Xwedê, li Firewnî dike, lê Firewn vê daxwazê qebûl nake. Ew jî Cihûyan bi tevahî dicivîne û bi hev ra diçine ber 'Behra Sor' û bi emrê Xwedê gopale xwe li avê dixê û behr dibe du şeq. Mûsa Pêxember û peyrewên wî ji avê derbaz dibin, lê Fîrewn û hevalên wî di avê da dixeniqin û Cihû bi vî awayî ji zilma Firewnî rizgar dibin¹⁰⁸.

Ji ber ku Mûsa Pêxember, li çiyayê Tûrê bênavgîn bi Xwedê ra axiftiye; yanê ew Kelîmullah e, xwediyê "yedî beyza"yê yanê "destê sipî" ye, wî Behra Sor bi qudreta Xwedê kiriye du şeq, Cihû, ji avê dane derbazkirin, ew ji zilma Fîrewnî rizgar kirine, Fîrewn jî di behrê da daye xeniqandin û ew, xwediyê gopale ku dibe 'ejderha' ye, di edebiyatê da cihê wî û serpêhatiyên wî gelek muhim in. Di helbestan da Mu'cîze û qîseyên wî zêde zêde derbaz dibin û bi berfirehî di nav helbestan da cihên xwe girtine.

Şêx Muşerref, di helbestên xwe da careke tenê navê Mûsa Pêxemberî bi kar aniye û ew jî di ev malika jêrîda ye:

Hezretî Yûsif jî te ew husnê bêhed girtibû

Hezretî Mûsa ji te bû fexrê Îsraîliyan

(Q:1/11)

2.2.1.2.9. Hz. Îsa

ÎsaPêxember, pêxemberê Cihûyan yê dawiyê ye û Xwedê, jê ra kitêba Încîlê şandiye. ÎsaPêxember, weke mucîzeyekê, ji dayîka xwe Meryemê bêbav welidiye¹⁰⁹. Îsa, ruhê ku Cêbraîl pifî Meryemê kiriye, ew e. Loma wî destê xwe daye çî, ew bi ruh ketiye û wî tiştên mirî sax kirine, çavên koran ronî kirine, ji heriyê çûk çêkirine û bi bask dane, hîna di pêçekê da bûye axiftiye û li ser avê bi rê va çûye û gelek mucîze nîşan dane. Di sî saliya xwe da bûye pêxember û sê salan rêya rastiye nîşanî gelê xwe daye, lê bi tenê donzdeh kesan pê bawerî anîne. Ji van kesan ra 'Hawarî' tê gotin.

¹⁰⁸ Tarîxu'l-Enbiya, r. 153-215.

¹⁰⁹ Sûreya Meryemê: 19/16.

Cihûyan, xwestine ku Îsa Pêxemberî bikujin, lê Hewariyekî wî ketiye şiklê wî û Cihûyan bi nezanî ev hevalê wî, darexaçî kirine. Îsa Pêxember jî ji aliyê melayîketan va bi bal asîmanan va tê kişandin. Di derbareyî Îsa Pêxemberî da di Quranê da di 22 cihan da agahiyên berfireh hene¹¹⁰.

Di edebiyatê da ev mijara hanê, ji gelek aliyan va hatiye nirxandin. Bo nimûne, ducanîbuna Meryemê bi Îsa Pêxember, di dema welidîbûna wî û di dema dergûşîya wî da bûyîna bûyerên awarte, mucîzeyên wî yên pêxembertiyê, qîmet nedayîna dinyayê, li ser piştta kerekê gera wî, cil û bergên xwe bi xwe dirûtin, çûyina wî ya asîmanan, bi cihbûna wî, di qata çaran da, nezewicandina wî û... hwd.

Tête gotin ku li cem Îsa Pêxemberî, ji mal û milkê dinyayê kevirek, şehek û derziyeke dirûnê hebûye. Carekê dibîne ku kesek bi destên xwe avê vedixwe û kesekî din jî bi tiliyên xwe rihê xwe şeh dike, ji nişka va li wê derê zerika xwe yî a avê û şehê xwe datîne. Dema hildikişe diçe asîmanan, bi tenê derziya dirûtinê pê ra hebûye, lê dîsan jî gelek pirs jê hatine kirin. Jê ber vê sedemê nikaribûye ji asîmanî qata çaran derbaz bibe.

Gelek çaran di helbestan da weke mesîh jî tê naskirin û jê ra ruhu'l-qudûs jî tête gotin. Di helbestan da gelek çaran weke nişaneyek ji jiyane bi peyva “dem/nefes”ê ra tê bikaranîn. Lêvên yarê di gerdenazakirinê da li Îsa Pêxember tê şibandin. Hinek çaran jî, ji ber ku bayê seba, yê ku ji yarê tê û taybetiyeke wî ya saxkirinê heye, di helbestan da li Îsa/Jesûs Pêxember hatiye şibandin¹¹¹.

Hezretî Eyyûb bi te heq da ji bo wî ‘afiyet

Hezretî Îsa bi te ew bû mesîhek bêziyan

(Q:1/12)

Xweş diket şibhê **Mesîh**her kesê ku bimirî

Şeh dibî her wekî şêrê ger biket lê nezerî

Wekî şiddîq e di şiddîq û di setwet ‘Umerî

Huwe ‘Uşmanu mine’l-ħilmî ‘eliyyu’ş-şiyem

(M:6/3)

Dil û canê me wê pehtin hekim Luqman eger bêtin

Digel **Îsa Mesîh** bêtin birînê min bi kew naî

(X:6/32)

2.2.1.2.10. Luqman

Luqman Pêxember, di kevneşopiya gel da weke kesayetekî dîrokî ye û di rewşên curbecur da derdikeve pêşîya me. Li ser navê wî di Quranê da sûreyeke serbixwe heye û navê wê, Sûreya Luqman e û di rêza 31an da cih digire. Di derheqê wî da Xwedê, evha emr û fermanê dike: “*Sond be, bi rastî me hikmet da Luqmanî; ku şikra Xwedayê xwe bike. Çi kesê*

¹¹⁰ Sûreya Beqereyê:2/84; Sûreya Nîsayê: 4/156-159; Sûreya Maîdeyê: 5/109-120; Sûreya Meryemê: 19/16-34; *Tarîxu’l-Enbiya*, r. 317-333.

¹¹¹ Pala, 235-236.

şikra Xwedê bike, ew ji bo xwe dike. Kî jî nakokiyê bike bila bizane ku bêguman Xwedê dewlemend e, hêjayî pesindayînê ye¹¹².”

Di tefsîran da agahiyên hevdeng tune ne, hinek dibêjin ew pêxember e û hinek jî dibêjin nebî ye. Lê hema hema tefsîr bi tevahî dibêjin ku ew kesekî salih e¹¹³.

Li gorî rîwayetan ew pisporek û sembola hikmet û hekîmtiyê ye. Ew, di Quranê da hinek şîretan li kurê xwe dike, bala wî dikişîne ser tewhîd û axretê. Di derheqê Luqmanî da di nava Cihû û xaçperestan da baweriyên cur bi cur hene.¹¹⁴

Şêx Muşerref, di helbestên xwe da careke tenê navê Luqmanî bi kar aniye û ew jî ev malikali jêrî ye:

Teîbîbek mişlê *Luqman* e
 Di weqtêda Suleyman e
 Hebîbê qelbê ehlan e
 Nehin wek wî di vê ‘eşrê

(M:9/2)

2.2.1.3. Navên Melayîketan

Li gorî dînê Îslamê baweriya bi melayîketan, ruknek ji ruknên îmanê ye. Di nav melayîketan da yên asta wan mezin hene û yên asta wan kêr hene. Xwarin û vexwarin û razan ji bona wan tune ye û ew herdem bi îbadetkirina ji Xwedê ra mijûlin.

2.2.1.3.1. Cêbraîl

Cêbraîl, ji çar melayîketên mezin e û qasidê di neqeba Xwedê û Pêxemberên wî da ye. Jê ra melayîketê wehyê jî tê gotin¹¹⁵.

Di edebiyata klasîk da navê wî weke Cibrîl, Cibrîlî Emîn, Ruhû'l-Emîn, Ruhû'l-Quds, Bilbilê Qudsê, Tawisê Qudsê, Tawisê ‘Erş, Tawisê Sidre û... hwd tê binavkirin. Di helbestan da herî zêde navê wî derdikeve pêşiya me. Cêbraîl, bi mijarên weke di bûyera Miracê da çûyîna Pêxemberî hetanî ber ‘Erşî bi alîkariya wî, firîna wî ya bi per û baskan, li Sîdretu'l-Muntehayê ji xwe ra girtina meqamekê, wehîanîna wî, di dema Nemrûd, Îbrahîm Pêxemberî diavêje agirî da pêşniyaziya wî ji bona alîkariyê, ducanîhiştina Hz. Meryemê bi nefesa xwe û... hwd li ser hatiye sekinandin.

Ji ber ku Cêbraîl, kelama Xwedê diaxive wezîfeya teyrê bilbil, tûtî û humayê bi cih tîne, bi per û baskên xwe ji bona bedewîbûna yarê sîdar e. Di helbestan da hinek caran jî canê evîndarê weke cêbraîlî û bejn û bala yarê jî weke sîdarê derdikeve pêşiya me. Li gorî ehlê tesewufê Cêbraîl, “‘Eqlê Kull” e¹¹⁶. Xinûkî di helbestên xwe da bi tenê navê Cêbraîlî bi kar aniye:

¹¹² Sûreya Luqmanî: 31/12.

¹¹³ *Tarîxû'l-Enbiya*, r. 278-283.

¹¹⁴ Pala, 290.

¹¹⁵ *Dini Kavramlar Sözlüğü*, r. 85.

¹¹⁶ Pala, 84.

Hem Medîna te ji bera xulqa dinê meqşûd bû
Dikirin qeşda ewî *Cibrîlû* hem ruhaniyan

(Q:1/13)

2.2.1.4. Navên Quranê û Sûreyên Wê

Navên Quranê û sûreyên wê, gelek caran bûne mijara helbestvanan. Xinûkî jî di helbestên xwe da him navên Quranê û him jî navên sûreyên wê, aniye ziman. Em ê li xwarê, vana yek bi yek bidin nîşandan.

2.2.1.4.1. Quran/Ummu'l-Kîtab

Quran, ji aliyê Xwedê va¹¹⁷ bi rêya wehyê,¹¹⁸ bi zimanê Erebi,¹¹⁹ peyapey,¹²⁰ ji Hz. Muhemmedî ra hatiye şandin,¹²¹ bi rêya tewatûrê û nifş bi nifş xwe gihandiye me, di mishefanda hatiye nivîsandin, bi Sûreya Fatîhayê destpê dike û bi Sûreya Nasê xelas dibe, bi xwendina wî îbadet tê kirin û xêr jê tê wergirtin, ji 6666 ayêt û 114sûreyan pêk tê û kelameke mu'cîzeyê¹²².

Xinûkî di helbestên xwe da navên Quranê, bi du rengan bi kar aniye: Quran û Ummu'l-Kîtab. Weke tê zanîn ku gelek navên Quranê hene ji wana yek ji Ummu'l-Kîtab yanê hîmê kitêban e.

Cami'ê *Quranê* zînnureynî pir feşl û heya
Hezretî Kerrar e wî ser 'eskerê îmaniyan

(Q:1/20)

Kî du sê îxlas û lahewlan û hem û him *ummu'l-kîtab*
Hedye kit bo tûtiya min rebbê heq lê kit nezer

(Q:14/13)

2.2.1.4.2. Sûreya Tûrê

Di Quranê da 114 sûre hene, ji wana yek jî Sûreya Tûrê ye û di Quranê da hejmara rêza vê sûreyê 52 ye. Sûreya Tûrê, li Mekkeyê nazil bûye û ji 49 ayêtan pêk tê. Navê xwe ji ayêta yekemîn digire û ev ayêt, navê Çiyayê Tûrê ye ku li ser vî çiyayî Tewrat, ji Mûsa Pêxemberî ra hatiye nazilkirin û Xwedê bi wî ra têkilî kiriye; yanê rasterast axiftiye¹²³.

Di edebiyata klasîk da gelek helbestvanan di derbareyî Çiyayê Tûrê da helbest nivîsandine û weke mijar hildane. Di tesewufê da Çiyayê Tûrê, nîşaneyê mirovan ya maddî ye. Bi rastî jî ev binyada maddî, bi tecelliya Xwedê wenda dibe. Ji bo vî tiştîjî hewce ye berî her tiştî hebûn were wendakirin¹²⁴. Şêx jî ev rasteqîniya hanê bi vî rengî aniye zimên:

¹¹⁷ Sûreya Heqqeyê: 69/43.

¹¹⁸ Sûreya Yûnusî: 10/12.

¹¹⁹ Sûreya Yûsifi: 12/2.

¹²⁰ Sûreya Furqanî: 25/32.

¹²¹ Sûreya Şuarayê: 26/192-195.

¹²² Abdulhamit Birişik, "Kur'an", *Diyanet İslam Ansiklopedisi DİA*, XXVI, Weşanên Türkiye Diyanet Vakfı, 2002 Ankara, r. 382.

¹²³ *Kur'an-ı Kerim ve Açıklamalı Meali*, Diyanet Vakfı Yayınları / 86-B, Ankara 2012, r. 522.

¹²⁴ Pala, 461.

Bi heqqê *sûreê Tûrê*
 Xuda baqî ke vê nûrê
 Bide tewfîq û destûrê
 Meded ya Gewsê Geylanî

(M:7/12)

2.2.1.4.3. Sûreyê Îxlasê

Ji sûreyên Quranê yek jî Sûreya Îxlasê ye û hejmara rêza vê sûreyê 112 ye. Sûreya Îxlasê, li Mekkeyê nazil bûye û 4 ayêt in. Îxlas; tê wateya jidilxwestinê, jidil xwe girêdana bi dîn va û bi tenê ji bo bi destxistina riza Xwedê bicihanîna emr û fermanên wî. Sûreya Îxlasê, ‘eqîdeya tewhîda Îslamê weke kakil binav dike¹²⁵.

Di derbareyî xêra xwendina Sûreya Îxlasê da gelek hedîs hene û Şêx Muşerefi jî di helbestên xwe da xwestiye bala xwendevanan bikişîne ser xwendina vê sûreyê.

Kî du sê *ixlas* û lahewlan û hem û him ummu’l-kîtab
 Hedye kit bo tûtiya min rebbê heq lê kit nezer

(Q:14/13)

2.2.1.5. Navên Şehabîyan

Şehabî, peyveke Erebi ye, ji lêkera “şe-şe-be”yê hatiye dariştin û tê wateya hevaltî û dostaniyê, pirjimariya wê şehabe û eşhab e¹²⁶. Weke têgeh ew kesê/a ku xwe gihandiye serdema Hz. Pêxemberî, ew kesê ku ewdîtiye, di suhbeta wî da rûniştîye û weke bisilman jiyana xwe ji dest daye ra tê gotin¹²⁷. Peyva xelîfetiye jî peyveke Erebi ye, ji lêkera “xe-le-fe”yê hatiye dariştin û tê wateya ew kesê/a dikeve cihê yekî/e din û ji bo Hz. Ebabekir, Hz. Umer, Hz. Osman û Hz. Elî tete gotin.

Şêxî, di helbestên xwe da gelek caran têgeha şehabîyan weke eşhab bi kar aniye û di gelek helbestanda jî navê wan gotiye.

Digel al û *eşhaban*
 Digel yarê emekdarî

(Q:23/17)

Digel *eşhab* û hem etba’ û alan
 Tijî dinya tijî deşt û newalan

(MS:9/10)

¹²⁵ *Kur’ân-ı Kerim ve Açıklamalı Meali*, r. 604.

¹²⁶ Mecdu’ d-dîn Muhemmed bî Ye’ qûb el- Fîrûz Abadî, *el-Qamûsu’l-Muhît*, (Tahqîq, Enes b. Muhemmed eş-Şamî we Zekeriya Cabir Ehmed, Darul’l-Hedîs, Qahîre 2008, r. 492.

¹²⁷ *Dini Kavramlar Sözlüğü*, r. 571.

2.2.1.5.1. Hz. Ebabekir

Hz. Ebabekir, ji herçar xelifeyên Îslamê yê yekemîn e, ji sehabiyên û ji ‘eşereyê mubeşşere ye (ew sehabiyên ku hîn li dinyayê bûne û mizgîniya biheştê ji wan ra hatiye). Him beriya Îslamê him jî piştî Îslamê dostê Hz. Muhemmedî bûye. Ji pêşengên Qureyşiyên e û dinav wan herçar kesên ku di serî da Îslamiyet pejirandine. Ji ber sedema ku ew, dema bûyera Miracê dibihîze bêşik û bêguman bawerî pê tîne, leqeba “siddîq” lê hatiye danîn. Dema Hz. Pêxember hîcret/koç dike, ew, hevalê wî bûye û di Quranê da pesna wî hatiye dayîn¹²⁸. Xanima Hz. Pêxemberî, Hz. Ayşe, keça wî ye, ew hertim li cem pêxemberî bûye, di nexweşiya pêxemberî da wî li pêşiya bisilmanan nimêj kiriye û dema Hz. Pêxember emrê Xwedê bi cih tîne, ew dibe xelîfe. Cara ewil bi fermana wî, Quran tê berhevkirin û di sala 634 a mîladî da çûye ber dilovaniya Xwedê¹²⁹.

Şêx Muşerrefî, di helbestên xwe da navê xelîfeyê yekemîn, bi şiklê Ebûbekr, Sedîqê Ekber û Siddîq bi kar aniyê:

Bi sirra şewata qelbê *siddîq*

Ebûbekrê reîsê ehlê teşdîq

(MS:3/2)

Xaşşeten *Sedîqê Ekber* wî şehê şahib hüner

Hezretî Farûq e fettahê ‘Îraq û Şamiyan

(Q:1/19)

2.2.1.5.2. Hz. Umer

Hz. Umer, ji sehabiyên e, xelîfeyê duyemîn e û hîna li dinyayê bûye, mizgîniya biheştê jê ra hatiye. Di 26 saliya xwe da bûye bisilman û bi wî ra hejmara bisilmanan gihêştîye 40 kesî. Êdî Hz. Pêxember û sehabiyên wî, bi awayekî aşkere teblîxa/danasîna dîne Îslamê li mirovan kirine.

Piştî wefata Hz. Ebabekirî, ew dibe xelîfe û di serdema wî da gelek cih û war dikevine bin qontrola bisilmanan. Hz. Umer, hem bi jiyana xwe hemjî bi tevgera xwe bûye sembola edaletê. Ji bona vê sedemê jê ra hatiye gotin “Umerê Farûq” yanê ew kesê ku heqî û neheqiyê ji hev cuda dike. Di sala 644ê mîladî da ji aliyê bendeyê waliyê Besrayê va tê kêrkirin û diçe bal Rebbê xwe.¹³⁰

Di edebiyata klasîk da Hezretê Umer, cihekî gelek berfireh girtiye û weke nimûne ji bona dadmendiya hatiye nîşandan. Xinûkî jî navê wî di vê wateyê da bi kar aniyê:

Xaşşeten Şedîqê Ekber wî şehê şahib hüner

Hezretî Farûq e fettahê ‘Îraq û Şamiyan

(Q:1/19)

¹²⁸ Sûreya Tewbeyê: 9/40

¹²⁹ *Muxteşeru’s-sîretî’n-nebîyyî we sîretu eşhabîhî’l-’eş’ere*, r, 185-189.

¹³⁰ *Muxteşeru’s-sîretî’n-nebîyyî we sîretu eşhabîhî’l-’eş’ere*, r, 191-194.

2.2.1.5.3. Hz. Osman

Hz. Osman, xelîfeyê sêyemîn yê Îslamêye, ji sehabiyan e û bisilmanê pêncemîn e. Kesekî karsaz û dewlemend bûye. Bi du keçên Hz. Pêxemberî ra zewiciye, berê bi Hz. Rukiyyê ra û piştî mirina wê bi Ummu Gulsumê ra zewiciye. Piştî mirina Hz. Umer di sala 644ê mîladî da dibe xelîfe û hetanî sala 656ê mîladî xelîfetiya xwe berdewam dike. Ew, dema li ser Quranê û bi xwendina wî ra mijûl bûye hatiye şehîdkirin.

Hz. Osman, ew kes e ku cara yekemîn nusxeyên Quranê zêde kirine û şandiye navendên muhim yên Îslamê. Ew, kesekî şermok û xwediyê edeb û heyayê bûye. Di serdema wî da sînore dewleta Îslamê gelek berfireh bûye¹³¹.

Hz. Osman; bi şermokî, edeb û heya xwe û bi leqeba xwe ya Zînnûreyn, bûye mijara edebiyata klasîk. Şêxî jî ew bi leqeba wî ya Zînnûreyn bi kar anîye, lewra ew, du caran bi keçên Pêxemberî ra zewiciye û du caran bûye xwediyê nûra Pêxemberî.

Cami'ê Quranê *Zinnureynî* pir fêsl û heya

Hezretî Kerrar e wî ser 'eskerê îmanîyan

(Q:1/20)

2.2.1.5.4. Hz. Elî

Hz. Elî, xelîfeyê çaremîn û yê dawiyê ye. Ew jî weke hersê xelîfeyên din sehabe ye û hîna li ser dinyayê bûye, mizgîniya biheştê jê ra hatiye. Hz. Elî, kurê apê Pêxemberî ye û navê bavê wî Ebû Talib e. Ew, di nav herçar kesên ku beriya her kesî Îslamiyet qebûlkirine da ye û wê demê temenê wî 10-12 salî bûye û tucaran berê xwe nedaye pûtan û ji wan ra îbadet nekiriye. Lewra, dema navê wî derbaz dibe ji bona hurmetê jê ra “Kerremallahu weche” tete gotin.

Zavê Hz. Pêxember e, mêrê Hz. Fatimayê ye û bavê Hesên, Huseyîn û Zeynebê ye. Ebu'l-Heesen (Bavê Hesên), Ebû Turab (bavê xweliyê) û Murteza (kesê hîlbijartî, berbiçav) navên wî yên din in û Esedullah (Şêrê Xwedê), el-Ğalîb (kesê bi serketî) û Heyder (Serokê Şêrî) leqebên wî ne.

Dema Hz. Pêxemberî hîcret kiriye û çûye Medîneyê, bi armanca ku muşrîk pê nehesin ku Pêxember çûye, Hz. Elî di şûna wî da di nivînê wî da radizê û di gelek şeran da li kêleka wî bi awayekî serkeftî şer dike. Di sala 656ê mîladî da piştî şehîdketina Hz. Osmanî, dibe xelîfe. Di navbera wî û kurê Ebû Sufyan, Muaviyeyê da gelek şer diqewimin û di dawiyê da ji aliyê Xariciyekî va di sala 661ê mîladî da tê şehîdxistin¹³².

Di edebiyata klasîk da dema helbestvan di helbestên xwe da pesna kesekî didin, ji gelek aliyan va dişibihînine Hz. Elî. Eger ew kesê ku pesna wî tê dayîn navê wî Elî be beyt, bi hunerên weke telmîh, tewriye, teşbîh, tenasub û...hwd tê xemlandin. Di hunera îqtibasê da hespê Hz. Elî bi navê “Duldul”, şûrê wî yê du çetel e bi navê “Zulfiqar” û gotina “*La feta îlla*

¹³¹ *Muxteşeru's-sîretî'n-nebîyyî we sîretu eşhabîhî'l-'eş'ere*, r, 195-198.

¹³² *Muxteşeru's-sîretî'n-nebîyyî we sîretu eşhabîhî'l-'eş'ere*, r, 199-208.

*Elî, La seyfe îlla zulfîqar*¹³³ê zêde zêde hatine bikaranîn. Di pesindayîna Hz. Elî da, peyva ‘çariyar’ di helbestên gelek helbestvanan da cih digire.

Di edebiyata tesewufê da cihê Hz. Elî, cihekî gelek muhim e û tê gotin ku silsileya gelek terîqetan xwe digihîne Hz. Elî¹³⁴.

Şêx Muşerrefî, di helbestên xwe da navê Hz. Elî weke Hezretê Kerrar, Padişahê Zu’l-fîqar û Babê Faţimayê bi kar aniyê:

Îmamê me *Elî* dibêjî efendim

Li her erdê ji bo ustad ‘ebdim

(MS: 1-2/6)

Cami‘ê Quranê zînnureynî pir feşl û heya

Hezretî Kerrar e wî ser ‘eskerê îmanîyan

(Q:1/20)

Îlahî seyyîd cara du carî

Bi heqqê padişahê *zî’l-fîqarî*

(MS:3/5)

2.2.1.5.5. Hz. Hesen

Hz. Hesen, kurê Hz. Elî û Hz. Fatimayê yê mezin e û neviyê Hz. Pêxemberî ye, leqeba wî “Mucteba” ye û di sala sisêyê hîcrî da li Medîneyê hatiye dinê. Piştî wefata bavê wî, Muaviye, dixwaze ku wî bike xelîfe, lê kurê Muaviyeyî, Yezîd, ji Şamê jehrê dişîne Medîneyê û bi hinek dek û dolaban xanima Hz. Hesenî dixapîne û bi destê jina wî jehrê bi wî dide xwarinê û ew di 46 saliya xwe da dimire. Ji binemala wî ra “Şerîf” tê gotin.

Di edebiyata klasîk da mirov, gelek caran di helbestan da rastî navê Hz. Hesenî tê û bi piranî jî navê wî û birayê wî Huseyîn bi hev ra tê gotin. Şêx Muşerrefî jî ev rêya hanê wiha şopandiye:

Bi wan herdu durran ewwel *Hesen* bû

Huseyn peyve çîqa nazik beden bû

(MS:3/6)

Hezretî ‘Ebbas û Hemze hem Huseyn û hem *Hesen*

Ehlê bey‘et ‘eskerê herba Uğud û Bedriyan

(Q:1/21)

¹³³ Tê rîwayetkirin ku di herba Uğudê da Hz. Elî performanseke zêde nîşan daye û melayîketan ji bona wî ev malik gotine: Bi xêr jî Elî tu ciwanek tune ye/ Bi xêr jî Seyfullah tu şûrek tune ye

¹³⁴ Pala, 19.

2.2.1.5.6. Hz. Huseyîn

Hz. Huseyîn jî weke Hz. Hesenî, kurê Hz. Elî û Hz. Fatimayê ye û neviyê Hz. Pêxemberî ye. Ji donzdeh îmaman weke yê sisêyan tê hesabandin û di rêza Ehlê Beytê da, di rêza pêncan da ye. Di dehê meha Muhherremê di sala 683ê mîladî da li Kerbelayê şehîd dikeve. Dema bavê wî emrê Xwedê bi cih tîne, ew vedigere Medîneyê û piştî mirina Muaviyeyî, ew ji Yezîdî ra bîetê nake. Gelê şênîyên Kûfeyê, wî vedixwînine Kûfeyê û dixwazin wî bikin xelîfe. Li ser vê daxwaziyê ew û 72 hevalên wî ber bi Îraqê va bi rê dikevin. Lê Yezîd, ji vê rewşê agahdar dibe û ji Şamê xeberê ji waliyê Îraqê Ubeydullahê kurê Ziyadî ra dişîne ku ew, wana nehêle ku bikevine Kûfeyê. Ev agahî digêhêje destê Hz. Huseyînî, lê ew ji rêya xwe venagere û li Kerbelayê ew û 72 hevalên wî bi zilm û şenceyê mezin şehîd dikevin.

Bi taybetî di edebiyata Elewîyan da ji bona Hz. Huseyînî cihêkî taybet heye û di derheqê wî da gelek helbest hatine nivîsandin. Hemû bisilman û bi taybetî jî Elewî di 1-10ê meha Muhherremê da diçin gora Hz. Huseyînî ziyaret dikin. Şêx Muşerrefê Xinûkî jî navê Hz. Huseyînî di helbestên xwe da evha bi kar aniyê:

Bi wan herdu durran ewwel Hesen bû

Huseyn peyve çîqa nazik beden bû

(MS:3/6)

Hezretî ‘Ebbas û Hemze hem *Huseyn* û hem Hesen

Ehlê bey‘et ‘eskerê herba Uşud û Bedriyan

(Q:1/21)

2.2.1.5.7. Hz. ‘Ebbas

Hz. ‘Ebbas, kurê ‘Ebdulmutelîb e û apê Hz. Muhemmedî ye, sê salan ji Hz. Pêxemberî mestir/mezintir e û zaroktiya wan bi hev ra derbaz bûye. Hz. Pêxemberî, zêde jê hezkiriye û gotiye ku apê mirovan weke bavê mirovan e. Ew, di ciwantiya xwe da bi bazirganiyêra mijûl bûye, wezîfeya îkramkirina ava zemzemê li ser milê wî bûye. Hz. ‘Ebbas, di herba Bedrê da ji aliyê bisilmanan va dîl tê girtin û ew piştî azadbûnê, dibe bisilman. Di serdema hersê xelîfeyên ewil da jiyaye û di sala 653yê mîladî da çûye ber rihma Xwedê¹³⁵.

Hezretî ‘*Ebbas* û Hemze hem Huseyn û hem Hesen

Ehlê bey‘et ‘eskerê herba Uşud û Bedriyan

(Q:1/21)

2.2.1.5.8. Hz. Hemze

Hz. Hemze him apê Hz. Muhemmedîye him jî birayê wî yê şîrîye. Ew wexta ku hêj nebûbû bisilman, rojekê dibihîze ku Ebû Cehil li ser girê Sefayê ji Hz. Pêxemberî ra çêr û dijûnan dide, hema diçe lê dixê û serê wî dişikêne. Hz. Hemze, di Mekkeyê da kesekî bihêz, navdar û hezkirî bûye. Bi bisilmanbûna wî, hêza bisilmanan gelek bi quwet dibe û mirov

¹³⁵Faruk Sümer, “Abbas”, *Dîyanet İslam Ansiklopedis*, Weşanên Diyanet Vakfîyê, İstanbul 1988, I, 16-17.

dikare bibêje ev quweta hanê quweteke manewî bûye. Ew, di nav wan kesên ku hîcret kirine da bûye. Di herba Bedrê da qehremaniyekepir zêde nîşandaye û di herba Uhudê da jî bi gernasî şer kiriye. Ji aliyê bendeyekî bi navê Wehşî va hatiye şehîdkirin û di dema şhadeta xwe da temenê wî 57 sal bûye. Nimêja cenazeyê wî Hz. Pêxemberî bi xwe kiriye û ji ber şehîdketina wî zêde zêde xemgîn bûye¹³⁶. Şêxî, ji ber ku Hz. Hemzeyî bi bîr bîne, navê wî dihelbestên xwe da ewha bi kar aniye:

Hezretî ‘Ebbas û **Hemze** hem Hûsêyn û hem Hesen

Ehlê bey‘et ‘eskerê herba Uhud û Bedriyan

(Q:1/21)

2.2.1.5.9. Hz. Selman

Hz. Selman, ji mezinên sehabeyan e, ji Îsfehanêye û weke Selmanê Farisî hatiye naskirin. Ew, ji aliyê baweriyê va mecûsî bûye. Carekê di ber derê dêreke xaçperestan ra derbaz dibe û dema dêrê dibîne dikeve hundirê wê dêrê û dibe xaçperest. Paşê diçe Şamê û ji wir jî diçe Medîneyê û li wir Hz. Pêxember dibîne û pê bawer dike, dibe bisilman. Salên dût û dirêj bi Hz. Elî ra hevaltîyê dike û di sala 655an da dimire¹³⁷. Şêx Muşerrefî, navê ev sehabeyê qehreman ewha bi kar aniye:

Bi **Selman** ku şehabiyek **Farisî** bû

Welê me‘dûd ji nav beyta nebîbû

(MS:3/3)

2.2.1.5.10. Uhudî û Bedriyan

Bedir, li ser rêya Şamê û Mekkeyê ye û 160 km ji Medîneyê dût e. Navê cihê herba ku di neqeba muşrîkên Mekke û bisilmanan da di sala 624an da qewimiye. Hejmara leşkerên muşrîkan 950 ya bisilmanan jî 305 bûye. 100 siwarî û 700 hêştirên muşrîkan hebûne, bi piranî jî zirxê wan hebûne, bisilman jî xwediyê 3 hesp û 70 hêştiran bûne. Serleşkerê artêşa muşrîkan Ebu Cehil bûye û şer bi serkeftina bawermendan bi dawî bûye. Ji muşrîkan tevî Ebu Cehil 70 kes mirine 70 kes jî dîl hatine girtin, ji bisilmanan jî 14 kes şehîd ketine.

Gelek sehabe beşdarî vê herbê bûne. Hinek navên sehabeyên ku beşdarî herba Bedrê bûne ev in: Hz. Ebabekir, Hz. Umer, Hz. Osman, Hz. Elî, Hz. Telhe û Hz. Zubêyr...¹³⁸.

Uhud, navê çiyayekî nêzîkî Medîneyê ye. Di navbera muşrîkên Mekke û bisilmanan da di sala 625ê mîladî da herb rû dide. Di vê herbê da hejmara muşrîkan 3000 bûye û ji wan jî 200 kes siwarî û 700 kes jî bi zirxî bûne û artêşa Îslamê jî bi tenê 700 kes bûne û ji wan jî 2 kes siwarî û 100 kes jî bi zirxî bûne. Di destpêkê da bisilman bi ser dikevin, lê ji ber ku tîravêjên li ser girê Uhudê cihên xwe berdîdî û tene jêrî, muşrîk bi xwe tîn û êrişî bisilmanan dikin, rewşa bisilmanan xirab dibe û erzînk û didanê Hz. Pêxember dişikên û 70 kes jî şehîd dikevin.

¹³⁶ Hüseyin Algül, “Hamza”, *Dîyanet İslam Ansiklopedis*, Weşanên Diyanet Vakfîyê, İstanbul 1997, XV, 500-502.

¹³⁷ İbrahim Hatıboğlu, “Selman-ı Farisî”, *Dîyanet İslam Ansiklopedis*, Weşanên Diyanet Vakfîyê, İstanbul 2009, XXXVI, 441-443.

¹³⁸ Mustafa Fayda, “Bedir Gazvesi”, *Dîyanet İslam Ansiklopedis*, Weşanên Diyanet Vakfîyê, İstanbul 1992, V, 325-327; *Dini Kavramlar Sözlüğü*, r. 61-62.

Gelek sehabe beşdarî vê herbê bûne. Hinek navên sehabeyên ku beşdarî herba Uhudê bûne wiha ne: Hz. Ebabekir, Hz. Umer, Hz. Osman, Hz. Elî, Hz. Telhe, Hz. Zubêyr, Ebdurrahman b. Awf...¹³⁹.

Şêx Muşerref, bi armanca ku sehabeyên beşdarî herba Bedrê û Uhudê bûne bi bîr bûne, ew weke Uhud û Bedriyan bi nav kiriye û bi vî şiklî hildaye helbestên xwe:

Hezretî ‘Ebbas û Hemze hem Hûsêyn û hem Hesen

Ehlê bey‘et ‘*eskerê herba Uhud û Bedriyan*

(Q:1/21)

2.2.2. Unsûrên Uxrewî

2.2.2.1. Îman

Îman, di ferhengê da tê wateya pesendkirina kesekî di gotina wî da, qebûlkirina gotina wî, pejirandina bi rizaya dil û bêgumana pesendkirina jidil. Weke têgehê, tê wateya bawerkirin û pejirandina bêşik û bêguman bi emrên ku Hz. Pêxemberî ji cem Xwedê ji me ra aniye, ew weke zaruretên dînî bi me daye zanîn û di derbareyî wan da agahî daye me ra, tê gotin¹⁴⁰. Xinûkî têgeha îmanê di helbestên xwe da emilandiye:

Li ser *îman* ruh bistîne ya Reb

Di qebrê da tu arî min be ya Reb

(MS:3/38)

Îlahî kû çewan *îman* te kir bexş

Ji ewwil dil bi tewhîdê te kir neqş

(MS:6/16)

2.2.2.2. Mewt/Mirin

Mewt, peyveke Erebi ye û ji lêkera “ma-te”yê hatiye dariştin û wateya wî mirin û tunebûn e¹⁴¹ û Kurdiya wî jî mirin e. Mirin di tesewufê da tê wateya ku derwêş, nefsa xwe ji daxwaz û hewesên dinyayê paqij bike. Ji vê yekê ra tê gotin ku mirina îxtiyarî; yanê mirina dilxwazî. Di tesewufê da pileya yekemîn, kuştina nefsê ye û di şûna mewtê da memmat jî tê bikaranîn¹⁴². Di derbareyî vê mijarê da hedîsek hatiye rîwayetkîrin ku Pêxemberî gotiye “*Beriya mirinê bimirin.*”¹⁴³. Ev hedîs ji bo terbiyekirina nefsê di tesewufê da cihekîmuhim digire. Lê hewceye eva jî were gotin ku, gelek pisporên ilmê hedîsan dibêjin ku ev hedîs sehîh nîne.

Şêx Muşerrefî jî xwestiye mirinê ji bîr neke, lewra di helbestên xwe da gelek caran têgeha mirinê bi kar aniye:

¹³⁹ Muhammed Hamidullah, Casim Avcı, “Uhud Gazvesi”, *Dîyanet İslam Ansiklopedis*, Weşanên Diyanet Vakfiyê, İstanbul 2012, XXXXII, 54-57; *Dini Kavramlar Sözlüğü*, r. 665.

¹⁴⁰ *Dini Kavramlar Sözlüğü*, r. 315.

¹⁴¹ *el-Qamûsu 'l-Muhîf*, r.1562.

¹⁴² Pala, 314.

¹⁴³ Tîrmîzî, Zuhd, 25; İbn Mace, Zuhd, 3; Musned, 2/24, 41, 131.

Ya Eba Selman Suleyman ey bira û ey çira
Bo çî mektûban birê nakî ji bo dostan çira
Hel tera innî erakum qeble mewtî hel tera
Yan evan derd û geman dê bibne qebrê bi xwe ra
Ah ser û patêk helan ji vê firqetê ah firqetê

(MX:1/4)

Ey şufêr lezke tu baco bifire wek çeyyareê
Da ji bera *mirinê* vexun em şerbeta Eşhabê Kehf

(Q:4/2)

Bi hewar û bi newa cumle bi bal wî ve herin
Xwe bikin ‘ebdê derîzanê heta hûn *bimirin*
Ji ewî ava heyatê bi yeqîn hûn bigerin
Exlîşû et-tewbete lîllahî we za bi’n-nedem

(M:6/9)

2.2.2.3. Roja Qiyametê

Qiyamet, peyveke Erebi ye û ji lêkera “qe-we-me”yê hatiye dariştin, wateya wî tîkbûn, rabûna ser lingan, sekinandin û roja ku her zindî têda li hizûra Xwedê disekinîn e¹⁴⁴. Weke têgeheke dînî tê wateya ku hatina dema ku Xwedê ji ezel va teqdîr kiriye, mirina bi tevahî zindiyên ku di dinyayê da dijîn û paşê jî ji aliyê Xwedê va vejîndina bi tevahî kesên ku mirine, kombûna wan li cihê mehşerê, di derheqê wan da lêpîrsînkirin û dayîna beramberiya karê ku wan li dinyayê kirine¹⁴⁵. Roja mehşerê jî di heman wateyêda ye.

Di edebiyata klasîk da têgeha qiyametê/mehşerê bi piranî bi wateya peyvên qiyam, qed û qametê va hatiye girêdan û hatiye bikaranîn¹⁴⁶. Xînûkî jî ev têgeha hanê, bi vî rengî bilêv kiriye:

Bide destûr di wî **roja qiyamet**
Ku mehderke ji mi ra şahê şefa‘et

(MS:3/39)

Qeş tu nakî carekê fikrê di **roja mehşerê**
Tu gelo ma qeş nizanî ku tu şahîb defterî

(MS:7/4)

2.2.2.4. Cennet/Biheşt

Peyva cennetê, peyveke Erebi ye, tê wateya baxçeyê ku bi riwêk û daran hatiye xemilandin. Di lîteratura dînî da jî wateya wê ew e ku ji bona ew kesên hîna di dinyayê da ne

¹⁴⁴ *el-Qamûsu ‘l-Muhîţ*, r.1383.

¹⁴⁵ *Dîni Kavramlar Sözlüğü*, r. 378.

¹⁴⁶ Pala, 275.

îman anîne û ‘emelên salih kirine ra cihê mikafat û nîmet dayînê ye. Di Quranê da weke cennetu’l’adn, cennetu’l-firdews, cennetu’n-ne‘îm, daru’l-xuld û daru’s-selam û... hwd cur be cur nav ji bona cennetê hatine bikaranîn¹⁴⁷. Di Kurdî da ji peyva cennetê ra biheşt tê gotin, lê gelek caran jî peyva cennetê tê bikaranîn.

Di edebiyatê da biheşt, remza koşk, baxçe, tax û welatê yarê ye. Xweza, di demsala biharê da nimûneyek ji cennetê ye. Cihên xweşik li biheştê hatine şibandin. Di helbestan da gelek caran bi têgeha cennetê ra peyvên kewser, hûrî, xilman, tawis û... hwd jî hatine emilandin:

Welê elhemdulillah me yeqîn e

Kû **cennet** xweş cih e ji bo mu’minîn e

(MS:6/13)

Bi heqqê Xace Babayê Simasî

Riya **cennet** gelek taze dinasî

(MS:6/16)

2.2.2.5. Dojeh

Cehennem, di ferhengê da tê wateya bîra kûr, di dînî da jî tê wateya cihê ku ew kesên di dinyayê da îman neanîne bi bêdawî yan jî ew kesên ku îman anîne, lê belê ‘emelên salih nekirine têda bi qasî pileya gunehên xwe ceza kişandinê. Di Quranê da ji bona cehennemê ji xeynî navê cehennemê, şeş navên din jî hatine bikaranîn û ew jî ev in: Nar, cehîm, hawiye, saîr, leza, seqer û hutame¹⁴⁸. Kurdiya peyva cehennemê dojeh e.

Dojeh, di edebiyatê da ji ber firqeta ji yarê remza kişandina êş û jana evîndarê ye. Ji ber ku dojeh, agir e û taybetmendiya wê ya şewitandinê jî heye, di helbestan da gelek caran hatiye bikaranîn. Hêrs û xezeba yarê jî remza dojehê ye¹⁴⁹.

Şêx Muşerrefî, di helbestên xwe da peyva Kurdî yanê “dojeh” bi kar aniye. Ev a jî nîşa dide ku wî girîngiyeke mezin daye parastina zimanê Kurdî.

Mişlêdojê ew ‘ezab e

Ew diket cergan kebab e

Her diket qehr û şitab e

Ruh diket ji qalib cuda ye

(M:1/3)

2.2.2.6. Hûrî

Hûrî, navê qîzên cennetê ne û qîzên were ne ku spîlkeya çavên wan ji reşahiya çavên wan zêdetir e û ku ji wan ra tê gotin qîzên çavxezal. Hûrî, di cennetê da xizmetkarên mumînan in¹⁵⁰.

¹⁴⁷ Dini Kavramlar Sözlüğü, r. 96.

¹⁴⁸ Dini Kavramlar Sözlüğü, r. 87.

¹⁴⁹ Pala, 86.

¹⁵⁰ Sûreya Beqereyê: 2/25; Sûreya Alî İmranî: 3/15; Sûreya Nîsayê: 4/57.

Hatiye rîwayetkirin ku gulpikên horiyan weke gulan in, didanên wan weke durran in, lêvên wan weke mercanan in, bejna wan wekedara selwiyê ne, xûy û xisleta wan baş e û ew, xweşikîrîn qîzên ji gulan in. Ji ber ev taybetiyên xweşik di edebiyatê da yar, li horiyan hatiye şibandin. Ew yara ku hiş û aqilê evîndarî ji serê wî derxistiye, horiyek ji horiyan e û cihê yara wî jî cennet e¹⁵¹:

Nê ji te mewcûd bûne filheqîqet her du kewn

Hem ji te bîhna xwe girtin misk û biskên *horiyan*

(Q:1/8)

2.2.3. Têgehên Tesewufê

Şêx Muşerrefê Xinûkî di helbestên xwe da gelek têgehên tesewufê emilandine. Ji ber ku ew, ehlê medrese û ehlê terîqetê bûye, loma wî girîngiyeke mezin daye tesewufê.

2.2.3.1. Tewhîd

Tewhîd, di ferhengê da tê wateya hukimkirina tişteki bitenê û bi vî şiklî zanînbûna wî. Weke têgehê, tewhîd, tê wateya cihêkirina zatê Xwedê ji hemû tesewuran û ew tiştên ku di xeyalan û wehman da derbaz dibin. Tewhîd, bi sê curan çêdibe: Naskirina ulûhiyeta Xwedê, pesendkirina yekîtiya wî û nepejirandina şirîkan ji bona wî¹⁵².

Îlahî ku çewan îman te kir bexş

Ji ewwil dil bi *tewhîdê* te kir neqş

(MS:6/16)

2.2.3.2. Fena/Beqa

Fena, di ferhengê da tê wateya miweqetiyê, mirinê û tunebûnê¹⁵³. Di edebiyatê da zêdetir di çarçoveya hebûna maddî û jiyânê da tê bikaranîn. Miweqetbûna hebûnê bûye sedem ku fena, li ba û lehiyê were şibandin. Di tesewufê da fena, bi wateya “fena fî'l-lah”ê ye¹⁵⁴.

Beqa, di ferhengê da tê wateya mayîdebûnê û dijberî wateya peyva fenayê ye¹⁵⁵. Di tesewufê da tê wateya di dewsxûyê û xisletên nebaş da xûyê û xisletên baş, qenc û xemilandina evdan bi sifet û wesfên Xwedê.

Di edebiyatê da ji bo ku were nîşandan ku jiyana dinyayê jiyaneke demkîye, têgehên fena û beqayê bi hev ra tene bikaranîn¹⁵⁶.

¹⁵¹ Pala, 212-213.

¹⁵² *Dini Kavramlar Sözlüğü*, r. 659-660.

¹⁵³ *Dini Kavramlar Sözlüğü*, r. 175-176.

¹⁵⁴ Pala, 150.

¹⁵⁵ *Dini Kavramlar Sözlüğü*, r. 62.

¹⁵⁶ Pala, 63; *Dini Kavramlar Sözlüğü*, r. 62.

Derdê bêderman fîraq e
 Ew bi mişlê ihtîraq e
 Ew didit xelqê filaq e
 Raĥetî vê ra *fena* ye

(M:1/1)

Dinê madem *fena* ye bes dirêjkem
 Serê sami‘ ji tetwîlatê gêjkem

(MS:6/12)

Ey ‘ezîz dinya weha ye bê *beqa* ye fanî ye
 Sed xwezî bi wî dilgirê nadit bi dinya faniyan

(Q:25/4)

2.2.3.3. Sirr

Sirr, di ferhengê da tê wateya veşartîhiştina tişteki. Di edebiyata klasîk da lêvên yarê weke sirr/raz li ser tê sekinandin û ew nayê veçirandin, nayê fêmkirin û kesek bi wî nizane. Bi taybetî jî eger mijar evîna îlahî be, sirr xwe nîşan dide. Di şerabê da jî taybetmendiya sirrê heye¹⁵⁷. Şêx Muşerrefî jî bal kişandiye ser vê têgehê:

Ehsene’l-lahu tebareke ji *sirra* vê tûtiyê
 Zahirî ger çî qemer bû baîni bû wek qemer

(Q:14/4)

Bi *sirra* şewata qelbê şiddîq
 Ebûbekrê reîsê ehlê teşdîq

(MS:3/2)

2.2.3.4. ‘Arif

‘Arif, di ferhengê da tê wateya kesê/a zana, şareza, zanistmend, agahdarvan û aşînavan. Weke termeke tesewufê tê wateya ew kesê/a ku bi serpehatiyên manewî xwe digîhîne asta me‘rîfet û rasteqîniyê. Wateya ‘alim û ‘arifê ji hev cuda ne. Ji ber ku ‘alim, bi xwendin û xebatê dibe ‘alim, lê mirov, bi ‘îrfan, îlham û hal dibe ‘arif¹⁵⁸. Şêx Muşerref jî di malika jêrî da dibêje kesê ‘arif şareza ye û ji bona ‘arifan terîf tişteki nexweşik e:

Bira te‘rîf ji bo *‘arifqebîh* e
 Ji bo zana neşîhet *naşehîh* e

(MS:6/6)

¹⁵⁷ Pala, 375.

¹⁵⁸ Cebecioğlu, 15.

2.2.3.5. Ʀerîqa Zulcelal

Celal, tê wateya ew kesê ku mafê dayîna fermanan û qedexekirina wan di destê wîda ye. Celal, sifateke taybet e û bi tenê ji bo Xwedê tê emilandin. Zulcelal jî sifetek ji sifetên Xwedê ye û tê wateya xwediyê celalê¹⁵⁹. Ʀerîqa Zulcelal, tê wateya rêya Xwedê. Seyda jî bal dikişîne ser vê yekê:

Bi heqqê Xace Baqî xweş delal bû

Gelek nasê Ʀerîqa **Zulcelal** bû

(MS:3/26)

2.2.3.6. Şer‘a Miħemedî

Şer‘a Miħemedî, ew e ku Xwedê qanûnên xwe yê n îlahî bi navbeynkariya Hz. Muhammedî şandine. Di tesewûfê da şirî‘et, weke tiştêkî zahir li ser hatiye sekinandin û ji batinê wî ra jî gotine heqîqet. Ew rêya ku ji şirî‘etê diçe heqîqetê ra terîqet hatiye gotin. Ew kesên ku gihiştine heqîqetê, sirrên xwe vedişêrin û tabîê şirî‘etê dibin ji wan ra jî merîfet hatiye gotin¹⁶⁰.

Îmamê Rebbanî Farûqî û Eħmed

Muceddid bû bo **Şer‘a Miħemmed**

(MS:3/26)

2.2.3.7. Ĥebîbullah

Ĥebîb, tê wateya yarê û têgeha Ĥebîbullah jî di edebiyata klasîk da tê wateya yara/ê Xwedê, yara/ê Xwedê jî Hz. Muhammed e. Xinûkî jî peyva “Ĥebîbullah”î di heman wateyê da emilandiye:

Piştî wê qesda **Ĥebîbullah** Ʀebîbê dilkulan

Ez bikim bazarî û lerzî ku mehder çêbîbî

(Q:2/13)

2.2.3.8. Bedra Munîr

Bedr, di ferhengê da tê wateya heyvê weke istilahê jî wateya bedrê xelîfe ye û Bedra Munîr jî tê wateya heyva ku 14 rojî ye. Di tesewûfê da wateya Bedra Munîr ew e ku çawa heyva çardehrojî ronahiya xwe bi awayekî bêqisûr nîşan dide, were jî Xwedê, esmayê xwe bêkêmasî di xelîfeyê xwe da nîşan dide¹⁶¹. Şêx Muşerref jî balê dikişîne ser vê yekê:

Kanê gelo **Bedra Munîr**

Ev fađilê her ca şehir

Deryaê ‘ilmê bênezîr

Ax ‘eskerî ax ‘eskerî

(M:14/2)

¹⁵⁹ Sureya Rehman: 55/78.

¹⁶⁰ Kavak, *Dîvân-ı Mevlânâ Halidi Bağdâdî Tam Metin*, Ensar Yayıncılık, Konya 2009, r. 4.

¹⁶¹ Cebeciođlu, 6.

2.2.3.9. Ava Heyatê

Ava Heyatê tê wateya tunebûna mirinê û dilopên ava şîrîn ya ku jiyana bêdawî dibexşîne. Ava Heyatê, di tesewufê da bi armanca ‘eşqa îlahî weke remzekê hatiye bikaranîn û ev jî ji ilmê ledûnva kinaye ye. Ew, gotin û nezera murşîdê kamil e ji bo vejyandina aqilê mirovê ku jiyanekeheywanî dijî ye. Ev mezmûna hanê di edebiyata klasîk da cihekî berfireh digire û di şûna kêfxweşiya manewî, ‘eşq û ‘îrfanê da hatiye emilandin¹⁶².

Mektûbekemişlê nebat
Wek kehniya *ava heyat*
Îro di êvarê kû hat
Hat û ji Diyarbekra şîrîn

(M:15/5)

2.2.3.10. Bağê Weşletê

Di ferhengê da bağ, tê wateya “bend”î, weşlet jî tê wateya xwegîhandinê û bağê weşletê jî tê wateya bendê xwegîhandinê. Weke têgehê, wateya wî ew e ku aşîq, xwe bigîhîne yara xwe. Di edebiyatê da armanca aşîqî ya herî girîng û sereke, xwegîhandina yarê ye. Lewra dizane ku di dawiya hîcranê/veqetînê da xwegîhandin heye. Ji ber ku evîndar, nîmetên wesletê difikire, tehemmulî zehmetiyên firqetê dike. Lê belê weslet tiştê ewqas hêsan jî nîne û ew dişibihe Teyrê Simirê. Ji bo ku weslet çêbe, beriya her tiştî hewceye liyaqet/hêjayî hebe. Xwegîhandina yarê bi qasî xwegîhandina periyar zor û zehmet e. Yar, hinek caran soza wesletê dide, lê mixabin tucaran li soza xwe xwedî dernakeve. Dema evîndar xwe digîhîne yara xwe jî aramiyê nabîne. Lewra, hertim di tirs û xofa firqetê da dimîne û ev tirs û xof tucarê wî bernade¹⁶³.

Wesselam ez hatim û dil ma di *bağê weşletê*
Ez cuda bûm dil bi kul ma di wî xweş gulşenê

(Q:8/8)

Bizan *bağê weşlet* çîqa ku xweş e
Di wê da enîs dibne wek serxweş e

(MS:2/25)

2.2.3.11. Dil

Dil, cihê hemû bûyerên ku di derbareyî evîna yarê da derbaz dibe ye. Ji bo jiyana mirovan cihê dilî, gelek girîng e û hewcedariyê mezîna pê heye. Dil, cihê denglêkirinê ye. Evîndar, bi dilê xwe ra qise dike, derd û kulên xwe jê ra vedibêje, bi xem û kul û kederan mezîna dibe û bi xeyalên yarê jî kêfxweş dibe. Bi naskirina wî kêfxweş dibe û tucaran hêviya

¹⁶² Pala, 3.

¹⁶³ Pala, 476.

xwe ji yarê nabire. Ew, bi bedewbûna yarê tarûmar û serûbin dibe, ji ber vê sedemê perîşan e û xwediyê derd û kederan e û neçar e.

Di edebiyatê da dil; welat e, yar padîşah e, kul û keder û xema evînê jî artêş e û ew, welatî dişewitîne û diperitîne. Yar, di koşkê da, yanê di dilî da mêvan e û bi şev ji ber ku di nava kul û kederanda ye, nexweş e û bêhal e. Dermanê wî jî lêvên yarê ne. Lê yar vî dermanî nadê û vê daxwazê qebûl nake. Dil, boraqê yarê ye û ji bona di cejna wesletê da were serjêkirin, tê xwedîkirin.

Dilê evîndarî, di navbera porê yarê da ji xwe ra cih û warek çêkiriye. Di her takî porê wê da, dilê evîndarekî pê va girêdayî ye.

Dil, hinek caran piyale ye û hinek caran jî cam û şûşe ye. Lewra, hundirê wê bi rengê şerabê tijî xwîna sor dibe û zû jî dişikê. Dil, bi nalîna xwe hinek caran dişibihe neyê hinek caran jî dişibihe ûdê û bi lêdana xwe jî dişibihe defê. Dil weke rêwiyekî li pey yarê diçe.

Di tesewufê da dil, weke neynikê hatiye qebûlkirin û di vê neynikê da tecelliya Xwedê xwe nîşan dide. Tesewuf, girîngiyeke gelek mezin dide dilî. Ji ber ku mirov kakilagerdûn/kaînatê ye, rastiya însanî jî dilê wî/ê ye. Ji ew kesên ku rastiya dilî dizanin ra ehlê dilî tê gotin¹⁶⁴. Şêx Muşerref jî vê mijarê dinirxîne.

Wesselam ez hatim û **dil** ma di bagê weşletê

Ez cuda bûm dil bi kul ma di wî xweş gulşenê

(Q:8/8)

Gelî yaran wekî caran şifa kin me birîndaran

Bi bejnê xwe **dilan** geş kin guhan xweş kin bi eş'aran

(Q:11/1)

2.2.3.12. Şerab

Di edebiyata klasîk da ji vexwarinan herî zêde navê şerabê derbaz dibe. Ji ber rengê wê ew; li xwînê, li hêstirê çavan, li lêvên yarê û li gulkên yarêhatiye şibandin. Li gorî mutesewufan 'eşq, rêya Xwedê ye; şerab jî amûrek ji amûrên ku ruhê mirovan ber bi coş û kelecane va dibe ye. Ew dilê ku bi kirina gunehan qirêjî girtiye û reş bûye, bi şeraba îlahî tê şuştin û ji jengê paqij dibe û evîna Xwedê di dilê evîndarî da weke neynikê xweşiktir dibe û dibiriqe¹⁶⁵.

Ew te'am ew **şerab** ew civat

Cumle bêfayde me dîtin li dehlekî

(X:8/5)

¹⁶⁴ Pala, 168-169.

¹⁶⁵ Pala, 53.

Gelek mehbûb nazidar û şîrîn e
Şerabek pir xweş e Şêxê ‘Îraqî
 Qewî xweş reng bihn û nazenîn e
 Gelek sor û geş e Şêxê ‘Îraqî

(M:4/3)

2.2.3.13. Cam/Qedeh

Cam, ji qedeha ku bi şerabê tijî ye ra tê gotin. Cam, nîşaneyê dev û lêvên yarê ye. Ji bo ku qedeha bi şerabê tijî di şiklê lêvan da dixuyê û ji ber ku ji devên yarê gotinên tahl derdikevin, ev gotin li şerabê hatiye şibandin, lewra, şerab jî tal e.

Cam, hinek caran gula bigulpik e, hinek caran lale ye û hinek caran jî roj e.¹⁶⁶ Di tesewufê da cam, ji bona dilê tê bikaranîn. Lewra dil, cihê me‘rifet û zanîna manewî ye û me‘rifet jî gelek caran bi mezmûna şerabê hatiye bilêvkin.

Melhema dag û birînê saqiyê **cam qedeh**
 Hadiyê mu‘teqîdane calibê keyf û fereh
 Rohniya cumle murîdan û necma şubeh
Hebbeza en-newhu lî men yetbe ‘u ‘inde’l-fehem

(M:6/6)

2.2.3.14. Cemal

Cemal, di tesewufê da di şûna xuyabûn/peydabûna Xwedê da hatiye bikaranîn. Xwedê, xwediyê cemaleke bêhempa ye û çiqas cemal û xweşik û spehîtiyên li ser rûyê gerdûnê hene, werin cem hev û bibin yek jî nikarin li pêşberî cemala Xwedê bisekinin. Di edebiyata tesewufê da cemal û yar, pir caran ji bona Xwedê hatine bikaranîn. Lê di malika jêrî da Xinûkî tégaha cemalê ji bo bedewbûna Yûsif Pêxamberî bi kar aniye:

Kanê Suleymanê delal
 Kanê Yûsifê bi husn û **cemal**
 Ew hudhuda mizgîn li bal
 Ax ‘eskerî ax ‘eskerî

(M:14/4)

Heçî hûdhûd ew beşaret dike
 Ji mehbûb û yaran hikayet dike

(MS:2/11)

¹⁶⁶ Pala, 82.

2.2.4. Kesayetên Tesewufî

Di nava helbestên Şêx Muşerrefî da helbesteke wî, bi terza mesnewiyê hatiye nivîsandin heye û me di nava helbestên wî yê mesnewî da di rêza sisêyan da nîşan da ye. Ew helbest bi eslê xwe ne ya wî ye, ya Mewlana Xalidê Bexdadî (Şehrezorî) (1193/1779-1242/1826) ye û wî ev helbest wergerandiye Kurdî. Ew bi xwe jî vê agahiyê di derkenara rûpala ku ev helbest lê hatiye nivîsandin da dide. Mijara vê helbestê silsileya Terîqeta Neqşebendiyan e û me jî ew kesayetên ku navê wan derbaz dibin, di bin vê sernavê da bi kurtasî di derbareyê jiyana wan da agahî dane¹⁶⁷. Lê me di derheqê Hz. Pêxember, Hz. Ebabekir, Hz. Elî, Hz. Hesen û Hz. Huseyînî da li jorî di bin sernavên Pêxemberan û sehabeyan da agahî dabûn, ji ber ku dubare nebe, me li jêrî cara duduyan agahî nedane.

2.2.4.1. ‘Elî Zeynelabîdîn

Navê wî Ebu’l-Hesen Elî b. Huseyîn b. Elî b. Ebî Talîb e, leqeba wî Elî Zeynelabîdîn e û ji donzdeh îmaman di rêza çaran da ye. Di sala 38/659an da li Medîneya Munewereyê hatiye dinyayê. Bavê wî Hz. Huseyîn e û diya wî jî keça Împaratorê Sasaniyan yê dawiyê Yezdîcerdê IIIyan Şehrbanû ye. Di sala 94/712an da li Medîneyê dimire û li Goristana Baqî li kêleka apê wî Hz. Hesenî tê definkirin¹⁶⁸.

Bi *Zeynelabîdîn* navê ‘Elî bû

Bi Baqir nav Mihemmed heq welî bû

(MS:3/7)

2.2.4.2. Mihemmed Baqir

Navê wî Ebû Ce‘fer Muhemmed b. Elî b. Huseyîn b. Elî b. Ebî Talîb e. Ji donzdeh îmaman yê pêncan e. Li Medîneya Munewereyê di sala 57/676-677an da hatiye dinê. Bavê wî Elî b. Huseyîn Zeynelabîdîn e û diya wî Fatîma bîntî Hesen e. Ji aliyê bavê va neviyê Hz. Huseyînî ye, ji aliyê dê va jî neviyê Hz. Hesenî ye, leqeba wî “Baqir” e, ev jî kurteya raveka “baqiru’l-Îlm”ê ye û tê wateya qelişandina zanistê û bi hûrgilî ketina nav wan e. Ew, xwediyê donzdeh ilman e¹⁶⁹, hinek caran bi leqeba Emîn, Hadî û Şebîn jî hatiye binavkirin. Piştî mirina bavê xwe di sala 94/712an da wezîfeya îmamtiyê hildide ser milê xwe. Jiyanê paqij û bişeref jiyaye, wexta xwe bi kirina îbadetê derbaz kiriye û girîngiyekemuhim daye terbiyekirin û paqijkirina nefîsê. Muhemmed el-Baqir, di sala 114/733yan da li Medîneya Munewereyê çûye ber rihma Xwedê û li Goristana Baqî hatiye definkirin¹⁷⁰.

Bi *Zeynelabîdîn* navê ‘Elî bû

Bi Baqir nav Mihemmed heq welî bû

(MS:3/7)

¹⁶⁷ Ji bo reseniya helbestê binêrin: Kavak, 555-604.

¹⁶⁸ Ahmet Saim Klavuz, “Zeynelabîdîn”, *DİA*, XXXIV, 365-366.

¹⁶⁹ Kavak, 564.

¹⁷⁰ Mustafa Öz, “Muhemmed el-Bakir”, *DİA*, XXX, 507-508.

2.2.4.3. Ce‘ferê Şadiq

Navê wî, Ce‘fer es-Şadiq b. Muhammed el-Baqir b. Elî b. Huseyîn b. Elî b. Ebî Talîb e. Ji donzdeh îmaman yê şeşan e. Di sala 83/702an da li Medîneya Munewereyê hatiye dinê. Navê bavê wî Muhammed el-Baqir e, navê diya wî Ummu Ferwe ye û ew, keça Qasimî ye, Qasim jî neviyê Hz. Ebabekirî ye. Nasnavê wî Ebû Ebdîllah û Ebû Îsmâil e, leqeba wî jî “Sadiq” e. Îmamê Ce‘ferê Sadiq ji tabînan e û ew ji aliyê zuhd û ilmî va gelek pêş da çûye. Îmamê Henefî û Îmamê Malikî gelek ji ilmê wî sûd wergirtine. Îmamê Ce‘ferê Sadiq di sala 148/765an da li Mekkeya Mukeremeyê wefat dike û li Medîneya Munewereyê tê definkirin¹⁷¹.

Bi heqq *Ce‘ferê Şadiq* heqîqet

Xewda dabû ewî her du terîqet

(MS:3/8)

2.2.4.4. Bayezîdê Bîstamî

Navê wî, Ebû Yezîd Teyfûr b. Îsa el-Bîstamî ye. Di sala 161/777an da li navçeya Bîstamiyê hatiye dinê. Ev navçe girêdayî bajarê Îranê bi navê Şahrûd e¹⁷². Di silsileya terîqeta Neqşebendiyan da di şaxa Xalidiyan da piştî Îmamê Ce‘ferê Sadiq, cihê wî di rêza şeşan da ye û leqeba wî “Sultanu’l-‘Arifîn” e. Tê rîwayetkîrin ku kalikê wî berê Mecûsî bûye û paşê bûye bisilman.

Bayezîdê Bîstamî, ji pêşengên xelîfeyê Ce‘ferê Sadiq bûye û ev gotina navdar ya wî ye: “*Dinya, ji bo ehlê wê, pozbilindiya di nav pozbilindiyê da ye. Axret jî ji bo ehlê wê kêfxweşiya di nav kêfxweşiyê da ye û hezkirina Xwedê jî ji bo ehlê hezkirina wî, ronahiya di nav ronahiyêda ye.*” Ji Bayezîdê Bîstamî tê pirsin ku, tu çawa gihiştî ev me‘rîfeta hanê? Ew jî dibêje ku “*Bi zikekî birçî û bi bedeneke rût û tazî.*”¹⁷³.

Bayezîdê Bîstamî, di sala 261/848an da li Bîstamê emrê Xwedê bi cih tîne û li wir tê veşartin¹⁷⁴.

Bi *Teyfûr* şuhreta wî *Bayezîd* bû

Ji bo deryê Xwedâî xweş kilîd bû

(MS:3/10)

2.2.4.5. Bul Hesen Xereqanî

Navê wî, Ebu’l-Hesen Elî b. Ce‘fer Xereqanî ye. Dîroka jidayîkbûna wî bi temamî zelal nîne, lê tê texmînkirin ku di sala 352/963an da li nêzîkî navçeya Bîstamê li gundê Xereqanê hatiye dinyayê û ev der, girêdayî bajarê Şehrûda Îranê ye. Dersa xwe ya tesewufê bi awayekî zahirî ji Şêx Ebu’l-‘Ebbas Qesab Amîlî girtiye û wî, Bayezîdê Bîstamî rûbirû nedîtiye, lê bi rêya Uweysî jê sûd wergirtiye¹⁷⁵. Di beyta jêrî da Bul Hesen navê Ebu’l-Hesen el-Xereqanî ye.

¹⁷¹ Kavak, 566.

¹⁷² Necdet Tosun, *Altin Silsile*, Erciş Vakfı 2017, r. 39.

¹⁷³ Kavak, 568.

¹⁷⁴ Tosun, 43.

¹⁷⁵ Tosun, 44.

Bi heqqê **Bul Hesên** wî Şêxê Xîrqa

Ku nûra wî dida bêhed ji xelqa

(MS:3/11)

2.2.4.6. Ebu Elî Fermedî

Navê wî, Fedl b. Muhemmed e, ji sedî sed teqez nebe jî li gorî rîwayetan di sala 401/1010an da li gundê Fermedê ku girêdayî bajarê Îranê, Tûsê ye hatiye dinê. Li Nîşabûrê beşdarî suhbetên Sofî Ebû Se‘îd b. Ebu’l-Xeyr dibe û di medreseya Ebdulkerîm Quşeyrî da tehsîla ilmî dike. Li cem Ebu’l-Qasim Gurganî û Ebu’l-Hesên Xereqa jî perwerdehiya tesewufê dibîne. Ebû Elî Fermedî, piştî qedandina perwerdehiya tesewufê, dest bi îrşadê dike û şagirtên wî yên herî binavûdeng, Îmamê Xezelî û Xace Yûsif Hemedanî ye. Fermedî, di sala 477/1084an da li bajarê Tûsê dimire û li vî bajarê tê gorkirin¹⁷⁶. Di beyta jêrî da Bul Hesên navê Ebû Elî Fermedî ye.

Bi heqqê **Bul Elî** wî qutbê faîq

Bi Xace Yûsif Ğewsulxelaq

(MS:3/12)

2.2.4.7. Yûsif Hemedanî

Navê Yûsif Hemedanî, Ebû Ye‘qûb Yûsif b. Eyyûb b. Yûsif b. Huseyîn e. Di sala 440/1049an da li gundekî bajarê Hemedanê ji dayîk bûye. Di 18 saliya xwe da diçe Bexdayê û li cem Şêx Îbrahîm b. Elî b. Yûsif Fîrûzabadî û li cem sermuderrisê Medreseya Nîzamiyeyê Şêx Ebû Îshaq Şîrazî hînî fiqîha Şafîî dibe. Terbiyeya xwe ya tesewufê jî ji Ebû Elî Fermedî digire. Li Medreseya Nîzamiyeyê xelesa we‘zê û perwerdehiyê saz dike. Paşê li bajarê Merwê tekyayekê ava dike û ev kar gelek xweşiya gelê Merwê diçe. Yûsif Hemedanî, di sala 535/1140î da emrê Xwedê bi cih tîne. Mirûdên wî, wî li bajarê Merwê defin dikin¹⁷⁷. Bajarê Merwê anîha di nav sînorê dewleta Turkmenistanê da ye.

Bi heqqê Bul Elî wî qutbê faîq

Bi Xace Yûsif Ğewsulxelaq

(MS:3/12)

2.2.4.8. ‘Ebdulxaliq Ğucduwanî

Navê ‘Ebdulxaliq Ğucduwanî, ‘Ebdulxaliq b. ‘Ebdulcemîl e, di sala 493/1099an da li Buxarayê li gundê Ğucduwanê hatiye dinyayê. Malbata wî, ji aliyê bavê va xwe digîhîne Îmamê Malikî. Dema Yûsif Hemedanî tê Buxarayê ‘Ebdulxaliq Ğucduwanî diçe cem wî, întîsabî wî dike û piştî çûyîna şêxê wî, ew li ser post rûdine û dikeve xizmeta tesewufê.

‘Ebdulxaliq Ğucduwanî keseke yekemîn e ku prensîbên terîqeta Neqşebendiyan weke 8 prensîb danîne û piştî wî jî Şêx Bahaûddîn Neqşebend 3 prensîbên din jî lê zêde kirine û ev

¹⁷⁶ Tosun, 48-53.

¹⁷⁷ Kavak, 571-572.

prensîbana hetanî roja me hatine. ‘Ebdulxaliq Ğucduwanî di sala 575/1179an da diçe ber rihma Xwedê¹⁷⁸.

Bi ‘Ebdulxaliqê Ğucdewanî
Ku şêxê cumle şêxan e tu zanî

(MS:3/13)

2.2.4.9. ‘Arif Rîwgerî

‘Arif Rîwgerî, di sala 565/1169an da li gundê Rîwgerê ku 7 km ji Ğucduwanê dûr e, hatiye dinê. Ji xelîfeyên ‘Ebdulxaliq Ğucduwanî ye û piştî mirina Ğucduwanî, ew, karê şêxê xwe dide ser milê xwe û berdewam dike. ‘Arif Rîwgerî weke “Pêşewayê ‘Arifan” têtê bibîranîn. Rîwgerî di sala 634/1236-37an da li gundê Rîwgerê dimire û li heman cihê tê definkirin. Rîwger gundekî girêdayî bi Buxarayê va ye¹⁷⁹.

Bi heqqê *Xace ‘Arif* behrê me‘na
Bi Mehmûd wîşe încîr feğna

(MS:3/14)

2.2.4.10. Mehmûd Încîr Feğnewî

Mehmûd Încîr Feğnewî, li gundê Feğneyê ku nêzikî Buxarayê ye tê dinê û dîroka ji dayîkbûna wî bi zelalî nediya e. Yek ji xelîfeyên Şêx ‘Arif Rîwgerî, yên herî mezin e û piştî mirina ‘Arif Rîwgerî, ew li ser postê wî rûdine. Di terîqeta Neqşebendiyan da hetanî dema wî, zikrê xefî zêde dihate kirin. Lê ew meyla xwe dide ser zikrê cehrî. Ew, zikrê xefî ji bo ferdan û zikrê cehrî jî ji bo cemaetê pêwist dibîne. Ji sedî sed teqez nebe jî Mehmûd Încîr Feğnewî, di sala 717/1317an da miriye¹⁸⁰.

Bi heqqê Xace ‘Arif behrê me‘na
Bi *MehmûdWîşe Încîr Feğna*

(MS:3/14)

2.2.4.11. Elî Remetenî

Şêx Elî Remetenî, ji meşayîxên sereke yên terîqeta Neqşebendiyan e. Dîroka ji dayîkbûna wî teqez nebe jî tê gotin ku di sala 591/1194an da hatiye dinyayê. Leqeba wî ya herî navdar “Hezretê ‘Ezîzan” e. Ew, ji xelîfeyên Încîr Feğnewî ye. Tê gotin ku Şêx Elî Remetenî di sala 721/1321an da li Herezmê wefat kiriye¹⁸¹.

Bi îrşada ‘ezîzanê *‘Elî* nav
Dilê xelqê dikir tahir wekî av

(MS:3/15)

¹⁷⁸ Kavak, 572-573.

¹⁷⁹ Tosun, 68-71.

¹⁸⁰ Kavak, 574-575.

¹⁸¹ Tosun, 74-81.

2.2.4.12. Muhemmed Baba Semasî

Şêx Muhemmed Baba Semasî, li gundekî girêdayî Buxarayê bi navê Semas hatiye dinê. Dîroka jidayîkbûna wî bi zelalî nayê zanîn û ew, ji xelîfeyên Şêx Elî Remetenî ye. Adabê terîqetê ji wî hînbûye û piştî wefata seydayê xwe, wezîfeya îrşadkirinê daye ser milê xwe û di sala 755/1354an da çûye ber rihma Xwedê. Ev gotina navdar ya wî ye: “*Hewceye ku dil ji hestên bêfayde were parastin*”¹⁸².

Bi heqqê *Xace Babayê Simasî*

Riya cennet gelek taze dinasî

(MS:3/16)

2.2.4.13. Emîr Seyyîd Kelal

Ji ber ku ji malbata Hz. Pêxemberî ye, jê ra hatiye gotin “Seyyîd” û “Emîr” û ji ber ku karê kûzkeriyê kiriye û kûzîkvan bûye jê ra “Kelal” yanê Kûzker hatiye gotin û navê wî yê rasteqîn nayê zanîn. Tê gotin ku di devdora sala 680/1280yî da li gundê Suharê ku girêdayî bi Buxarayê va ye hatiye dinê. Ew, ji Şêx Muhemmed Baba Semasî, rê û rêbazên terîqetê hîn dibe û paşê jî hînî xelkê dike. Di sala 772/1370yanda li gundê xwe wefat dike û li wir tê definkirin¹⁸³.

Emîr *Seyyîd Kelal* wî şêxê kamil

Ji geyrî heq gelek xalî bibû dil

(MS:3/17)

2.2.4.14. Muhemmed Behaiddîn Neqşebend

Navê wî, Bahaiddîn Muhemmed b. Celaluddîn el-Buxarî Şahê Neqşebend e. Li gundê Qesra ‘Arifan, nêzîkî Buxarayê ye di sala 718/1318an da hatiye dinyayê. Bi awayekî rêkûpêk adab û prensîbên terîqetê diyar dike û zîkrê xefî (bi dizî) weke esasek ji esasên terîqetê qebûl dike. Berê ‘Ebdulxaliq Ğucduwanî prensîbên terîqeta Neqşebendiyî weke 8 prensîb danîne û piştî wî jî Şêx Bahaiddîn Neqşebend, 3 prensîbên din jî lê zêde dike û ev xalana hetanî roja me hatine û ew prensîb jî ev in: Wuqûfê Zeman (Zanîna qîmeta demê û bi têr û tijî derbazkirina wê), Wuqûfê ‘Ededî (Zanîna hejmarên zîkrê), Wuqûfê Dil (Zanîna di dilan da), Nezer Ber Qedem (Mêzekirina çavan li lingan), Hûş der dem (hay jixwehebûna di girtin û dayîna nefesê da), Sefer Ender Weten (Çûyîna bi bal Xwedê va), Xelwet Ender Encûmen (Di nava gel da bi Heq ra), Yad Kerd (Zîkirkirin), Baz Geşt (Zivirandin), Nîgah daşt (Parastin) û Yad Daşt (Nejibîrkirina Xwedê) ye¹⁸⁴.

Şahê Neqşebend, di 73 saliya xwe da li gundê Qesra ‘Arifan di sala 791/1389an da wefat dike û li wir tê definkirin¹⁸⁵.

¹⁸² Kavak, 576-577.

¹⁸³ Kavak, 577; Tosun, 86-91.

¹⁸⁴ Ji bo agahiyên berfireh mêze bikin: Kavak, 46-52.

¹⁸⁵ Kavak, 578-579; Tosun, 92-103.

Behaeddîn we'd-dinya **Muhammed**

Terîqet pir qewî kir wî bîla hed

(MS:3/19)

2.2.4.15. 'Elaeddîn 'Eṭṭar

'Elaeddîn 'Eṭṭar, li Cefanyayê ku giredayî Buxarayê va ye hatiye dinê. Ji ber ku herdem bêhna xweş li xwe daye yan jî ew kesên ku beşdarî suhbeta wî bûne xweşbîhneke manewî ji wî bêhn kirine, bi leqeba 'Eṭṭar navdar bûye. Ji malbateke gelek dewlemend bûye, lê herdem meyla wî li ser fikr û zanistê bûye. Terbiyeya xwe ji şêxê xwe Şêx Behaeddîn Muhammed Neqşebendî girtiye. 'Elaeddîn 'Eṭṭar, di sala 802/1400î li Cefanyayê miriye û li heman cihî hatiye definkirin¹⁸⁶.

Bi quṭbê heq '**Elaeddînê 'Eṭṭar**

Ku merkez bû ji bo enwar û esrar

(MS:3/21)

2.2.4.16. Ye'qûbê Çerxî

Ye'qûbê Çerxî, li Afxanistanê li bajaroka Çerxê hatiye dinyayê. Li Heratê û li Misrê xwendina xwe diqedîne û ji bo xwendina xwe ya me'newî jî diçe Buxarayê û ji Şêx Bahauddîn Muhammed Şahê Neqşebend dersê digire. Ye'qûbê Çerxî di sala 851/1447an da wefat dike û li gundê Gulistanê, li navçeya Wehdetê li bajarê Dûşanbiyê, ku paytexta Tacekistanê ye, hatiye definkirin¹⁸⁷.

Bi wî quṭbê ku Çerx bajarê wî bû

Ji lew **Ye'qûbê Çerxî** navê wî bû

(MS:3/22)

2.2.4.17. Xace Ubeydullah Eḥrar

Xace Ubeydullah Eḥrar di sala 806/1404an da li Taşkentê tê dinyayê. Xwendina xwe li Semerqendê diqedîne û întisabî Ye'qûbê Çerxî dike û paşê vedigere Taşkentê. Him bi karê cotkariyê ra mijûl dibe him jî karê îrşadkirina gel dike. Ew, di sala 895/1490î da wefat dike û qebra wî li Ozbekistanê li bajarê Semerqendê ye¹⁸⁸.

Bi heqqê **Xace Eḥrar** ku şah bû

Belê 'ebdalê dergahê îlahî bû

(MS:3/23)

¹⁸⁶ Kavak; 580; Tosun, 104-107.

¹⁸⁷ Kavak; 581-582; Tosun, 109-113.

¹⁸⁸ Kavak; 582-583; Tosun, 116-123.

2.2.4.18. Xace Muhammed Zahid

Xace Muhemmed Zahid, li bajarê Hîsarê li gundê Weşê hatiye dinyayê û merivê Ye‘qûbê Çerxî ye. Wî ji xelifeyên Ye‘qûbê Çerxî gelek sûd wergirtiyeû bi ihtûmaleke mezin întîsabî kurê Ye‘qûbê Çerxî, Yûsif Çerxî jî kiriye. Leqeba wî “Zahidê Fanî” ye. Di sala 936/1529an da li gundê xwe dimire û li wê derê jî tê definkirin¹⁸⁹.

Bi *Xace Zahidê Şêxê Şefakêş*

Bi wî Şêxê ‘Ezîmê Xace Derwêş

(MS:3/24)

2.2.4.19. Xace Derwêş

Cihê jidayîkbûna Xace Muhemmed Derwêş û dîroka wî bi zelalî nediyar e. Di ciwaniya xwe da bi qasî 15 salan jiyaneke zuhdane dijî û paşê întîsabî Xace Muhemmed Zahidî dike. Bi borandîna demê ra dibe xelîfeyê Xace Zahidî yê sereke. Xace Derwêş, di sala 970/1562an da diçe ber rihma Xwedê¹⁹⁰.

Bi Xace Zahidê Şêxê Şefakêş

Bi wî Şêxê ‘Ezîmê *Xace Derwêş*

(MS:3/24)

2.2.4.20. Xacegî Îmkenegî

Xacegî Îmkenegî, di sala 918/1512an da hatiye dinê, kurê Xace Muhemmed Derwêşî ye. Li cem bavê xwe perwerdehiya tesewufê dibîne û piştî mirina bavê xwe bi sifeta xelîfetiye gelî perwerde dike. Di sala 1008/1600an da di 90 saliya xwe da dimire û li Semerqendê li gundekî bi navê Îmkeneyê tê definkirin¹⁹¹.

Bi heqqê *Xacegî* şêxek mezin bû

Hemî fi‘lêd wî her serîzin bû

(MS:3/25)

2.2.4.21. Xace Baqî

Navê wî, Xace Muhemmed Baqî Bîllah e û di sala 971/1564an da li Qabîlê hatiye dinyayê. Li gelek deveran tehsîla ilm û tesewufê kiriye. Li Semerqendê întîsabî Xacegî Îmkenegî dike. Di sala 1012/1603an da li bajarê Delhiyê dimire û li taxa Qademgehê tê definkirin¹⁹².

Bi heqqê *Xace Baqî* xweş delal bû

Gelek nasê terîqa zulcelal bû

(MS:3/26)

¹⁸⁹ Kavak; 584-585-583; Tosun, 124-125.

¹⁹⁰ Kavak; 585-583; Tosun, 126-127.

¹⁹¹ Kavak, 586; Tosun, 128-131.

¹⁹² Kavak, 587; Tosun, 132-139.

2.2.4.22. **Îmamê Rebbanî Farûqî**

Navê wî Ahmet Farûq Sîrhîndî ye, li Hindistanê li Sîrhîndê di sala 971/1564an da hatiye dinyayê. Ji ber ku malbata wî xwe digîhîne xelîfeyê duyemîn Hz. Umerî leqeba “Farûq”î lê hatiye danîn. Îmamê Rebbanî, di serdema xwe da gelî hînî heqîqetên Quranê û sunetên seniyeyê kiriye. Bi baweriyêke bihêz û bivîn girêdayî bi Quranê û bi Ehlê Beytê va bûye. Di sala 1007/1599an da bavê wî dimire û ew li dewsa bavê xwe rûdine û dest bi îrşada gelî dike. Di gotineke xwe da evha dibêje: “*Însan, di roja qiyametê da ne ji tesewufê ji şerîetê berpîrsiyar e. Hewceye ku berê îtiqada li ser ehlê sunnetê were sererastkirin, paşê fiqh were hînkirin û hîna rêz tê tesewufê.*”¹⁹³ Îmamê Rebbanî di sala 1034/1624an da li Sîrhîndê dimire û li heman cihê tê definkirin¹⁹⁴.

Îmamê Rebbanî Farûqî û Eħmed

Muceddid bû bo şer‘a Miħemmed

(MS:3/27)

2.2.4.23. **Şêx ‘Ebdulehed**

Şêx ‘Ebdulehed, neviyê Îmamê Rebbanî ye û kurê Muhemmed Seîdî ye. Şêxê Muhemmed Abîd Senamî ye, lê navê wî, di silsileya şaxa Xalîdiye-Neqşebendiyan da derbaz nabe¹⁹⁵.

Bi *Şêx ‘Ebdulehed* wî şêxê qabil

Muhemmed ‘abid û şêxek bû kamil

(MS:3/29)

2.2.4.24. **Muhemmed ‘Abid**

Navê wî, Şêx Muhemmed ‘Abid, Senemî Siddiqî ye û yek ji pêşengê xelîfeyê Şêx ‘Ebdulehedî ye û heft salan li cem Şemseddîn Hebîbullah Mezherî ders girtiye¹⁹⁶.

Bi Şêx ‘Ebdulehed wî şêxê qabil

Muhemmed ‘Abid û şêxek bû kamil

(MS:3/29)

2.2.4.25. **Seyyîd Nûr Miħemmed**

Seyyîd Nûr Miħemmed, li Hindistanê li bajarê Bedayûnê hatiye dinê. Di zaroktiya xwe da xwe di warê şerîet û tesewufê da perwerde dike. Gelek xizmeta Şêx Seyfeddîn dike û paşê wek xelîfe tê wezîfedarkirin. Ew, wek “Şehrê Bedayûn” hatiye binavkirin. Seyyîd Nûr Miħemmed di sala 1135/1722an da li Bajarê Delhê wefat dike û li vî bajarî tê definkirin¹⁹⁷.

¹⁹³ Tosun, 143.

¹⁹⁴ Kavak, 588-590; Tosun, 140-149.

¹⁹⁵ Kavak, 593.

¹⁹⁶ Kavak, 593.

¹⁹⁷ Kavak, 594-595; Tosun, 156-157.

Bi Seyfeddînê *Seyyîd NûrMihemmed*

Hebîbullahê mezher şemsê ewhed

(MS:3/30)

2.2.4.26. Şemseddîn Hebîbullah

Şemseddîn Hebîbullah, di sala 1113/1701î tê dinê, di 18 saliya xwe da întîsabî Seyyîd Nûr Mihemmedî dike û piştî çûyîna di rêya seyr û silûkê da çar salan dibe xelîfeyê wî. Piştî mirina Seyyîd Nûr Mihemmedî ew li ser postê wî rûdine û dest bi îrşada gelî dike. Di sala 1195/1781î da emrê Xwedê bi cih tîne¹⁹⁸.

Bi Seyfeddînê Seyyîd NûrMihemmed

Hebîbullahê MezherŞemsê ewhed

(MS:3/30)

2.2.4.27. ‘Ebdullahê Şahê Dewlewî

‘Ebdullahê Şahê Dewlewî, di sala 1156/1743yan da ji dayîk dibe û bi leqeba (X)Ġulam Elî jî tê naskirin û neseba wî xwe digîhîne Hz. Elî. Di ciwaniya xwe da tê Delhiyê û li wir Quranê jibere dike û ilmên Îslamî tehsîl dike. Di 22 saliya xwe da dikeve xizmeta Hezretê Canî Cananî. Ligel terîqeta Neqşebendiyan ji Qadiriyan, Suhrewerdiyan, Kîbrewiyan û Çeştiyan jî îcazet girtiye. Şahê Dewlewî, di sala 1240/1824an da li Delhiyê dimire û li heman cihî tê definkirin¹⁹⁹.

Bi *‘Ebdullahê Şahê Dewlewî* bû

Xezîne belkî beħrek me‘newî bû

(MS:3/31)

2.2.4.28. Mewlanayê Xalid

Mawlana Xalid b. Huseyîn, di sala 1193/1779an da li Başûrê Kurdistanê li Bajarê Şehrezorê hatiye dinê. Leqebên wî: “Ziyaûddîn, Şehrezorî, Kurdî, Osmanî, Şafîî, Neqşebendî, Qadirî, Kûbrewî, Çeştî, Muceddîdî û Bexdadî” ne. Ji ber ku pisporbûna wî him di ilmê zahirî da him jî di ilmê batinî da hebûye, jê ra hatiye gotin “Zu’l-Cenaheyn”. Ji gelek seydayên navdar weke Seyyîd Ebdulkerîm Berzencî, Seyyîd Ebdurrehîm Berzencî û Mela Îbrahîm Beyarî ders wergirtiye. Ji Şêx Ebdullah Dehlewî îcazeta Neqşebendiyê digire û vedigere Silêmaniyê û dest bi îrşada gelî dike. Mawlana Xalidê Bexdadî di sala 1242/1827an da li Şamê emrê Xwedê bi cih tîne û li wê derê tê definkirin²⁰⁰.

Bi *Mewlanayê Xalid* zîlcenaheyn

Kû ew bû quţbê weqtê xwe di ‘ilmeyn

(MS:3/32)

¹⁹⁸ Kavak, 595; Tosun, 158-161.

¹⁹⁹ Kavak, 596; Tosun, 162-165.

²⁰⁰ Kavak, 6-13; Tosun, 166-175.

2.2.4.29. Şêx Osman Siraceddîn Et-Ṭewîl

Navê Şêx Osman Siraceddîn et-Ṭewîl bi tamamî Osman b. Xalîd b. Abdîllah b. Muhemmed b. Derwêş b. Muşerref b. Cûma b. Zahîr e. Ew di sala 1195/1781an da li Başûrê Kurdistanê li bajarê Helebceyê, li gundê Ṭewîlê tê dinyayê. Li bajarê Helebceyê dest bi xwendina xwe dike û paşê jî diçe Bexdayê xwendina xwe berdewam dike. Şêx Osman, di dema xwendina xwe ya li Helebceyê da Mewlana Xalidê Bexdadî nasdike û dibe peyrewê wî. Mewlana Xalidê Bexdadî radibe diçe Silêmaniyê û Şêx Osman jî diçe cem wî û li wir îcazeta tesewufê ji Mewlana Xalidîwerdigire. Şêx Osman, di sala 1283/1866an da li gundê Ṭewîlê diçe ber rihma Xwedayê xwe û li heman cihê tê gorkirin²⁰¹.

Bi *Şêx Osman* bi wî *Şêxê Ṭewîl* e

Siraceddîn bo min geyrî hîle

(MS:3/33)

2.2.4.30. Şêx Kemaleddîn Mustefa

Şêx Kemaleddîn yek ji xelîfeyên Mewlana Xalidê Bexdadî ye û jiyana xwe li Başûrê Kurdistanê li bajarê Hewlêrê (Erbîlê) borandiye. Şêx Muşerref, dema cara ewil diçe Başûrê Kurdistanê, diçe Hewlêrê jî. Li wir Şêx Kemaleddîn Mustefa nas dike û jê îcazeta terîqeta Neqşebendiyê werdigire. Şêx Muşerref, navê şêxê xwe di helbesta xwe da evha tîne ziman:

Kemaleddînê heq *Şêx Mustefa* ye

Gelek teslîm ji bo emrê Xweda ye

(MS:3/35)

2.2.5. Nav û Sifetên Ku Ji Bo Evîndaran Hatine Bikaranîn

Hinek mezmûn hene ku him di edebiyata klasîk da him jî di tesewufê da wek têgehên evîndariya mecazî û evîndariya îlahî hatine bikaranîn. Emê li jêrî behsa ew mezmûnên ku di helbestên Şêx Muşerrefî da derbaz dibin, bikin.

Şêx Muşerrefî, ji bona evîndariyê herî zêde peyvên “aşîq”, “ma‘şûq” û “uşşaq” emilandiye. Ev peyvana bi ‘eslê xwe Erebi ne û ji lêkera “e-şe qe”yê hatine dariştin. Lêkera “e-şe qe”yê tê wateya zêdetir hezkirina bengîbûn û evîndarbûnê²⁰². “Mehbûb”, “yar” û “dost” jî di wateya ma‘şûqê da hatine bikaranîn.

Di edebiyata klasîk da helbestvan, hertim evîndar e û ji bo vê sedemê ew, di dawiyê da têkiliya her tiştî bi ‘eşqê va girêdide. Zadê evîndar kerb û keder e, herdem li benda lutfaya ye, tu wextekê ew û yara xwe, xwe nagihînin hevûdin û wesleta wan her daim xeyalî ye.

Taybetiyeke evîndarî jî ew e ku, nêrîneke yarê û gotîneke wê dibe sedema serxweşbûna wî û ew dema van tiştan difikire, mest dibe. Evîndar, ji yara xwe ra ewqas cUmerd e, bêşik û bêguman canê xwe di rêya wê da dide, li ser soza xwe dimîne û jê ra dilsoz e. Tehemula her cur ezyet û zehmetkêşiyên ku ji yarê tên, dike, lê dîsan jî yar wî zû bi zû bi bîr nayîne û bi her

²⁰¹ Abdulcebar Kavak. “Mevlânâ Halid-i Bağdadî’nin Halifelerinden Şeyh Usman Siracuddin et-Tavîlî (v. 1283/1866) ve Biyâre Medresesi/Tekkesi”, *Atatürk Üniversitesi İlahiyat Fakültesi dergisi*, Sayı: 43, Erzurum 2015, r. 260-285.

²⁰² *el-Qamûsu’l-Muhîṭ*, r.1096.

kesî ra baş tevdigere, lê her wext bi evîndarê/a xwe ra xemsar e. Ev rewş dualî ye, yar rûyî nade evîndarê xwe, lê ‘eşqa evîndarî her diçe zêde dibe. Çareya vê rewşê yan tehemmul e yan jî çûyîn e. Evîndar, tehemmulê hildibijêre û rêya evînê çiqas di nava xeteranda be jî evîndar sebir dike û di wê rêyê da pêxwas û serqot diçe. Ji ber ku veqetîna ji yarê ji bo evîndarî, mirin e. Ji bo vê sedemê ew, di navbera jiyana û mirinê da tê û diçe. Ji bona ‘aşiq, belaya herî mezin eleqederbûna ma ‘şûqê bi kesên din ra ye. ‘Aşiq herdem lavayî ma ‘şûqa xwe dike û ew, tucarî ji lavakirinê bêzar nabe²⁰³.

Saqî, di ferhengêda tê wateya meyger û pêşkêşvanê şerabê, di tesewufê da jî tê wateya murşîd û rêberê terîqetê. Li cem hinek sofîyan jî saqî, saqiyê roja elestê²⁰⁴ ye ku ew Xwedê bixwe ye û şeraba evînê dide sofîyan.

Xinûkî ev mezmûnên evîndariyê bi awayekî xweş û geş gelek caran di helbestên xwe da bi kar anîye. Şêx Muşerref, ev mezmûnana bi tevahî di wateya ‘eşqa îlahî da emilandiye:

‘Eşq:

Çavê te ra maçu dikem bi *‘eşq* û şewq û lezzetan

Daim du‘açî ne ji te ra bêşik bizane ey filan

(X:24/4)

Tûtiyek bêhed emekdar û wefakar her demek

‘Eşq û şewqa wî gelek bû mişlê fanûs û fener

(Q:14/5)

Me‘Şûq:

Belê em *‘aşiq* û jarîn û hûn *me‘şûq* û nazdarin

Welê bilbil fikir gulgul dibit gulşahê eqtaran

(Q:11/6)

Bibî ey name ger nakî bi halê *‘aşiqan* bawer

Binêrin xameya bêrih kirî bi halê me bîmaran

(Q:26/9)

‘Uşşaq:

Mufeşşel ke ji bo yaran hemî ehwalê *‘uşşaqan*

Dibîtin rehmeke kin ew bi halê wan birîndaran

(Q:26/3)

²⁰³ Pala, 37.

²⁰⁴ Sûreya ‘Erafê: 7/172.

Mehbûb:

Belê *mehbûbê* subhanî
Belê şîrînê rebbanî
Belê ew ‘abidê fanî
Ji dinya kir sefer îro

(M:12/7)

Dost:

Wişala *dost* û hem *yanan*
Dê saq²⁰⁵ ket me birîndaran
Dê kêr ket dem‘ê wek baran
Çi dewlet bû li min peyda

(M:2/2)

Yar:

Lêbelê ‘adet qedîm e
Ku li pey hicra elim e
Wesleta *yara* kerîm e
Lê tenê bo min gela ye

(M:1/8)

Dîlber:

Di fesla nûbiharêda digel **dîlber** biçim geştê
Ji ew xweştir ‘umur nayê li min hal qewî xweş tê

(X:9/1)

Saqî:

Bizanin wî gelek samî
Nezîrê quţbê Bestamî
Wekî Mewlayê ma Camî
Di ‘işqa *saqiyê* xemrê

(M:9/9)

²⁰⁵ Yanê sax ket. (N. S.)

Bide *saqî* şerabê tu peya pey
Bi wî qelbê mirî heqen dibit hey

(MS:9/8)

2.2.6. Unsûrên Xweşikbûnê Ji Bo Evîndar

2.2.6.1. Bisk

Di edebiyata klasîk da ji bo xweşikbûyîn û bedewbûyînê, mirov, dikare bibêje ji motîfên herî sereke yên hatine bikaranîn yek jî porê yarê ye. Porê belavela û dirêj; hişê evîndarî ji serê wî dibe, wî dîl digire û perîşan dike. Bîhna porê me‘şûq ji bîhna misk û ‘enberê xweşiktir e. Ba, li ev bîhna hanê dixê û wê dibe cem ‘aşiqî. Rengê porê yarê her daim reş e.

Ne ji te mewcûd bûne filheqîqet herdu kewn
Hem ji te bîhna xwe girtin misk û *biskên* horiyan

(Q:1/8)

2.2.6.2. Çav/Çeşm/Tîr

Di edebiyata klasîk da bi armanca xweşikbûyînê ji motîfên herî sereke hatine bikaranîn, yek jî çavên yarê ye. Hema mirov dikare bibêje taybetiyên yarê bi tevahî di xwe da dihewîne. Zilimkarî, bîganetî, kenandin, nazdarî û tinazkirin nekarê wê ye. Rengê wê yan reş e yan jî meşînî ye û yar bi çavên xwe bandoreke mezin li ser evîndarî çêdike. Ew, bi mêzekirina xwe ya watedar, dixwaze ji evîndarî ra gelek tiştan bibêje. Ev mêzekirina hanê hinek caran weke tîrekê li dilê evîndarî dikeve û wî birîndar dike. Wezîfeya çavî; dîtine, lê çavên yarê herdem xwe wekî nedîtî nîşan dide.

Di çavên yarê da hertim tilsima sêhrê heye. Ji bo ku evîndarî bixe bin bandora xwe, tu kesek weke wê pispor nîne û ji bo bin bandorxistina xwe awireke wî/ê ya melûl têrê dike. Di edebiyatê da çav, sermest e, ji ber ku bi nêrîna xwe ya jixweçûyî dişibihe kesê/a serxwoş. Çav, ji bo ku dilan feth bike, taybetiyên wê yên kujer hene. Ew, di xwînrijandinê da pispor e, wek şikil li nêrgêz û badeyê hatiye şibandin û hinek caran jî li herfa Erebi ya “şad”ê hatiye şibandin. Li gorî evîndarê, çavên yarê ji çavên xezalê xweşiktirin²⁰⁶.

Çav:

Radimûsim herdu *çavan* jê gulavan bihn dikim
Radimûsim pir bi şewq wan destê wek armûşên sîm

(Q:10/8)

Gelî Berwariyan rabin
Vekin *çavan* û bes razin
Bi dostan qewî bigrin
Dewa Şêx Es‘edê Sanî

(M:10/10)

²⁰⁶ Pala, 101.

Çeşm:

Di pê ve herdu *çeşmanê* mubarek ra bi sed hurqet
Bike teqbîl bîla te'cîl tu ey name ke tekraran

(Q:26/2)

Tîr:

Dema ku em cuda bûn ji hev hêstir ji *çav* hatin
Dil û canên me gerger bûn ji ber *fîra* li min daî

(X:6/1)

2.2.6.3. Dîdar/Rû

Dîdar, tê wateya rû, sûret, dîtin û xurtbûna dîmenê. Di tesewufê da di şûna tecelliya Xwedê da tê bikaranîn. Dîdar, piraniya bedewiya yarê temsîl dike, ji ber ku dîdar xwediyê çav, birh, lêv û gelpikan e. Lewra ew qada bedewiyê ye. Hinek caran rû, bi rêya hunera mecazê mursel bi tenê di şûna gelpikan da û di wateya bedewbûnê da hatiye bikaranîn:

‘Umir borî nebû karek
Nebû haşil murad carek
Nehate ber me *dîdarek*
Meded ya Gewsê Geylanî

(M:7/4)

Li ‘Erefatê dest û *rû* ervaz bikim ahan bidim
Geh binalim geh bikalim ca dua meqbûl bibî

(Q:2/8)

2.2.6.4. Xedd

Xed, motîfek ji motîfên bedewiyê ye û di edebiyata klasîk da tê wateya dêma yarê. Dêm, cihekî were ye ku evîndar hertim dixwaze lê binêre. Ji aliyê rengan va dişibihe gulê, pela gulê, gulistanê, gulşenê, gula gulpik, şerab û... hwd. Lê gelek caran ev çîçek hewl didin ku xwe bişibihînin dêma yarê û her wext çavnebariyê ji rengê ku li ser rûyê yarê heye, dikin. Ketina pelên gulê nîşana çavnebariya gulpikê ye.

Çavên evîndarê weke şûşeyê, bijangên wî/ê jî weke diriyê, ji gulpika yarê ya wek gulê, avgulê didin barandin. Ji sedemên vê rewşê yek jî ew e ku çav, di hesreta gulpikê da dişewite ye²⁰⁷.

Ya Eba Selman salamê nazik û pak û temîz
Herwekî *xeddê* ‘erûsan xûb û şîrîn û lezîz
Û şîfetê wan qet nizanin sed mucaz û çil mûcîz
Ez dikim teqdîm ji bona wî Eba ‘Ebdul‘ezîz

²⁰⁷ Pala, 181.

Ah ser û patêk helan ji vê firqetê ah firqetê

(MX:1/2)

2.2.6.5. Bejn û Bal

Bejn û bala yarê hertim rast û dirêj e. Lewra ji bejn û bala yarê sifetên wek bilind, bala rast, azade, letîf û... hwd tên bikaranîn.

Yar, dema wek dara serwiyê xwe li ba dike, ji bo ku rêvaçûna wê ya bi bejnûbal hejandina dara serwiyê tîne bîra evîndarî û ew, ji xwe diçe. Bejn û bala evîndarî jî ji ber derd û kulên yarê kûz dibe, diçilmise û dibe du ta. Hinek caran dişibihe herfa dalê û amûra muzîkêya çenge. Ew axîn û fîxanên ji dilê evîndarî derdikevin, dişibihin naxmeyên ku ji çengê derdikevin²⁰⁸.

Gelî yaran wekî caran şifa kin me birîndaran

Bi *bejnê* xwe dilan geş kin guhan xweş kin bi eş'aran

(Q:11/1)

Werin dîsa me îhya kin bideng û *bejn û balan*

Ji nûve hûn ciwan kin ey gelî yaran me îxtiyaran

Q:11/3)

2.2.7. Çar Unsûr

Hebûna gerdûnê di serî da xwe bi çar unsûran daye xuyakirin; ew jî av, ax, agir û hewa ye. Ji ber ku agir bêreng e, zelal e û bi giraniya xwe jî ya herî sivik e, di asta herî bilind da û di rûxsara hîvê da belav bûye. Piştî wî hewa û dihundirê wê da jî av û di hundirê wê kureyê da jî ax heye. Herçar unsûr, bi xwezaiya xwe ji hev cuda dibin. Agir, ziwa û germ e, hewa germ û bi rutûbet e, av sar û bi rutûbet e û ax jî sar û ziwa ye. Bi gerandina asîman û stêrkan guhertina van çêdibe û ev herçar unsûr bi şiklên mîneral, riwek, heywan û... hwd xwe nîşan didin²⁰⁹. Şêx Muşerrefî, di helbestên xwe da herçar unsûr jî bi wateya ku li jor derbaz bûye bi kar aniye.

2.2.7.1. Av

Di edebiyatê da av, weke binyata jiyanê hatiye qebûlkin. Çavên evîndarî kanî ye û hêstirên wî jî aveke herikbar e. Dilê yarê wek keviran hişk e û evîndar bi armanca ku kevirî qul bike yan jî nerm bike, alikariyê ji hêstirên çavên xwe digire. Bikaranîna av û nanî bi hev ra îşareta cUmerdiyê ye. Av bi herikbariya xwe li temen, bi bêdawbûna xwe jî li porê yarê hatiye şibandin. Av, bi armanca dilê evîndarê/a ku ji ber evîna xwe dişewite û diperite, bitemirîne herdem diherike, lê ew agir, tu carekî natemire²¹⁰.

Di edebiyatê da pirî caran av, wek bax, baxçe, gul, bilbil û dara serwiyê hatiye bilêvkin û bi avdana wan jî li mucîzeyê Hz. Pêxemberî ya ku di tiliyên wî da bi herikandina

²⁰⁸ Pala, 75.

²⁰⁹ Songül Aydın Yaylacioğlu, *Fuzûlî ve Bâkî Divanının Karşılaştırılması*, İstanbul Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü, (Têza Doxtorayê ya neçapkirî), İstanbul 2009, r. 389.

²¹⁰ Pala, 1.

avê va hatiye şibandin. Bi gelemperî av, nîşaneya hêstirê çavên evîndarî ye. Bi peyva avê, gelek terkîb hatine çêkirin û “ava heyatê, ava kewserê û ava rewan” ê ji van terkîban in.

Av, li ku derê be, mirov dikare bibêje zindîbûnekêdide wê derê û derûdora wê bi gul, sosin û çîçekan dixemile:

Xaşşe kin *ava* çeman mişlê gelek gavan e ew

Çar kenarê wî giya û çîçek û mêrg û çem in

(Q:19/22)

Av, dermanê derd û kulan e û dema diherike bi xwe ra derd û kulan jî paqij dike, dibe:

Derd û êşan û birîn xweş bin bi *ava* zezzemê

Ji Şefa û Me-rweê ji bo min şefa hasil bibî

(Q:2/7)

Şêx Muşerrefî, ev cureyên avê di helbestên xwe da emilandiye:

2.2.7.1.1. Baran

Baran, di halê dilopên avê da ji hewayê dibare, ew nîşaneya rehmeta Xwedê ye û mizgîniya hatina biharê ye. Lewra di serdema biharê da xweza, ji nû va vedijî û herder bi gul, sosin û çîçekan dixemile. Ji ber ku cihê av lê tunebe jiyana jî tune ye, baran bi ava xwe, jiyane dide xwezayê.

Di edebiyatê da baran, sembola cUmerdî, xweşxwazî, dilovanî û qehra yarê, yan jî ew kesê/a ku pesna wê tê dayîn e. Ji ber ku dema baran dibare, li erdê û li ser pelên daran dibiriqe li durran hatiye şibandin. Barana biharê ji ber ku hêdî hêdî dibare û kêfa mirovan jê ra tê, di edebiyatê da zêde behsa wê tê kirin. Dilopên baranê li hêstirên çavên evîndarê/hatiye şibandin û eger baran zêde bibare û lehî rabe, wê demê tê wateya rondikên evîndarê/hatiye zêde.

Herdu mamê medrese de çûne Xesxêr ew jiha

Lêbelê *baran* di îsal zehf e ewî emekdarêd min

(Q:19/12)

Îlahî tu selamê min li ser Mela Hesên danî

Bibarînî li wî daim wekî *baranê* nîsan

(Q:20/1)

2.2.7.1.2. Ava Zemzemê

Zemzem, peyveke Erebi ye û tê wateya ava zêde û bîra zemzemê. Ava zemzemê navê bîreke ku li tenîştê Ke‘beyê ye û ji aliyê bisilmanan va wek aveke pîroz tete qebûlkin²¹¹.

²¹¹Qamûsu ‘l-MuhîT, r. 720.

Ava zemzemê, ji aliyê jina Îbrahîm Pêxemberî va hatiye dîtin. Piştî zewaca Îbrahîm Pêxemberî bi Hz. Hacerê ra Xwedê lawekî dide wan û ew navê wî Îsmâil lê dikan. Îbrahîm Pêxember, wan dibe Mekkeyê, datîne û şûnda vedigere cih û warê xwe. Dema ava wan xilas dibe, Îsmâil ji tîbûnê dest bi giriyan dike û dayîka wî Hacer jî direve ser girê Sefayê, dema li wir avê nabîne îjar direve ser girê Merweyê û ev çûyîn û hatina xwe heft caran dubare dike. Di dawiyê da li ser girê Merweyê melayîketekê dibîne, ev melayîket Cêbraîl e û bi per û baskên xwe erdê vedikole û avê dibîne. Di hinek rîwayetan da jî derbaz dibe ku Îsmâil, lingê xwe li erdê dixê û di şûnpêyên lingê wî da ava zemzemê dipejîqe²¹². Ev ava hanê, aveke pîroz e û hecî, dema ji heca xwe vedigerin vê avê weke tiberik tînin û weke diyarî didin dost û heval û cîranên xwe. Xinûkî jî bal dikişîne ser ev taybetiya ava zemzemê.

Derd û êşan û birîn xweş bin bi *ava zemzemê*

Ji Şefa û Merweê ji bo min şefa hasil bibî

(Q:2/7)

2.2.7.1.3. Hêstir

Di edebiyatê da evîndar, herçax bi piraniya hêstirên çavên xwe pesna xwe dide. Dema hêstir dibarin, ava wan dibe lehî û diherike behran. Ji ber ku dilopên hêstirên çavan dirêj dirêj dibarin, li porê yarê hatiye şibandin. Rengê rondikên çavên evîndarîsor in û sedema wê jî ew e ku gelpik û lêvên yarê sor in. Evîndar, hêstiran çiqas zêde bibarîne, qîmeta wî jî ewqas zêde dibe. Hêstirên wî bedewiya yarê zedetir dike û dema evîndar digirî û hêstiran dibarîne, ji aliyê derûnnasiyê va bêhna wî derdikeve û xwe rehet hîs dike. Hinek caran jî ji bo rengê hêstirên evîndarî; xwîn, gul û şerab tê bikaranîn.

Di tesewufê da bi awayekî mecazî xwîn, dibe madde û bi rêya hêstirên çavan ji bedena mirovan derdikeve, diçe û evîndarî ji tiştên dinyewî xelas dike.

Hêstirên evîndarî, peyam in ji bo yarê û evîndar, bi hêstirên xwe, xwe digîhîne yara xwe û fikr û ramanên wê hîn dibe²¹³.

Dema ku em cuda bûn ji hev *hêstir* ji çav hatin

Dil û canên me gerger bûn ji ber tîra li min daî

(X:6/1)

Cism û can tevda fena çûn şewutîn qelb û ceger

Hêstirê xûn wek cewan tîn babê Hifzullah meded

(Q:9/2)

2.2.7.1.4. Ava Kewserê

Kewser, navê avek ji avên cennetê ye, di Quranê da bi navê Kewserê, sûreyek heye ji sê ayêtan pêk tê û rêza vê sûreyê 108 e. Di gelek tefsîran da di derbareyî ava Kewserê da cur be

²¹² Îbn'î-Esîr, Alî bîn Muhammed bîn Abdulkerîm el-Cezerî bîn Abdulvâhid eş-Şeybânî, *el-Kamil fi't-tarîx*, I-X, el-Mektebetu't-tewîqiyye, Qahîre 2004, I, 82-85.

²¹³ Pala, 142.

cur şîrove hene. Di edebiyatê da bi terkîbên ‘Ava Kewserê û Şeraba Kewserê’ jî tê bikaranîn²¹⁴.

Barê dinyaê tu ranakî nika bibte serî

Tu bi dinyaê dibî mehrûm jî *ava kewserî*

(X:7/7)

Barê dinyaê tu ranakî nika bibte serî

Tu bi dinyaê dibî mehrûm jî *ava kewserî*

(X:7/7)

2.2.7.2. Ax/Toz

Ax, unsûra asta herî di jêrda ye û ji bo vê sedemê ew, nîşana dilnizmiyê ye. Evîndar, ji bo yara xwe dibe xwelî û dixwaze evîna wî pê li wîbike û ew dixwaze bi vî rengî bibe xwedan qîmet. Ax, cihê veşartina tiştên girîng û biqîmetê ye. Ew, di afirandina mirovan da maddeyeke herî muhim e û dema mirov dimire, dîsan vedigere axê û dikeve binê wê. Yar, dema evîndara wî dimirê wî binax dike, lê bêhna evîndara wê li devdoran belav dibe û bêhna xwe dide xweliyê, ji wê xweliyê şerbik têne çêkirin û evîndar bi rêya şerbikê dev û lêvên yara xwe radimûsîne²¹⁵.

Ax, di tesewufê da ji nefsa mutmeînneya kinayeyê ye û tê şibandin ji bo îtaetkirinê û tiştên bêqîmet²¹⁶. Kil, jibo çavan derman e û dema mirov, kilê li çavên xwe dide, hêstir ji çavan tîn. Şêx Muşerref, axa Medîneyê dişibihîne kilê û dixwaze li rûyê xwe bide. Toz, di edebiyatê da weke xweliya lingê yarê derbaz dibe û Xînûkî jî ev motîfa hanê bi kar aniye û bi vî awayî evîna xwe aniye zimên:

Ez bi *toza* Mekkê û *axa* Medîne kil bikim

Herdu çavan ca wekû çavê mi jî rohnî bibî

(Q:2/3)

Lubsê fanî wî jibîr kir eçlesê baqî girift

Pir tereqqî kir ji *axê* çû giha asmanîyan

(Q:22/3)

2.2.7.3. Agir/Ar/Nar

Agir, agirê dogehê ye, lê di wê da taybetiyeke nûrê jî heye û çawa agir tiştan dişewitîne were jî derûdora xwe ronî dike.

Di edebiyata klasîk da agir, tê wateya jana evîna ku evîndar têda ye. Her weha bêrîkirin û hesreta yarê jî xwe wek agir nîşan dide. Agir, di çavan da vêdikeve û di dilan da dibe pê. Evîndar, ji bo ku agir û pêtên dilê xwe xavra bike, herdem hêstiran dibarîne, lê tucar ew agirê di dil daaş nabe. Li kêleka agirî, axîn tê kişandin, ew jî pêtên agirîgurrîr dike. Hinek caran

²¹⁴ Pala, 268.

²¹⁵ Pala, 183.

²¹⁶ Hayrullah Acar, *Dîwana Şêx Ehmedê Feqîr (Metn û Lêkolîn, Weş. Nûbihar, Çapa 1mîn, İstanbul 2016, r.137.*

evîna evîndarî li mûmê hatiye şibandin. Çawa mûm hêdî hêdî di xwe da dişewite û dihele, were jî evîndar bi agirê evînê dişewite û dihele.

Ji ber ku rengê lêv û gelpikên yarê sor in, li agir hatiye şibandin û şerab jî ji aliyê rengê xwe yê sor va dişibihe agirî.

Em dizanin kebab li ser agirî tê pijandin, her wiha dilê evîndarî jî bi agirê evîna yarê tê şewitandin. Xinûkî peyva ‘nar û agir’î bi wateya firqetê bi kar aniye û ew, destnîşan dike ku firqet, wek agirî ketiye dilê wî û wî disoje.

Heçî firqet vexwarî ew

Ji bo Mim Fa digrî ew

Dizanî nîne têda xew

Wekî *agir* di cergê da

(M:2/10)

Ez nikarim qet ku halê firqetê tefşîl bikim

Herwekî zeytê li yekî kin paşê *agir* berdinê

(Q:8/2)

Nîsbeta we ji me ra keleşek bilind û muhkem e

Nagihête me belaê dunyê û *narê cehîm*

(Q:10/15)

Birîndarim tijî *narim*

De‘îf û xeste û jarim

Giranbar im û bêkarim

Ji bu‘da Xalidê Sanî

(M:17/3)

2.2.7.4.Hewa/‘Ewr

Di edebiyatê da ‘ewr nîşana cUmerdî, qencî, mîhrîvanî û qehra yarê ye. Xem û keder û hêsirên çavên evîndarî, li ‘ewran hatiye şibandin û porên yarê jî remza ‘ewran e. Çawa ji ‘ewran barandina baranê dibe, sedema derketina heşînahî, gul û çîçekan e were jî porê yarê, bi xweşikbûna xwe, dilê evîndarî dike cihê kêfxweşiyê. ‘Ewr, hinek caran xem û kederên evîndarî nîşan dide²¹⁷.

Şêx Muşerrefî, motîfa ‘ewran bi şibandina biharê bi kar aniye. Lewra, dema bihar tê û bi barîna baranê ji ‘ewran, devûdor bi gul û sosinan dixemilin û bi vî awayî jî dilê wî xweş û geş dibe.

²¹⁷ Pala, 130.

Herin cem wî şehînşahî
 Bibin ‘ebdalê dergahî
 Bi hawar û dused ahî
 Bikin çavan wekî ‘ewrê

(M:9/13)

Keremkir ‘ewrê îhsanatê barand
 Ji bo’ m keyf û şahî û fereh şand

(MS:9/13)

2.2.7.4.1. Asîman

Asîman, ji ber ku weke qubeyî li ser rûyê erdê ye temsîliyeta mezinatî û hêzê dîke û bi rengê xwe yê heşîn, spî û zelal, nîşaneyê paqijiyê ye. Asîman, ji ber ku fireh e û bêsînore remza bêdawîtiyê ye. Di edebiyatê da hinek caran di wateya “felek”ê da hatiye bikaranîn²¹⁸.

Ax û oxan pir dibêjim lew dinalim mişlê ney
 Ahê dil çûn *asîman*an babê Hifzullah meded

(Q:9/3)

2.2.7.4.2. Birûsk/Berq

Birûsk, ew tişt e ku bi valabûna elektirîka di navbera binê ‘ewrek û erdê da, di navbera du ‘ewran da yan jî di ‘ewrekî da ronahiyeke demkî ye ku bi xetên şikeste çêdibe. Gurucandina ‘ewran, bi vedana birûskê derketina dengê bilind e û dişibihe dengê teqemeniyê²¹⁹.

Di edebiyata klasîk da herî zêde bi derxistina dengê herî zêde û bilind hatiye bikaranîn. Bi aliyê ronahiya xwe bi bedewîtiyê, rû û gelpikan ra û bi bilezbûna xwe jî bi axîn, nalîn, qeza û qedere ra hatiye bikaranîn²²⁰.

Bêdilan ey ‘aqîlan qet hûn nebên rahet heyê
 Her şewaî û agir e *berq* û *birûsk* her dinê

(Q:8/9)

2.2.7.4.3. Baê Nesîm

Baê nesîm, tê wateya pêlvedana bayê hêdî hêdî. Li gorî hin kesan, hatina bayê ewilî ye²²¹ û serê spêdeyê tê. Di edebiyatê da bayê nesîm, tê taxa yarê û bêhna yarê ji evîndarî ra

²¹⁸ Pala, 36.

²¹⁹ Usman Aslanoğlu, *Pervin-i İ'tisami Divanı'nın Tahlili*, Atatürk Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü (Têza Doxtorayê), 2014, r. 290., 396.

²²⁰ Pala, 68.

²²¹ Aslanoğlu, 401.

dibe. Ji ber vê rewşê wek nûçegîhanekî/ê tê qebûlîkirin û evîndar bi alîkariya bayê nesîm, xeberan ji yara xwe digire. Pir caran bi xweşhatina wê hatiye bilêvkirin.

Di tesewufê da baê nesîm, tê wateya “tecelliya cemala îlahî”, “nefsa rehmanî” û rehmeta ku li pey hev tê”²²².

Cumle sadatê li ho destê ewan maçu dikem

Hem selaman rêdikem her ez digel *baê nesîm*

(Q:10/10)

2.2.8. Unsûrên Kozmîk

2.2.8.1. Felek

Felek tê wateya asîman, şans, bext û qederê, pirjimariya wê, eflak e. Di helbestan da bi piranî felek ji bo gilî û gazinan hatiye bikaranîn û hinek caran jî bi wateya bilind, mezin, fireh, bêdawî, biriqandin û... hwd hatiye emilandin. Li gorî evîndarî/ê, qîmeta yara wî/ê ji qîmeta felekê jî bilindtir e û felek bi tenê dikare bibe koşka wê. Ax û fixanên evîndarî/ê jî wekî felekê bêdawî ne û hinek caran jî ax û fixanên dilşewat felekê dişewitînin. Gelek caran jî felek, ji ber êş û elemên evîndarî/ê digirî. Têkiliya felekê hinek caran bi gurîna ‘ewran û bi vedana birûskê va hatiye girêdan. Bi awayekî kurtasî mirov; dikare bibêje helbestvanan bi gelek aliyên va felek emilandine²²³.

Belê ez bawerî nakim

Ji min ra her wekî ‘alem

Felek çerxek biket yek dem

Li min ruh û cesed derda

(M:2/3)

Ya îlahî tu bikî ‘emrê ewî zehf û gelek

Tu bikî rutbetê wî mişlê semakan û *felek*

Bike nuşret ji ewî ra heme eqtab û melek

We edîm ‘eyşehu we ‘c ‘elna lehu mîn xedem

(M:6/10)

Di pê van ‘ecêban ve çûme derek

Eva çadirek têda mişlê*felek*

(MS:2/22)

2.2.8.2. Roj/Xurşîd

Roj, bi navê afirtab, xurşîd, mihr û şemsê jî tê bikaranîn. Di edebiyatê da pir caran bi taybetmendiyên xwe yên wek ronahîdan, birqonekî, tîndan û germahiyê va hatiye bikaranîn.

²²² Aslanoğlu, 402.

²²³ Pala, 150.

Roj, him hatiye şibandin û him jî lê hatiye şibandin. Roj, sultanê cismên esmanan e û stêrkên esmanan yê din jî xizmetkarên wê yê bi paye ne. Ji ber ku ew tîrêjên xwe li her derê belav dike, ev yeka hanê nîşaneyê cUmerdiyê ye û bi ev taybetiyên xwe temsîlkara yara xwe ye.

Di helbestan da hinek caran roj li yarê hatiye şibandin û hinek caran jî yar li rojê hatiye şibandin. Roj, bi birqonekbûna xwe jî li gelpikên yarê hatiye şibandin. Ji aliyê bedewiyê va jî Hz. Yûsif bi rojê ra tê pîvandî²²⁴.

Şêx Muşerref, nûra Hz. Pêxember û rojê dide berhev û dibêje roj bi nûra te ronî dibe.

Nê ji nûra te munewwer bûne ev *roj* û heyiv

Fîlheqîqet her tu yî ronahiya ronahiyan

(Q:1/7)

Jimara beyreqa kesk e

Çi *xursîd* e çî xweş misk e

Sebeb wî ger Xuda hezke

Bi serbestî biçin heşrê

(M:9/15)

2.2.8.3. Heyv

Heyv, jêdereke ronahiyê ye, lê ronahiya wê wek ronahiya rojê agir nîne, ew nûr e. Şev, bi bedewiya hîvê xweşik dibe û ew bedewî, bedewiya yarê ye, destê kesî/ê lê neketiye û tu dest nagihêjinê jî. Ew, bi ronahiya xwe şevan ronî dike; ango ew, yar e. Derketina hîvê ji nav ‘ewran li yara ku cil û bergên xwe ji xwe derdixîne, hatiye şibandin. Berê girtina hîvê tê wateya ku yar bi porên xwe ser û çavên xwe diniximîne.

Ew reşahiyên li ser rûyê yarê, remza pirça ser bihokan e û roj, sultanê asîmanan e, hîv jî wezîrê wê ye²²⁵. Şêx Muşerref, nûra Hz. Pêxember û hîvê dide berhev û dibêje hîv, bi nûra te ronî dibe.

Nê ji nûra te munewwer bûn e ev *roj* û heyiv

Fîlheqîqet her tu yî ronahiya ronahiyan

(Q:1/7)

2.2.8.4. Dem/Zeman/Wext

Helbestvanan, di helbestên xwe da unsûrên demê yê wek sal, meh, hefte, şev, subh, roj, êvar, bihar, nûbihar û newroz... him ji bona diyarkirina demê û him jî bi şiklê muşahedekirina rewşa xwezayî bi kar anîne.

Şêx Muşerrefî, di helbestên xwe da van unsûrana bi piranî ji bo diyarkirina demê bi kar aniyê û hinek caran jî ji bo evîna xwe; yanê ji bo şêxê terîqeta xwe bi kar aniyê. Weke li jêrê jî

²²⁴ Pala, 176.

²²⁵ Pala, 42.

tê xuyakirin di hinek malikan da jî ji bo xweşikahiya demsala biharê nîşan bide ev unsûranan bi kar aniye.

Zeman:

Zemanê îctîma‘ê dê bihar bit

Tebî‘et mu‘ted’il bit hem li kar bit

(MS:8/13)

Mah û Sal:Min digota hal û mal ey dil dixwazî ez biçim

Dil digota hal û malan *mah û salan* piş dinê

(Q:8/6)

Şev: Ne rênas im ne zana me

Şeva tarî li paş mame

Bîlahed îro westa me

Medet ya şahê Erbîlê

(M:3/3)

Şubh û Êvar:

Xweyê ewrad û ezkaran

Hezarê *şubh* û *êvaran*

Ji îstîğfarê eşharan

Kire mehrûmê weşen îro

(M:12/9)

Bihar / Nûbihar:

Binêrin ev *bihar* çend dil kuşa ye

Cemî‘ê ‘alemê der keyf û şa ye

(Q:24/6)

Kelamê min xweş û pir nazdar e

Şîrîn e taze ye wek *nûbihar* e

(MS:1/3)

Newroz:

Li Erdîşê li wî tozê
 Di wî huzna *şev* û *rojê*
 Li min kir mişlê *newrozê*
 Li nav xelqê di Îranî

(M:13/6)

Feqîr mane li nav tozan
 Bila biherin ji tû gûzan
 Ji şahiyên û *newrozan*
 Meded ya Gewsê Geylanî

(M:7/6)

2.2.9. Heywanat

Di edebiyata klasîk da helbestvanan ji bo ku evîna xwe bînin zimên, gelek mazmûn emilandine. Ji wan mazmûnan cureyek jî bikaranîna navê heywanan e. Helbestvanan bi vî awayî evîna xwe nîşandane. Helbestvanê mijara me Xînuki jî bi vî rê û rêbazê xwestiye evîna xwe ya îlahî nîşan bide.

2.2.9.1. Tûfî

Tûfî, ji çûkên ku nikulê wan stûr û lezlezok in, lingên wan tenik in, ji çar tiliyên wan du heb ber bi paşda ne û bi awayekî xweşik zarî dengê mirovan dikin ra tê gotin. Tê gotin ku ji ber ku tûfî, ji xwarina şekirî gelek hez dikin, di qefesa wan da herdem şekir dardakirî ye. Lewra helbestvanên klasîk bawer dikin ku ev çûkana ji ber ku şekirîdixwin, diaxivin û dibêjin ku ger ji me ra jî hurmet û alîkarî were kirin, em jî dikarin helbestên xweşiktir binivîsin.

Tûfî, di edebiyata klasîk da bi şekir û aweneyê ra hatiye bikaranîn. Bi bîranîna wê li hember neynikê bi şekirî ra; li pênuşa helbestvanî/ê, li kesayeta wî/ê, li evîndar û li dilê wî hatiye şibandin²²⁶.

Hebûn têda *tûfî* û çûkê xerîb
 Ê şehlûl û bilbil digel ‘endelîb

(MS:2/2)

2.2.9.2. Bilbil/‘Endelîb/Şehlûl

Bilbil, bi xweşikbûna dengê xwe navdar e û di wextê siharê da dike wîçewîç. Tê gotin ku di dinyayê da tu amûreke muzîkê tune ye ku weke bilbilan dengê xweşik derxîne. Bi Erebi jê ra tê gotin ‘Endelîb û ji cureyeke bilbilan ra jî şehlûl tê gotin.

Di edebiyata klasîk da bilbil gelek zêde hatiye bikaranîn. Lewra bilbil, evîndara dilbikula e û herdem qala xweşikahiyên yara xwe dike. Hinek caran bi xwe dibe evîndar û hinek caran

²²⁶ Pala, 461; Kadri Yıldırım, *Ehmedê Xanî Külliyyatı IV Dîwan*, Weş. Avesta, İstanbul, 2014, r. 98-99

jî dibe dilê wê. Bilbil evîndarê gulê ye û bi dengê xwe yê xweşik, dibe helbestên evîndarî. Çawa ku bilbil bi gulê nabe, were jî ‘aşiq bê me’şûq nabe. Çawa ku dirî û qîtên gulê kezeba bilbilê qul dikin; were jî eziyetên yarê dilê evîndarî qul dike û bi derd û kulan tijî dike.

Di dema spêdeyê da bilbil derdikeve pêşberî gulê û dixwîne. Gul ji bo bilbilê wek pirtûkeke nû ye û ew wê pirtûkê dixwîne. Bilbil dema bi gulê ra be kêfa wî tê û dema ji hev cuda dibin, ev dike zarîn û nalîn û dema wî dibîne, ji kêf û zewqan sermest dibe.

Di tesewufê da bilbil, motîfa evîndara ku bi ‘eşq û evîna Xwedê dişewite û diperite ye.

Tê gotin ku gul, ji bo nazkirinê û bilbil jî ji bo niyazkirinê yanê ji bo lavakirinê hatiye afirandin. Di edebiyata klasîk da gul, motîfa yarê ye û bilbil jî sembola evîndarê ye²²⁷. Ji ber ku bilbil bi evîna gulê dişewite û diperite, jê ra bilbilê şeyda (dîn û har) û bilbilê zar (axîn û nalîn) hatiye gotin.

Çawa ku li jêrî jî tê xuyakirin, Şêx Muşerrefî, motîfa bilbilê bi awayekî gelek serkeftî bi kar aniyê. Wî, di helbestên xwe da him bilbil him bilbilê şeyda him ‘endelîb û him jî çûka ‘endelîb bi kar aniyê:

Qewî lalim dinalim mişlê **bilbil**

Qewî dûrim ji bihna Hezretê gul

(MS:2/10)

Ya Eba Selman ricakarin ji rebbê ‘alemê

Ew ji bo me dîtin û şohbetkerem ket her demê

Xweş biket cumle birînan def’e ket gemê

Ma neket wek **bilbilê şeyda** wekî Zîn û Memê

Ah ser û patêk helan ji vê firqetê ah firqetê

(MX:1/8)

Û hem ‘**endelîb** xweş rîwayet çî ye

Ji exbarê pêxemberan hâkî ye

(MS:2/10)

Hebûn têda **tûfî** û çûkê xerîb

Û **şehlûl** û bilbil digel ‘endelîb

(MS:2/2)

2.2.9.3. Hudhud/Silêmanê Dunikil/Dawidê Dunikil

Hudhud, ji ber ku dikare li hewayê, avên ku gelek dûr in bibîne û wan kifş bike bûye xizmetkarê Suleyman Pêxemberî. Navekî wî jî murgê Suleymanî ye û di Quranê da navê wî bi çîroka Suleyman Pêxemberî ra derbaz dibe. Hudhud, di navbera Suleyman Pêxember û

²²⁷ Pala, 77.

melîkeya Seba/Sebeyê Belqisê da peyamber/xeberdar bûye²²⁸. Ev çîroka ku di navbera Suleyman Pêxember û Belqisê da derbaz bûye, weke tiştêkî efsaneyî ye, di edebiyata klasîk da derbaz dibe. Di lîteratûra Îslamê da navê hudhud, ebû'l-exbar, ebû'r-rebî', ebû 'îbad, ebû's-seccad û... hwd derbaz dibe. Gelek taybetiyên ev çûkê hanê hene û ji wan taybetiyan hinek ji wan vana ne: Dikare ava di binê axê da bibîne, bi hevsera xwe ra dilsoze, dema hevsera wî dimire, dil nake ku cara duduyan bizewice, hurmeta wî ji bo diya wî û bavê wî gelek zêde ye. Dema diya wî û bavê wî kal û pîr dibin, li pey rizqê wan digere û dema dayîka wî dimire, ji bo veşartina termê wê heta ku cihekîlêhatî dibîne, wê li ser serê xwe digerîne. Lewma weke xelat, tepelîka serê wî gelek xweşik hatiye xemilandin û ji ber vê sedemê navekî wî jî sahîbu'l-kulah e.²²⁹ Ew, çûkekî gelek têngiştî û xweşxeber e.

Heçî *hudhud* ew beşaret dike

Ji mehbûb û yaran hikayet dike

(MS:2/11)

2.2.9.4. Qaz/Quling

Qaz, çûkeke/î bejindirêj, nikilfireh, lingperde, rengqehweyî yan jî gewr e. Ew, bi pirç e û giyaxur e gelek ji avê hez dike û têda avjeniyê dike. Yek ji ew heywanên ku di edebiyata klasîk da wek motif hatine bikaranîn e. Keç û bûk li qazan hatine şibandin û ew, yek ji remzên dilsoziya zewicandinê ne û mînaka bedewiyê ne.

Quling, çûkeke/î reşdeq, renkgewr yan jî spînokî, çîpdirêj, bejindirêj û perûbaskfireh e. Quling jî wek qazê zêdetir di edebiyata gelerî da hatiye bikaranîn. Bi hatina wî ya ji cih û warên dûr, ji aliyê teyrê baz va nêçîrkirina wî, xeberanîna wî ji yarê re, di edebiyatê da hatiye bikaranîn.

Çawa di malika jêr da tê xuyakirin, Şêx Muşerref jî îşaret li bal van tiştana dike.

Evan şêran piling hêran bi van şîran rim û tîran

Ji van *bazan* leşê *qazan* hemî razan li ser piştê

(X:9/4)

Dinya tamam lew bûye tav

Gulçîçekan girtin xunav

Qaz û *quling* lê bûn belav

Van bilbilan lê qal û şer

(M:15/2)

2.2.9.5. Teyrê Baz

Teyrê baz, çûkeke/î rengspî û gir e. Di edebiyatê da porê yarê ji aliyê nêçîrvaniyê va li teyrê baz hatiye şibandin. Ew, çûka nêçîrvaniyê ye û porê yarê jî wek nêçîrvanî ye û ew,

²²⁸ Sûreya Nemlê: 27/16-35.

²²⁹ Cahiz, Pala, 2106.

nêçîrvaniya dilê evîndara xwe dike.²³⁰ Teyrê baz, bi bêtirs û berzbûna xwe navdar e û ew, şahê çûkan e û sultan û paşayan bi wî ra nêçîr kirine²³¹.

Di tesewufê da tê wateya ku çawa nêçîrvan dema bixwaze çûkekê/î binêçîrîne wî bi teyrê baz dinêçîrîne, were jî Xwedêdema bixwaze ‘evdeke/î xwe îrşad bike wî/ê bi wesîleya weliyekî xwe tîne hizûra xwe²³².

Evan şêran piling hêran bi van şîran rim û tîran

Ji van *bazan* leşê qazan hemî razan li ser piştê

(X:9/4)

2.2.9.6.Şêr/Piling

Di edebiyata klasîk da motîfa şêr/pilingê herî zêde di berhemên qala baweriya Elewiyan dikin da hatiye bikaranîn û di edebiyatê da gelek caran Hz. Elî û şêr, bi hev ra hatinebikaranîn. Şêr, leqeba Hz. Elî ye û jê ra “Şêrê Xwedê” hatiye gotin. Piling jî cureyek ji famileya pisîkan ya mezin e û ev heywana him bi hêza xwe û him jî bi reva xwe ya bi lez navdar e.

Wateya pençeyên şêr ew e ku evîndar, ji bo evîna xwe dikare her tiştî bike. Di helbestan da hinek caran şêr û xezal bi hev ra hatine bilêvkirin. Sedema herî mezin ji bo vî tiştî ew e ku yar, bi çavxezaliya xwe û bi tirs û xofa ku li şêr dinihêre bi wî awayî jî li evîndara xwe mêzedike ye. Li hember nihêrandina bi vî şiklî tu kesek nikare bisekine²³³.

Evan *şêran piling* hêran bi van şîran rim û tîran

Ji van *bazan* leşê qazan hemî razan li ser piştê

(X:9/4)

Xweş diket şîbhê Mesîh her kesê ku bimirî

Şeh dibî her wekî *şêrê* ger biket lê nezerî

Wekî şiddîq e di şiddîq û di setwet ‘Umerî

Huwe ‘Uşmanu mîne’l-ħîlmî ‘eliyyu’ş-şiyem

(M:6/3)

2.2.9.7.Kehêl

Di edebiyata klasîk da motîfa hespê, gelek caran hatiye bikaranîn. Kehêl jî cureyek ji cureyên hespan e û rengên wan sorî qehweyî ne. Ev cure hespi hespên pir hêja û bi qîmet tînan hesibandin.

Sed wekî Cemşîd û Rustem westiyan e mane ew

Tu *kehêl* û tu xezal negîhan binî ey musteqîm

(Q:10/5)

²³⁰ Pala, 418.

²³¹ Kadri Yıldırım, 97.

²³² Suleyman Uludağ, *Tasvuf Terimleri Sözlüğü*, Weşanên Marifet, İstanbul, 1991, r. 88.

²³³ Pala, 26-27.

2.2.9.8. Xezal

Di edebiyatê da xezal, bi çavên xwe û bi bîhna xwe ya xweşik û newêrektiya xwe û nazdariya xwe li yarê hatiye şibandin. Ji ber ku çavên wê girover, girs û mezinin û reşqemer in, çavên yarê tîne bîra mirovan. Ji bo ku bîhna miskê jê tê li bîhna porê yarê hatiye şibandin.

Tu dikarî tu ji kehêlan û xezalan zêde kî

Rehberê xwe ger bikî nîsbeta Seyyîd Fehîm

(Q:10/6)

2.2.10. Çîçek

Çîçekan, bi xwezayetiya xwe ya dîtbar û nedîtbar çawa di hemû şaristaniyan da cihê xwe girtine, bi vê awayî di şaristaniya Îslamiyetê da jî cihê xwe girtine. Ji ber ku Kurd jî perçeyek ji vê şaristaniyê ne, çîçekan bi unsûrên xwe yên xwezayî di nav çanda wan da jî cih girtine.

Çîçekan, bi awayekî berfireh di edebiyata Kurdî da cih girtiye. Şêx Muşerrefî jî ev rê şopandiye û di helbestên xwe da navê hinek çîçekan bi lêv kiriye.

2.2.10.1. Rihan

Reyhan yan jî rihan, li ber devê av û çeman heşîn dibe. Pelên wê, li dil hatiye şibandin. Rihan, ji tava rojê zêde hez dike û dema rojê diçe ava, ew jî gulên xwe vedimirîne. Ji ber ev taybetiya wê, ew wek afirtabperest yanê rojparêz hatiye binavkirin²³⁴.

Di edebiyata klasîk da ji aliyê bîhna wê û şiklê wê li porê yarê û bi taybetî jî pirça li ser rûyê wê li reyhanê hatiye şibandin.

Û *reyhan* û sosin telettuf dikir

Du carî ser hev ewan maçu kir

(MS:2/21)

Mu'et̄ter bin wekî *reyhan* û werdan

Bikin def'a gem û eşan û derdan

(MS:6/2)

Selamê mişlê*reyhanan* mu'et̄ter

Ji bo ewladê eşrafan muzeffar

(MS:7/1)

Pir selamê wek *rihanan* ji we ra hediye dikim

Radimûsim ez bi hürmet hem bi şewq dest û piyan

(Q:25/10)

²³⁴Kadri Yıldırım, r. 91.

2.2.10.2. Nêrgiz

Nêrgiz, çîçekeke narîn û rengzer e û bi bîhna xwe mirovan sermest dike. Bi narînê û rengzeriya xwe û bi stûxwarî û şermokiya xwe nûnertiya evîndarî/ê dike. Ji bo ku dişibihe çavan, bi awirên xwe yên melûl û jixweçûyî, unsûreke şibandinê ye.

Li gorî mîtolojiyê nêrgiz, xortekî bedew û bixweqaîl bûye. Bi sedema pozbilindbûna wî, qîzên ku dilê wan diketê, lê eşqa wan bêbersiv dima, diçûn bal Xwedêyan û giliya wî bi wan da dikirin. Li ser vê giliyê Xwedayên wan ev cezayê hanê didin nêrgizî: Nêrgiz, rojekê li ser çemî di nav avê da rûyê xwe dibîne û dibe aşiqê wê. Li rûyê xwe temaşe dike û hişê wî ji serê wî diçe, ew dikeve avê û difetise. Piştî ev bûyera bidilşewat ji bedena wî gulên ku dişibihin çavan, dipişkivin. Tê gotin ku təkiliya di navbera nêrgiz û çavan ji vê bûyerê derketiye²³⁵.

Û *reyhan* û sorgul di wî bûn

Û nêrgiz digel sosinê tê hebûn

(MS:2/14)

2.2.10.3. Gul

Bêguman di edebiyata klasîk da çîçeka ku herî zêde bala helbestvanan kişandiye, gul e. Di zimanê Erebi da ji gulê ra ‘‘werd’’ tê gotin.

Gul, di helbestan da bi pelên xwe, bi diriyên xwe, bi şitlên xwe, bi koka xwe, bi fidaniya xwe, bi rengê xwe, bi tertiya xwe, bi xweşikbûyîna xwe, bi bedewiya xwe, bi bêhna xwe ya xweşik, bi nazdarî û dilzîziya xwe û bi badokbûyîna pelên xwe va hatiye bikaranîn û dilê evîndaran xweş û geş kiriye. Li goreyî rengên wê cureyên wê jî wek sorgul/ gulasor, gulazer û gulaspî hene. Bêhna wê jî, ji pelên wê tê çêkirin û dibe gulav. Bi taybetî bi navê gulîstan, gulşen û gulzar baxçeyên gulan hene²³⁶.

Sedemên ku gulê di helbestan da cihekî evqas berfireh girtiye, bi gelemperî ev in: Çîçeka herî naskirî ye, li her derê heşîn dibe û herî xweşik û dilkêş e. Dişibihe organên yarê yên wek rû û lêvan; xuyakirina wê ya xweşik û şibandina wê li Hz. Yûsif û Hz. Muhemmed. Ji sedemên ku gul di helbestan da cihekî evqas berfireh girtiye, yek jî ev çîroka hanê ye: Tê gotin ku berê rengê gulê sor nebûye. Bilbil evîndarê gulê bûye. Gulê qet rû nedaye bilbilê, tebat li bilbilê nehatiye, fir daye çûye ser şitleke gulê. Diriyên gulê ketine bedena bilbilê û xwîn kirine. Dilopên xwînê rijiyane bin dara gulê û kişiyane bin koka gulê. Temarên gulê ew xwîn mêtine û rengê xwe yên sor dane gulê. Piştî vê bûyerê gulê, êdî bi rengê sor vekiriye. Yê ku fedî dike rengê rûyê wî sor dibe, ev ji ar û şermokiya gulê ye. Rengê rondikên dildaran jî ji rengê gulê yê sor e.

Helbestvanan gul, bi navê sorgul, gulasor, werd, nûgul û gulvan bi kar anîne.

Sorgul:

Û *reyhan* û *sorgul* di wî bûn

Û nêrgiz di gel sosinê tê hebûn

(MS:2/14)

²³⁵Kadri Yıldırım, r. 89.

²³⁶Pala, 169-170.

Gula Sor:

Gula sor di gel nêrgiz şer dikir
Belê herbekê pir mezin wan dikir

(MS:2/15)

Werd:

Mu'et̄ter bin wekî reyhan û *werdan*
Bikin def'a gem û eşan û derdan

(MS:6/2)

Gulçîçek:

Dinya tamam lew bûye tav
*Gulçîçek*an girtin xunav
Qaz û quling lê bûn belav
Van bilbilan lê qal û şer

(M:15/2)

Gulreng:

Ela ey saqiyê *gulrengê* şêrîn
Emekdarî wefakarî li bîrîn

(MS:8/1)

Nûgul:

Ey biraê min 'Ubeyd ey raĥeta qelb û dilan
Ey binefş û wey riĥan wey *nûgula* baġê gulan

(Q:16/1)

Gulav:

Welê şert e li terîqa wan biçit ew
Ku jê bêtin qewî bîhna *gulavan*

(Q:13/6)

Baġ:

Sosin li mêrgan zeyînîn
Nêrgiz li wan xweş xweş kenîn
Xweş bû gulek *baġ* û cenîn
Dost û evên têda çerîn

(M:15/4)

Bağê Gulan:

Ey biraê min ‘Ubeyd ey raĥeta qelb û dilan
Ey binefş û wey riĥan wey nûgula *bağê gulan*

(Q:16/1)

Gulşen:

Wesselam ez hatim û dil ma di bağê weşletê
Ez cuda bûm dil bi kul ma di wî xweş *gulşenê*

(Q:8/8)

2.2.10.4. Sosin

Sosin, di edebiyata klasîk da bi pelên xwe yên tûj û dirêj derdikeve pêşberî me. Dirêjahiya pelên wê temsîliyeta xençerê û zimanê yarê yê tûj û bijangên wê dike. Sosin, him bi şiklê xwe û him jî bi bêhna xwe çîçekeke gelekî xweşik e.

Û reyhan û *sosin* telettuf dikir
Du carî ser hev ewan maçu kir

(MS:2/21)

Û reyhan û *sosin* telettuf dikir
Du carî ser hev ewan maçu kir

(MS:2/21)

Ey binefşa bağê zehra *sosina* bağê ‘Elî
Ez xezîna Hezretê Muxtarî tu durrek yetîm

(Q:10/2)

2.2.10.5. Binefş

Di edebiyatê da binefş, bi bêhna xwe ya xweşik, bi rengê xwe yê tarî û bi stûxariya xwe namdar e û nîşaneyê hatina biharê ye. Ji ber ku di bazaran da baq bi baq tê firotin, bi ev şiklê xwe temsîliyeta porê yarê dike û ji aliyê reng û bêhnê va jî dişibihe miskê, ev jî temsîliyeta bedena yarê ye²³⁷.

Sed selamê wek *binefşan* taze û re‘na û nexeş
Ez ji bona te dişînim ey Melaê Serhilî

(Q:12/3)

Ey biraê min ‘Ubeyd ey raĥeta qelb û dilan
Ey *binefş* û wey riĥan wey nûgula bağê gulan

(Q:16/1)

²³⁷ Pala, 305.

Sed salamê wek *binefşan* taze û re‘na û nexeş
Ez ji bona te dişînim ey Melaê Serhilî

(Q:12/3)

Ey biraê min ‘Ubeyd ey raşeta qelb û dilan
Ey *binefş* û wey rihan wey nûgula bagê gulan

(Q:16/1)

2.2.10.6. Dara Biyê

Di edebiyatê da ji daran herî zêde qala dara biyê tê kirin. Bejna yarê li dara biyê tê şibandin. Di vê şibandinê da mubalexe û husnî talîl esas e. Bi hatina bayî, xwe dihejîne, evîndar ev hejandina wê dişibihîne rêvaçûna yara xwe. Dara biyê, dareke bêfêkî ye û zêdetir di qebristanan/goristanan da hene. Sedem jê ew e ku dema ba li wan dixê, ew hêdî hêdî xwe dihejînin û dengê “Hû”yêderdixin, yanê gazî Xwedê dikin û bi vî rengî tê hizirkirin ku ev rewşa hanê dibe sedem ji bo bexşandina miriyan. Dara biyê li devdora baxçeyan jî bi vê armancê tên çikandin²³⁸.

Dilerzim mişlê*dara bî* dikim nakim ‘îlac nabî
Kî ye qelbê me pê şabî were ey can çira naî

(X:8/6)

2.2.10.7. Misk

Misk, navê bîhneke pir xweş e û ji ûrû zikê cureyeke xezalên nêr tê derxistin. Tê gotin ku ev ûra nerihetiyê dide xezalê û xezal, bi rêya xwetêdanê va ev ûrê hanê derdixê. Nêçîrvanên miskê, ji bo ku xezal xwe têdin û ûrê di zikê xwe da derxin sîngan li erdê dikutin. Xezal, dema xwe di van sîngan da didin, kakilaev maddeya reş derdixin û bêhna wê li devûdora wê derê belav dibe û bi vî rengî cihê miskê diyar dibe.

Di edebiyatêda ji navên bîhnên xweş yê herî zêde derbaz dibe yek jî misk e. Gelek caran di hunera tewriyeyê da bi peyva miskîn ra tê bikaranîn. Misk, bi bîhna xwe ya xweşik û bi rengê xwe yê reş dişibihe birh, nîşan, por û bîhna yarê. Peyva ahûyê, xezala miskê tîne bîra mirovan. Li gorî evîndarî, porê yara wî herwekî cihê bazara ku têda tijî misk e. Ji ber ku ahû, çavnebariya yarê dike, xwîn di hundirê wî da hişk dibe, dibe misk. Xinûkî di helbestên xwe da terma miskê evha bi kar tîne:

Nê ji te mewcûd bûne filheqîqet her du kewn
Hem ji te bîhna xwe girtin *misk* û biskên horiyan

(Q:1/8)

Hûn ji *miska* hezretî Zehraê bihnek pir xweşin
Sed xwelî bêtin li ser bihna xweşa zava û bûk

(Q:17/5)

²³⁸ Pala, r. 400-401.

Jimara beyreqa kesk e
Çi xurşîd e çi xweş *misk* e
Sebeb wî ger Xuda hezke
Bi serbestî biçin heşrê

(M:9/15)

2.2.10.8. ‘Enber

‘Enber, maddeyêke reş, zeliqonek û bêhnxweş e û di nava behra Hindê da di nav zikê cureyekî masiyan da heye û masî wê ji zikê xwe derdixe û diavêje avê û ew tê ber qeraxê behrê. Reng û bêhna wê li porê yarê hatiye şibandin. Lewra porê yarê jî her weke ‘enberê reş e û herdem bîhneke xweş dide. Xet û nîşanên yarê ‘enber bi xwe ye. Ji bona porê Pêxemberî têgeha “‘enberê erzan” tê bikaranîn²³⁹.

Saqiyan şerbet gerandin *misk* û ‘*enber* lê reşandin
Ax li ser dinya werandin pir bi kêf û şahiyên

(Q:22/8)

2.2.11. Unsûrên Di Derbareyê Jiyana Rojane Da

Xinûkî di helbestên xwe da ew têgehên kû di derbareyê jiyana rojane da bi kar aniye di bin vê sernavê da tê nixandin.

2.2.11.1.Xwarin û Vexwarin

2.2.11.1.1. Kebab

Kebab, navê cureyekî xwarina goştî ye. Çêkirina wê ewha ye: Goştê dewar, pez, mirîşk yan jî masiyan tê tenikkirin û bi qasî hewcedariyê madeyên ku tahm û lezeta xwe didin lê tê werkirin û li ser şîşikên hesinan di hev da tê raxistin û tê danîn ser agirê ku rijîye. Ji bo ku goştê kebaban neşewite û nebe kizik, şîşik hêdî hêdî tî guherandin heta ku goşt dipije.

Di helbestên klasîk da kebab, li dilê evîndarî hatiye şibandin. Çawa ku agir goştê li ser xwe dişewitîne, diperitîne û dike kebab, bi vî awayî hesreta yarê jî dilê evîndarî dişewitîne û dike weke kebabê.

Helbestvanî, ji ber ku hesreta şêxê xwe zêde kişandiye, dilê wî weke kebabê şewitiye:

Gelek îro cîger rîşim
Cefakêşim bela‘eyşim
Kebabim ez li ser şîşim
Kû çû Şêx Xalidê Sanî

(M:17/1)

²³⁹ Pala, 23.

2.2.11.1.2. Şîr

Şîr, vexwarineke bitam û xweşik û şîrîn e. Di edebiyatê da dev û lêv û gotinên yarê li şîr û şîrînahiya wê hatiye şibandin.

Êdî sehî nakin ew bangî
 Dikin ‘ebdaliya gangî
 Vexwarin *şîrê* vî mangî
 Meded ya Ğewsê Geylanî

(M:7/7)

Ji bo qeṭ‘a xerabî *şîrê* tîje
 Wekî navê xwe ye gûz û miwîj e

(MS:1/ 4)

2.2.11.1.3. Şerab/Şerbet

Şerab, vexwarineke wereye ku dema mirov wê vedixwe serxwoş dibe. Motîfa şerabê di edebiyata klasîk da, herî zêde di wateya ‘eşq û hezkirinê da hatiye bikaranîn. Mirov dikare bibêje di edebiyata cîhanê da jî têkilî di navbera ‘eşq û şerabê da heye. ‘Eşq, wek şerabê, mirovan ji ser hiş û aqilî dibe, serxweş dike û kêfxweşiyêke mezin dide mirovan û ji ber van taybetiyan ‘eşq li şerabê hatiye şibandin. Şerab, hinek caran bi peyvên wek cam, qedeh û piyaleyê jî derbaz dibe. Ji ber rengê wê yê sor li lêvên yarê û hêstirên wê hatiye şibandin.

Di tesewufê da şerab, motîfekemuhim e. Lewra mirov, bi rêya evînê xwe digîhîne Xwedê. Şerab di wateya serxwoşbûna evîndariya îlahî da hatiye bikaranîn. Xinûkî jî peyva şerab û şerbetê di wateya evîna îlahî da bi kar aniye.

Şuḥbetek ḡayet tamam her yek li yek dikra selam
Şerbeta şafî gerandin ax ji destê saqiyan

(Q:22/7)

Saqiyan *şerbet* gerandin misk û ‘enber lê reşandin
 Ax li ser dinya werandin pir bi kêf û şahiyân

(Q:22/8)

Bide saqî *şerabê* tu peya pey
 Bi wî qelbê mirî heqqen dibit hey

(MS:8/9)

Şeraba şaf digel yaranê ebrar
 Diket dil *mecme ‘u’l-beḥreynê esrar*

(MS:8/12)

2.2.11.2. Mêwe

2.2.11.2.1. Sêv

Di edebiyata klasîk da sêv, bi rengê xwe, bi bîhna xwe, bi şiklê xwe û bi pêşxwariniya xwe hatiye bikaranîn. Gulpika yarê, erzînka wê û gerdena wê li sêvê hatiye şibandin. Kulên di dilê evîndarî da û kezeba wî ya bixwîn jî li sêvê hatiye şibandin. Rengê sêvê pirê caran sor û hinek caran jî spî hatiye bilêvkin.

Ne hûn zanin ku em daim bi bal lufta we çavnêrîn

Nezerdarin li *sêva* tehl di piştî nîvro û êvaran

(Q:11/4)

2.2.11.2.2. Hinar

Hinar, bi rengê xwe, bi şiklê xwe, bi daneyên xwe, bi ava xwe, bi çîçeka xwe û bi şitlên xwe bûye mijara edebiyatê. Hinek caran têkilî di navbeyna peyva “nar”ê yanê agir û wê da bi hunera tewriye û kînayeyê hatiye danîn. Rûyê yarê, lêvên wê, çîçikên wê li hinarê û bejna wê jî li dara hinarê hatiye şibandin.

Li Şêx Sebrî selamê mişlê baran

Şêrîn û xweş weke taze *hinaran*

(MS:6/1)

2.2.11.2.3. Gûz û Mewîj

Mewîj, bi şiklê xwe, bi rengê xwe, bi bîhna xwe, bi halê xwe yê hersim û gûşî, bi pêşxwarinê û ji wê çêkirina şerabê va bûye mijara edebiyatê. Him bi halê wê yê gûşî him jî bi halê wê yê hişkirî yanê miwîjî va hatiye bilêvkin. Hêstirên çavan û lêv li libên tiriyan, tilî li gûşiyên û por jî li rezên tiriyan hatiye şibandin. Gûz û miwîj bi hev ra hatine bikaranîn û ji ber ku qafikên gûzan hişkin û nayên xwarin, bi tenê di warê tesewufê da hatiye bilêvkin.

Ji bo qeṭ‘a xerabî şîrê tîje

Wekî navê xwe ye *gûz û miwîj* e

(MS:1/4)

2.2.11.2.4. Tû

Tû, ji ber ku mêweyeke nerm û tamxweş e, di edebiyatê da li lêvên yarê hatiye şibandin.

Tû gihan e *sêv* xuyan e vê bizan e ey lebîb

Derdê zik derdek giran e pir gerîb û pir ‘ecîb

(Y:4/1)

2.2.12. Maddeyên Giranbuha

2.2.12.1. Zêr û Zîv

Di edebiyata klasîk da teswîra zêr û zîvan, cuda cuda hatiye kirin. Bedena evîndarî ya ku ji ber ‘eşqê zer bûye, bi îksîrê tê helandin û dibe zêr. Hinek caran jî têkiliya rengê rojê û

zêr bi hev ra hatine danîn û ji ber ku zêr û zîv du madenên giranbuhane, gelek tişt liwan hatine şibandin. Şêx Muşerrefî di helbestên xwe da tenê carekê peyva “zêr û zîv”ê bi karaniye û bi armanca girîngiya xwendin û nivîsandinê nîşanî feqîyan bide; xwendin û nivîsandin li zêr û zîvan şibandiye.

Ji ‘ilm ra qelem la şekke nîv e

Ji bona her kesê xeṭ **zêr** û **zîv** e

(MS:1-1/8)

2.2.12.2. Durr/Lu’lu’

Durr; yanê încî di behran da di hundirê heywana ku jê ra sedef tê gotin da çêdibe û bi girbûn û bi birqonekbûna xwe, xwe dide xuyakirin. Lu’lu’ jî tê maneya înciya herî birqonek. Di edebiyata klasîk da durr ji bo didanên yarê, xwîdana wê, xwe gihandina wê, hêstirên çavên evîndarî, helbestên helbestvan û xweşxebardanê hatiye bikaranîn. Tê gotin ku durrên herî biqîmet ji behra Âdenê tene derxistin. Ji ber vê sedemê weke durrê Âden jî tê binavkirin. Te’bîra durrê yetîm jî, ji înciya ku di hundirê sedefê da bi tenê ye û ji wê tê derxistin ra tê gotin. Te’bîra înciya dinyayê jî, ji bo Hz. Pêxemberî hatiye bikaranîn²⁴⁰.

Şêx Muşerrefî, şêxê xwe yê terîqetê li înciyan şibandiye û qedr û qîmeta wî aniye ziman:

Xezîna **durr** û elmasî

Dikî hel muşkilê asî

Wekalê Şahê Vêlasî

Meded şêx Es‘edê Sanî

(M:10/4)

Bi wan her du **durran** ewwel Hesên bû

Ḥuseyn peyve çîqa nazik beden bû

(MS:3/6)

Ez rê dikim bêntiha bêhed selamê bêbiha

Pir tazetir ji **lu’lu’an** zede ji reyhan sorgulan

(X:2/2)

2.2.12.3. Mercan û Yaqût

Di edebiyata klasîk da mercan, li devê yarê, lêvên wê û li rondikên çavên evîndarî yên ku xwîne dibarînin, hatiye şibandin. Li gorî hinek baweriyên nivîstek heye ji bo ku mirov, xweşiktir û bedewtir were xuyakirin têda dua nivîsandî ye ji wê nivîstê ra jî mercan tê gotin. Tête gotin ku rojekê cariyeyeke ku paşayî pir jê hezkiriye, miriye. Paşa, beriya definkirinê dixwaze careke din wê cariyeyê bibîne. Ew termşo, ya ku term şuştîye, di nav porê cariyeyê da nivîstekê dibîne û wê derdixe û dixwe bêrika xwe. Dema paşa tê ser cesedê cariyeyê, dibîne ku ew bedewbûna wê jê çûye û termşo jî gelek bedew bûye, ew, cariyeyê ji bîr dike û bi

²⁴⁰ Pala, 126.

termşoyê ra dizewice. Di niviştâ ku ji nav porê cariyeyê hatiye derxistin da duaya mercanan nivîsandîbûye, lewra ku ew hildabûye ser xwe û loma bedew bûye²⁴¹.

Yaqût, kevirekî gelek biqîmet e û bi rengê xwe yê sor, zer û keskesor e, sê cure ye. Yê herî biqîmet ew e yêku wek hebên hinarê sor e. Ji vî cureyî ra yaqûtê rummanî jî tê gotin.

Di edebiyata klasîk da yaqût jî wek mercanê li devê yarê, lêvên wê hatiye şibandin û li rondikên çavên evîndarî yên ku xwîne dibarînin jî hatiye şibandin.

Dema dil hey bitin ‘ezman dibêjî

Derê *mercan* û *yaqûtan* dirêjî

(MS:8/10)

2.2.12.4. Elmas

Elmas, di nava madenan da ya herî hişk e û mirov, tenê bi wê dikare caman çê bike. Ji ber ku ew, çiqas hişk e, ewqas jî zû dihele li guherandina xirabiyê bi bal rindiyê va hatiye şibandin. Di edebiyatê da elmas bi xemze, hêstirên yarê, qedeh, şûr û xencerê va hatiye şibandin.

Xezîna durr û *elmasî*

Dikî hel muşkilê asî

Wekalê Şahê Vêlasî

Meded şêx Es‘edê Sanî

(M:10/4)

2.2.13. Navên Milet û Dewletan

Di edebiyata klasîk da navên millet û dewletan li gorî taybetiyên xwe tên dayîn. Hinek caran jî navê millet û dewletan bêarmanca taybetiyên wan tên dayîn. Di helbestên Xinûkî da navê millet û dewletên derbaz dibin ev in:

2.2.13.1. Faris/Îranî

Îran, navê dewleteke qedîm e û li gorî nexşeya dinyayê li rojavayê parzemîna Asyayê cih digire û cîranên wê ji aliyê bakûr va; Azerbaycan, behra Xezerê û Turkmenistan, ji aliyê rojhilat va; Afxanistan û Pakistan, ji aliyê başûr va; Kendava Besrayê û Kuwêyt, ji aliyê rojava va; Îraq û Tirkîye ne. Di sala 1935an da navê xwe wek Îran daniye û bi eslê xwe welatê Persan e²⁴².

Taybetiyên gelê Îranê yê herî berbiçav ev e ku rewşa jinên wan gelek xirab e û ew nedane xwendin û cahil hiştine²⁴³.

²⁴¹ Pala, 306.

²⁴² Hakkı Devrim, *Axis 2000 Ansiklopedik Sözlük*, I-XII, Doğan Kitap Ankara 1999, III, 1541.

²⁴³ Aslanoğlu, r. 290.

Bi Selman ku şehabiyek *Farisî* bû
Welê me‘dûd ji nav beyta nebîbû

(MS:3/3)

Li Erdîşê li wî tozê
Di wî huzna şev û rojê
Li min kir mişlê newrozê
Li nav xelqê di *Îranî*

(M:13/6)

2.2.13.2. Îsraîliyan

Îsraîlî navê milletê Yahûdiyan e/Cihûyan e û di Quranê da wek “BenîÎsraîl” derbaz dibe. Di zimanê Îbraniyan da peyva “Îsraîl”ê tê wateya “Evdê Xwedê” û leqeba Hz. Yeqûbî ye²⁴⁴. Ji ber ku dozdeh lawên Yeqûb pêxemberî hebûne û Îbranî jî ji wan zarokan zêde bûne û li dinyayê belav bûne ji wan ra Benî Îsraîl/zarokên Îsraîliyan hatiye gotin.

Di Quranê da behsa gelek taybetiyên Îsraîliyan hatiye kirin û ya herî zêde bala mirovan dikişîne nankoriya wan ya di derheqê nîmetanda ye²⁴⁵.

Hezretî Yûsif jî te ew husnê bêhed girtibû

Hezretî Mûsa ji te bû fexrê Îsraîliyan

(Q:1/11)

2.2.13.3. Îraq

Îraq, li gorî nexşeya dinyayê li rojavayê parzemîna Asyayê cih digire û cîranên wê jî ji aliyê bakûr va; Tirkîye, ji aliyê rojhilat va; Îran, ji aliyê başûr va; Kuwêyt, Kendava Besrayê û Siûdî Erebiistan, ji aliyê rojava va jî Sûriye ye. Di edebiyata klasîk da behsa Îraqê gelek zêde tê kirin.

Kesê zana welew bimirî ji saq e

Ji navê wî tijî Şam û Îraq e

(MS:5/8)

2.2.13.4. Misir

Misir, navê dewleteke qedîm e û li gorî nexşeya dinyayê li bakûrê parzemîna Afrîqayê cih digire û cîranên wê jî ji aliyê bakûr va; Behra Reş, ji aliyê rojhilat va; Behra Sor, Urdun û Îsraîl, ji aliyê başûr va; Sûdan, ji aliyê rojava va jî Lîbya ye.

Di edebiyata klasîk da Misir, cih û warê Hz. Yûsif û Zuleyxayê ye, Hz. Yûsif li wir avêtine bîrê, li wir ketiyê zîndanê û li wir bûye sultan. Çemê Nîlê li wir diherike û qamîşê şekirî li wir heşîn dibe. Gelek caran bi navê Ken‘an, Rûm, Bexda, Şam û Hebeşê ra hatiye bikaranîn²⁴⁶.

²⁴⁴ Sûreya Alî İmranî: 3/93.

²⁴⁵ Sûreya ‘Erafê: 7/160.

²⁴⁶ Pala, 315.

Dibû sîn herdu reş çavan me tu li birî hemî gavan
Digel maî sih û tavan çi der *Misir* û çi der Şaman

(Q:7/3)

2.2.13.5. Êzidî

Êzidî, bi Xwedê bawer dikin û jê ra Yezdan/Ezdan dibêjin û ew bi pêxemberan û kitêbên pîroz jî bawer dikin. Ola Êzidiyan li ser fikra Melekê Tawis ava ye û li gorî wan di dema afirandina dinyayê da Melekê Tawis serokê melayîketan bûye û ew li ser rûyê dinê nûnerê Xwedê ye²⁴⁷. Li gorî ramana herî ber bi çav damezirînerê vê baweriyê, Şêx Adî b. Misafir (1074-1162) e û di derheqê jiyana wî da di jêderan da gelek agahî hene. Şêx Adî b. Misafir, di serê sedsala XIIan da hatiye Laleşê û li wir tekyayek vekiriyê û gelê herêmê perwerde kiriyê. Laleş, di navbera Bajarê Mûsil û Hekariyê da ye²⁴⁸.

Her wekî bab kûştîyan e
Ew ji nesla *Êzdiyan* e
Destbixûna însiyan e
Kafiran ew bit ceza ye

(M:1/5)

2.2.14. Cih û Kesayetên Çîrokî û Dîrokî

2.2.14.1. ‘Erefat

‘Erefe, diferhengê da tê maneya zanîn, naskirin, têgihîştin û bîhna xweş. Ji lêkera “‘e-re-fe”yê hatiye dariştin²⁴⁹. Navê cihekî li başûrê rojhilatê Mekkeyê ye û bi qasî 25 km jê dûr e. Cihê bi cihanîna ruknek ji ruknên hecê ye û ji bo heciyan sekinandina li ‘erefê di 9ê meha zilhicayê da piştî derketina rojê, bi qasekî demeke kurt ferz e²⁵⁰.

Li ‘Erefatê dest û rû ervaz bikim ahan bidim
Geh binalim geh bikalim ca dua meqbûl bibî

(Q:2/8)

2.2.14.2. Muzdelîfe û Mîna

Mîna, navê cihekî li nêzîkî Mekkeyê ye û jê bi qasî 4,5 km dûr e û di nav sînore Heremê da ye. Şeytanê mezin, yê navend û yê piçûk li vir e û hecî roja 10ê meha zilhicayê li vê derê şeytanî recim dikin û piştî recma şeytanî, qurbana xwe serjê dikin, rûyê xwe kur dikin û ji îhramê derdikevin²⁵¹.

²⁴⁷ Adnan Zeyan Ferhan, “Êzidilik ve Êzidi Toplum”, Uluslararası *Geçmişten Günümüze İdil Sempozyumu*, İstanbul 2011, r. 297.

²⁴⁸ Yaşar Kaplan, *Günümüz Yezidiliği*, Weş. Nûbiharê, Çapa Yekem, İstanbul 2013, r. 41.

²⁴⁹ *Qamûsu'l-MuhîT*, r. 1087.

²⁵⁰ *Dini Kavramlar Sözlüğü*, r. 27-28.

²⁵¹ *Dini Kavramlar Sözlüğü*, r. 446.

Muzdelîfe jî di sînore Heremê da ye û di navbera ‘Erefat û Mînayê da ye. Piştî weqfeya (sekinandina) li ‘Erefê, hecî têne Muzdelîfeyê û li vir disekinin û ji bo recma şeytanî, keviran berhev dikin²⁵².

Ez hucûm kim ser neyaran li *Mîna* û *Muzdelîfê*

Ca heta saqim ji wan yek qet li min peyda nebî

Q:2/9)

2.2.14.3. Şefa û Merwe

Şefa û Merwe, navê du girên piçûk in û ew li rojhilatê Ke‘beyê ne. Aniha dîwarê Mescîdu’l-Heramê xwe gîhandiye ew herdu giran. Di derheqê Şefa û Merweyê da di Quranê da ayêt hene²⁵³. Navbera herdu giran 350metre ye û di serdema hecê da hecî heft caran di navbera ev herdu giran da bilez diçin û tîn û ji ev karê hanê ra şe‘y tê gotin. Ev kara ji menasîkên hecê ye. Heft caran çûyîn û hatina bi lez di neqeba Şefa û Merweyê da ruknek ji ruknên hecê ye.

Di edebiyata klasîkda peyva “şefa”yê, gelek caran bi peyva şe‘yê ra hatiye bikaranîn²⁵⁴.

Derd û êşan û birîn xweş bin bi ava zemzemê

Ji *Şefa* û *Merwe*ê ji bo min şefa hasil bibî

(Q:2/7)

2.2.14.4. Eşhabê Kehf

Eşhabê Kehf, tê maneya hevalên şikeftê û xwedyên şikeftê. Eşhabê Kehf, navê komeke bawermendan e û ew, ji civateke nebawermend direvin û li ser çiyayekî dikevin şikeftekî. Bi navê wan di Quranê da sûreyek heye û qala çîroka wan dike²⁵⁵. Di van ayêtan da agahiyên wek ku “ew ciwanên ku xwe spartine şikeftê, bi salan di şikeftê da razane, seyê wan jî bi wan ra bûye, piştî demeke dirêj ji xewa xwe hişyar bûne û ji hev pirsîne gelo ev çiqas deme ku em razane? Yek ji wan diçe bajêr û dixwaze bi pereyê xwe yê zîv, nanî bistîne, lê ji wî ra tê gotin 309 sal inku hûn di şikeftê da razane, lê belê rastiya vê bûyerê herî baş Xwedê dizane” derbaz dibe.

Di gelek tefsîran da derbaz dibe ku ev xortê ku diçe bajêr nanî bistîne, di destê wî da pereyê zîv yê ku li ser wî, navê qiral Deqyanûsî nivîsandî bûye hebûye. Qiral Deqyanûs, kesekî nebawermend û zilimkar bûye. Civat zen dike ku vî xortî xezîneyek dîtiye û wî digirin, dibin hizûra qiralî. Lê ji ber ku gelek dem derbaz bûye û şert û merc jî hatine guherandin, qiral û civata xwe bûne xaçperest. Xort, dema bûyera ku di serê wan da derbaz bûye ji qiral û civata wî ra dibêje, qiral û civata xwe bi hev ra radibin, diçin şikeftê û bi ew xortan ra qise dikin. Piştî axaftina bi wan ra, ciwan, cara duduyan dikevin xewa mirinê û qiral jî wan di şikeftê da defin dike û li ser mezê wan mescîdê çêdike. Di Quranê da navê cihê şikeftê derbaz nabe. Ji vê bûyerê armanc ji bo roja qiyametê piştrastkirina qudreta Xwedê ye²⁵⁶.

²⁵²Dini Kavramlar Sözlüğü, r. 509.

²⁵³Sûreya Beqereyê: 2/158.

²⁵⁴Pala, 385.

²⁵⁵Sûreya Kehfê: 18/9-27.

²⁵⁶Dini Kavramlar Sözlüğü, r. 34-35.

Di edebiyata klasîk da Eşhabê Keħf û seyê wanê bi navê Qitmîr, bi rêya hunera telmîhê gelek zêde hatine bikaranîn.

Em cema‘et çûn ziyaret Hezretê *Eşhabê Keħf*

Da muradatê me pêk bîn ji himmeta *Eşhabê Keħf*

(Q:4/1)

Ey şufêr lezke tu baco bifire wek teyyareê

Da ji bera mirinê vexun em şerbeta *Eşhabê Keħf*

(Q:4/2)

2.2.14.5. Cemşîd

Cemşîd, hukumdarê çaremîn û yê herî mezin ji malbata xanedanên Pîşdadiyan e û ev malbat, li Îranê bi salan selteneta xwe berdewam kiriye. Tê gotin ku Cemşîdî, 700 salan rêveberiya mirovan, cinan û periyên kiriye û di serdema wî da dinya bi xweşî û aramî bûye. Li gorî hinek rîwayetan Cemşîd, di serdema Nûh Pêxemberî da jiyaye, tofan di serdema wî da çêbûye û bajarê Babîl û Tûsê wî ava kiriye²⁵⁷.

Cemşîd, çêkerê şerab û qedehê ye û qedehê wî ya bisêhr hebûye û dema wî li qedehê mêzekiriyê, her tişt zanîbûye²⁵⁸. Cemşîd, li gorî Zend Avestayê îlahê Hindûyan e²⁵⁹. Tê gotin ku Cemşîd, girêdayî bi baweriyaya Sabîyan bûye û ji ber vê sedemê jî ji aliyê Dehhaqî va tê kuştin û textê wî jî tê hilweşandin. Pers, wî wek kesekî dadmend, xwediyê baweriyaya yekxwedayî, xwedan xweşxûyê û mirovhez qebûl dikin²⁶⁰.

Peyva “cemşîd”î, ji bona padişahê bedew û payebilind jî hatiye bikaranîn. Di edebiyata klasîk da bi nîşana padişahî, seltenet, hêz, text û... hwd hatiye bikaranîn.

Sed wekî *Cemşîd* û Rustem westiyan e mane ew

Tu kehêl û tu xezal negîhan binî ey musteqîm

(Q:10/5)

2.2.14.6. Rustem

Rustem, qehremanek ji qehremanê Îranê ye, di Şehnameyê da pesna wî zêde tê kirin. Navê bavê wî Zal e û ew jî wek kurê xwe bi cesaret û bi gernasîya xwe bûye navdar. Tê gotin ku Rustem, gelek dêw kuştine û kesekî xwediyê bihêz û quweteke awarte bûye. Wî, gelê Îranê, gelek caran ji xetereyên mezin rizgar kiriye, çarsed salan jiyaye û di derbareyî wî da bi sedan efsane di Şehnameyê da derbaz dibin²⁶¹.

Di edebiyata klasîk da sembola tali‘, quwet û têkneçûyinê ye²⁶². Bi bisk, çav û biriyan ra wek simbol tê bikaranîn. Di edebiyata tesewufê da jî tê wateya nefsa mutmaînne, ruh û cesareta me‘newî²⁶³.

²⁵⁷ Aslanoğlu, r. 263.

²⁵⁸ Aslanoğlu, r. 263.

²⁵⁹ Pala, 86.

²⁶⁰ Nimet Yıldırım, *Fars Mitoloji Sözlüğü*, Fenomen Yayıncılık, İstanbul 2012, r.

²⁶¹ Aslanoğlu, r. 263.

²⁶² Pala, 382.

Sed wekî Cemşîd û *Rustem* westiyane mane ew

Tu kehêl û tu xezal negîhan binî ey musteqîm

(Q:10/5)

2.2.14.7. Sikender

Li gorî pisporan di dîrokê da du Sikender hene: Sikenderê yekemîn yê Yewnanî ye û yê duduyan jî Sikenderê Zu'l-Qerneyn e. Ji ber ku jiyana wan, cih û warê wan û jêhatibûna wan dişibihe hevûdin, pisporên dîroka kevn, edebiyatnas û mufessîran, ew, wek yek kes zanîbûne. Lê belê Zu'l-Qerneynê ku di Quranê da qala wî hatiye kirin²⁶⁴ û Zu'l-Qerneynê ku di çavkaniyên Yewnaniyan da wek Sikenderê Mezin (Alexander The Great) derbaz dibe têtikiya wan bi hev ra tune ye²⁶⁵.

Sikenderê Mezin, weke Îskenderê Maqedonî û Îskenderê Lenetî jî tê naskirin û ew di sedsala IIIyan ya beriya mîladê da jiyaye û li gorî Şehnameyê kurê Darabî ye û bi şahê Îranê, Darayî ra jî şer kiriye²⁶⁶. Li gorî çavkaniyên Yewnaniyan ew xwendekarê Arîstotalesî ye û ji wî hînî ziman, edebiyat, siyaset û felsefeyê bûye²⁶⁷. Li gorî çavkaniyên Îraniyan, ew dema dibe hukumdar, Arîstotalesî jî ji xwe ra dike wezîr. Di sala 334a beriya mîladê di sefera Asyayê da Anatolyayê dagir dike û di sala 333yan da jî Babîl û Persepolsê dixwe bin qontrola xwe²⁶⁸.

Sikenderê din, di Quranê da bi navê Zu'l-Qerneyn derbaz dibe, tê gotin ku ew, evdekî salih û pêxember bûye û li hember êrişên Ye'cûc û Me'cûcanbendeke mezin çêkiriye.

Di edebiyatê da zêdetir bi hunera telmîhê û bi armanca Zu'l-Qerneyn û bi gerandina wî ji bo ava heyatê, bi hevaltîya wî ya bi Xizirî ra, bi ketina wî ya welatê tarîtiyê, bi rêwîtiyên wî, bi pîrbûna leşkerên wî û bi qehremaniya wî hatiye qalkirin²⁶⁹.

Yekî got Ey *Sikender* bo çî daim

Dikî teqdîm li ser babê xwe 'alim

(MS: 1-2/7)

2.2.14.8. Ferhad û Şîrîn

Destana Ferhad û Şîrînê, destanek ji destanên beriya Îslamê ya Îranî ye û Ferhad û Şîrîn jî du lehengên ev destana evîndariyê ya binavûdeng in. Şîrîn, navê xanima Perwîzî ye û dilê Ferhadî ketiyê. Li gorî efsaneyêke din jî Şîrîn, keçeke Ermenî ye û xwenga Xatûna Ermenistanê Mehîn Banûyê ye.

Li gorî rîwayetan ji bo ku evîna xwe piştrast bike, Şîrîn ji Ferhad dixwaze ku ew ava li paş çiyê ye, bi rêya qulkirina çiyê ji wê ra bîne. Li ser daxwaza Şîrînê, Ferhad dest bi xebata qulkirina çiyê dike. Rojekê xeber ji Ferhadî ra tê ku Şîrîn miriyê û ew jî bi tevrê ku di destê wî da ye, xwe dike. Li gorî rîwayeteke din Ferhad, bi destê padîşahek ji malbata Sasaniyan bi navê Xusrewîcezayêzîndankirina li paş çiyê lê tê dayîn. Ji ber ku Ferhad, ji ber evîna Şîrînê

²⁶³ Aslanoğlu, r. 263.

²⁶⁴ Sureya Kehfê: 18/86, 94

²⁶⁵ Pala, 236.

²⁶⁶ Aslanoğlu, r. 273.

²⁶⁷ Nimet Yıldırım, r. 427.

²⁶⁸ Nimet Yıldırım, r. 428.

²⁶⁹ Nimet Yıldırım, r. 432-434.

dîn û har bûye, ew çiyayê ku ew li paş wî di zîndanêda ye, wî çiyayî qul dike û ava bi navê “Cûyî Şîr” ê tîne, tê nav bajêr²⁷⁰.

Di edebiyatê da ev çîroka hanê him ji bo mesnewiyên serbixwe him jî ji bo hinek malikan bûye mijar. Bi piranî bi qulkirina çiyayî bûye mijara edebiyatê û ji ber ku peyva “şîrîn”ê bi wateya xwe jî şîrîn û xweşik e, bi rêya hunera tewriyeyê jî hatiye hildan²⁷¹. Ji tiştên herî balkêş yên di vê çîrokê da yek jî ew e ku; ew navên di çîrokê da derbaz dibin, dibin sedema bikaranîna hunera tewriyeyê. Xusrew, bi wateya xwe ya padîshahtî û hukumdartiyê nîşana yarê û qudretê ye; Şîrîn jî bi wateya xwe ya şîrîn û xweşik, nîşaneya dev û lêvên yarê û bi xweşxeberdana xwe jî hinek caran tê wateya hêstirên çavên evîndarî²⁷².

Çira çimkî ‘îşqek bi wî ra hebû

Ne *Ferhad* ne Mecnûn wekî wî nebû

(MS:2/6)

Bi we şahî dibit qelbê hezînan

Dikim gohrê we *Şîrînan* û Zînan

(MS: 1-5/3)

2.2.14.9. Leyla û Mecnûn

Çîroka Leyla û Mecnunê, çîrokeke gelerî û serpehatiyeke evînî ye û di edebiyata Îslamê da jî bûye mijara mesnewiyên. Li gor hin gotinan ev çîroka hanê çîrokeke rasteqînî ye û lehengên wê jî lehengên rasteqînî ne. Çîrok di sedsala VIIan da di serdema Dewleta Emewiyên da di dema hukumdariya Merwan b. Hekemî (623-685) da li herêma Necdê qewimiye. Li gorî hinek rîwayetan Mecnûn, leqeba helbestvanê bi navê Qeys b. Mulewweha el-Amîrî (m. 698) ye û ev çîroka ji şîrovekirina helbestên wî derketiye. Leyla jî qîza Mehdî b. Saîd el-Emîrî ye.

Li gorî di çavkaniyan da derbaz dibe bûyer bi vî rengî derbaz bûye: Di çolên Necdê da ji êla Benu Amîr, Qeys û Leyla, di zaroktiya xwe da ji hev hez dikin. Xelkê devûdorê bi vê bûyerê dihese û gelek deng û behs tête kirin. Dayîka Leylayê ji ber ev gotinên nebaş, cezayê nederketina ji konî dide keça xwe Leylayê. Qeys, nikare yara xwe bibîne û ji ber hesreta nedîtina yarê, gelek xemgîn dibe, hiş û aqil ji serê wî diçin û derdikeve çol û çiyayan. Piştî demekê weke “mecnûn”î yanê dîn tê binavkirin. Bavê Qeysî, bi derdê kurê xwe agahdar dibe û diçe ji malbata Leylayê wê ji kurê xwe ra dixwaze. Lê ji ber ku navê Qeysî weke mecnûn hatiye belavkirin, malbat, keça xwe nade wî. Bavê Qeysî, ji bo ku kurê wî şifayê bibîne, radibe wî dibe ser Ke‘beyê. Lê Qeys li Ke‘beyê bi armanca ku evîna wî xurttir bibe duayê dike ku nexweşiya wî hîn xedartir bibe. Xwedê duaya wîqebûl dike û nexweşiya wî her diçe zêde dibe. Bavê wî bi awayekî dilşewatî vedigere mala xwe û Mecnûn jî derdikeve çol û çiyayan û dibe hevalê heywanan. Yara wî Leyla jî dest bi nivîsandina helbestên evîndariyê dike. Mîrekî Ereban, bi navê Newfelî, helbestên wê bi dest dixwe û dixwîne, dilê wî gelek pê dişewite û ji bo ku birîna wîbikewîne, radibe, diçe Leylayê ji bavê wê dixwaze. Mêze dike

²⁷⁰ Aslanoğlu, r. 282.

²⁷¹ Pala, 433.

²⁷² Pala, 153.

bavê Leylayê wê bi rindî nade, radibe leşkerên xwe kom dike û bi malbata Leylayê ra şerî dike.

Mecnûn, ewqas ji Leylayê hezdike ku naxwaze zirar bigêhêje devdora wê jî û ji bo ku malbata Leylayê di şerî da bi ser bikeve, duayê dike. Duaya wî tê qebûlîkirin û Newfel bi ser nakeve. Lê ew bi vê rewşê şanaz nabe û careke din leşkeran kom dike, diçe sermalbata Leylayê û şerî dike. Vê carê bi ser dikeve, lê ji ber bi duaya ku Mecnûnî kiriye dihese, Leylayê nagire û lêdixe diçe. Leyla bi mirovekî navê wî Îbn Selame ra dizewicîn. Ji ber ku Leyla naxwaze bi Mecnûnî ra xiyaretê bike, ji mêrê xwe ra dibeje ku ji zaroktiya min da cinek bûye evîndarê min û ji min hez dike û eger tu destê xwe bidî minev cinê min, dê me herduyan jî bikuje. Bi vî awayî mêrê xwe dixapîne û ji xwe dide dîrxistin. Piştî demekê, bi duayên Mecnûnî, mêrê Leylayê dimire. Ji ber ku Leyla azad dibe, radibe diçe çolan, li Mecnûnî digere û wî dibîne, lê ji ber ku Mecnûn, wê nasnake û naxwaze xwe bigîhîne wê wîsal çênabe. Lewra, Mecnûnî tîkiliya xwe ji dinyayê qut kiriye û ji ber ‘eşqa îlahî, dîn û har bûye. Leyla, bêhêvî ji cem wî vedigere û demeke di nav derd û kulan da jiyana xwe berdewam dike û dimire. Dema Mecnûn ev xebera bidilsoj dibihîze, direve, diçe ser gora Leylayê û ji Xwedê rica û dexaletê dike ku ruhê wî jî li wê derê bistîne. Xwedê, duaya wî qebûl dike û ruhê wî distîne û Mecnûn hetanî ruhê xwe radestdike, navê Leylayê, ji ser zar û zimanê xwe naxe.

Çîroka serpêhatiya Leyla û Mecnûnê, cara yekem bi tevahî bi terza mesnewiyê di edebiyata Farisan da ji aliyê Nizamiyê Gencewî (m. 1204) va hatiye nivîsandin. Çavkaniyên vê mesnewiyê rasterast jêderên Ereban in. Piştî Gencewî, di edebiyata Farisan, Kurdan Tirkan û Urdûyan da jî gelek mesnewî di derheqê vê mijarê da hatine nivîsandin²⁷³.

Hatiye tesbîtkirin ku di edebiyata Kurdî da hetanî niha 13 mesnewî bi mijara Leyla û Mecnûnê va hatine nivîsandin. Bo nimûne: Mela Mehmûdê Bazidî, ŞêxMuhemmed Canê Axtepî, Mela Muhemmedê Hezanî, Elî Kemal Bapîr, Hecî Ebdulfetahê Hezroyî, Mîrza Şefî‘ê Kulyayî, Xanay Qubadî û Sewadî mesnewiya Leyla û Mecnûnê bi Kurdî nivîsandine²⁷⁴

Gelek Zînan vexarin firqeta Mem

Gelek *Leylan* ji bo *Mecnûn* kirin gem

(MS:6/11)

Çira çimkî ‘işşek bi wî ra hebû

Ne Ferhad nê *Mecnûn* wekî wî nebû

(MS:2/6)

2.2.14.10. Mem û Zîn

Mem û Zîn, berhema Ehmedê Xanî ye û wî berhema xwe bi terza mesnewiyê nivîsandiye. Berhem ji 60 beşan û ji 2656 beytan pêk tê²⁷⁵. Xanî, di berhema xwe da fikrên

²⁷³ İsmail Durmuş, “Leylâ ve Mecnûn”, *Diyanet İslam Ansiklopedisi* I-XXXXIX, İstanbul 2003, XXVII, 159-160; İslam Pala, 288-290; Abdurrahman Adak, “Di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de Mesnewiyên Leyla û Mecnûnê”, *Wêje û Rexne*, J. 3, İstanbul 2014, r. 100-101.

²⁷⁴ Adak, “Di Edebiyata Kurdî ya Klasîk de Mesnewiyên Leyla û Mecnûnê”, r. 99-119.

²⁷⁵ Di derbareyî hêjmara beytan da hevdengî tune ye. Ev hejmar ya Kadri Yıldırım û ya Abdullah Yaşınî ye. İbrahim S. Işık hejmara 2633an û M. Said Ramazan el-Bûti û Selim Temo ji hejmara 2657an didin.

xwe yên di derbareyî realîteya Kurdan, civaka wan, siyaseta wan, baweriya wan, çanda wan, felsefe û tesewufa wan da aniye ziman. Wî, berhema xwe di sala 1695an da di 44 saliya xwe da qedandiye û mijara wê jî ji bûyera evîndariyê ya ku di sala 1393an da li Cizîra Botanê qewimiye, wergirtiye. Lehengên bûyerê; Mem û Zîn in. Ev destana evîndariyê beriya mîladê jî di nava gel da dihate zanîn û taybetmendiyên wê yên mîtolojîk jî hene. Xanî, ev destana evîndariyê aniye serdema xwe û bi azîneke nûjen hûnandiye û pêşkêşî gelê xwe kiriye²⁷⁶.

Bi kurtasî bûyer evha qewimiye: Çîroka Mem û Zînê, li herêma Botan, li bajarê Cizîrê derbaz dibe. Wê demê mîrê Cizîra Botanê Zeynuddîn, emîr bûye û bi navê Zîn û Stî du keçên wî hebûne. Bi navê Tacdîn kurekî wezîrê dîwana wî û bi navê Mem jî kurekî katibê dîwana wî hebûye. Di bernameyeke cejna Newrozê da Tacdîn, dibe evîndarê Stiyê û Mem jî dibe evîndarê Zînê. Tacdîn, Stiyê ji bavê wê dixwaze û pê ra dizewice. Mem jî Zînê ji Mîrî dixwaze, lê bi navê Beko dergevanekî Mîrî hebûye û ew bi gelek dek û dolaban nahêle Mîr, Zînê bide Memî. Mem û Zîn dikevin fîrquetê û rojên wan bi kul û derdan derbaz dibin. Lê herdu evîndar, bi alîkariya Tacdînî hinek caran hevûdin dibînin. Bi armanca ku Mem û Zîn bi hev ra nezewicin, Beko, Mîrî li Memî dike dijmin û herdem di derheqê Memî da, bi Mîrî ra qiseyên nebaş û nexweş dike. Beko, dixwaze evîna Mem û Zînê li pêşberî Mîrî aşkere bike û dafikekê ji Memî ra çêbike. Ji Mîrî dixwaze ku bi Memî ra kişikê bilîze û jê ra dibêje “kî bi ser neket bila ji yê din ra daxwaza dilê xwe bibêje”. Mîr vê pêşniyazê qebûl dike û bi Memî ra li ser kişikê rûdine û dest bi listikê dikin. Mem di serî da zora Mîrî dibe, Beko, bi awayekî dekûdolabî cihê Mîr û Memî diguherîne û direve diçe Zînê derdixe ber pencereyê. Dema Mem serê xwe bilind dike û Zînê dibîne, hiş û aqil ji serî diçin, di dawiya listikê da Mîr bi ser dikeve û Mem têk diçe. Mîr ji Memî dipirse dibêje de ka ji min ra daxwaza dilê xwe bibêje. Mem dibêje, Mîrê min ya ku dilê min revandiye yeke esilzade ye, keça mîran e û navê wê jî Zîn e. Gava Mîr vê gotinê dibihîze, pir hêrs dibe û ji muhafizên xwe ra dibêje wî yê hanê bikujin. Muhafiz, dema şûr û xencerên xwe dikişînin, Tacdîn û herdu birayên wî Çeko û Arif jî şûrê xwe dikişînin û xwe didin pêşiya Memî û ji Mîrî ra dibêjin hetanî ku hûn me nekujin, hûn nikarin Memî bikujin. Li ser vê bûyerê Mîr, dest û lingên Memî li qeydê dixwe û wî dişîne zîndanê. Zîn, dema vê bûyerê dibîne, dikeve û ji xwe diçe. Piştî demekê Stî tê mizgîniyê dide Zînê ku Mîrî, Mem bexşandiye. Lê belê Memî di zîndanê da ji ‘eşqa mecazî xwe gihandiye ‘eşqa îlahî û ruhê xwe teslîm kiriye. Dema Tacdîn pêdihese ku Mem di zîndanê da miriye gelek hêrs dibe û bi ew hêrsa xwe diçe Bekoyî dikuje. Zîn jî diçe ser gora Memî û şîn û giriye dike, heta ku ew jî dimire. Zînê jî tînin li kêleka Memîgor dikin û Bekoyî jî li binê lingê Mem û Zînê vedişêrin²⁷⁷.

Gelek *Zînan* vexarin firqeta *Mem*

Gelek Leylan ji bo Mecnûn kirin gem

(MS:6/11)

²⁷⁶ Mehmet Emin Bozarşlan, *Mem û Zîn*, Weş. Deng, Çapa 2yan, İstanbul 2005, r. 27

²⁷⁷ Bozarşlan, 1-30; Namık Açığöz, “Türkçe ve Kürtçe Mem u Zin ile Fuzûlî'nin Leylî vü Mecnûn Mesnevisinin Mukayesesi, *Turkish Studies International Periodical For the Languages, Literature and History of Turkish or Turkic*, Volume 2/4 Fall 2007, r. 37-38; M. Sait Özervarlı, “Hanî Şeyh Ahmed” *DİA*, b. 16, r. 32.

Ya Eba Selman ricakarî ji rebbê ‘alemê
 Ew ji bo me dîtin û şoḥbetkerem ket her demê
 Xweş biket cumle birînan def‘e ket gemê
 Ma neket wek bilbilê şeyda wekî *Zîn* û *Memê*
 Ah ser û patêk helan ji vê firqetê ah firqetê

(MX:1/8)

2.2.15. Bajar û Warên Taybet

2.2.15.1. Mekke

Bajarê Mekkeyê, dikeve bakûrê nîvgirava Erebiştanê. Dîroka bajarê Mekkeyê, digêhêje Adem Pêxember, li vê bajarê jîyan, bi hatina Hz. Îbrahîm ra destpê dike û di dîroka Îslamê da cihê wê gelek muhim e. Lewra, em dizanin ku Ke‘be, li wir e û warê Hz. Muhemmed e û cihê ferza hecê ye.

Di edebiyatê da ji ber ku Ke‘be li wir e û ew kesên ku qedr û qîmeta wan li cem bisilmanan gelek zêde ne, li wir medfûnin gelek caran hatiye bikaranîn û hinek caran jî ji bo hecê hatiye bilêvkirin. Ji ber ku Ke‘be li wir e, bi rêya hunera mecazî mursel behsa Mekkeyê hatiye kirin û hinek caran jî bi rengdêra xwe ya ‘Mukerreme’ ra hatiye bikaranîn.

Ez bi toza *Mekkê* û axa Medîne kil bikim
 Herdu çavan ca wekû çavê mi jî rohnî bibî

(Q:2/3)

2.2.15.2. Medîne/Yesrîb

Bajarê Medîneyê, dikeve rojavayê nîvgirava Erebiştanê û di herêma Hîcazê da cih digire û ji Mekkeyê jî 350km dûr e. Bajarê Mescîdu’n-Nebewî ye; yanê cihê mizgefta Hz. Pêxemberî ye, cih û warê hicretê wî ye û cihê paytexta dewleta Îslamê ya yekemîn e. Navê wê ye kevn Yesrîb e. Qebra Hz. Pêxember û gelek şehabeyan li wir e.

Di edebiyatê da ji ber ku qebra Hz. Pêxemberî li wir e û ew kesên ku qedr û qîmeta wan li cem bisilmanan gelek zêdene li wir medfûnin, gelek caran di helbestan da navê wê hatiye bilêvkirin. Ji ber ku Rewza Munewerê li wir e, bi rêya hunera mecazî mursel behsa Medîneyê hatiye kirin û hinek caran jî bi rengdêra xwe ya ‘Munewwer’ê ra hatiye bikaranîn.

Ez bi toza Mekkê û axa *Medîne* kil bikim
 Her du çavan ca wekû çavê mi jî rohnî bibî

(Q:2/3)

Çuwe *Yesrîb* ji bo derman

Eger ku Ew biket ferman

Cuwan dê ew biket hirman

Bîla îza bîla ‘esrê

(M:9/16)

2.2.15.3. Rewda Medîneyê

Rewda Medîneyê, navê cihê ku li Medîneya Munewweryê di hundirê Mescîda Nebewî da û di navbera gora Hz. Pêxember û mînbera wî da ye re, tê gotin. Lê li vir armanca Xinûkîgora Hz. Pêxemberî ye.

Baranê tehiyyatan

Ser *Rewda Medîne* bin

Hem al û eşhaban

Hem Turbeê Mewlana

(M:11/12)

2.2.15.4. Ke'be

Ke'be, peyveke Erebi ye û tê wateya tiştê ku di şiklê kûpî daye û ji peyva "ke'- be"yê hatiye dariştin û ev nav di ferhengê da tê wateya çar kenar an jî kûp²⁷⁸. Ke'be, li bajarê Mekkeyê, di hundirê Mescîdu'l-Heramê da ye. Li gorî Quranê, Ke'be, ji bo mirovatiyê di dinyayê da avahiya yekemîn e ku hatiye çêkirin²⁷⁹. Li gorî çavkaniyên Îslamê, Îbrahîm Pêxember û kurê wî Îsmâil Pêxember, bi hev ra Ke'beyê çêdikin²⁸⁰. Bisilmanan dema nimêj dikirin berê xwe didane Mescîdu'l-Eqsayê û ji piştî nazilbûna ayêta ku Xwedê ferman dike ku berê xwe bidin Mescîdu'l-Heramê û nimêj bikin, bisilman bi tevahî berê xwe didin Ke'beyê û nimêjê dikin²⁸¹.

Di edebiyatê da ji ber ku Ke'be li wir e û bisilman bi tevahî berê xwe didin wî û nimêjê dikin, gelek caran di helbestan da navê wê hatiye bilêv kirin. Ji ber ku qibleya bawermendên Îslamê ye, bi rêya hunera mecazî mursal behsa Ke'beyê hatiye kirin.

Ez bi toza *Mekkê* û axa Medîne kil bikim

Herdu çavan ca wekû çavê mi jî rohnî bibî

(Q:2/3)

Heftê caran çar kenarê *Ke'be* ê serxweş bibim

Hêstiran ez pir birêjim ca qirêj zaîl bibî

(Q:2/4)

2.2.15.5. Şam

Bajarê Şamê, paytexta dewleta Sûriyeyê ye û navê wî yê eslî Dimeşq e. Peyva "şam" ê, bi Farisî ye û tê wateya êvarê û xwarina şivê²⁸². Di helbestan da hinek caran weke "Şamî Xerîban" (êvara rebenan) hatiye bikaranîn û gelek caran jî bi hunera tewriyeyê hatiye bikaranîn. Bi peyvên Misir, Bexda, Rûm û... hwd ra di hunera tenasubê da tê bikaranîn²⁸³.

²⁷⁸ *el-Qamûsu 'l-Muhîtu*, r. 1421.

²⁷⁹ Sûreya Alî İmranî: 3/96.

²⁸⁰ Nesim Sönmez, *Cahiliye Dönemi ve Sadru'l-İslam Döneminde Hitabet*, Atatürk Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, (Têza Doxtorayê), Erzurum 2013, r. 41.

²⁸¹ Sûreya Beqereyê: 2/149.

²⁸² Hesên Enwerî, *Ferhengê Kînatê Suxen*, I-II, Weş. Kîtabxaneî Millî İnan, Tehtan 1383, II, 993.

²⁸³ Pala, 420.

Dibû sîn herdu reş çavan me tu li birî hemî gavan
Digel maî sih û tavan çi der Misir û çi der *Şaman*

(Q:7/3)

Xaşşeten Şedîqê Ekber wî şehê şahib huner
Hezretî Farûq e fettahe ‘Îraq û *Şamiyan*

(Q:1/19)

2.2.15.6. Esfehan

Bajarê Esfehanê, navê paytexta dewleta Sefewiyan e û di helbesta klasîk da bi gelek rengên wî behs lê tê kirin. Li gorî çavkaniyan “kila çavan” ya herî biqîmet ji Esfehanê derdikeve.

Esfehan, bajarekî xemilandî û avakirî ye, ji bo vê sedemê jê ra hatiye gotin “Esfehan nisfê cihan” (Esfehan, nivê cihanê ye). Ji ber ku di demên borî da li Esfehanê koşkên gelek bilind û baxçeyên xweşik hatibûne avakirin, ji wan cihan ra “Çarbax” hatiye gotin²⁸⁴.

Ger tu bikî feşsa cihan
Hetta hidûdê *Esfehan*
Yek ca tu nakî şefqetê
Ax ‘eskerî ax ‘eskerî

M:14/12)

2.2.15.7. Çerx

Çerx, navê bajarê Mewlana Ye‘qûbê Çerxî (m. 851/1447) ye û li Afxanistanê ye û girêdayî Luhûgerê ye²⁸⁵. Mewlana Ye‘qûbê Çerxî, ji mutesewufên Neqşebendiyan e. Ji ber ku Şêx Muşerref jî ji terîqeta Neqşebendiyan e, navê şêxê xwe û navê bajarê wî bi bîr aniyê.

Bi wî qutbê ku *Çerx* bajarê wî bû
Ji lew Ye‘qûbê Çerxî navê wî bû

(MS:3/3)

2.2.15.8. Maweraunehr

Maweraunehr, navê cihê ku di navbera çemê Seyhûn û Ceyhûnê da digire ra tê gotin. Îro li vî cihê dewleta Qezaxistan, Ozbekistan û Turkmenistanê heye. Bajarê Semerqend û Buxarayê li Maweraunehrê ne û ev bajarana ji bo çanda bisilmanan gelek girîng û pîrozî²⁸⁶. Ji ber ku Maweraunehr, cih û warê derketina terîqeta Neqşebendiyan e, Xinûkî, navê vî cihî di helbestên xwe da aniyê ziman.

²⁸⁴ Talât, Onay, Eski Türk Edebiyatında Mazmunlar ve İzahı, Hzl. Cemâl Kurnaz, Weş. Türkiye Diyanet Vakfı Ankara 1992, r. 100-101.

²⁸⁵ Emek Üşenmez, “XVI. Yüzyıl Doğu Türkçesi ile Yazılmış Bir Kur’an Tefsiri: Tercüme-i Tefsir-i Yakubi Çerxi (H. 993/M. 1585)”, *Uluslararası Türkçe Eğitim Kültür Dergisi*, Sayı: 3/1 s. 167-190 Türkiye, r. 168.

²⁸⁶ Usman Gazi Özgüdenli, “Maweraunehr”, *DİA*, XXVIII, r. 177.

Ji ‘Ebdilxaliqê Şêx ‘Arif û Mehmûd xudan behr in

Ji Yumna wan ‘ezîzan Maweraunnehr bû wek Tûr

(Q:3/2)

2.2.15.9. Zaxo

Zaxo, navê bajarekî Başûrê Kurdistanê ye û ji aliyê başûr va; bajarê Dihok û ji aliyê bakur va jî bajarê Şirnexê cîranê vî bajarî ne.

Şêx Muşerref, di hengama çûyîna leşkeriyê da ku naxwaze biçe leşkeriyê bike û bi qasî 4 salan diçeBaşûr li bajarê Zaxoyê bi cih dibe û navê vî bajarî di helbestên xwe da bi bîr tîne:

Li **Zaxo** hem di wê huznê

Bibûm nêzîk ji bo defnê

Suleymanê xweyî husnê

Li min kir ‘îda qurbanî

(M:13/7)

2.2.15.10. Sêrt

Sêrt, navê bajarekî kevnare ye û di nexşeya Tirkîyeyê da dikeve herêma başûrê rojhilata Anatolyayê. Ji aliyê rojhilat va; Şirnex, ji aliyê bakûr va; Êlih (Batman) û Bitlîs, ji aliyê başûr va jî Mêrdîn, cîranê vî bajarî ne. Bajarê Sêrtê ji bo Xinûkî bajarekî gelek girîng e. Çunkû ew, li vî bajarî hatiye dinê û jiyana xwe bi piranî li vî bajarî derbaz kiriye.

Piştî çendek min sefer kir çûme **Sêrt** û Tillohê

Lê dihatin çûn baran bê hesab roja li min

(Q:19/10)

2.2.15.11. Diyarbekir

Diyarbekir, navê bajarekî kevnare ye û di nexşeya Tirkîyeyê da dikeve herêma başûrê rojhilata Anatolyayê. Ji aliyê rojhilat va; Êlih (Batman), ji aliyê rojhilatê bakur va; Mûş, ji aliyê bakur va; Çewlig û Xarpêt (El-‘Ezîz), ji aliyê rojava va; Semsûr (Adiyaman) û Ruha (Ûrfa) û ji aliyê başûr va jî Mêrdîn cîranê vî bajarî ne.

Amed, ji bo herêmê û ji bo Kurdan, bajarekîbiqedr û binavûdeng e. Hezkirina vî bajarî di dilê tevahî Kurdan da heye. Cih û warekî dîrokî ye, cihê pêxemberan û sehabeyan e.

Mektûbekî mişlê nebat

Wek kehniya ava heyat

Îro di êvarê kû hat

Hat û ji **Diyarbekra** şîrîn

(M:15/5)

2.2.15.12. Erzincan

Erzincan, navê bajarekî Tirkîyeyê ye û di herêma rojhilata Anatolyayê da cih digire. Ji aliyê rojhilat va; Erzîrom, ji aliyê bakur va; Baybûrt û Gûmûşxane, ji aliyê rojava va; Sêwaz û ji aliyê başûr va; Cebaxşûr (Bîngol) û Dêrsim (Tunceli) cîranê vî bajarî ne.

Ji ber ku hevalê Xinûkî, Mela Hesên diçe li Erzincanê leşkeriya xwe dike, ew, di helbesta xwe da qala cihê wî dike:

Civata me kire kerker û avêt her yekî yek der

Melaê me kire ‘esker di iqlîmê *Ezircan*

(Q:20/6)

2.2.15.13. Tillo

Tillo, navê navçeyê bajarê Sêrtê ye û cih û warê medreseyan e. Şêx Muşerref jî bi qasî demekê çûye Tilloyê û li wir di medreseyan da ders xwendiyê û li wir bûye hevalê weke Mela Hesên û hinekên din, xwestiyê ku navê vê navçeyê bi bîr bîne:

Piştî çendek min sefer kir çûme Sêrt û *Tillohê*

Lê dihatin çûn baran bê hesab roja li min

(Q:19/10)

Ewladê gewsê uxrewî

Quṭbê zemanê *Tillowî*

Behra ‘ulûmê me‘newî

Ax ‘eskerî ax ‘eskerî

(M:14/7)

2.2.15.14. Xesxêr

Xesxêr, navçeyek ji navçeyên bajarê Sêrtê ye û di nexşeya Tirkîyeyê da dikeve herêma rojhilatê Anatolyayê. Ji aliye bakur va; navçeya Hîzan û Miksê (Bahçesaray), ji aliye rojhilat va; navçeya Şaxê (Çatak) û Êlk (Beytüşebap), ji aliye başûr va; bajarê Şirnexê û navçeya Dihê (Eruh) û ji aliye rojava jî Tillo (Aydinlar) û Kufra (Şirvan) cinarên vê navçeyê ne.

Navê vî cihê yê kevn, Berwarî an jî Xesxêr e. Piştî avakirina Komara Cumhûriyetê dibe navçe û navê wê yê fermî tê guherandin û dibe Perwarî. Xesxêr 96km ji navenda Sêrtê dûr e, di deverê çiyayî da ye û çiyayê Herekolê li vêderê ye. Vê demê 50 gund girêdayî navçeyê ne.

Şêx Muşerref, ji navçeya Xesxêrê ye û ev der cihê bav û kalên wî ye. Lewra wî, di helbestên xwe da navê navçeya xwe bi bîr aniyê.

Fêkiyê pîr û ciwan *Xesxêr* bû wî ‘eşl û mekan

Sofiyê dewr û zeman kî bi wî gera axir meqer

(Q:14/9)

2.2.15.15. Miks

Miks (Bahçesaray), navê navçeya Wanê ye û heta sala 1962yan weke bajarokê girêdayî navçeya Perwariyê ya bi bajarê Sêrtê vabûye. Paşê bi navçeya Westanê (Gevaş) ya bi bajarê Wanê va tê girêdan û di sala 1987an da bi awayekî fermî dibe navçeyê Wanê.

Miks, cihekî dîrokî û binavûdeng e, cihê Feqiyê Teyranî ye. Feqiyê Teyran, helbesta xwe ya bi navê “Ey av û av” ê li vê navçeyê li ser çemê Miksê rûniştiye û nivîsandiye. Ji ber ku Şêx Muşerref, gelek di bin bandora Feqiyê Teyranî da maye û xwestiye cih û warê wî jî bîne zimên:

Ya Eba Selman salamê mişlê çaya bin xetê
Ku bi *ava Miksê* çêbit da tamam ket lezzetê
Pir şirîntir ji hingivînê şarihê da ‘illetê
Xweş diket bêzehmetî li şuna tebîbê hikmetê
Ah ser û patêk helan ji vê firqetê ah firqetê

(MX:1/1)

2.2.15.16. Turbeya Mewlanayî

Mewlana, di sala 604/1207an da li Afxanistanê li bajarê Belxê tê dinyayê. Navê wî Muhemmed Celaleddîn e. Malbata wî di sala 609/1228an da ji Belxê koç dike û ber bi bajarê Qonyayê vatê. Di sala 625/1228an da tê û li Qonyayê cî bi cî dibe. Dema temenê Mewlanayî dibe 24 sal, bavê wî dimire û ew li şûna bavê xwe li ser postî rûdine û dest bi îrşada gelî dike. Piştî salekê Seyyîd Burhaneddîn Muheqqîq et-Tîrmîzî tê Qonyayê û Mewlana li cem wî perwerdehiya tesewufê dibîne û piştî heft salan jî jê îcazeta xelîfetiye digire. Mewlana di sala 672/1273yan da diçe ber rihma Xwedê û li bajarê Qonyayê tê definkirin²⁸⁷. Di ev malika jêrî da Xinûkî behsa Mewlana û gora wî dike.

Baranê tehiyyatan
Ser Rewda Medîne bin
Hem al û eşhaban
Hem *Turbeê Mewlana*

(M:11/12)

2.2.16. Rojên Dînî

2.2.16.1. Leyletu'l-Qedir

Qedir, tê wateya teqdîrkin, pêkarîbûn, hikm, qeza, şeref, ‘ezamet û pijikandinê²⁸⁸. Leyletu'l-Qedir jî tê wateya şeva teqdîrkinê, pêkarîbûnê, hikimdayîne, qezayê, ‘ezametê û pijikandinê. Quran, di vê şevê da nazil bûye²⁸⁹ û li gorî gelek zanayan ev şev, şeva 27ê meha Remezanê ye.

²⁸⁷ Mewlana Celaleddîn Rûmî, *Mesnevî*, (amadekar: Adnan Karaismailoğlu), I-II, Weş. Yeni Şafak, Ankara, 2004, r. 19-27.

²⁸⁸ *el-Qamûsu'l-Muhîṭ*, r. 1293-1294.

²⁸⁹ Sureya Qedrê: 97/1.

Eberre'n-nase fî'l-qewlî
 We muncîhîm lede'l-hewlî
 We î n tes'el 'enî'l-feđlî
 Fehaza *leyletu'l-qedrî*

(M:9/3)

2.2.16.2. Leyletu'l-Berat

Berat, di ferhengê da tê wateya xilasbûna jideynan, cezayan, berpirsariyan, bêfîkirin, dûrbûn û qutkirina tîkiliyan²⁹⁰. Şeva Beratê di 15yê meha Şe'banêda ye û tê wateya bersivdayîna daxwaz, lava û ricayên 'evdan li bal Xwedê. Bisilman bawer dikin ku di vê şevê da Xwedê, duaya wan qebûl dike û daxwazên wan bi cî tîne.

Hero 'îda we her şev *leyletu'l-qedrî* û *berate* bû
 Bi her saet ziyaret bû û şuhbet bû û şerbet bû

(Q:27/12)

2.2.16.3. 'Îda Qurbanê

Qurban, di ferhengê da tê wateya nêzîkbûyîna û wesîleya nêzîkbûyîna bal Xwedê va²⁹¹. Wek terîmekedînê jî tê wateya bi armanca îbadetkirinê û li gorî şert û mercên diyarkirî, serjêkirina heywana ku xwediyê xusûsiyetên taybet e²⁹².

Di edebiyatê da herî zêde bi hunera telmîhê bi bûyera Îbrahîm Pêxember û kurê wî Îsmâil Pêxemberî ra hatiye bikaranîn. Evîndar, amade^ye ku di rêya yara xwe da hezar car bibe qurban. Di tesewufê da qurban, nefis e û yê n ku nefsa xwe dikin qurban jî derwêşin²⁹³.

Li Zaxo hem di wêhuznê
 Bibûm nêzîk ji bo defnê
 Suleymanê xweyî husnê
 Li min kir *'îda qurbanî*

(M:13/7)

2.2.17. Dem û Zeman/Wext

2.2.17.1. Şev û Roj

Şev, navê dema ku roj diçe ava û tarîfî dikeve erdê hetanî dortira rojê ye. Roj jî navê dema ku roj derdikeve, hetanî diçe avayê. Bi piranî bi şevê ra hatiye berawirdkirin. Ji ber ku rengê rojê spî ye, di helbestan da pirê caran li tiştên baş û xweşik û li dijberî tiştên tarî û nebaş hatiye şibandin. Ji ber ku şev û roj, dijberî hev in, di helbestan da bi hev ra hatine bikaranîn. Di edebiyatê da porê yarê li şeva tarî hatiye şibandin. Şev, cih û warê evîndaran e ku ew, têda

²⁹⁰ *el-Qamûsu'l-Muhît*, r. 108.

²⁹¹ *el-Qamûsu'l-Muhît*, r.1299.

²⁹² *Dîni Kavramlar Sözlüğü*, r. 388.

²⁹³ Pala, 279.

dikin axîn û nalîn. Şev, hinek caran jî ji ber ku temsiliyeta tarîtiyê dike, bi mûmê ra hatiye bikaranîn.

Li Erdîşê li wê tozê

Di wî huzna *şev* û *rojê*

Li min kir mişlê newrozê

Li nav xelqê di Îranî

(M:6/3)

Çiraê dîn rêya kurt û selamet

Delîlek haziqe Şêxê ‘Îraqî

Heyîva rûhnî û *rojja* hîdayet

Tebîbek şadiq e Şêxê ‘Îraqî

(M:1/4)

Bixûnin hûn di havîn û zivistan

Nebî çêbî ji we yek *roj* û westan

(MS: 1-1)

Ezê *rojekê* çûme bagê wişal

Geram ez di wêda bi mişlê gezal

(MS: 2/ 3)

2.2.17.2. Seher/Berbang

Seher, peyveke Erebi ye û tê wateya şevborandina bêxewtiyê²⁹⁴. Dema wexta seherê, beriya derketina tavê/rojê ye û di vê demê da dibe wîçiwîça çûçikan, bayê nesîm tê, tarîti û ronahî ji hev diqetin û dua tene qebûlkin; dergehê şifayê vedibe, dert tene dermankirin û pirsgerêkên herî dijwar tene çareserkin. Dema seherê dema îbadetê ye, bangvan, bangî dide û nimêj tê kirin. Ji bo zikirkinê, dema herî xweş, dema seherê/spêdeyê ye û seher dema şikirkinê ye.

Ew bilbila şîrîn xeber

Ew tûtiya weqtê *seher*

Derman dikir qelb û ceger

Ax ‘eskerî ax ‘eskerî

(M:14/5)

2.2.17.3. Bihar

Ji ber ku demsala biharê demsala herî xweş û xweşik edi edebiyata klasîk da cihê demsala biharê, gelek girîng e. Tê zanîn ku di demsala zivistanê da ji ber sar û seqemê, gul û çiçek hişk dibin, pelên xwe diweşînin û dimirin. Di demsala biharê da jiyaneke nû destpê dike

²⁹⁴ *el-Qamûsu 'l-Muhîf*, r. 817.

û gul û çiçek ji nû va heşîn dibin; gul, lale, simbil û binefş pelên xwe vedikin û bîhnên xweş li devûdora xwe belav dikin. Yar, di vê biharê da derdikeve seyrangê. Ji ber ev sedemên xweşik, bandora biharê û mehên wê, gelek zêde li ser edebiyatê çêbûye. Ji bona biharê, teswîrên wek biriqandina rojê, herikandina çem û kaniyan, firîna perperokan, çiveçiva teyr û balindeyan, belavbûna bîhnên xweş û hatina bayê nesîm... têne bikaranîn.

Bihar, xortaniya mirovan e, bilez diçe û ji ber vê sedemê herkes, sermest e. Di demsala biharê da ewr, încî û mercanan dibarînin²⁹⁵. Di biharê da meha Nîsanê/Avrêlê, meha destfirehiyê ye û bi ewrên xwe yê dewlemend û bi barana xwe ya xweşik û bi bereketa xwe, mizgîniya biharê dide mirovan.

Hat *bihara* rast û xweş ey dil ji lew min kul neman

‘Eskerê şahî mehû kir leşkerê derd û geman

(X:3/1)

Feqî rabûn bi hev rabûn ji bo geştê bi bal deştê

Li Rûbarê di *adarê* di roja bîst û hem heştê

(X:9/2)

Weqtê min xweş qelbê min geş lêvê min beş wî geran

Her wekî *nîsan* bibî şeş kom bibin esbabê geşt

(X:1/2)

Ellahhez biket bixêr û şahîtî tu bê

Geştan û seyranan bikîn di heyva *nîsan* û *gulan*

(X:2/6)

2.2.17.4. Newroz

Newroz, tê wateya roja nû²⁹⁶ û li gorî salnameya kevn, weke Nehê (9ê) Adarê tê zanîn²⁹⁷. Li gorî salnameya Îranê Newroz, navê destpêkirina cejna serê salê ye²⁹⁸. Hinek lêkolîner dibêjin cara peşîn navê Newrozê, di çavkaniyên Persan da derbaz dibe. Hinek mîlet vê cejnê di 21ê Adarê da pîroz dikin. Cejna Newrozê; Faris, Kurd, Azerî, Tirk, Afxan, Arnawût, Gûrcî, Tirkmen, Tacîk, Ozbek, Kirxiz, Qaraqalpax û Qazax wek cejna biharê pîrozdikin²⁹⁹.

Di edebiyata klasîk da newroz, di nav taybetiyên biharê da tê nirxandin û wek cejnê tê qebûl kirin³⁰⁰. Newroz, sembola hatina biharê ye, hatina biharê jî bi vekirina pelên çiçekan tê fêmkirin.

²⁹⁵ Pala, 54-55.

²⁹⁶ Hesên Enwerî, II, 1644

²⁹⁷ Pala, 357.

²⁹⁸ Pala, 357.

²⁹⁹ Aslanoğlu, 353.

³⁰⁰ Pala, 358.

Li Erdîşê li wî tozê
Di wî huzna şev û rojê
Li min kir mişlê *newrozê*
Li nav xelqê di Îranê

(M:13/6)

2.2.18. Amûrên Muzîkê

2.2.18.1. Ney

Ney, ji gihayê bi navê qamiş tê çêkirin, dirêjahiya wê bi qasî arşinekê ye (pîvanek e ku 68 cm ye), hundirvala ye, parbipar e û li cihê avî, heşîn dibe. Li hinek deveran ji bo sergirtina xaniyan û di çêkirina xasîlan da tê bikaranîn. Wek amûreke muzîkê jî bi pifkirinê tê bikaranîn. Ev amûra hanê, di navbera Mewlewiyan da zêdetir berbelav e. Mewlana, bi helbesteke ku navê wê “Ney Name” ye dest bi Mesnewiya xwe dike û di 18 beytên serî da çîroka Ney’ê dibêje³⁰¹.

Li gorî Mewlanayî, ney, sembola însanê kamil e. Çawa ku ney ji cihê xwe yê avî tê jêkirin, ji welatê xwe cuda dibe, were jî însan, ji mekanê xwe yê îlahî dûrketiye û li gorî teceliya qedera xwe hatiye dinyayê û hesreta welatê xwe dikişîne. Lewra dinya, ji bo mumînan cihê sirgûnê û cihê azmûna tehemulkirina zor û zehmetiyan e. Însan, hinek caran bi tiştên qenc kêfxweş dibe û bi tiştên nebaş jî dikeribe û digîrî. Şîn û giriya wî, hinek caran ji ber bêhêvîtiyê ye, hinek caran jî ji hesreta welatî ye. Însan û Ney di vê xalê da xwe digîhînin hevûdin. Ji ber hesreta welatî, dengê axîn û fîxana însanî, feryad û fîxana Neyê tîne bîra mirovan³⁰². Ji Neyê newayên gelek xweşik derdikevin û ew newana nîşaneyê reqşê ne.

Ax û oxan pir dibêjim lew dinalim mişlê ney

Ahê dil çûn asîmanan babê Hifzullah meded

(Q:9/3)

2.2.18.2. ‘Erbane

‘Erbane, amûreke muzîkê ye, jê ra def jî tê gotin û ev amûr; bi çermekî li dora xelekekê ye bi zengil yan jî bi pûlê va tê girêdan. Hem mezinên wan hene û hem jî piçûkên wan.

Di edebiyata klasîk da, di nava amûrên muzîkê da derbaz dibe û temsîliyeta dilê evîndar û hinek caran jî temsîliyeta rûyê yarê dike. Sedema ku dil li ‘erbaneyê hatiye şibandin ew e ku ew, ji diltengiyên evîndarî ra tempoyê digire. Sedema ku şibandina wî li rûyê yarê jî ew e ku ‘erbane; gilover e, lewra tê zanîn ku rûyê yarê jî gilover e³⁰³.

³⁰¹ Mewlâna, I, 37.

³⁰² Gencay Zavotçu, “Ney’in Öyküsü ve Divan Şiirinde İşleniş”, *A.Ü. Türkiyat Araştırmaları Enstitüsü Dergisi*, Sayı 39, Erzurum 2009, Prof. Dr. Hüseyin Ayan Özel Sayı, pp. 719-751, r. 724.

³⁰³ Pala, 109.

Hinek dawetî bûn hinek destirîn
Li *'erbanê*hinda didan pir şirîn

(MS:2/4)

Heçî tûfî ye ew tinazan dike
Welêdana *'erbanê* jî ew dike

(MS:2/9)

BEŞA SÊYEM METNÊ HELBESTAN

3. LATÎNÎZEKIRINA METNÊ NAHELBESTAN

3.1. Danasîna Nusxeyan

Me dema dest bi xebata helbestên Şêx Mûşerref Xinûkî yên Kurdî kir, em li pey şûn û şopa nusxeyan geriyan û ev agahiyên jêrî me bi dest xistin. Dema me dest bi xebatê kir, em têgihîştin ku destxetên muellîfî bi xwe mixabin tune ne. Li gorî agahiyên ku kurê wî Ebdullah Ozcan daye me, Seydayî, nexwestiye weke dîwaneke serbixwe helbestên xwe ber hev bike. Wî hinek caran ji dost û hevalên xwe ra helbest nivîsandine û ji wan ra bi rê kiriye, lê mixabin edetekî wî tunebûye ku nusxeyekê jî li cem xwe bihêle. Di dema lêkolînê da em rastî du nusxeyan hatin ku ev herdu nusxe jî di bin qontrola muellîfî ra derbaz bûne. Em ê li xwarê di derheqê van nusxeyan da agahiyan bidin û wan bidin nasîn.

3.1.1. Nusxeya Mela Osmanî

Mela Osmanî, nusxeya xwe li ber destxetên Şêx Muşerrefî nivîsandiye û ev nusxeya hanê, me ji xwe ra weke nusxeya bingehîn girt û em li ser xebitîn. Orijinaliya vê nusxeyê li cem Şêx Muhemmed Wefayî ye û ev kesê hanê kurê Şêx Muşerrefê Xinûkî ye. Fotoqopiya vê nusxeyê me ji Prof. Dr. Îhsan Süreyya Sirmayî wergirt û dest bi xebatê kir. Îhsan Xoce, bi eslê xwe ji navçeya Berwariyê ye û dostê Şêx Muşerrefî ye. Îhsan Xoceyî, ji min ra got: Şêx Muşerrefî nedixwest helbestên wî weke pirtûkekê yan jî dîwanekê were weşandin. Ji ber ku ew zêde nefspîçûk bû û nedixwest quretî û fîz di ber wî ra derbaz bibe. Û paşê me bi Şêx Muhemmed Wefa ra têkilî danî û em gihîştin ‘eslê vê nusxeyê. Mela Osman, dema nusxeya xwe diqedîne, Xinûkî li hêj sax bûye û Mela Osman nusxeya xwe dibe nîşa seydayî dide. Ew jî di ber çavan ra derbaz dike û pesend dike. Destxet ji 456 wereqeyan pêk tê û têda him helbestên Erebi û Farisî him jî helbestên Kurdî hene û helbestek jî bi Tirkî ye.

3.1.2. Nusxeya Heşerî

Şêx Muşerref, ev nusxeya hanê, weke diyarî daye hevalekî xwe, bi navê Mela Xidir Heşerî. Fotoqopiya vê nusxeyê li cem meye û ev agahiya jorî jî li ser wereqeya yekemîn ya vê nusxeyê bi destxeta Xinûkî hatiye nivîsandin. Me fotoqopiya vê nusxeyê li cem Ebdullahê kurê Şêx Muşerrefî, , peyda kir. Me di derheqê Mela Xidirê Heşerî da agahî zêde peyda nekirin. Lewra, ev kesê hanê kî ye û li ku derê dijî, nehate sehkirin. Ev nusxe jî ji 391 wereqeyan pêk tê û ew jî weke nusxeya Mela Osmanî ji helbestên Erebi, Farisî û Kurdî pêk tê û têda helbestek jî bi Tirkî ye. Li ser nusxeyê dîroka nivîsandina wê tune ye.

3.1.3. Xebata M. Xalid Sadinî û Tehsîn Doskî

Ev xebata M. Xalid Sadinî û Tehsîn Doskî, bi navê “Şêx Muşerrefê Xinûkî û Şairên Malbata Wî” di sala 2013yan da li Dihokê ji aliyê çapxaneyê Parêzgeha Dihokê va hatiye çapkirin. Pirtûk, ji pênc beşan û destpêkekê pêk tê. Di beşa yekem da, di derheqê jînenîgariya Şêx Muşerref û malbata wî da hinek agahî hatine dayîn û di beşa duduyan da helbestên Şêx Muşerrefî yên Kurdî û Farisî bi tevlihevî hatine nivîsandin û têda helbesteke Tirkî û du helbestên Erebi jî hene. Di beşa sisêyan da helbestên Şêx Munewwerê Xinûkî di beşa çaran da helbestên Şêx Muhemed Nûriyê Xinûkî û di beşa pêncan da jî helbestên Şêx Hemdullahê Xinûkî (Belengaz) hatine dayîn. Berhem, bi elifbêya Erebi û li gorî elifbêya bikaranîna Başûriyan hatiye nivîsandin û li ser helbestan, bi tu awayî tehlîl nehatine kirin. Her çiqasî di warê rastnivîsê da hinek kêmasî hebin jî berhemeke gelek biqîmet e û me di xebata xwe da, gelek sûd jê wergirt. M. Xalit Sadinî, di ev xebata me da ji me ra gelek bûye alîkar û bi taybetî bi destxistina nusxeyan da keda wî gelek e.

3.1.4. Xebata Ebdusselam Kartal (Bêcirmanî)

Ev xebata hanê ji aliyê Ebdusselam Kartalî va bi navê “Dîwana Şêx Muşerrefê Xinûkî” bi herfên Erebi hatiye nivîsandin û di sala 2013yan da ji aliyê weşanxaneyê ‘Dua Yayincilik’ê va li Stenbolê hatiye çapkirin. Ebdusselam Kartalî jî di berhema xwe da weke nusxeyên ku li jor derbaz bûne, helbestên Xinûkî yên Erebi, Farisî û Kurdî nivîsîne. Her wiha helbesteke Tirkî jî nivîsandiyê. Di berhemê da di derheqê muellîfî da tu agahiyek nehatiye dayîn û li ser helbestên wî qet nirxandinek û şîroveyek jî nehatiye kirin. Di derbareyî rastnivîsandinê da jî gelek xeletî hene. Lê dîsan jî berhemeke xwedan qîmet e.

3.2. Rê û Rêbaza Amadekirina Helbestan

Metna helbestên Şêx Muşerrefê Xinûkî di çarçoveya ev xalên jêrî da hatiye amadekirin.

1. Di nusxeyan da helbest, bi awayekî tevlihev hatine nivîsandin, celebên helbestan, ji hev nehatine veqetandin. Ji ber ku lêkolîna me bi tenê li ser helbestên Kurdî bû û me celebên helbestên Kurdî diyar kirin û li gorî celebê wan rêzkirina/tesnîfa wan çêkir. Li gorî tespîta me, helbestên Kurdî şeş celeb in û ev celeb jî qesîde, xezel, mesnewî, murebbe‘, muxemmes û yekmalik in. Rêza metnên helbestan qesîde, xezel, mesnewî, murebbe‘, muxemmes û yekmalik in.

2. Ayêt û hevokên Erebi yên di helbestan da derbaz dibin xwar (*italik*) hatine nivîsandin û wateya wan ya Kurdî di jêrenotê da hatiye dayîn. Her weha ayêt û hedîsên di helbestan da weke îqtibas hatine wergirtin, di bin serenava îqtibasê da hatine nirxandin.

3. Di transkîrîpsiyonê da tiştên ku me li metnê zêdekirine bi kevaneka koşedar [] daye nîşandan.

4. Di nusxeyan da ji aliyê muellîf va li derkenarê wereqeyan, di derheqê helbestan da hinek agahî hatine dayîn û me ew agahî weke jêrenot nîşan dane.

5. Di latînîzekirina helbestan da elifbêya transkrîpsiyonê ya standart hatiye bikaranîn û li xwarê lîsteya herfên Erebî û muqabilên wan ên transkrîpsiyonê hatine dayîn:

s	h	z	ş	đ	ţ	z	‘	ğ
ث	ح	ذ	ص	ض	ط	ظ	ع	غ

METNÊ HELBESTAN

Qesîde

1. Ya Resûlellah

Fa‘îlatûn Fa‘îlatûn Fa‘îlatûn Fa’îlun

1

Ya Resûlellah tu yî meqşûd ji hecca hacîyan

Ya Resûlellah tu yî heq dergehê muhtaciyan

2

Her dîkî qeşta te yî gunehê mezin bêhed kirî

Her tu yî ya seyyîdê ‘alem hewara ‘aşîyan

3

Herkesê xemgîn û mehzûn dîkul û her dîl tijî

Weqtê kû bigrî rikaba te digehte şahîyan

4

Herkesê dînya fireh lê teng bûyî bêhed eger

Ew bikî qeşda te dê filhal dê xîlaş bî ji tengîyan

5

Ew feqîrê destvala bêdelîl û çare bî

Dê diwate hişk bigrî ey tu behra qenciyan

6

Yê kû dîl sohtî ji tehnan dê bikî qeşda te ew

Lew tu serkehnî bêşubhe ji bo ser kehniyan

7

Nê ji nûra te munewwer bûn e ev roj û heyiv
*Fîlheqîqet*³⁰⁴ her tu yî ronahiya ronahiyan

8

Nê ji te mewcûd bûne fîlheqîqet her du kewn
Hem ji te bîhna xwe girtin misk û biskên horiyan

9

Hezretê Adem ji cennet derket û bêçare bû
Ya Mihemmed wî bilind got heq gerande ji eşfiyan

10

Hem bi yumna te ji tofan Hezretê Nûh bû xelaş
Hem bi te ji agir xilaş bû ew reîsê enbiyan

11

Hezretê Yûsif jî te ew husnê bêhed girtibû
Hezretê Mûsa ji te bû fexrê Îsrâîliyan

12

Hezretê Eyyûb bi te heq da ji bo wî 'afiyet
Hezretê Îsa bi te ew bû mesîhek bêziyan

13

Hem Medîna te ji bera xulqa dinê meqşûd bu
Dikirin qeşda ewî Cibrîl û hem rûhaniyan

14

Sed wekî Weyselqerenî ku li dergahê te ne
Bûsedarê wî derîne Neqşî û Geylaniyan

15

Ger dinê çî bû li kizwan wê demê dî çî bibî
Weşfê te li gotin eya bînahiya bînahiyan

16

Pişti Rebbu'l-'alemîn methê te gotî der qidem
Dê çî bêjin hadisan bêzeban û bêbeyan

³⁰⁴ Bi rastî

17

Zuryeta te zuryetek pak û temîz û tahir e
Her bi wan rehîmê dîkî li îns û cînnan

18

Cumleê eşhabê te heqçen hudatê ummetin
Pir bi mal û ruh cîhad kir wan şehîd û gaziyan

19

Xaşseten Şedîqê Ekber wî şehê şahib huner
HezretêFarûq e fettahe 'Îraq û Şamiyan

20

Cami'ê Quranê zînnureynî pir feşl û heya
HezretêKerrar e wî ser 'eskerê îmaniyan

21

Hezretê'Ebba û Hemze hem Huseyn û hem Hesen
Ehlê bey'et 'eskerê herba Uhud û Bedriyan

22

Ey şehê *lewlake*³⁰⁵ men hacet di dilda bê hedin
Pir feqîrim pir dixwazim ey reîsê egniyan

23

Heq birijînî li ser te hem li ser al û şehab
Pir şelat û pir selam her şibh û her êvariyan

³⁰⁵ Ger tu nebayî

2. Kengê Ya Reb Dê Bibînim³⁰⁶

Fa'îlatûn Fa'îlatûn Fa'îlatûn Fa'îlun

1

Kengê ya Reb dê bibînim ku li min dergeh vebî
Em jî her wek van hecacan ji bo me jî ev rê vebî

2

Qeyd ûzincîrê di min bişkên ji hebsan derkevîm
Destûlingên min bi riş bin ji bo me jî destûr hebî

3

Ez bi toza Mekke û axa Medîne kil bikim
Her du çavan ca wekû çavê mi jî rohnê bibî

4

Heft caran çar kenarê Ke'beê serxweş bibim
Hêstiran ez pir birêjim ca qirêj zaîl bibî

5

Carinan qeşda berê reş kim bi keyf û lezzetan
Zahirî dev baîinî tev ca bi wî kamil bibî

6

Nuqteyek bêtin li ser min da ji şirka rehetê
Daxilî hicra Zebîhullah me jî cihkek hebî

7

Derd û êşan û birîn xweş bin bi ava zemzemê
Ji Şefa û Merweê ji bo min şefa hasil bibî

8

Li 'Erefatê dest û rû ervaz bikim ahan bidim
Geh binalim geh bikalim ca dua meqbûl bibî

³⁰⁶ Dema bavê Şêx Muşerrefî bi hinek xelkê Berwariyê va diçe hecê, Hîcazê ew ji şewqan vê helbestê dinivîse.

9

Ez hucûm kim ser neyaran li Mîna û Muzdelîfê
Ca heta saqim ji wan yek qet li min peyda nebî

10

Wan cihan yek yek bi ‘îşq û lezzetan ez bihn bikim
Ca ku rê pê tey bibî hem ca kû dil pê hey bibî

11

Cumle eczaê beden ger zahirî ger bañinî
Da bi ah û naleê ‘umrê hemî şeyqel bibî

12

“Da bi reḥmet xaneê xirbeê min te‘mîr bibî
‘Alema şurrî bi mêj û we du‘an zaîl bibî

13

Piştî wê qesda Ḥebîbullah tebîbê dilkulan
Ez bikim bazarî û lerzî ku mehder çêbibî

14

Yê ku Mekke lê mubarek bû ji yumna payê wî
Yê çî kes bigrî rikaba wî murad hasil bibî”³⁰⁷

15

Meş‘ela nûra Îlahî dergehê reḥma Xuda
Destegîrê cumle xelqan çî welî û çî nebî

16

Yê ku Geylanî û Rifa‘î û Weyselqerenî
Ji xidmeta dergahê wî her yek tekê ‘alem dibî

17

Cibraîl û çend ruḥ anî jî bera xelqa dinê
Dikirin qesta Medîna wî ku Reb razî bibî

18

Kengê ya Reb wê derîzana mezin dê bihn bikim
Ev dil bêḥaşil min ta ebed serxweş bibî

³⁰⁷ Ev her sê malikên di nav dunikê da ne yên bavê min Şêx Es‘edê Sanî ne. Rehma Xwedê Teala lê be û cezayê xêrê bidê.[Şêx Muşerref]

19

Li Rewzeê yan e Uhud yan e Quba û ya beqî‘
Yek bi yek qelbê xwe pê derman bikem raħet bibî

20

Ya Resûlellah meded destêm bigir û min bikêş
Ger tu himmet kî kesê çendan kû dûr nêzîk dibî

21

Ya Resulellahî ger nalaiqim tu laiqî
Ger li nalaiq nezerkî wê demê laiq dibî

22

Şed selat şed selam li Rewza te bin ya seyyîdî
Al û eşhab hem di gel bin hem kesê ji benda te bî

3. Nebî Şiddîq û Selman³⁰⁸

Mefa'îlun Mefa'îlun Mefa'îlun Mefa'îlun

1

Nebî Siddîq û Selman Qasim û hem Ce'fer û Teyfûr
Di piştî Bul Hesên hat bû 'Elî û Yûsifê pirnûr

2

Ji 'Ebdilxaliqê Şêx 'Arif û Mehmûd xudan behrin
Ji Yumna wan 'ezîzan Maweraunnehr bû wek Tûr

3

'Elî Baba Kelalê Neqşebend û Şêx 'Elaeddîn
Di pê Ye'qûbê ÇerxîXaceê Ehrarî bû meşhûr

4

Mihemmed Zahid û Derwêş MihemmedXacekî baqî
Muceddîd 'urwetu'l-wusqa û Seyfeddîn û Seyyîdnûr

5

Ĥebîbullahê Mezher Şah û 'Ebdullah Şêxê min
Ji yumna wan ji mi ra bû wek subê 'îydê şeva deycûr

6

Diyauddîn Sîraceddîn Ĝiyaseddîn Kemaleddîn
Bi heqqê wan dilê min ke îlahî Tahîr û Meşhûr

³⁰⁸ Ev helbesta bi 'eslê xwe ya Mela Xalidê Şehrezorî ye û wî ew bi Farisî nivîsandî ye û min ew bi xwe wergerandiye Kurdî. [Şêx Muşerref]

4. Em Cema‘et Çûn³⁰⁹

Fa’îlatûn Fa’îlatûn Fa’îlatûn Fa’îlun

1

Em cema‘et çûn ziyaret Hezretê Eşşabi Kehf
Da muradatê me pêk bên ji himmeta EşşabiKehf

2

Ey şufêr lezke tu baco bifire wek teyyareê
Da ji bera mirinê vexun em şerbeta Eşşabi Kehf

3

Ey hevalan hoşyar bin hûn dilan hazir bikin
Hûn hemî bîra xwe bînin qîşta Eşşabi Kehf

4

Dergehê dil hûn vekin da dil bi wan ronî bibî
Hûn bi can û dil bizanin hûrmeta Eşşabi Kehf

5

Ey Xuda ji bo toleê wan tu me van bêçareyan
Tu qebûlkî ji bo me ra wê de‘weta Eşşabê Kehf

6

Ya îlahî tu bi rehma xwe ji me ra ihsan bikî
Tiştêkî hindik îlahî ji ni‘meta Eşşabi Kehf

7

Ey dilê napak tu bigrî tu bi can zarî bike
Lew her ro naê bi dest te firseta Eşşabi Kehf

8

Lêbelê ey dil tu nabî pak û zana carekî
Dê çewan îro tu bighê lezzeta Eşşabi Kehf

³⁰⁹Ev helbesta hanê di roja pêncşembê di sala 1383/1963yan da di çûyina ziyareta ser Eshabê Kehf da hatiye nivîsandin.[Şêx Muşerref]

9

Ya Îlahî em nezanîn lê tu xwey pir rehetmet î
Tu me destvala neşîne ji dewleta Eşhabi Kehf

10

Pir şelat û pir selaman tu bide rewda Resûl
Hem li ser eşhab û alan hem li ser Eşhabi Kehf

5. Gelek Şukrê Dikin Em Ya Îlahî³¹⁰

Mefa'îlun Mefa'îlun Fe'ûlun

1

Gelek şukrê dikin em ya îlahî
Çiqa xweş hakim û xweş padişahî

2

Ji bo feqla te ra nînin xelaşî
Ji ihsana te ra nînin tenahî

3

Heyat û lezzeta şahibdilan e
Munacata te der weqt û tenahî

4

Şeraba te carek kesê binoşî
Dê bifroşî du konan û bigahî

5

Di sê zî'l-qa' de yekşenba mubarek
Te ihsan kir ji bo me kêf û şahî

6

Di hezar û sê sed û heştê û çarî
Li me nî'met te barandin ji şahî

7

Ûfalek te ji bona me keremkir
Bi rehîma xwe di pêşya nîvroğahî

³¹⁰ Min ev helbesta di sala 1384/1964an da dema Xwedê Teala kurek da min, nivîsand. [Şêx Muşerref]

8

Ji hifza xwe Xuda her wî lîbas ke
Muṭehher ke ji exlaqê menahî

9

Ji nura Şêx Fehîm bêmuşabih
Di qelbê wî tamam ke roşinahî

10

Du‘aê cumle bapîran ji bo wî
Bi luṭfa xwe rengîn gulahî

11

Bibarîne şelatan û selaman
Xuda rebbê li wî muḥkem penahî

12

Ewî şemsu duha hem al û şehaban
Di her êvarê û şubhegahî

13

Tu caran me ji wan dûr nêxe yar reb
Bi yumna wan bide me îmanî

6. ‘Aferîn ey Nazim û Asim

Fa‘îlatun Fa‘îlatun Fa‘îlatun Fa‘îlun

1

‘Aferîn ey Nazim û ‘Aşim hezar car ‘aferîn
Her bi keyf û şahiyan bin dûr ji her huzn û girîn

2

Her di hifza zu’l-celal da bin ji kullê afetan
Hûn bibin melhem ji bona qelbê pir derd û birîn

3

Heq ji bona we kerem kit edeb û ‘îlm û qelem
Da wekî bagê gulan bin her wekî hingivîn şirîn

4

Mîn ku seş kir hûn bi hevra hatine sunnetkirin
Bênihayet ez muferreḥ bûm gemê min tev firîn

5

Şed emanet hûn ji îro paş nivêjan taze kin
Hem bikin hifza libasan terk bikin yek car qirîn

6

Ya îlahî tu me îşlah ke di her weqt û zeman
Tu keremkar û ‘efûkarî Xuda em şakirin

7. Eya Sebra Me Pismaman³¹¹**Mefa'îlun Mefa'îlun Mefa'îlun Mefa'îlun**

1

Eya şebra me pismaman şifaa derd û esqaman
Dişînim her şub û şaman selamê şaf wekî caman

2

Li ser teyyariya 'işqê di zerfa mehbet û şewqê
Bi xetî katibê zewqê hilînî cumle xweş tîman

3

Dibû sîn her du reş çavan me tu li birî hemî gavan
Digel maî sih û tîvan çî der Misir û çî der Şaman

4

Tu caran em te bernadîn ji bîr nakin te yek carê
Ji bo te her du'açîne di şevan û di eyyaman

5

Temamê miletê yaran bişahîne wekî caran
Du'ayan hem dîkin şaran dîkin pê def'ê alaman

6

Mela 'Ebdulhemîd û Behaeddîn û cumleê feqyan
Dîkin teqdîm du şed weqyan selam û 'îz û îkraman

7

Kesê 'aqil diket şebrê di weqtê tengî û 'eczan
Ji geyrî şebrê nînin çareê ehzanê eqwaman

8

Heqîqet cînsê însanî li ku bî 'eskerek tam e
Ji *tehte'l-emrî* dernabî li bal eşhabê efhaman

³¹¹ Min ev helbest di dema pismamê min Mizeffer çûye 'eskeriyê ji bona wî nivîsandiye. [Şêx Muşerref]

9

Welakîn lezzet û cewra dinê domî nehîn jêra
Muhimme ‘eyşê erwağan menêre şe’nê ecnasan

10

Ji bona seyyîdê ‘alem digel alan û eşhaban
Şelat û hem selam pêra du‘a û şebrê pismaman

8. Tehliya Hicra Hebîban

Fa'îlatûn Fa'îlatûn Fa'îlatûn Fa'îlun

1

Tehliya hicra hebîban her Xuda zanî tenê
Kes nizanîtin beyan kit ne bi qelem ne bigotinê

2

Ez nikarim qet ku halê firqetê tefşîl bikim
Herwekî zeytê li yekî kin paşê agir berdinê

3

Şerha eḫwalê fîraqê muxteşer nînin bizan
Belkî sed eṭwel muṭewwel qet nika şerḫ dinê

4

Ḥeq dizanîtin Eba Selman peşîman pîr bibûm
Hem perişan hem bi îşan weqtê xaṭîrxwestinê

5

Min digota dê biçim da xan û manan çêbikim
Dil digota xan û manan jehr û janan bêxinê

6

Min digota hal û mal ey dil dixazî ez biçim
Dil digota hal û malan mah û salan piş dinê

7

Min digota bi xaṭîrê we dil digo naîm bizan
Ez nikarim qet cuda bim ya qebûl kim sohtinê

8

Wesselam ez hatim û dil ma di bagê weşletê
Ez cuda bûm dil bi kul ma di wî xweş gulşenê

9

Bêdilan ey 'aqîlan qet hûn nebên rahet he ye
Her şewaṭ û agir e berq û birûsk her dinê

10

Ey muslumanan bikin rehmê li halê bêdilan
Hem du'an bêjin gelek der zahir der batinê

11

Ey Xuda ya dil bişîne ya me jî waşil bike
Min ji bo hicran nîne taqeta hilgirtinê

9. Pir Birîndar û ‘Elîlim

Fa’îlatûn Fa’îlatûn Fa’îlatûn Fa’îlun

1

Pir birîndar û ‘elîlim Babê Hifzullah meded
Bêhekîm û bêdelîlim Babê Hifzullah meded

2

Cism û can tevda fena çûn şewutîn qelb û ceger
Hêstirê xûn wek cewan tên Babê Hifzullah meded

3

Ax û oxan pir dibêjim lew dinalim mişlê ney
Ahê dil çûn asîmanan Babê Hifzullah meded

4

Pir fihêtkar û qebahetkar û rûreş şermezar
Bêhisab jar û giranbar Babê Hifzullah meded

5

Cumle ‘alem şa û şatîr çun gîhane meqşedan
Ez ji hemyan mame mehrûm Babê Hifzullah meded

6

Dê cewan şabî kesê nefsek wekî ya min hebî
Zalim û geddardar û serxweş Babê Hifzullah meded

7

Daima dinya li bîrê û ew ji bo dinya esîr
Carekî hişyar nabî Babê Hifzullah meded

8

Qet tu caran ew xerabhal nake fikra axretê
Destvala ma ji hevalan Babê Hifzullah meded

9

Derheqê xêran nehişyar lê di weqtê gunehan
Ew qewî hişyar û hazir Babê Hifzullah meded

10

Pir ji bona gunehan hosta welê bo qenciyan
Pir biwestî qet nehosta Babê Hifzullah meded

11

Pir dikim zarî ji rehîma heq ku wî îşlah biket
Rahete tişta ku hesket Babê Hifzullah meded

12

Hem dikim hêvî dilo pak ji feyda Şahê Neqşebend
Ew li vê nefse birêjî Babê Hifzullah meded

13

Yek dilop kerbê ji feyda şah ew e dermanê ah
Cumle ‘illet xweş dibin pê Babê Hifzullah meded

14

Babê Hifzullah meded ey şêxê dilrehnî meded
Nuqtekî daxwaz dikim ez Babê Hifzullah meded

15

Bit li ser rewşa mubarek hem li etba‘an tamam
Hem li ser Şêx Es‘edê Sanî şelatê bê‘eded

10. Ey Gula Arwasiyan³¹²

Fa'îlatûn Fa'îlatûn Fa'îlatûn Fa'îlun

1

Ey gula Arwasiyan wey zadeê Seyyîd Fehîm
 Ey Kerîm Îbnu'l-Kerîm Îbnu'l-Kerîm Îbnu'l-Kerîm

2

Ey binefşa bagê Zehra sosina bagê 'Elî
 Ez xezîna Hezretê Muxtarî tu durrek yetîm

3

Ey rihana xweş gulistana ewî Şahê Huseyn
 Pederê tu li Medîne bûye mêhvanê muqîm

4

Ey **Muşerref** beske garan were rahet rûne tu
 Qore hespê te xelas nake ewê deşta 'ezîm³¹³

5

Sed wekî Cemşîd û Rustem westiyan e mane ew
 Tu kehêl û tu xezal negîhan binî ey musteqîm

6

Tu dikarî tu ji kehêlan û xezalan zêde kî³¹⁴
 Rehberê xwe ger bikî nîsbeta Seyyîd Fehîm

7

Ez dişînim pir selamê taze û xûb û şîrîn
 Da bi wan hadir şifa bin can weya cismê 'ezîm

8

Radimûsim her du çavan jê gulavan bihn dikim
 Radimûsim pir bi şewq wan destê wek armûşên sîm

³¹² Ev helbesta hanê ji bo Seyîd Muhemmed Racî kurê Muhemmed Salihê kurê Seyîd Fehîmê Arwasî hatiye nivîsandin. [Şêx Muşerref]

³¹³ Armanc ji Deşta 'Ezîm pesn û menaqibên malbata cenabê pêxember e. [Şêx Muşerref]

³¹⁴ Yanê di vê meydana berfireh da tu dikarî jê derbas bibî. [Şêx Muşerref]

9

Heq ji bo te rahetek tam ez kerem ihsan bike
Ji te ra çêket kirasek ji ewê luţfa ‘ezîm

10

Cumle sadatê li ho destê ewan maçû dikem
Hem selaman rêdikem her ez digel baê nesîm

11

Kaxiza we hat me xwend pê cism û can rahet kirin
Ew ji bo me bû muheqqeq herwekî Lûqman Hekîm

12

Cennetê hem Nazim û Asim digel dayka xwe ew
Pir selam û hurmetan dêjin digel vînek şemîm

13

Herwekî bapîr û baban me ji xwe mehcûr nekin
Daima bîra xwe bînin ‘adeta hubba qedîm

14

Heq dizanî daimu’l-ewqat di dil her hazirin
Bi xeyala we dikim ruhnî rêya pirtirs û bîm³¹⁵

15

Nîsbeta we ji me ra gelehek bilind û muhkem e
Nagihête me belaê dunyeê û *narê cehîm*³¹⁶

16

Bê li ser rewşa mubarek hem digel al û şehab
Sed şelat û sed selam bîn ji Xuda rebbê rehîm

³¹⁵“Bîm” peyveke farisî ye û wateya wê tirs e.

³¹⁶ Agirê dojhê.

11. Gelî Yaran

Mefa'îlun Mefa'îlun Mefa'îlun Mefa'îlun

1

Gelî yaran wekî caran şifa kin me birîndaran
Bi bejnê xwe dilan geş kin guhan xweş kin bi eş'aran

2

Wekî salan li havalan bipirsin keyf û ehwalan
Me van dalan wekî zalan hisab kin weqtê hijmaran³¹⁷

3

Werin dîsa me îhya kin bideng û bejn û balan
Ji nûve hûn ciwan kin ey gelî yaran me îxtiyaran

4

Ne hûn zanin ku em daim bi bal lufta we çavnêrîn
Nezerdarin li sêva tehl di piştî nîvro û êvaran

5

Me hûn rûh û heyatin her evê nuktê bizanin her
Heqîqet nuktezanin hûn gelî yaran û hişyaran

6

Belê em 'aşiq û jarîn û hûn ma'sûq û nazdarin
Welê bilbil dikir gulgul dibit gulşahê eqtaran

7

Civata we temamiyle şerîf û hem şeref ehlin
Biwan hûn me muşerref kin nekin mehrûm tu Rûbaran

8

Emekdarê ji mêjîn em wefakarîn fedakar în
Wefakarê weha kê in nekin terka wefakaran

9

Nebên em ehlê şerhan in û hûn kurmancê gundî ne
Ji meşûlatê gundan tê muheqqeq rizqê bajararan

³¹⁷ Li gorî hisaba ebcedê hejmara herfa “dal”ê çar e û ya “zal”ê jî heft sed e.

10

Nebêjin hûn qewî şûrin te'ma bêşorî namînî

Ne hûn şahib îşaratin binêre lefzeê karan

11

Şelat û hem selam her dem li ruhê Babê Fatmaê

Digel al û eşhaban digel yar û emekdaran

12. Ey Melaê Serhilî³¹⁸

Fa'îlatûn Fa'îlatûn Fa'îlatûn Fa'îlun

1

Ey ji Melaê Serhilî ey fend û fanûsa gelî
Tu bi min şahibdilî hem ey Melaê Serhilî

2

Tu di bostanê 'îbaret xweş rihan û sorgulî
Kakilek bêtovilî tu ey Melaê Serhilî

3

Sed selamê wek binefşan taze û re'na û nexiş
Ez ji bona te dişînim ey Melaê Serhilî

4

Ey mela nehwêd û du³¹⁹ kor bit bite çavê 'edû
Hêviya me her du'a ne ey Melaê Serhilî

5

Ey çil û sîh yek³²⁰ tu caran terkê eħbaban medar
Ne di êvar û ne şibhan ey Melaê Serhilî

6

Her dema bîra xwe bibînî Şêx Celaleddînî yan
Şêxekî dî min li bîr be ey Melaê Serhilî

7

Min tu meqbûlî çira lew tu ji bo min qabilî
Merhema qelbê kolî tu ey Melaê Serhilî

8

Tu ne wek min cildirêjî dilqirêjî ey mela
Hem ne wek min pir dibêjî ey Melaê Serhilî

³¹⁸ Ev helbesta hanê di sala 1382/1962yan da di derbareyî Mela Muhammedê Serhil da hatiye nivîsandin.[Şêx Muşerref]. Serhilî yan jî Serhêl gundek ji gundên devera Berwariyê ye.

³¹⁹ Nod û du li gorî hisaba ebcedê hejmara navê Muhammedî ye.

³²⁰ Çil û sîh û yek li gorî hisaba ebcedê hejmara sala ku dibine mela (m-l-e) ye.

9

‘İlmê cil qeṭ faîde nade mu‘teber ‘ilmê dil e
‘Îlmê dil nûra Xuda ye ey Melaê Serhilî

10

‘Îlmê cil ‘ilmê devan e ‘ilmê dil ‘ilmê şevan e
‘Îlmê şevan pir şîrîn e ey Melaê Serhilî

11

‘Îlmê cil axir diket wêran û axur çêdiket
Ehê axur her xerîn³²¹ ew ey Melaê Serhilî

12

Ey melaê rihspî û serspî û dilspî
Pir delal û xweş hevalî ey Melaê Serhilî

13

Min divêtin ez digel te pir xeberdim lê yekin
Pir xeberdan derbederdan ey Melaê Serhilî

14

Heq tu ca destê me dûr nexî ji dawa haşimî
Hem ji dawa neqşebendan ey Melaê Serhilî

15

Pir şelat û pir selam dêjim ji bo rewça nebî
Hem ji bo eşhab û alan ey Melaê Serhilî

³²¹“Xer” di farisî da tê wateya kerê.

13. Ela Ey Bedredîn³²²

Mefa'îlun Mefa'îlun Fe'ûlun

1

Ela ey Bedredîn nûra du çavan
Bi min nav şîrîntir ji navan

2

Dişînim ez tijî gelê Xinûkî
Ji bona te gelek şîrîn silavan

3

Dikem pirsra te daim tu ji qelban
Cuda nabî tu caran û tu gavan

4

Du'açî me ji bona te bizane
Bi te derman dikem cism û hinavan

5

Gelek mehbûb û nazîdar û şîrîn e
Kesê ronî li cih bapîr û bavan

6

Welê şert e li terîqa wan biçit ew
Ku jê bêtin qewî bihna gulavan

7

Cihê baban rêya baban ji kêra
Muyesser bin dibête mişlê zavan

8

Nebêje ey bira min kême xwendin
Qe 'Emr û Zeyd qe nabêjin tu xavan

9

Kesê exlaqê wî baş bin bizane
Li nav xelqê dibête wek xoşavan

³²² Ev helbest di derbareyî Mela Bedreddînê Kurê Mela Muhemmed derwêşê Tilloyê da hatiye nivîsandin.[Şêx Muşerref]

10

Kesê exlaqê muţehher bin şîrîn e
Çi ser xalîçan bî yan kulavan

11

Yekê ji exlaqê baban e îdare
Digel her kes çî ağa bî çî gavan

12

Tu caran guh nede qewlê xiraban
Tu caran guh nede ‘aqlbelavan

13

Îta‘et ke ji bo emran dewamî
Bila izin ji sihê qeţ neçite tavan

14

Eger xweş bû dinê werne li ba me
Ku em çêkin gelek seyran û ravan

15

Ji bo rewça Medîne û al û şehaban
Şelat û hem selam wek qeţrê avan

14. Min Hebû Xweş Tûtiyek³²³

Fa‘latun Fa‘latun Fa‘latun Fa‘îlun

1

Min hebû xweş tûtiyek şîrîn kelam û xweş xeber
Her dema ku qişşe bikra xweş dikir yûz bîn zerer

2

Tûtiyek rengîn nekir her jê dihat qend û şeker
Daima derman dikir wî derd û êşanê cîger

3

Tûtiyek xweşhîs û dengqamet ewî pir şoxûşeng
Tûtiyek bû zuhrereng teb‘et melek bûne beşer

4

*Ehsene’l-lahû tebareke*³²⁴ ji sirra vê tûtiyê
Zahirî ger çi qemer bu baînin bû wek qemer³²⁵

5

Tûtiyek bêhed emekdar û wefakar her demek
‘Eşq û şewqa wî gelek bû mişlê fanûs û fener

6

Derheqê min pir evîn bû destekî şahîcivîn
Hem hebûb û xemrevîn eş‘ar hemî yekcar jiber

7

Her dema dilkul bûma yan çavê min ku şil bûya
Sa‘eta min ew bidiya xewş dibû huzn û keder

8

Tûtiyê bapîr û baban teyrê goyayê şewab
Bêcewab û bêkitabî çêdibû jê xweş eser

³²³ Ev helbest di derbareyî Mela Abdullahê Kodikî da hatiye nivîsandin. Ew li gundê Kîbê di sala 1382/1962yan da çûye ber rihma Xwedê.[Şêx Muşerref]

³²⁴ Vêca Xwedê pîroz û bilind e ku ew xweşiktirînê afirînêran e.

³²⁵“Qemer” navê rengêkî ji rengan e.

9

Fêkiyê pîr û ciwan Xesxêr bo wî 'eşl û mekan
Sofiyê dewr û zeman kî bi wî gera axir meqer

10

Sed hezar heyfan dibêjim ah û efğanê dirêj
Tûtîya min kirye nêçîr îro şehbazê qeder

11

Bû di sala sê sed û heştê û du piştî hezaran
Çardehê zu'l-qa' de da vê tûtîyê min kir sefer

12

Ya Xuda baranê rehmê daima li ser tûtî bî
Tu birêje wî bike haval ji bo pêxember

13

Kî du sê îxlas û *lahewlan* û hem û him ummu'l-kîtab
Hedye kit bo tûtîya min rebbê heq lê kit nezer

15. Ey Emekdarê Zerîf³²⁶

Fa'îlatûn Fa'îlatûn Fa'îlatûn Fa'îlun

1

Ey emekdarê zerîf ey muxlişê yarê leîf
 Ey wefakarê nezîf ey dost û ey Hacı Şerîf

2

Sed hezar barê selaman ez dişînim şubh û şam
 Lê ji bona we temaman pêkve ey Hacı Şerîf

3

Ez du'ayan her dibêjim hûn ji dil dernakevin
 Qet qebûl nake nişaf terka we ey Hacı Şerîf

4

Hûn jî her weqtê du'ayan min li bîr bin eşşehê
 Ev du'a şîrê musulmanan e ey Hacı Şerîf

5

Bedreddîn jî pir selaman pir du'ayan her dike
 Du hevalê pir delal in em eya Hacı Şerîf

6

Ey gelî ewladê sofî Abdurrehman Muşterî
 'Îda we hemûyan mubarek bin eya Hacı Şerîf

7

Piştî çend rojek dê bê rojek ji şerqê derkevî³²⁷
 Bê bibî mihvan li mala we eya Hacı Şerîf

8

Hem dê bêtin piştî çend rojek ji alê megrîbê
 Bedr û necmek bîn bibin mihvanê we ey Hacı Şerîf

9

Sed şelat û sed selam dêjim ji bo rewşa şîrîn
 Hem ji bo eşhab û alan cumle ey Hacı Şerîf

³²⁶ Ev helbest di derbareyî Hacı Şerîfê Muşterî da hatiye nivîsandin. [Şêx Muşerref]

³²⁷ Di vir da Xinûkî qesta xwe dike û ew dê here bibe mihvanê Hacı Şerîfî.

16. Ey Biraê Min ‘Ubeyd

Fa’îlatûn Fa’îlatûn Fa’îlatûn Fa’îlun

1

Ey biraê min ‘Ubeyd ey raĥeta qelb û dilan
Ey binefş û wey riĥan wey nûgula baġê gulan

2

Sed selam wek riĥanan bibne dermanê riĥan
Wek gulan emma nemexşûş bi adar û gulan

3

Her du şadê reşbelek wan her du nûneynê helek
Jorve wê deşta fireh pê wan dikim dermanê gulan

4

Yek bi yek maçû dikem ez pir bi şewq û pir bi zewq
Wek yekî koçer bixut ew hingivîn û kakilan

5

Sed hezar caran li te ev ‘îd mubarek bit bira
Dûr biket xaliq ji te derdan û êşan û belan

6

Min ku seh kir tu li Xinûkî rohnî ye hucre bi te
Xizmeta şehra mubarek tu dikî wek ‘aqilan

7

Pir muferreĥ bûm dilê min rabû herwek serxoşan
Qêr kire şî‘r û qeşîdan gulgulî wek bilbilan

8

Lew me tebrîk şand ji bo te qet ji bo kes me neşand
Kî wekalê kamilan bî ew dibîte ji kamilan

9

Rewneqa her kes ew e ku ew li cihê babê xwe bî
Ne bihulû bûn û bi pirçik yan bi eşlik yan şalan

10

Ger li vî halî dewam kî terk nekî vê xizmetê
Dê bikem qurban û heyrana te Rûbar Serhilan

11

Kî li cihê zanan da rûnê dê yeqîn zana bî
Kî ji wan dûr bî welew paşa bî dibîte ji cahilan

12

Destê bab çavê hifz maçî dikeyn ez Bedredîn
Pur selaman em dibêjin ji bo tamam daxilan

13

Ya îlahî tu min û cumle biran xasima ‘Ubeyd
Pir şîrîn kî tu nekî me tehl û tîrş wek tovilan

14

Hem wekî baran şelatan tu bide rewda resûl
Hem digel eşhab û alan hem tamam şahibdilan

17. Sed Selam û Hurmetê

Fa'îlatûn Fa'îlatûn Fa'îlatûn Fa'îlun

1

Sed selam û hurmetê min ji bona sadatê Berok
Bi temami çî jin û mêr û çî mazin çî piçûk

2

Heq dizanî ez dikim qurban û heyrana ewan
Sed wekî Rûbar û Serhêl Rebenok û Kêverok³²⁸

3

Hûn gulê bagê hebîbê Rebbê 'erşin hûn hemî
Yê ku tu li dergêhê wî ne hemî ehlê silûk

4

Hûn bih û sêvin ji dara Şehsiwarê Duldulê
Yê ji yumna zulfîqara wî xweşin bajar û sûk

5

Hûn ji miska Hezretê Zehraê bihnek pir xweşin
Sed xwelî bêtin li ser bihna xweşa zava û bûk

6

Hûn hemî ehlê Berok ewladê Hacı Qasim
Wî şehê 'alî cenab wî hakimê mîr û milûk

7

Hûn hemî tevda Berokî mişlê zêrê xalisin
Nîne qe'îyyen ji we yek naqîş weya neçirûk

8

Lêbelê emma divêtin hûn riya baban biçin
Hûn gelek taze bizanin hürmeta erdê Berok

9

Heq ji bo bapîrê we rêket şelatan û selam
Hem ji bo al û şehab sed car tijî gelê Xinûk

³²⁸ Berok, Rûbar, Serhêl, Rebenok û Kêverok navên hinek gundên devera Berwariyê ne.

18. Bi Min Urfe Gelek Xûb û Şîrîn e

Mefa'îlun Mefa'îlun Fe'ûlun

1

Bi min Urfe gelek xûb û şîrîn e
Li ba min her wekî cennat e Urfe

2

Li urfê xweş dibin derd û birîn e
Heqîqet mecme'ê lezzat e Urfe

3

Veke çava li dergahî nezer ke
Dibê tu fehm bikî me'nayê Urfe

4

Li ser wan cami' û hucran gezer ke
Bizanibe rutbeê 'ulyayê Urfe

5

Yeqînen weqtekî ezher şifet bû
Rîcalu'l-lah dibûn mecmu' li Urfe

6

Mekanê ruşt û faql û me'rîfet bû
Liwaê dîn dibû merfû' bi Urfe

7

Xusûsen çend eşxasê meşaîx
Hene ku bi wan qewî pir nûr e Urfe

8

Neşîh û Bercîs û Zulkîflê rasix
Muzeffar pir bi van meşhur e Urfe

9

Ji ehlê 'ilmê ewwel Xace Hamid
Digel derwêş bi van bêmişl e Urfe

10

Mihemmed Ehedê şahib Mehamid

Û Ebdullah bi wan xwey fedl e

11

Ji lew ustad Se'îdu'l-weqtê meşhûr

Di paşî întiqal kir bal Urfe

12

Eger çendan ji Urfe bûye meşhûr

Gelek xweş kir bi nûrê halê Urfe

13

*We şelle 'l-lahu 'ela xeyrî 'l-beraya*³²⁹

Fe mîn enwarîhî qed dae Urfe

14

*We alî summe eşhabu 'l-mezaya*³³⁰

We men mîn hîzbîhî qed cae Urfe

³²⁹ Selat û hem selam li ser xêtirê mexlûqan

Urfe bi ronahiya wê ronî dibe

³³⁰ Û li ser malbata wî paşê li ser eshabeyên bifezîlet

Û li ser ew kesên ku ji hîzba wî ne û hatine Urfeyê

19. Ey Behaeddîn Ey Ronahiya Çavêd Min³³¹

Fa'îlatûn Fa'îlatûn Fa'îlatûn Fa'îlun

1

Ey Behaeddîn ey ronahiya çavêdi min
Ey bira û wey çira dermanê êşanêdi min

2

Sed salam wek melheman xweş her wekî avê çeman
Ku bike def'a geman bêtin ji bo te ew ji min

3

Her du çavan wekî gulavan radimûsim ey bira
Daima min tu li bîrî hazirî li qelbêdi min

4

Her zeman û her mekan her tu li ba min hazirî
Carekê wenda tu nabî tu ji efkarêdi min

5

Ey Behaeddîn tu jî min daima winda neke
Qet tu caran tu neke ji dil ey bira terkadi min

6

Em digel ehlê çeman hem Rebenok û medrese
Rahetin em bêmereq bawerke wî qewlêdi min

7

Ez mela 'Ebdulhemîd û Behaeddîn û gel feqan
Piştî 'îdê çûn Rebenokan em li ba şêxêdi min

8

Bedredîn 'Ebdulhemîd beriyê xwendin wan bi deng
Pêve mewlayî digotin cumleê feqyê di min

³³¹ Ev helbest di derbareyî Şêx Behaeddînê Muderrîsî da dema ew li leşkeriyê bûye hatiye nivîsandin.[Şêx Muşerref]

9

Serhilî pêşiya me hatin ba xuşûş Sofî Rehîm
Ew wusan girya ku min dil soht û hat giryadi min

10

Piştî çendek min sefer kir çûme Sêrt û Tillohê
Lê dihatin çûn baran bê hesab roja li min

11

Min nikarî biçme ba mamê Rebenkan pir ji wî
Min fihêt kir lew bi xwe li mal bû nezer dikra li min

12

Her du mamê medrese de çûne Xesxêr ew jiha
Lêbelê baran di îsal zehf e ey dostêdi min

13

Mekesî qeşda ewan mana çeman e ey bira
Ew li ser qeşda xwe ne her ewî emekdarêdi min

14

Miletê Tînîs muweqqet bû çeman ew hatine
Lê ziyankar û gedaran tu bike yesdîq ji min

15

Şahîb û Mihemmed Emîn Mihemmed Şefîq Şelaheddîn
Hem digel sofî li malin keyfxweşin hem salim in

16

Ger Xuda heske tu jî dê bê jibîrkî zehmetan
Bête nav feqyan bibî çîçek li ber bîhnadi min

17

Cumle feqyan û muhîbban ew ji dil teqdîm dikin
Pir selam û pir du'an bîlxaşşe Bedreddînê min

18

Lêbelê 'Ebdurrehîm jê ra bixûne Fatiha
Lew ji wî xalî geraye şuhbet û hucradi min

19

Vê qeşîda han bixûne bi 'îşq û şewq ey Beha
Lew kelimê min behalîne hemî ew melhem in

20

Hem tu bêje her tu avabî eya Rûbariyan
Lew ku seyrangahê te tevda hemî *def'u'l-ğem*³³² in

21

Kehniya spî çemek feqyan û newala xwey cemed
Deşt û hem çirnê tennûr qeb qeb dîkin em her em in

22

Xaşşe kin ava çeman mişlê gelek gavan e ew
Çar kenarê wî giya û çiçek û mêrg û çem in

23

Pur şelat û selam dêjim ji bo *Şemsu'd-duha*³³³
Al û eşhab hem digel bin hakeza ustadê min

³³² Defkirin.

³³³ Sond bi rojê û ronahiya wê.

20. Îlahî Tu Selamê Min Li Ser Mela Hesên Danî³³⁴

Mefa'îlun Mefa'îlun Mefa'îlun Mefa'îlun

1

Îlahî tu selamê min li ser Mela Hesên danî
Bibarînî li wî daim wekî baranê nîsan

2

Dirêjkî tu heyata wî muweffeqkî di her weqtî
Xuda tu wî bike mehfûz ji şerrê cin û însan

3

Çi yarek pak û muxliş bû biraek şaf û xaliş bû
Biadab û xeşaiş bû bo çi mêrek bû li meydan

4

Çi mêrek bû di tengêda emîn bû ew di qelbê da
Di gem û derd û huznê da çi keyfek bû li meydan

5

Mecalîs pê muneqqeş bû civatê me bi wî xweş bûn
Bi wî em daimî geş bûn xirab kir çerx û dewran

6

Civata me kire kerker û avêt her yekî yek der
Melaê me kire 'esker di iqlîmê Ezircan

7

Ĝeman da ser me bêhejmar ji çavan tîn şet û rûbar
Di her şubh û di her êvar dinalîn balê rehman

8

Dibêjin ya xweyê rehmê tu yî qađî di her hukm
Qebûl bû çi dikî zulmê ji tirkê dostê şeytan

³³⁴ Ev helbest dema Mela Hesên esker bûye ji bo wî hatiye nivîsandin. [Şêx Muşerref]

9

Bike def`a belaê me bixêr bîne melaê me

Bihev bixe civata me birehm û luţf û ihsan

21. Sed Mubarek Sed Mubarek Ey Mela ‘Ebdulhemîd

Fa’îlatûn Fa’îlatûn Fa’îlatûn Fa’îlun

1

Sed mubarek sed mubarek ey Mela ‘Ebdulhemîd
*Fî rîdâi’l-lahî tebarek*³³⁵ ey Mela ‘Ebdulhemîd

2

Rebbê ‘Alem şihhetê hem lezzetê ihsan biket
Keyf û şahî bêgunahî rahet û ‘umrê medîd

3

Der lîbasê ‘eyş û noşan der ciwarê meyfiroş
Derfireh bin çav û goşan roj hemî wek rojê ‘îd

4

Ya Îlahî padîşahî destê ma tu red nekî
Meqşedan rahet bikî hađir bikî cumle ûmîd

5

Rê bikî her dem şelatan gel selamê bê‘eded
Bo şehînşahê Medînê û al û şehaban û şehîd

³³⁵ Di rizaya Xwedayê pak û pîroz da.

22. Sed Hezar Heyf û Mixabin³³⁶

Fa'îlatûn Fa'îlatûn Fa'îlatûn Fa'îlun

1

Sed hezar heyf û mixabin newgula Erwasiyan
Çilmisî zahir fena bû bû yek ji windabûyiyan

2

Lêbelê emma heqîqet geştir û pir taze bû
Ji avê dinyaê fanî çû gihêşte baqiyan

3

Lubsê fanî wî jibîr kir eþlesê baqî girift
Pir tereqqî kir ji axê çû giha asmaniyan

4

Çû giha dostan li ser cisrê wefatê pir bilez
Bi asansora wefatê çû giha ruhaniyan

5

Ji avê zindanê mehpûs pir bi şahî derketin
Ji qefes vî teyrî firda her bi mişlê fûzeyan

6

Çû giha bapîr û baban mam û pismam û biran
Wê civata pir bilezzet şuhbeta wan ewliyan

7

Şuhbetek gayet tamam her yek li yek dikra selam
Şerbeta şafî gerandin ax ji destê saqiyan

8

Saqiyan şerbet gerandin misk û 'enber lê reşandin
Ax li ser dinya werandin pir bi kêf û şahiyen

9

Pir dikin seyran û gezmağan li bağan bêkeder
Bağê daim lê bihar lê bilbilan xweş taliyan

³³⁶ Ev helbest li ser wefata Şêx Muhemmed Sidîqê kurê Şêx Hesenê Arwasî hatiye nivîsandin.[Şêx Muşerref]

10

Heq nîda kir ey ‘ezîz îro te çî divê bêje got
Min rehê bagê cînan ey rebbê ins û cinniyan

11

Lew ji bona întiqala vê gula pêxemberî
Min rehê bagê cînan³³⁷ tarîxgera gayet beyan

12

Ya îlahî şebrekî tam bide ehlê vî gelî
Ji me ra jî bide nuqtek şerbeta Arwasiyan

13

Pir şelat û pir selamê bêxilasî bêhisab
Bide şahê ‘erşê lewlake fexrê enbiyan

14

Hem bide eşhab û alan û ewladan tamam
Hem digel wan cumle etba‘ hem temamê eşfiyan

³³⁷ Li gorî hisaba ebcêdê wefata Şêx Muhemmed Sidiqî, ji gotina “Min re bagê cînan” derdikeve ku ew di sala 1402/1982yan da bûye.

23. Îlahî Pir Keremkarî³³⁸

Mefa'îlun Mefa'îlun

1

Îlahî pir keremkarî
Dibit feqla te her carî

2

Qe daxil nîne in'amî
Te derte' dad û hijmarî

3

Ji bo qelbê şikestî ra
Eya Rebbî tu cebbarî

4

Di şibha rojan pêncşenbe
Keremkir Xaliqê Barî

5

Rebî'u'l-axira rûşen
Ji ortê qet neçû xarî

6

'Uyûnê nî'metê der bûn
Sehabê rehmetê barî

7

Ji ihsanê çira hil bû
Munewwer kir şeva tarî

8

Şefeq da erd û asîmanan
Muşerref bûye Berwarî

³³⁸Min ev helbest ji bo pîroziya neviyê birayê xwe 'Ebdullahê kurê Hemdullahê kurê Şêx Munewwer nivîsandiye.[Şêx Muşerref]

9

Ûfalek daye me îro
Xudan qedr û eqdarî

10

Dibû mensûbê Hemdullah
Dikem hemdê digel zarî

11

Musemma bû bi ‘Ebdullah
Ji şukrê zêde sed carî

12

Mihemmed dane ser çavan
Şifa qelbê birîndarî

13

Dika tebdîl biket dapîr
Bi kêfa xwe bi muxtarî

14

Hezar û çar sed û yek bû
Ji hicret kir hesabdarî

15

Şelatan rêke ya Rebbî
Di şibhan û di êvarî

16

Ji bona seyyîdê ‘alem
Xudanê qedr û miqdarî

17

Digel al û eşhaban
Digel yarê emekdarî

24. Bileyzin Her Bileyzin³³⁹

Mefa'îlun Mefa'îlun Fe'ûlun

1

Bileyzin her bileyzin ey ciwanan
Bi perwazan fereshînin ciwanan

2

Bileyzin her bileyzin ey şîrînan
Bikin derman hemî derd û birînan

3

Bileyzin her bileyzin ey 'Ezîzan
Bikin guhrî biharê sed peîzan

4

Bileyzin daimî ey mustefîdan
Bibin kehlê di ebşarê mufîdan

5

Hilavêjin xwe hûn her mişlê kîskan
Nekin fikra dilopkan yan pirîskan

6

Binêrin ev bihar çend dilkuşa ye
Cemî'ê 'alemê derkeyf û şa ye

³³⁹ Ev helbest ji bo feqiyên gundê Rûbarê hatiye nivîsandin.[Şêx Muşerref]

25. Ey Muzeffer³⁴⁰

Fa'îlatûn Fa'îlatûn Fa'îlatûn Fa'îlun

1

Ey Muzeffer ey 'ezîz ey çîçeka 'Ebbasiyan
Ey munewwer ey mubarek ey gula sultaniyan

2

Sed hezar car *e'zeme'l-lahu'l-'ezîm ecrekum*
Heq bidet we şebrekî kamil di pê ra şahiyân

3

Hem ji bo merhûmeê heq cennete 'alî bidit
Heq Te'ala wî bigêrit hemnişînê hûriyan

4

Ey 'ezîz dinya weha ye bê beqa ye fanî ye
Sed xwezî bi wî dilgirê nadit bi dinya faniyan

5

*Fî'l-heqîqet*³⁴¹ ev wefat jî întiqalek pir xweş e
Întiqal e ji faniyan yekcar bi bal baqiyân

6

Libsê eskî berdidit wî eţleşên nû ber dikit
Bi esansora wefatê diçite nav eflakiyan

7

Ev wefat cîsr e bi wî eĥbab hemî berhev dibin
Şuĥbetek şîrîn dibînin bê keder û bê tēhliyan

8

Ev wefata xelqê ku razane bi wî hişyar dibin
*Şedeqe'r-rusul*³⁴² dibêjin geyb hemî dibne 'eyan

³⁴⁰ Ev helbest ji bo Seyîd Muhemmed Ğerbî kurê Şêx Me'sûmê kurê Şêx Fehmiyê Arwasî hatiye nivîsandin.[Şêx Muşerref]

³⁴¹ Di rastiye da.

³⁴² Pêxamberan rast gotin.

9

Ya îlahî tu wefatê ji me ra şêrîn bikî
Herwekî gotî hebîbu'l-lah bi qewlê rawiyan

10

Pir selamê wek rihanan ji we ra hedye dikim
Radimûsim ez bi hürmet hem bi şewq dest û piyan

11

Hemdê bê hed bo Xuda yê bê zewal û bê fena
Malikê her nî'metan û mu'tiyê her qenciyan

26. Biru Ey Name³⁴³

Mefa'îlun Mefa'îlun Mefa'îlun Mefa'îlun

1

Biru ey name mîbûsin kif nazik du sê caran
Xwezî bûyê muyesser bê ji bo bosa kefê yaran

2

Di pê ve her du çeşmanê mubarek ra bi sed hurqet
Bike teqbîl bîla te'cîl tu ey name ke tekraran

3

Mufeşşel ke ji bo yaran hemî ehwalê 'uşşaqan
Dibîtin rehmkê kin ew bi halê wan birîndaran

4

Çiqa mumkin bî ey name dirêjke şuhbeta dostan
Bi lutf û riħmeta nazik bike şaran tu ixbaran

5

Di weqtê fîrsetê teqşîr ne exlaqê 'eqilmend e
Dema çû fayde qet nakit welew bigrî wekî baran

6

Nebî dûr bî tu ey name di yek gavê ji me'sûqan
Kesê ji wan yekdemî dûr bî dibî mehrûm ji enwaran

7

Xwezî ey name ez bûma di cayê te dema cih bî
Di wan tilyê mubarek da di subhan yan di êvaran

8

Eger bûma di wî destî ji mestî min we ya qestî
Qe cennet nakira xwestî di şîva û di eşheran

9

Bibî ey name ger nakî bi halê 'aşiqan bawer
Binêrin xameya bêriħkirî bi halê me bîmaran

³⁴³ Ev helbest ji bo Seyîd Me'sûqê Arwasî hatiye nivîsandin.

10

Meke ey name gem ger her wekî bextê me reşbûyî

Ji derdan çimkû yek dîtin didet ba cumle ekdaran

11

Muşeref qet nebî carek tu de‘wayê feşahet kî

Ji yumna sorgulan bilbil dîkin tertîbê eş‘aran

27. Îlahî Ev Çi Dewlet Bû Di Vê Salê Çi Nî‘met Bû

Mefa’îlun Mefa’îlun Mefa’îlun Mefa’îlun

1

Îlahî ev çi dewlet bû di vê salê çi nî‘met bû
Çi îhsan bû çi înan bû îlahî ev çi rehmet bû

2

Çi cem‘ek pir mubarek bû eħîbba bûn e‘îbba bû
Çi ‘uşşaq bûn çi eşwaq bûn çi ezwaq bûn çi rehmet bû

3

*Rîcalun leyse tulhîhîm wela yeşqa mudanîhîm*³⁴⁴
Îlahî şukr û zikr û fikrê wan heqpen ‘elamet bû

4

Muzeffar Şêx Behaeddîn Memdûhî Selaheddîn digel Taha
Digel ustaz Behaeddîn teberruk bû keramet bû

5

Huseyn ew rohnîya çavan û burhan merhema navan
Digel wan bû ‘Elî *welhemdu lillahi*³⁴⁵ ku selamet bû

6

Digel wan cem‘ekî tabî‘ ji adaban mukemmel bû
Şî‘arê wan wefakarî û dîndarî û şedaqet bû

7

Dexîlê wan Xinûkî sist û nadan û bêkar bû
Welê *welhemdu lillah* kû ticareta wan bi şirket bû

8

Tewccuh bû li cennatan tewccuh bû li lezzatan
Îlahî ev îşaret bû beşaret bû se‘adet bû

³⁴⁴ Hin merivên were (di wan da hene) ku ne bazirganî ne jî danûstandin nikare ji bîranîna (navê) Xwedê, wan mijûl bike.

³⁴⁵ Hemd ji bo Xwedê ye.

9

Li ser teyyareya ‘işqê bi sewqî saîqê şewqê
Dîrekson şiddeta zewqê îlahî ev çi himmet bû

10

*Mîne’l-lahî, île’l-lahî; me’e’l-lahî, we fi’l-lahî*³⁴⁶
Feya lî’l-lahî mîn ze’l-halî ya reb çi lezzet bû

11

Sikût û nuqç û tehrîk û sikût bî hemdî’l-lahî
Îlahî ev çi şefqet bû îlahî ev çi hikmet bû

12

Hero ‘îda we her şev leyletu’l-qedr û beratê bû
Bi her saet ziyaret bû û şuhbet bû û şerbet bû

13

Peîz esla nehin peyda biharek kesk û rengîn e
Seyyahê bilbilan hetta gihê ‘erş bēnihayet bû

14

Ji şewq û zewq û telqahum sukara ya îlahî ev
Çi dewlet bû çi lezzet bû çi pir ‘îbret qiyamet bû

15

Belê yê wî teweccuh ku li cennatê medînê bin
Wekî ustaz û Behaeddîn cunûnek pir mehebbet bû

16

Belê yê ku şehî lewlake îstîqbal bike lazim
Kû ‘eql û hiş biçin yekcar ji vê dinyaê rahet bû

17

Îlahî hemduke daim şelat û selam her dem
*Xîtamu’l-qewlî*³⁴⁷ tewbet bû tezellul bû şehadet bû

³⁴⁶ Ji Xwedê, bal Xwedê va bi Xwedê ra û ji bona Xwedê.

³⁴⁷ Gotina herî dawî.

Xezel

1. Wê Dema Çavê Me Roni Kir³⁴⁸

Fa'îlatûn Fa'îlatûn Fa'îlatûn Fa'îlun

1

Wê dema çavê me roni kir wî mubarek nod û heşt³⁴⁹

Pêkve ev dinya tamamî bo me bû her wek bihişt

2

Weqtê min xweş qelbê min geş lêvê min beş wî geran

Her wekî nîsan bibî şeş kom bibin esbabê geşt

3

Çend sal bûn min digot 'ilm û huner yekcar çûn

Dîtina wî ew kul û êşan ji min yekcar rişt

4

Zehreê ewladê zehra durreê ehle 'eba

Şaxê sadatê Birîfkan beyreqa zozan û deşt³⁵⁰

5

Ey **Muşerref** bes bibêj yeksane lew kurt û dirêj

Yê ku zana bî li nik wî wek yekin lew tişt û teşt³⁵¹

³⁴⁸ Ev helbesta hane di derheqê Şêx Memdûhê Birîfkanî da ye. Şêx Memdûh (1911-1976) ji helbestvanên devera Badînanê ye û ji malbata Şêx Şemseddînê Exlatî û Şêx Nûreddînê Birîfkanî ye.[Şêx Muşerref]

³⁴⁹ Nod û heşt, li gorî hisaba ebcedê navê Memdûhî ye.

³⁵⁰ Ji bo ku wî îrşad li devera Badînan û Hekariyê dikir.

³⁵¹ Teşt yan jî teşt amareke mezin a navdar e.

2. Ey Rohniya Çavêd Me

Mustef'îlun Mustef'îlun Mustef'îlun Mustef'îlun

1

Ey rohaniya cavêd me wey şahiya qelb û dilan
Ey tu *eḥebbu'l-'eqrîba*³⁵² derman û derdê dilkulan

2

Ez rê dikim bêntiha bêhed selamê bêbiha
Pir tazetir ji lu'luan zêde ji reyhan sorgulan

3

Xweştir ji çay û hingivîn ji bo te ra ey xweş evîn
Şahî çavên bit gemrevîn herwek binefş û sorgulan

4

Çavê te ra maçu dikem bi 'eşq û şewq û lezzetan
Daim du'açî ne ji te ra bêşik bizane ey filan

5

Weşyet li te şebra cemîl şebrê dikit ê 'aqil e
Însanê bêsebr û sikun wî 'ed dikim ji cahilan

6

Ellah hez biket bixêr û şahîti tu bê
Geştan û seyranan bikîn di heyva nîsan û gulan

³⁵² Eqrebayê herî hezkirî.

3. Hat Bihara Rast û Xweş

Fa‘îlatun Fa‘îlatun Fa‘îlatun Fa‘îlun

1

Hat bihara rast û xweş ey dil ji lew min kul neman
‘Eskerê şahî mehû kir leşkerê derd û geman

2

Bê hisab îro muferreħ xatîr û dilşa me ez
Lew ku îro bêdirew derbûne kun avê çeman

3

Avekî spî û şîrîn û pir zelal û bêmisal
Lew di her weqt û deman diket humhuman û xumxuman

4

Dipte wek kafan li wî deşta fireh ya laiq e
Ew ji bo herba ‘ecîba toz û giyo û rusteman

5

Min divêtin cumle ehbab carî dî berhev bibin
Ca weku derd û birînan lê bikin ew melheman

6

‘Ebdurrehman Behaeddîn melaê min ‘Ebdulhemîd
Lew biwan dilşa dibin her weqt û her hîn û zeman

4. Eya Baxçevan³⁵³

Fe‘ûlun Fe‘ûlun Fe‘ûlun fe‘ûl

1

Eya baxçevan baxçevanê delal
Bide xatirê rehmata zu‘l-celal

2

Wekî tu diçî baxçêê taze rengîn
Tu derman dikî wî diljar û gemgîn

3

Ziyaret dikî tu ewî baxçêê
Temaşa diki tu li wî rewçêê

4

Nezer tu dikî li nêrgizan û gulan
Didî baê komê geman û gulan

5

Tu xweş bihn dikî sosinan û rihanan
Muferreḥ dikî qelbê pîr û canan

6

Dikî nalenal û dikî gulgulan
Dibî xweş mu‘ellîm ji bo bilbilan

7

Diçî raserê du gulê Ehmedî³⁵⁴
Du reyhanê wî baxçêê sermedi

8

Tu min bîne bîrê eya baxçevan
Me hazir bike tu bi qelb û devan

³⁵³Ji baxçevanî armanc ev e ku zilamekî bi navê Hecî Celaleddîn e û wî serdana qebra bavê min û yê bapîrê min dikiir.[Şêx Muşerref]

³⁵⁴ Yanê babê wî û bapîrê wî.

9

Bila ez jî mehrûm nemînim ji wan
Nebim têhnî ez jî ji ava rewan³⁵⁵

10

Eya baxçevan fehm bike meqşedan
Bike ferqê çaran digel hefsedan³⁵⁶

³⁵⁵ Yanî ji bereketa wan û feydeyên wan.

³⁵⁶ “Çar” li gorî hisaba ebcedê hisaba hejmara “dalê” ye û “hefsed” jî hejmara “zalê” ye. Yanê bila tu xwediye ditineke baş bî û tiştên bi ser ve wekî yek bila te di ser da nebin.

5. Ey Feqîrê Sist

Fa'îlatûn Fa'îlatûn Fa'îlatûn Fa'îlun

1

Ey feqîrê sist û bêsermaye destvala hilû
Ma tu me'na "qum"³⁵⁷ nizanî ya fihêt nakî gelo

2

Ey dilo hetta bi kengê eħmeq û cahilî
Melheza halê xwe nakî ey dilo bêhaşilo

3

Tu binêre van hevalan ku çewan borîn û çûn
Tu tenê maî di paş da bêheval ey cahilo

4

Ev mûyê spî qaşidîn dêjin bilind û pir feşîh
Pir 'ecîbdarim ku seħ nakî tu ey bêaqilo

5

Rabe wek mêran tu hilde dest û lingan bêsikûn
Rabe êvarî dereng e bêxebat nabî dilo

6

Êkem ez Rûbariyan şermet³⁵⁸ nemî ayed ke tu
Kem şumarî mermera ez bi sîrek bar çilo³⁵⁹

³⁵⁷ Rabe

³⁵⁸ Yanê şermek û herfa "t"yê di qisedana farisî da weke herfa "kaf"ê ye. [Şêx Muşerref]

³⁵⁹ Ev beyta dawiyê beyteke kevn e ku min ew di destpêka hatina xwe da ji bo Rûbarê gotibû. Paşê di sala duduyan da ji akincîbûna min li Rûbarê, min her pênc malikên din lê zêde kirin. [Şêx Muşerref]

6. Dema Ku Em Cuda Bû Ji Hev³⁶⁰

Mefa'îlun Mefa'îlun Mefa'îlun Mefa'îlun

1

Dema ku em cuda bû ji hev hêstir ji çav hatin
Dil û canên me ker ker bûn ji ber fîra li min daî

2

Dil û canê me wê pehtin Hekîm Luqman eger bêtin
Digel Îsa Mesîh bêtin birînê min bi kew naî

3

Xwezî carek wişal bihta fîraq biçwa êdî nehta
Bi ruh bihta dilê mewta belê zanim tuca naî

4

Ezê îro feqîr bû me bi hicrê mubtela bûme
Ze'îf û jar û zer bûme ji ber vê cîfe dinyai

5

Nikarim serhilînim ez li nik yaran ji şermê ez
Dibêjim mewt were xweş lez xelaske min ji vê daî

6

Çi derdek pir 'ecêb min dît kî ye dêjî mi jî ew dît
Ji dem'an çavan qe nanêrit dikim weyl û 'uwylaî

7

Li kunca firqetê mame li toza wî bi werha me
Bîla xelqê enîs mame niza bêm cem kê şekwaî

8

Dilerzim mişlê dara bî dikim nakim 'îlac nabî
Kî ye qelbê me pê şabî were ey can çira naî

³⁶⁰Min ev helbasta hanê di zemanê ciwaniya xwe da nivîsandiye.[Şêx Muşerref]

9

Îlahî qed teheybertu we 'en ġeyrike rece 'tu³⁶¹

*Bîke emrî tefewwedtu fe xuz **mîm** mame 'el **faî***

³⁶¹Xwedayê min! Ez şaş mam û min serî li xeyrî te da
Min xwe radestî te kir wê demê min hilîne.

7. Ey Feqîrê Destvala

Fa'îlatûn Fa'îlatûn Fa'îlatûn Fa'îlun

1

Ey feqîrê destvala diltijiyê serserî
Tu ji dinyaê çî daxwazî dikî ya li çî digerî

2

Ma tu ehwalan qe nabînê weya bênazir î
Ma tu seh nakî hikayatan weyaxut tu kerr î

3

Tu ji wan xelqê di pêşya xwe tu 'îbret nagrî
Ma tu razaî gelo bêje weya teb'etkerî

4

Qeş tu nakî carekê fikrê di roja mehşerê
Tu gelo ma qeş nizanî ku tu şahibdefterî

5

Nê hevalan çûn tamamî tu feqîr maî li rê
Carekê nakî wekî bê'aqilan qeşda derî

6

Durr û yaqûtan didî dikrî tu vî av û herî
Ey tu ehmeq baî'ê şahib xesaret muşterî

7

Barê dinyaê tu ranakî nika bibte serî
Tu bi dinyaê dibî mehrûm ji ava kewserî

8

Bifikire lefza ewî Şêx Sîbgetullahê berî
Ku dike bi heq ra xîtabê ew gula pêxemberî

9

Ê ku te dinya ji bona wî heqîqet çêkirî
Qencyek wî tînedî lew çû li rewde ewerî³⁶²

³⁶² Tu bizan ku ev malika hanê ji bo Gewsê Hîzanê hatiye nivîsandin. [Şêx Muşerref]

8. Em Ji Ber Zorê Ku Çûn

Fa'îlatûn Fa'îlatûn Fa'îlun

1

Em ji ber zorê ku çûn dilşa û geş
Bo Bişar Axaê Sindî³⁶³ salekî

2

Yek ji havalan Mela 'Ebdul'ezîz
Yek Mela Xurşîdê wek merçalekî

3

Çend xewş û naxweş me dîtin qet mepirs
Zor e tefşîl guh bide îcmalekî

4

Li Hevşînê ew çend hijîr ji bîra me bir
Tirsa pîstir ku bela desmalekî

5

Ew te'am ew şerab ew civat
Cumle bêfayde me dîtin li dehlekî

6

Hêvî mana Şêx³⁶⁴ xewa çavan revand
Ê ku ne li malekê nizanî halekê

7

Ger çî mizgînî seharê hat û em
Geş bûyîn em bûne wek gulalikî

8

Lê lezê li ser teştê û li ser taretî
Her wekî însan bikeve çalekê

9

Hingiv û nîvişk Bişar anî gelek
Hem tirî hijîr li nava nalekê

³⁶³ Li 'Îraqê miletek naskirî ye û Bişar jî serokê wan e.

³⁶⁴ Şêx Memdûh Birîfkanî.

9. Di Fesla Nûbiharê da

Mefa'îlun Mefa'îlun Mefa'îlun Mefa'îlun

1

Di fesla nûbiharê da digel dîlber biçim geştê
Ji ew xweştir 'umur nayê li min hal qewî xweş tê³⁶⁵

2

Feqî rabûn bi hev rabûn ji bo geştê bi bal deştê
Li Rûbarê di adarê di roja bîst û hem heştê

3

Çi herbek pir mezin rabû di îro da li ser deştê
Hezaran aferîn dêjim ji bona wî ku dariştê

4

Evan şêran piling hêran bi van şîran rim û tîran
Ji van bazan leşê qazan hemî razan li ser piştê

5

Şel û şaşê bidin paş e bikin kaş e evan laş e
Bi şaş û şel kesê guhbel di îro da çewan xiştê

6

Didit qêran Feqî Hamid wekî ne'rê Îmam Xalid
Ji bo betalan û rimbazan dibêjê ev çi kişkiş tê

³⁶⁵ Ev malika hanê rasterast ji Nûbara Piçûkan ya Ehmedê Xanî hatiye wergirtin.

10. Bi Xêr Hatî

Mefa'îlun Mefa'îlun Fe'ûlun

1

Bi xêr hatî eya dostê Girafê

Li ser çav û seran dostê Girafê

2

Xweda mebrûr biket hecca te çêket

Hemî şolê te ey dostê Girafê

3

Ji bo te afiyet bit ew şeraba

Vexarî te eya dostê Girafê

11. Ey Gelî Cem‘a Şîrînan

Fa’îlatûn Fa’îlatûn Fa’îlatûn Fa’îlun

1

Ey gelî cem‘a şîrînan wey civata togehê
Wey mekanê pir mubarek wey şîrîn te‘lîmgehê

2

Sed emanet sed emanet se‘î û teşîl bêsikûn
Ca weha her hûn şîrîn bin ji we bê bihna bihê

3

‘Ilm e her ummu’l-feđâil cehl e her ummu’l-bela
Van belaê bêhisab cahilan ma nabihê

Mesnewî

1. Kitêba Gûz û Miwîj

Mefa'îlun Mefa'îlun Fe'ûlun

1.

Gelî feqyan gelî feqyan nezer kin

Heçî bêjim bizanin hem jiber kin

2

Çikû ez bo we tehqîqa evînim

Muhibbek şadiqim hem gemrevînim

3

Kelamê min xweş û pir nazdar e

Şîrîn e taze ye wek nûbihar e

4

Ji bo qeṭ'a xerabî şîrê tîj e

Wekî navê xwe ye gûz û miwîj e

1.1. Fesla Tehşîlê

Mefa'îlun Mefa'îlun Fe'ûlun

1

Bixûnin hûn nekin teqşîr û sistî
Emanet se'î û teşîl û durustî

2

Durustî lefzekî kurt û dirêj e
Kesê ku ew durust nabî qirêj e

3

Bixûnin hûn di havîn û zivistan
Nebî çêbî ji we yek roj û westan

4

Kesê xwenda muheqqeq her emîr e
Nexwenda her wekî pîvaz û sîr e

5

Bi dîqqet hûn bikin daim mişal e
Muşale malekî qet bêzewal e

6

Ji metnan qet nebî lefzek jibîr kin
Xwe destvala û bêmal û feqîr kin

7

Nivîsandin qe nahêlî ku xwenda
Ji 'ilmê xwe biket yek lefzê winda

8

Ji 'ilm ra qelem la şekke nîv e
Ji bona her kesê xet zêr û zîv e

1.2. Feşla Qedrê Seyda

Mefa'îlun Mefa'îlun Fe'ûlun

1

Ji bo seyda muheqqeq ferz e îkram
Kesê ku nake îkram naxwe în'am

2

Ji seyda ger dixwazî îstifade
Divêtin tu bikî bo înciyade

3

Ji seyda ra kesê nakit îta'e
Qe nabînî di dinya intifa'e

4

Eger jê ra muftî nabî bizane
Ku seydayê te ew nefsa nezane

5

Ji bo wî zahir û baîin evîn be
Kesê ku ew nevê jê ra nevîn be

6

Îmamê me Elî dêjî efendim
Li her erdê ji bo ustadî 'ebdim

7

Yekî got Ey Sikender bo çi daim
Dikî teqdîm li ser babê xwe 'alim

8

Cewab da faida bab fena ye
Welakin faida 'alim beqa ye

1.3. Fesla Mu‘ameleta Hevalan

Mefa’îlun Mefa’îlun Fe‘ûlun

1

Bihev ra xweş biborînin bi şahî
Bixûnin hûn bi meqşûda îlahî

2

Bihurmet bin ji bona hev dewamî
Hemî pêk ra ji hev ra kin gulamî

3

Emanet sed emanet sed emanet
Ji bona hev bikin daim şîyanet

4

Xuşûşen yê ku lefzek zêde xwendî
Hemî hev ra ji bo bêjin efendî

5

Hemî hûn eskerê xaşê îlahin
Gulam û xadimê wî barigahin

6

Eger ku hûn ji bona hev nebaş bin
Ji dergeh dê li paş bin bê me‘aş bin

7

Nebî carek di dinyaê ku şer kin
Heta saqin fihêtkar û zerer kin

8

Nebêjin ratiba min zêde dûr e
Weya ev xizmeta hanê bîzor e

9

Nikarim ez hero hucrê bimalim
Li mala xwe ‘ezîz û hem delalim

10

Kubarim min ji şalê xwe fihêt e

Binêre îşlikê min şubhê pêt e

1.4. Feşla Exlaq

Mefa'îlun Mefa'îlun Fe'ûlun

1

Nebî çavê we daim bî li kevçik
Weya şalê heşîn û ya nepirçik

2

Cil û pirçik ji exlaqê jinan e
Biha nakit kesê metnê wî nan e

3

Ji bo feqiyan civat û hem 'elaiq
Di gel geyrî feqan qet nîne laiç

4

Di nava gund herin meşyek giranî
Li rast û çep nezer 'eyb e tu zanî

5

Muheqqeq pir kenîn û dengbilindî
Munaffî ne ji bona 'eqilmendî

6

Cihan paqij bikin çendî bi karan
Di hucran qirş û qal wek 'eyb û 'aran

1.5. Gelî Feqyan

Mefa'îlun Mefa'îlun Fe'ûlun

1

Gelî feqyan gelî cem'a şîrînan
Bi wê derman dikim her dem birînan

2

Çira hûnin di dîwana evînan
Bi min mehbûbtirin ji mal û defînan

3

Bi we şahî dibit qelbê hezînan
Dikim gohrê we Şîrînan û Zînan

4

Emanet metin û tekrar û mutale
Ji we ra ewlatirin ji hesp û mehînan

5

Bihev ra xweş biborînin bihev ra
Bixun qend û nebat û hingivînan

6

Welê çend rojekan hûn min 'efûkin
Nekin behsê ji **dal û ra û sînan**

1.6. Xatime

Mefa'îlun Mefa'îlun Fe'ûlun

1

Îlahî tu min û feqyan Îlahî
Hîmayet kî ji ef'alê menahî

2

Me şîrîn kî bi wan ewşafê şîrîn
Gelek muhtac û ne 'ilac û feqîrîn

3

Ji wî behra ku jê rihtî bi qencan
Bike îhsan ji bo me yek du fincan

4

Şelat û hem selam hingî hîrûfan
Li pêxember di gel şehib û mirovan

2. Ezê Rojekê Çûme Bagê Wisal³⁶⁶

Fe‘ûlun Fe‘ûlun Fe‘ûlun Fe‘ûl

1

Ezê rojekê çûme bagê wişal
Geram ez di wêda bi mişlê gezal

2

Hebûn têda tûtî û çûkê xerîb
Û şehlûl û bilbil digel ‘endelîb

3

Di wê da ji enwa‘ê teyran hebûn
Bi cumle şukurdarê Rebbê xwe bûn

4

Hinek dawetî bûn hinek distirîn
Li ‘erbani hindan didan pir şirîn

5

Çi dengêk ‘ecîbê ji bo wan hebû
Belê mişlê bilbil qe kes tê nebû

6

Çira çimkî ‘işqek bi wî ra hebû
Ne Ferhad ne Mecnûn wekî wî nebû

7

Me nêrî şebahê dîlopek ji xwûn
Bi difnê vematî ketî sernexûn

8

Û şehlûl digel bilbil destekin
Gînaê dikin tu dibêjî yekin

9

Heçî tûtî ye ew tinazan dike
Welêdana ‘erbanê jî ew dike

³⁶⁶ Şêx Muşerrefî ev helbasta hanê di zemanê ciwaniya xwe da nivîsandiye.

10

Û hem ‘endelîb xweş rîwayetçî ye
Ji exbarê pêxemberan haka ye

11

Heçî hudhud ew beşaret dike
Ji mehbûb û yaran hikayet dike

12

Û hem çokê dî reqşe mergûb kirin
Bi du destekan dora hev dikirin

13

Û hingî diçû seyra wan xweş dibû
Heçî bihta wê der mûşewweş dibû

14

Û reyhan û sorgul di wî bûn
Û nêrgiz di gel sosinê tê hebûn

15

Gula sor di gel nêrgiz şer dikir
Belê herbekê pir mezin wan dikir

16

Gulê gote nêrgiz ez im pir ‘ezîm
Qesem jî dikim ez bi şahê ‘elîm

17

E bême li ho ezê te kor bikim
Bi şewkê xwe paşê te meksûr bikim

18

Du sê carî nêrgiz te’eddub dibû
Ewê got we paşî bi te’zîm bû

19

We got dema yarê te te dibin
Sitirê te destê ewan xûn dikin

20

Çi bêbext û xaîn û bêqewlî tu
 Ji yaranê xwe ra jî nerastî tu

21

Û reyhan û sosin telettuf dikir
 Du carî ser hev ewan maçu kir

22

Di pê van ‘ecêbanve çûme derek
 Eva çadirek têda mişlê felek

23

Eve ‘alimek pir ‘elîm û kerîm
 Di benda gelek ew hekîm û ‘elîm

24

Bi mişlê ‘Elî bû ji ber ‘ilmê xwe
 Ewî ‘Ebdirehman³⁶⁷ bû navê xwe

25

Bizan bagê weşlet çîqa ku xweş e
 Di wê da enîs dibne wek serxweş e

26

Îlahî bike meskenê **Mîm Fa**
 Ewî bagê pir lezzet û hem şefa

³⁶⁷ ‘Ebdirehman kurê Mela ‘Ebdulahê Sarihî ye ku kurê Seydayê Şêx Muşerref û kurê meta wî ye. Şêx Muşerref û ‘Ebdirehman hevalên hev yên feqîtiyê bûne. Di navbera wan da hezkirineke pir mezin hebûye. Şêx Muşerref ev agahî li ser vê helbestê nivîsandiye.

3. Îlahî Tu bi Heqqê Îsmê E‘zem³⁶⁸

Mefa’îlun Mefa’îlun Fe‘ûlun

1

Îlahî tu biheqqê îsmê e‘zem
Bi nûra seyyîd ewladê Adem

2

Bi sirra şewata qelbê şiddîq
Ebûbêkrê reîsê ehlê teşdîq

3

Bi Selman ku şehabiyek Farisî bû
Welê me‘dûd ji nav beyta nebîbû

4

Bi Qasim ku ji bo Şiddîq nevî bû
Di wê weqtê ‘ilim têda civî bû

5

Îlahî seyyîd cara du carî
Bi heqqê padişahê zî‘l-fîqarî

6

Bi wan her du durran ewwel Hesen bû
Huseyn peyve çîqa nazikbeden bû

7

Bi Zeynelabidîn navê ‘Elî bû
Bi Baqir nav Miħemmed heq welî bû

8

Bi heqq Ce‘ferê Şadiq heqîqet
Xewda dabû ewî her du terîqet

³⁶⁸ Ev helbest bi ‘eslê xwe ya Mela Xalidê Şehrezorî ye û wî ew bi Farisî nivîsandiye û min ew bi xwe wergerandiye Kurdî. [Şêx Muşerref]

9

Bi kullî ehlê wê beyta mubarek
Jin û mêt û piçûk mazin bi carek

10

Bi Teyfûr şuhreta wî Bayezîd bû
Ji bo deryê Xwedaî xweş kilîd bû

11

Bi heqqê Bul Hesen wî Şêxê Xîrqa
Ku nûra wî dida bêhed ji xelqa

12

Bi heqqê Bûl Elî wî qutbê faîq
Bi Xace Yûsif Gewsulxelaq

13

Bi ‘Ebdulxaliqê Ğucduwanî
Ku şêxê cumle şêxan e tu zanî

14

Bi heqqê Xace ‘Arif behrê me‘na
Bi Mehmûd Wîşe Încîr Fegna

15

Bi îrşada ‘ezîzanê ‘Elî nav
Dilê xelqê dikir tahir wekî av

16

Bi heqqê Xace Babayê Semasî
Riya cennet gelek taze dinasî

17

Emîr Seyyîd Kelal wî şêxê kamil
Ji geyrî heq gelek xalî bibû dil

18

Bi heqqê Şêxê Şêxanê Buxarî
Ji wî feyz û hîdayet heq dibarî

19

Behauddîn we'd-dinya Muhemmed
Terîqet pir qewî kir wî bîla hed

20

Li nik Ellahê rutba wî bilind bû
Ji lew navê wî Şahê Neqşebend bû

21

Bi quṭbê heq 'Elaeddînê 'Eṭṭar
Ku merkez bû ji bo enwar û esrar

22

Bi wî quṭbê ku Çerx bajarê wî bû
Ji lew Ye'qûbê Çerxî navê wî bû

23

Bi heqqê Xace Eḥrar ku şah bû
Belê 'ebdalê dergahê îlahî bû

24

Bi Xace Zahidê Şêxê Şefakêş
Bi wî Şêxê 'Ezîmê Xace Derwêş

25

Bi heqqê Xacekî³⁶⁹ şêxek mezin bû
Hemî fi'lêd wî her serîzin bû

26

Bi heqqê Xace Baqî xweş delal bû
Gelek nasê terîqa zulcelal bû

27

Îmamê Rebbanî Farûqî û Eḥmed
Muceddid bû bo şer'a Miḥemmed

28

Bi du çavan ji bo vî şêxê merhûm
Se'îd û 'urwetu 'l-wuṣqa³⁷⁰ê me'sûm

³⁶⁹ Xacekî, bi xeletî hatiye nivîsandin û rastiya wî Xacegî ye.

³⁷⁰ ...bi teqez wî xwe bi qulpa saxlem va girtiye...Sûreya Beqereyê: 2/256; Sûreya Luqmanî : 31/22

29

Bi Şêx ‘Ebdulehed wî şêxê qabil
Muhemmed ‘Abid û şêxek bû kamil

30

Bi Seyfeddînê Seyyîd NûrMihemmed
Hebîbullahê mezher şemsê ewhed

31

Bi ‘Ebdullahê Şahê Dewlewî bû
Xezîne belkî beherk me‘newî bû

32

Bi Mewlanayê Xalid zîlcenaheyn
Ku ew bû quţbê weqtê xwe di ‘ilmeyn

33

Bi Şêx ‘Osman bi wî Şêxê Tewîl e
Siraceddîn bo mîn geyrî hîle

34

Ebûbekr Giyaseddînê Erbîl
Ku zana bû ji bo me‘nayê tenzîl

35

Kemaleddînê heq Şêx Mustefa ye
Gelek teslîm ji bo emrê Xweda ye

36

Bistrîne li min ‘eyban îlahî
‘Efûke cumle van barên gunehan

37

Ji behra rihtî jî ser van delalan
Ji me ra îhsan bike yek du peyalan

38

Li ser îman ruş bistîne ya Reb
Di qebrê da tu arî min be ya Reb

39

Bide destûr di wî roja qiyamet
Ku meherke ji mi ra şahê şefa'et

40

Şelat û hem selam hingê cîbalan
Ji bo wî bin digel eşhab û alan

4. Eya Nazim

Mefa'îlun Mefa'îlun Fe'ûlun

1

Eya Nazim di şubhan zû tu rabe
Ji bo mêjê gelek 'ebdê Xweda be

2

Hemî mêjan cemaet ke dewamî
Ji bo mêjan xwe paqij ke tamamî

3

Ji bo seyda û bab û da û maman
Îta'et ke wekî 'ebd û gulaman

4

Kesê mestir bitin hürmet ke jê ra
Çıqa bikarî bike xidmet tu jê ra

5

Nebî 'aciz bikî heval û feqıyan
Xweda ca li te nedit derban bi weqyan

6

Nebî carek ku dersê te biçitin
Xwe a'ciz ke ciqasî ku ji te bêtin

7

Rewa ke ders û dewran qenc Nazim
Li hucran û li nav feqıyan beda im

8

Digel zarokê gundiyan ra nelîze
Feqî weqtê bilîz tu bilîze

9

Tu meşqêke bi xettek hûr û reş ke
Xetê xwe taze û navê xwe xweş ke

5. Eya Ronahiya Çavê Me Nazim

Mefa'îlun Mefa'îlun Fe'ûlun

1

Eya ronahiya çavê me Nazim
Bixûne hem digel binvîse daim

2

Neborîne li xwe dersan tu caran
Feqî bi dersan dibin mişlê tucaran

3

Hero carek tu dewrê xwe bixûne
Eger carek biwestî tu tu rûne

4

Bila ji bo te qelem her dem li kar bî
Dewîda te bila her derkenar bî

5

Nenêre li saet û kurtek û şalan
Di civatan da bibe her mişlê lalan

6

Eger carek tu acizkî hevalan
Bizane qet tu nabîte ji delalan

7

Eger xwendin nekî heta mezin bî
Te dê heval ker û ga û bizin bî

8

Kesê zana welew bimirî jî saq e³⁷¹
Ji navê wî tijî Şam û Îraq e

9

Nezan her weqtekî wek meyyîtan e
Hevalê te' b û toz û zehmetan e

³⁷¹ Saq e yanê sax e.

10

Çiqa şerm e ji te haval biborî
Wekî çokan e ew tu mişlê morî

11

Di deh sal dî heval dibite ji seyda
Tu dê bikevte di nav zencîr û qeyda

12

Hezar axan hezar heyfan bibêje
Ji bo wî kû nexûnî bibite gêj e

6. Li Şêx Sebrî Selamê Mişlê Baran³⁷²

Mefa'îlun Mefa'îlun Fe'ûlun

1

Li Şêx Sebrî selamê mişlê baran
Şêrîn û xweş weke taze hinaran

2

Mu'et̤ter bin wekî reyhan û werdan
Bikin def'a gem û êşan û derdan

3

Dikim teqbîl ewan destê mubarek
Qena'et nakem ez eşlen bi carek

4

Ji bo eşyax û Naviyan temamî
Dikem te'zîm û hurmet hem xulamî

5

'Ele't-texşîş Şêx³⁷³ 'Abid îlahî
Ji bona wan bide her xêr û şahî

6

Bira te'rîf ji bo 'arif *qebîh*³⁷⁴ e
Ji bo zana neşîhet *naşehîh*³⁷⁵ e

7

Kesê *naşehîh* ji bo behran verêket
Di nav 'alem miheqqeq dê fehêket

8

Ji bo bağan kesê fêkî bişînî
Dibin riswaîû şermî dimînî

³⁷² Ev helbest ji bona serxweşiya şêxên Naviyan hatiye nivîsandin.[Şêx Muşerref]

³⁷³ Bi taybetî

³⁷⁴ Kirêt e

³⁷⁵ Durust nîne

9

Welakîn³⁷⁶ carinan nef'e tekellum³⁷⁷Diket def'a gem û huzn û teellum³⁷⁸

10

Bira dinya heqîqet her weha ye

Cihê derd û gem û huzn û cefa³⁷⁹ ye

11

Gelek Zînan vexarin firqeta Mem

Gelek Leylan ji bo Mecnûn kirin gem

12

Dinê madem fena ye bes dirêjkem

Serê sami' ji tetwîlatê gêjkem

13

Welê elhemdulillah me yeqîn e

Ku cennet xweş cih e ji bo mu'mînîn e

14

Li wê qet nîne firqet her lîqa³⁸⁰ ye

Li wê qet nîne zehmet her sefa ye

15

Ji vê fikrê me dil daim dibit hey

Nehin têda birînê dağ û hem key

16

Îlahî ku çewan îman te kir bexş

Ji ewwil dil bi tewhîdê te kir neqş

17

Bi lufta xwe bike ihsan di axir

Me nîne taqeta te'ziya agir

³⁷⁶ Lê belê³⁷⁷ Fayde ye axaftin³⁷⁸ Def kirina xem û xemgînî û pê eşandin e.³⁷⁹ Derd û xem û xemgînî û eş e.³⁸⁰ Hev û din dîtin.

18

Menêre ya Îlahî van gunehan
Tu seħke Rebbena nalîn û ahan

19

Semî'î tu 'efûkarî muheqqeq
Miħemmed jî şefa'etkar e el-heq

20

*Lekê 'l-hemdu îlahî we'ş-şelatu*³⁸¹
'Ela zatî lehu kemulet şifatu

21

*Keza al we eşhab cemî'en*³⁸²
We men edħa lî emrîhûm muţî'en

³⁸¹ Xwedayê min, selat û hemd ji te ra ye
Ew Xwe bixwe ye, sifetên wî bê kêmasî ne

³⁸² Keza malbat û hevalên wî bi tevahî
Û (li ser) kesên îtaetkirên emrê wî

7. **Selamê Mislê Reyhanan**³⁸³**Mefa'îlun Mefa'îlun Fe'ûlun**

1

Selamê mislê reyhanan mu'etter
 Ji bo ewladê eşrafan muzeffer

2

Dibosim ez ewan destê mubarek
 Qena'et nakem ez eşla bi carek

3

Dikim te'zîm ji bona bab û maman
 Dibosim destê wan piştî selaman

4

'Ezîzem weqtê min îro peîz e
 Peîz bêşubhe feşlek nalezîz e

5

Qewî zerbûn ev ewraq û eşcar³⁸⁴
 Qewî çikyan ev rûbar û enhar

6

Mij û moran e berf e her li dağan
 Nemaye rewneq û eşlen li bağan

7

Me 'umrek pir 'ezîz borand bêkar
 Me der winda kirin bê'ed û hijmar

8

Ji 'eyban deftera xwe pir me reşkir
 Ji 'işyan agirê herbê me geşkir

³⁸³ Ev helbest ji bo Şêx Muzefferê kurê Şêx Bircisî hatiye nivîsandin. Ew ji malbata Sultan Memdûhê Tilloyî ye û li Urfeyê niştecih e.[Şêx Muşerref]

³⁸⁴ Pel û dar

9

Direngîme li min êvar e êvar
‘Elîlim ez birîndar im birîndar

10

Qewî lalim dinalim mişlê bilbil
Qewî dûrim ji bihna Hezretê gul

11

Ji bo min heq di îro her girîn e
Ji me ra lazim gem û êşan û şîn e

12

Kelamê min qewî bêtam û xam e
Qewî sist e qewî bêintîzam e

13

‘Ezîzê min dikim hêvî bicaran
Nenêre qet li ‘eybê ixtiyaran

14

‘Efû kin min ji dergahan nekin dûr
Bicebrînin bi rehmê qelbê meksûr

8. Ela Ey Saqiyê Gulrengê Şîrîn³⁸⁵

Mefa'îlun Mefa'îlun Fe'ûlun

1

Ela ey saqiyê gulrengê şêrîn

Emekdarî wefakarî li bîrîn

2

Cem' ke tu ji bo min tev evînan

Muferreḥ ke bi wan qelbê hezînan

3

Tu berhev ke 'ezîz cumle yaran

Tijî agir bike qelbê neyaran

4

Civatê tu munewwer ke bi bedran

Tijî şahî bike qelban û sedran

5

Ji delîlan bîne tu burhanê qaṭî³⁸⁶

Nehin ji geyrî yeqîn da nûrê saṭî'

6

Bixûne sûretê Taha tamamî

Bikem her dem ji bo te ez gulamî

7

Ela ey saqiyê gulbûyî rabe

Dilê min pir 'elîl û pir xerab e

8

Şerabek şafî û şîrîn tu bîne

Bike derman bi wî derd û birîn e

³⁸⁵ Ev helbest ji bona Şêx Muzefferê kurê Şêx Bircisî hatiye nivîsandin. Ew ji malbata Sultan Memdûhê Tilloyî ye û li Urfeyê niştecih e. [Şêx Muşerref]

³⁸⁶ Delîla teqez

9

Bide saqî şerabê tu peya pey
Bi wî qelbê mirî heqqen dibit hey

10

Dema dil hey bitin ‘ezman dibêjî
Derê mercan û yaqûtan dirêjî

11

Dilê mexzen lisan jê ra kilêd e
Dil hey bit bi wî her weqt û ‘îd e

12

Şeraba şaf digel yaranê ebrar
Diket dil *mecme ‘e’l-behreyne esrar*³⁸⁷

13

Zemanê îctîma‘ê dê bihar bit
Tebî‘et mu‘ted’il bit hem li kar bit

14

Mekanê îctîma‘ê ger dipirsî
Eger heybet nebit eşlen netirsî

15

Kenarê rewçê Sultan Memdûh
Dibî dil ber derê Memdûhî meftûh

16

Xezîna dil ku meftûh bî muheqqeq
Cewahir tene meydanê ‘ele’l-heq

17

Selamê taze û pir mişlê baran
Dewamî bit ji bo ehbab û yaran

³⁸⁷ Sîrrên cihê ku her du derya digêhêjine hev.

9. Ji Hicret Bû Hezar û Bîst û Çar Sed

Mefa'îlun Mefa'îlun Fe'ûlun

1

Ji hicret bû hezar û bîst û çar sed
Muherem nû bibû roja mucedded

2

Di sebtê piştî nimêja şubhê bêşek
Xwedanê 'alemê yek xaliqê tek

3

Keremkir 'ewrê îhsanatê barand
Ji bomîn keyf û şahî û fereh şand

4

Ji bo se'dê tifalek pîr mubarek
Ewî da pîr şîkur ya reb ne carek

5

Ji bo wî efdelê navan me danî
Ku Ebdullah bidê ya reb me'anî

6

Digel rehmet digel ni'met selaḥet
Digel bab û diyan hev ra se'adet

7

Xweda nebire ji me 'ilm û şelaḥî
Ji me nestîne ya reb wî silaḥî

8

Xweda amîn hezar amîn û amîn
Feqîrin bê'îlacîn bêmeqamîn

9

Şelat û hem selam ya reb bişîne
Ji bo şahînşehê textê Medîne

10

Digel eşhab û hem etba‘ û alan

Tijî dinya tijî deşt û newalan

Murebbe‘**1. Dêrdê Bêderman Firaq e³⁸⁸****Fa‘îlatûn Fa‘îlatûn**

1

Dêrdê bêderman firaq e
 Ew bi mişlê ihtiraq e
 Ew didit xelqê filaq e
 Raĥetî vê ra fena ye

2

Diçte xelqê bi kulab e
 Ew diket sîne qelab e
 Kes niza ew çi ‘îtab e
 Reĥm û însaf cem ğela ye

3

Mişlê dojê ew ‘ezab e
 Ew diket cergan kebab e
 Her diket qehr û şîtab e
 Ruh diket ji qalib cuda ye

4

Ne ji yek ne ji hezaran
 Her wekî celladê daran
 Serfirandî wê bi şîran
 Çimkî bêwe‘d û wefa ye.

³⁸⁸ Şêx Muşerrefî li ser vê helbestê bi zimanê ‘Erebî ev nîşe nivîsandiye: “*Fî eyyamî’s-şeba we lîza yûcedu fîhî neqâişun.*” Yanê di zemanê ciwaniyê da hatiye nivîsandin. Ji bona vê sedemê têda kêmasî hene.

5

Her wekî babkuştîyan e
Ew ji nesla Êzidiyan e
Destbixûna insiyan e
Kafirên ew bit ceza ye

6

Her kesê firqet gihayê
Her dîkî ew ayî û wayê
Hingî ruhê xwe nedayê
Cezbe û lertzîn û tay e

7

Firqet û hicra diyaran
Aniye ji çehvê hezaran
Hêstirê wek tavê baran
Çimkî derdek pîr cefa ye

8

Lêbelê ‘adet qedîm e
Ku li pey hicra elîm e
Wesleta yara kerîm e
Lê tenê bo min gela ye

9

Firqeta mehbûbê zor e
Ew di kê da bit zihûr e
‘Aqîbet çav dibite kor e
Nabêjî zulm û cefa ye

10

Her kesê dîtî bi şewket
Ew dizanî ew we naket
Hetta ser tilyan bi zer ket
Yek ji wan jî **Mîm Fa**³⁸⁹ ye

³⁸⁹ Mîm û Fa mexlesa Şêx Muşerrefî ye û wî ev mexlesa hanê gelek caran weke destnîşan (îmze) bi kar aniye. Mîm herfa serî ya navê wî ye (Muşerref) û Fa ji herfa dawiyê ya navê wî ye.

2. Gelo Kengî Dê Weşlet Bê³⁹⁰

Mefa'îlun Mefa'îlun

1

Gelo kengî dê weşlet bê
 Ciwan ket min ji vê şeybê
 Xwezî hudhudekî geybê
 Bixunid ewî di mizgîn da

2

Weşala dost û hem yaran
 Dê saq³⁹¹ ket me birîndaran
 Dê kê m ket dem'ê wek baran
 Çi dewlet bû li min peyda

3

Belê ez bawerî nakim
 Ji min ra her wekî 'alem
 Felek çerxek biket yek dem
 Li min ruh û cesed derda

4

Li min meylak bi ker ker kir
 Bi nanê min ewî zer kir
 Ciwa çehvan li min der kir
 Mirî me ez di destan da

5

Welê ez bêrica nîme
 Du'adarê ji barî me
 Ku ew weşlet biket xîm e
 Me danîne di bin wê da

³⁹⁰Min ev helbasta hanê di zemanê ciwaniya xwe da nivîsandiye.[Şêx Muşerref]

³⁹¹Yanê sax ket.

6

Eya weşlet çira naê
Gelo ma qey tu razaê
Tu sehnakî ‘uweylaê
Te ez kirime di caşkêda

7

Ji ber zikra ‘esê³⁹² pîr bûm
Wekî kalê hezar sal bûm
Bi gopal tenehnuh bûm
Di efraz û rêya tûl da

8

Wişal mişlê gula sûr e
Yeqîn tu dêjî kafûr e
Belê ji min qewî dûr e
Ji min ra feyde nehin têda

9

Îlahî tu bi Eşmed kî
Bi Yasîn û Mişhemmed kî
Bi babê Faşimayê kî
Me ruh bistîn di weşlê da

10

Heçî firqet vexwarî ew
Ji bo **Mîm Fa** digrî ew
Dizanî nîne têda xew
Wekî agir di cergê da

³⁹² Yanê ez ê.

3. Gelek Îro Birîndarim³⁹³

Mefa'îlun Mefa'îlun

1

Gelek îro birîndarim
Medet ya Şahê Erbîlê
Gelek îro gunehkarim
Medet ya şahê Erbîlê

2

Gunehkar im tebat naê
Giranbar im li dinyaê
Nizanim dê çewan çêkem
Medet ya şahê Erbîlê

3

Ne rênas im ne zana me
Şeva tarî li paş mame
Bîlahed îro westa me
Medet ya şahê Erbîlê

4

Ji rê mame gelek dûr im
Ne hosta me wekî kor im
Delîl û rehberêk nîne
Medet ya şahê Erbîlê

5

Dil û mîlak li min sohtin
Evan derdan û êşanan
Hekîmek nîne derman kit
Medet ya şahê Erbîlê

³⁹³ Ev helbest di derheqê Şêx Mustefa Kemaleddînê Neqşebendiyê Erbîlî da hatiye nivîsandin.[Şêx Muşerref]

6

Di dilda min tijî derdin
Ji hemyan zêde tirsî ne
Gelek dijwarin ew hersê
Medet ya şahê Erbîlê

7

Di wê hengama ruş danî
Nizanim ku ezê îman
Xelaşkim ya xwelî li ser bim
Medet ya şahê Erbîlê

8

Di wê qebra xir û xalî
Evê çala reş û tarî
Çewan dê bidim cewaba xwe
Medet ya şahê Erbîlê

9

Gelo belkî di heşrê da
Bibînim seydayê ‘alem
Şefa‘et ke ji bo min ew
Medet ya şahê Erbîlê

10

Îlahî pir dikim zarî
Di dinya û di ‘uqbaê
Ji qencan tu me dûr nexî
Medet ya şahê Erbîlê

11

Şelat û hem selam her dem
Li wî bînahiya çavan
Û al û şehb û etba‘an
Xusûsen şahê Erbîlê

4. Çiraê Dîn Rêya Kurt û Selamet³⁹⁴

Mefa'îlun Mefa'îlun Fe'ûlun

1

Çiraê dîn rêya kurt û selamet
 Delfîlek hazîqe Şêxê 'Îraqî
 Heyîva rûhnî û roja hîdayet
 Tebîbek şadiq e Şêxê 'Îraqî

2

Hekîm e dîtina wî her şifa ye
 Bi destûra Xuda Şêxê 'Îraqî
 Heqîqet destê wî destê Xuda ye
 Ji heq nabî cuda Şêxê 'Îraqî

3

Gelek mehbûb nazidar û şîrîn e
 Şerabek pir xweş e³⁹⁵ Şêxê 'Îraqî
 Qewî xweş reng bihn û nazenîn e
 Gelek sor û geş e Şêxê 'Îraqî

4

Di vê weqtê me da ew neqşebend e
 Diket hel muşkîlan Şêxê 'Îraqî
 Ji malê axiret pir dewlemend e
 Diket derman dilan Şêxê 'Îraqî

5

Di vê weqtê ew e her Xace Ehîrar
 Qewî xwey hîmmed e Şêxê 'Îraqî
 Xezîna 'ilm e behra nûrê esrar
 Çiraê ummet e Şêxê 'Îraqî

³⁹⁴ Ev helbest di şeva çarşembê 21ê Remezana sala 1373/1954an da hatiye nivîsandin û di derbareyî Şêx Mustefa Kemalê Erbilî da ye.[Şêx Muşerref]

³⁹⁵ Di nusxeya din da "bêgîş e" hatiye nivîsandin.

6

Ji bo Îslam Rebbanî îmam e
Îmamek ‘alim e Şêxê ‘Îraqî
Ji bo dîn û dinê bedrek temam e
Heyîvek salim e Şêxê ‘Îraqî

7

Bi heq ew naibe ji bo Şahê Dehlen
Û kalek mutleq e Şêxê ‘Îraqî
Li ser çavê me bê ehlen we sehlen³⁹⁶
Çîqa xwey rewneq e Şêxê ‘Îraqî

8

Ji bo wî *zu'l-cenaheyn*³⁹⁷ destgîr e
Çîqa xwey ‘esker e Şêxê ‘Îraqî
Di vê weqtê bila mîs û nezîr e
Çi zana rehber e Şêxê ‘Îraqî

9

Xelîfê Hezretê Şêxê Tewîl e
Siraceddîn e ev Şêxê ‘Îraqî
Gelek ew murşîdek bêqalûqîl e
Bi hal û hem bi dev Şêxê ‘Îraqî

10

Ġiyasettin ji bo wî bab û pişt e
Binêre quwweta Şêxê ‘Îraqî
Di dest da kewser û hewza bihişt e
Vexu tu şerbeta Şêxê ‘Îraqî

³⁹⁶ Bi xêr û xweşî hatî

³⁹⁷ Xwdanê per û baskan

11

Eya Şêxê ‘Îraqî min tu yî ruh
Tu yî ruh û rewan Şêxê ‘Îraqî
*Îleykum eştekî we’l-qelbu mecrûh*³⁹⁸
Bînari’l-hubbî bu’dî we’f-tîraqî

12

Birêje ey Xuda rebbê Selaman
Li babê Faţîma şahê boraqî³⁹⁹
Di gel alan û eşhab û gulaman
Temamiyle xusûs Şêxê ‘Îraqî

³⁹⁸ Gazindên min ji te ra ne û dil birîndar e.

Bi agirê evîna ji min dûr û cuda

³⁹⁹ Dî nusxeya din da evha hatiye nivîsîn: Li ser rewza xweşa şahê boraqî

5. Ya Îlahî Ez Ğerîbim⁴⁰⁰

Fa'îlatûn Fa'îlatûn

1

Ya îlahî ez Ğerîbim
Bênewa me bêdelîl im
Ya îlahî ez 'elîlim
Bêdewa me bêtebîbim

2

Ya îlahî ez feqîrim
Bêkes û bê destegîrim
Xaifê dexla se'îrim
Raciyê 'efwa mucibim

3

Ya îlahî tu Şebûrî
Hatime 'efwa Ğefûrî
Çimkî zanim tu Şekûrî
Nê ji tirsan dilkebînim

4

Ya îlahî tu qedîrî
Tu dika gunehan qeşîrî
Wê bike ji bo vê feqîrî
Lew ji xelqê bêneşîbim

5

Ya îlahî vê dikim ez
Zarî û hawar dikim ez
Hêvîya 'efû dikim ez
Mişlê çûka 'endelîbim

⁴⁰⁰ Ev helbasta hanê Şêx Muşerrefî di ciwaniya xwe da nivîsandiye.

6

Ya îlahî **mîm û fa** ye

Yê ji xelqê bêrica ye

Heviya zatê te maye

Pê ve ez hêviya hebîbim

6. Ji Me Ra Daye Xudayê Me⁴⁰¹

Fe‘ilatun Fe‘ilatun Fe‘ilatun Fe‘ilun

1

Ji me ra daye Xudayê me ji behra keremê
Murşidek mişlê semaê di ‘elaê ‘ezemê
Dafî‘ê derd û belan û kederan û elemê
*Kullu men yeḡlubuhu mu ‘teḡîden fel yenem*⁴⁰²

2

Qelbê ehlê dilan û çepera ehlê dînî
Quwweta wî ji şehînsahê Resûlê Medenî
Ruhniya qelb û ciger sani‘ê burdê yemenî
*Înnehu ‘l-quṭbu bîhî ‘r-rîbḡu fe mînhu îḡtenem*⁴⁰³

3

Xweş diket şibhê Mesîḡ her kesê ku bimirî
Şeh dibî her wekî şêrê ger biket lê nezerî
Wekî şiddîq e di şidqê û di setwet ‘Umerî
*Huwe ‘Uşmanu mîne ‘l-ḡilmî ‘eliyyu ‘ş-şiyem*⁴⁰⁴

4

Ḥatemê cûd û sexa şahibê mecd û şerefi
Yûsifê husn û beha naibê hindî selefî
Ew e meşhûr û munîr û fereha her terefî
*Înnehu ‘ş-şeyxu lî ehlî ‘l-lahî ḡaccu ‘l-ḡerem*⁴⁰⁵

5

Ji ewî bûye xûnek menbe‘ê îrşad û şifa
Cihê quṭban û murîdan û erbabê sefa
*Men yerum muntehîyen yuḡfer lehu ma selefa*⁴⁰⁶

⁴⁰¹ Min ev helbesta hanê li ser daxwaza Mela Ebdullahê Kodikî, dema bavê wî Şêx Es‘edê Xinukî çûye hecê nivîsandiye.[Şêx Muşerref]

⁴⁰² Ê ku dixwazin bawer bikin ew dibin bi aram

⁴⁰³ Bêguman ew qutbê qezenc bi wî ye û xenîmet jî ji wî ye.

⁴⁰⁴ Ew wek Usmanê xwedan şerm e û wek tebiyet Elî ye.

⁴⁰⁵ Ew şêx e ji bo ehlê Xwedê haciyu‘l-herem e

⁴⁰⁶ Kesê/a ku dev ji gunehan berdide û gunehên wî/ê tên bexşandin
Ew herî bextewar e pêşeng e û xwedî hîmnet e.

Es 'edu' l-kewnî îmamu melîkîn zû hîmem

6

Melhema dag û birînê saqiyê cam û qedeḥ

Hadiyê mu'teqîdane calibê keyf û fereḥ

Rohniya cumle murîdan û necma şubeh⁴⁰⁷

Ḥebbeza en-newḥu lî men yetbe 'u 'inde' l-fehem⁴⁰⁸

7

Sebebê fewz û xemmarê ji bo vê ḥeleqê

Di şevê zarî û nalîn e ewî ta şefeqê

Ger bidin weşfê ewî xelqê li ser vê ṭebeqê

Zehebe' l-kullu île' l-kellî⁴⁰⁹ we lew bî' l-qelem⁴¹⁰

8

Li me ferz e bi dewamî şukr û hemdê şemedî

Û bibêjin ya îlahî tu bikî vî ebedî

Û bixwazin ji ewî reḥm û dewa û mededî

Înne men yedrî ledeyhî zake e' le' n-nî' emî⁴¹¹

9

Bi hewar û bi newa cumle bi bal wî ve herin

Xwe bikin 'ebdê derîzanê ḥeta hûn bimirin

Ji ewî avê heyatê bi yeqîn hûn bigerin

Exlîşû et-tewbete lîllahî we za bi' n-nedem⁴¹²

10

Ya îlahî tu bikî 'emrê ewî zeḥf û gelek

Tu bikî rutbetê wî mişlê semakan û felek

Bike nuşret ji ewî ra heme eqṭab û melek

We edîm 'eyşehu we' c' elna lehu mîn xedem⁴¹³

⁴⁰⁷ Dengê ji vê misrayê kême.

⁴⁰⁸ Qewî qenc e hewar ji bo kesê/a bûye peyrew di têngiştinê da.

⁴⁰⁹ "el-Kellî" bi zebera kafê tê wateya westandin û tengezariyê.

⁴¹⁰ Welew bi pênuşê be jî gişt çû tengezariyê.

⁴¹¹ Xwediyê îdrakê xwediyê nîmetê herî qenc e.

⁴¹² Ji dil û bi poşmanî tewbe bikin ji bo Xwedê ew jî bi poşmaniyê ye.

⁴¹³ (Ya Rebbî) Daim bike jiyana wî û me bikê xizmetkarê wî.

7. Gelek Îro Birîndarim⁴¹⁴

Mefa'îlun Mefa'îlun

1

Gelek îro birîndarim
Ze'îf û xeste û jarim
Giranbarim gunehkarim
Meded ya Ğewsê Geylanî

2

Gunehkarim tebat naê
'Umur borî li ber baê
Nenasim kes ji dinyaê
Meded ya Ğewsê Geylanî

3

Di çolê mane em gorîn
Ji meqşûdê gelek dûrin
Divêtin em bikin qorîn
Meded ya Ğewsê Geylanî

4

'Umir borî nebû karek
Nebû haşilmurad carek
Nehate ber me dîdarek
Meded ya Ğewsê Geylanî

5

'Umur borî di nav derdan
Heval çûn ketne nav wîrdan
Feqîr mane li nav 'erdan
Meded ya Ğewsê Geylanî

⁴¹⁴Min ev helbesta hanê di sala 1375/1955an da li gundê Rûbarê li ser daxwaza Mela Ebdullahê kurê Hacî Şerîfî nivîsandiye.[Şêx Muşerref]

6

Feqîr mane li nav tozan
Bila biherin ji tû gûzan
Ji şahiyân di nevrozan
Meded ya Ğewsê Geylanî

7

Êdî seş nakin ew bangî
Dikin ‘ebdaliya gangî
Vexwarin şîrê vî mangî
Meded ya Ğewsê Geylanî

8

Bi meqşûd her kesek şay e
Tenê halê me îza ye
Dibêm bextê me razaye
Meded ya Ğewsê Geylanî

9

Di behrek bêbinî mane
Gemî qayîk nepeyda ne
Ne zana ne ne hostan e
Meded ya Ğewsê Geylanî

10

Di aĝîr û vi doman e
‘Ecîbek ba û baran e
Perê pêşî biweşyan e
Meded ya Ğewsê Geylanî

11

Xuda navê te Reḥman e
Bike derdê me derman e
Derîne me ji beḥran e
Meded ya Ğewsê Geylanî

12

Bi heqqê Sûreê Tûrê
Xuda baqî ke vê nûrê
Bide tewfîq û desturê
Meded ya Ğewsê Geylanî

8. Ey Bêkemala Bêemek⁴¹⁵

Mustef'îlun Mustef'îlun

1

Ey bêkemala bêemek
 Rûyê te nayîştin demek
 Wey bêcemala bênemek
 Xwehra fitilya kêlbitan

2

Rûyê te ma qey hesin e
 Qet naketin şerma min e
 Qelbê te ya neahen e
 Qeṭ'a nizanî hurmetan

3

Fitlê te fitlê hîle ne
 Xwehrî tê da bêhed hene
 Qet rastiya te mumkin e
 Ji şîret û nesîhetan

4

Berxî⁴¹⁶ dizanî her tenê
 Heqqê ey pîsa dinê
 Hem pêkiran hem gotinê
 Tête ewî bêmuhtetan

5

Heqqê xiraban her weye
 Şîret li wan bêfayde ye
 Dermanê pîsan pîsî ye
 Li ser xetan û bin xetan

⁴¹⁵ Min ji birayê xwe Bedreddîn kêlbitana agir xwest wî ew gelek giro kir û ez li Rûbarê bûm û ew li Xinûkê bû. Îna ez bi vê helbestê digel kêlbitanê axivîm. [Şêx Muşerref]

⁴¹⁶ Berxî: Hesinkarekî Xinûkî yê navdar bûye.

6

Ey guhdirêja bê‘elef⁴¹⁷

Ey eşqiyaê pir telef

Hevalê Îkramê Xelef⁴¹⁸

Beske ji van qebaĥetan

7

Soz bî li min we‘d û qerar

Ger bêtucarek van diyar

Dev te tijî bikim ji nar

Ĥetta bibînî zehmetan

8

Wî serkê xweher û fettilî

Ger bête der ji nava gelî

Dê ĥeps bikim ey serxwelî

Li Tenûr û yan Deştitan⁴¹⁹

9

Berdim te ez Gezû û Bebû⁴²⁰

Yan neviyê sofi nebû

Bêşermiya te qet nebû

Borî ji resm û ‘adetan

10

*Estegfiru ‘l-lahe ‘l-‘ezîm*⁴²¹

Ya Reb tu rehman û rehîm

Qencî ‘efûkarê kerîm

‘Efûke cumle qişşetan

⁴¹⁷ Yanê ker

⁴¹⁸ Eşqiyayek e

⁴¹⁹ Tenûr û Deştitan navê du gundên devera Berwariyê ne.

⁴²⁰ Gezû û Bebû nasnavên Muhammed Nazim û Muhammed Asimî ne û ev her du kes kurên Şêx Muşerrefî ne.

⁴²¹ Ji Xwedê lêborîna xwe jî bixwazin.

9. Xuda Daye di Vê Dewrê⁴²²

Mefa'îlun Mefa'îlun

1

Xuda daye di vê dewrê
 Kerîmek her wekî behrê
 Ji Buhtan û heta Misrê
 Xuyaye şibhetî bedrê

2

Ṭebîbek mişlê Luqman e
 Di weqtêda Suleyman e
 Hebîbê qelbê ehlan e
 Nehin wek wî di vê 'eşrê

3

Eberre 'n-nase fi 'l-qewlî⁴²³
We muncîhîm lede 'l-hewlî
We in tes 'el 'enî 'l-fedlî
Fehaza leyletu 'l-qedrê

4

Ew e Şêx Es'edê Sanî
 Ew e Sultânê Rebbanî
 Di 'ilm û hilm û sirkanî
Mehellê 'ewn û hem neşrê⁴²⁴

⁴²² Ev helbest, min li ser daxwaza Mela 'Ebdullahê Kodikî yê Xesxêrê nivîsand.[Şêx Muşerref]

⁴²³ Wî di gotinê da soz da însanan.

Û di tirsê da wan xilas kir.

Û ger bipirsî ji fezîletê

Ewa şeva Leyletul Qedrê ye.

⁴²⁴ Cihê alîkarî û serkeftinê

5

Ew e serdarê ‘uşşaqan
Ew e mecrûhê eşwaqan
Ew e xaqan di afaqan
Şehîr e ew di her qetrê

6

Ji bo xelqan ew e quṭb e
‘Ezîm û ‘aliyê rutbe
Wekî deryaekê rehbe
Ji bo me Yûsifê Şebrê

7

Yunacî'l-lahe fi'l-ğeybî⁴²⁵
We ma fi zake mîn reybî
Se'a 'edwen île 'ş-şîbî
Lî xewfi'l-lahî we'z-ze'erî

8

Ji bo medhan ew e cami‘
Di dinyaê nehîni tami‘
Ji qelbê nûr dibî lami‘
Ji ber tesbîh û hem zikrî

9

Bizanin wî gelek samî
Nezîrê quṭbê Bestamî
Wekî Mewlayê ma Camî
Di ‘işqa saqiyê xemrê⁴²⁶

⁴²⁵ Di xeybê da gazî û lavayê Xwedê dike.

Û tune ye di vir da du dilî.

Bi lêz ber bi kalbûnê va diçe.

Ji ber tirs û xofa Xwedê

⁴²⁶ Belavkarê şerabê/Şêxê Terîqetê

10

Bigêrin hûn ewî Ke‘be
Dê zail bibin hemî te‘be
Dê hel bin muşkîl û şe‘be
Bizanin wî wekî xizrê

11

Bi dinyaê nebin megrûr
Bi zêrê xwe nebin mesrûr
Nekin nefsa xwe hûn megdûr
Hemî dê em biçin qebrê

12

Bişemirînin evê lehwê
Bikin tewbe ji vê qehwê
Derêxin hûn ji vê sehwe
Munebbeh bin ji vê sekrê

13

Herin cem wî şehînşahî
Bibin ‘ebdalê dergahî
Bi hawar û du sed ahî
Bikin çavan wekî ‘ewrê

14

Ne ew bêqet xelaş nîne
Hemî em cumle şermî ne
Gelo ma bawerî nîne
Bi van lefzê di van şî‘rê

15

Jimara beyreqa kesk e
Çi xurşîd e çi xweş misk e
Sebeb wî ger Xuda hezke
Bi serbestî biçin heşrê

16

Çuwe Yesrîb ji bo derman
Eger ku ew⁴²⁷ biket ferman
Ciwana dê ew biket hirman
*Bîla îza bîla 'esrê*⁴²⁸

17

Di dilda ew feqîran e
Bizahir mişlê şahan e
Biquwwet şîbhê Sehlan⁴²⁹ e
*Ke qemqamîn bîla qe're*⁴³⁰

18

Îlahî tu mueyyed kî
Umûrê wî musedded kî
Bi tewfîqê muqelled kî
Dirêjkî weqtê vê muhrê

19

Bi wî tu me hîdayet kî
Ji mara tu 'înayet kî
Ji şerran me selamet kî
Muyesser kî hemî xêrê

⁴²⁷ Ji "ew" armanc Xwedê ye.

⁴²⁸ Bê zor û bê zehmetî

⁴²⁹ Sehlan navê çiyayekî ye.

⁴³⁰ Weke behreke bêbinî

10. Gelî Berwariyan

Mefa'îlun Mefa'îlun

- 1 Gelî Berwariyan beskin
Bikin tewbê ji 'îsyanan
Bi hawar û ji dil bêjin
Meded şêx Es'edê Sanî
- 2
Meded ey fexrê mehbûban
Meded ey şebrê mehsûban
Tebîbê derdê mensûban
Meded şêx Es'edê Sanî
- 3
Meded ey şêxê dilrehnî
Meded ey şêxê serkehnî
Çiqa xweşnav û xweşbînî
Meded şêx Es'edê Sanî
- 4
Xezîna durr û elmasî
Dikî hel muşkilê asî
Wekalê Şahê Vêlasî
Meded şêx Es'edê Sanî
- 5
Wekalê şahê aţaffî
Gelek ser kehniyek şaffî
Dihevda rehm û elţaffî
Meded şêx Es'edê Sanî

6

Belê çî bikim ji bêçavan
Ku mehrûmin hemî gavan
Qe nabînin seh û tavan
Meded şêx Es'edê Sanî

7

Ezê çî bikim ji bêqelban
Hetta ew biçne nav turban
Ewê li xwe bidin hezar derdan
Meded şêx Es'edê Sanî

8

Milek Mewlana Şêx Xalid
Milek Şêx Salihê Sîpkî
Di pişta bav û bapîran
Meded Şêx Es'edê Sanî

9

Kesê çavê wî bî nabî
Dilê wî ruhî û zana bî
Ewê bêjin digel zarî
Meded Şêx Es'edê Sanî

10

Gelî Berwariyan rabin
Vekin çavan û bes razin
Bi dostan qewî bigrin
Dewa Şêx Es'edê Sanî

11

Menêrin mal û emlakan
Xwe paqijkin ji van lakan
Bi ava paka serkehnî
Li nik Şêx Es'edê Sanî

12

Bi keyla heq Xuda da ye
Çira yek ruhnî berdaye
Wekî koran nebin ka ye
Ev e Şêx Es'edê Sanî

13

Xudaya Xaliqê Barî
Tu yî Hadî tu yî Ğgeffarî
Tu çêke xelqê Berwarî
Ji bo Şêx Es'edê Sanî

14

Îlahî fetḥ û îqbalî
Îlahî medḥ û îclalî
Rîza pêxember û alî
Bide Şêx Es'edê Sanî

15

Şelat û hem selam daim
Li ruhê babê Fatimaê
Bi wî ra al û eşḥabin
Digel Şêx Es'edê Sanî

11. Ey Nefsa Qewîrûreş⁴³¹

Mef'ûlu Mefa'ilun

1

Ey nefsa qewîrûreş
Bedbexta qewîserkeş
Rabe bilezîn lê xweş
Bal Hezretê Mewlana

2

Bigrî tu bike zarî
Qelbê xwe reş tarî
Paqij ke du sê carî
Bi ava derê Mewlana

3

Rabe tu neke teqşîr
Beske ji gem û teswîr
Re'yan û heme tedbîr
Teslîm bike Mewlana

4

Fikrê xwe hemî red ke
Kaxizê mucerred ke
Hazir bike tu ji bona
Neqş û xettê Mewlana

5

Pir 'eybek bêqam e
Yê wek te xeberdar bin
Der Hezretê ustadan
*Lasiyyema*⁴³² Mewlana

⁴³¹ Ev helbest li ser rêya bajarê Qonyayê hatiye nivîsandin.[Şêx Muşerref]

⁴³² Bi taybetî

6

Ey nefsê qewîşabe
Carek dî weha nabe
Teqdîm ke tu adab e
Ji bo merqedê Mewlana

7

Ev Hezretê Mewla ye
Bêmîşl û bêhemta ye
Meşhûrê di dinya ye
Pir himmet e Mewlana

8

Ev mexzenê ‘ilman e
‘Ellameê qewman e
Ev naibê Reḥman e
Pir rehmet e Mewlana

9

Serrafê qulûban e
Deffa‘ê kurûban e
Taca serê xûban e
Nura heqq e Mewlana

10

Ya Hezretê Mewlana
Ya laiqê iḥsana
Reḥm ke li perişana
Ya Hezretê Mewlana

11

Ya Rebbî tu bêhêvî
Meḥrûm me rênexî
Derman ke hemî derdan
Bo xatirê Mewlana

12

Baranê tehiyyatan

Ser Rewda Medîne bin

Hem al û eşhaban

Hem Turbeê Mewlana

12. Çi Bû Îro li Dinyaê⁴³³

Mefa'îlun Mefa'îlun

1

Çi bû îro li dinyaê
Dil û mêlak pijan îro
Bi narê firqetê sohtim
Ji ser ta pa hijan îro

2

Ser û pa tev birîndarim
Di dil da ez tijî narim
Gelek bêhal û bêkar im
Gula çavan rija îro

3

Çi hawarin çi nalîn e
Çi efganin çi kalîn e
Çira xelq cumle hezîn e
Çira şebrek nema îro

4

Çira millet diket zarî
Çira dinya bûye tarî
Çira tava geman barî
Gelo bêjin çi bû îro

5

Nebê seydayi seydayan
Çirai cumle zanayan
Nebê serdarê bînayan
Ji dinya berze bû îro

⁴³³ Ev helbest di derbareyî mirina Mela Ebdullahê Saruhî da ye.[Şêx Muşerref]

6

Nebê şer‘a şerîf rabû
Nebê dînê me winda bû
Ji me serkehnî çikya bû
Çiraê dîn tefa îro

7

Belê mehbûbê subhanî
Belê şîrînê rebbanî
Belê ew ‘abidê fanî
Ji dinya kir sefer îro

8

Belê ew ‘alimê ewhed
Belê ew meş‘ela bêhed
Belê Seydaê Şêx Es‘ed
Ji me wê bû cuda îro

9

Xweyê ewrad û ezkaran
Hezarê şubh û êvaran
Ji îstîğfarê eşaran
Kire mehrûmê weşen îro

10

Ewê xweş ‘alimê ‘amil
Ewê nûra gelek kamil
Ewêhişyar û şahib dil
Ji bo heq çû lîqa îro

11

Wefat kir zîneta ehlan
Ji we‘zê wî Ebû Cehlan
Dikir tewbe wekî ‘eqlan
Xirab kir memleket îro

12

Yeqîn cih bağê riđwan e
Bike tarîx û nîşan e
Binêre cezmê gufran e⁴³⁴
Hisab ke bê xeşa îro

13

Kesê seħ kit evan qewlan
Bila Îxlas û laħewlan
Bi Fatihê ra du sê neqlan
Bidet seydaê min îro

14

Jibona zuryeta seyda
Xuda derdan nekit peyda
Bikit haval ji bo Seyda
Miħemmed Mustefa îro

15

Ji bona Seydayê Muxtar
Û al û şehb û hem enşar
Şelat û hem selam sed car
Nebîtin întiha îro

⁴³⁴ Li gorî hisaba ebcedê cezm û gufran dibe 1381/1961. Ev dîroka hanê ya wefata Mela Ebdullahî ye.

13. Xuda Zanî Cegerrîşim⁴³⁵

Mefa'îlun Mefa'îlun

1

Xuda zanî cegerrîşim⁴³⁶

Bela'eyşim cefakêşim

Kebab im ez li ser şîşim

Ji hecra Babê Selmanî

2

Dinalim pir fenaçal im

Wekî mecrûhê çilsal im

Du çav û 'eynên bi xwe dal im⁴³⁷

Ji bu' da vî Suleymanî

3

Çewan wesla exê nûr î

Heyat û weqt xweş borîn

Ji lew em qet nemesrûr î

Ketîne vê zivistanî

4

Wişala wî çîqa xweş bû

Li meydanê gola geş bû

Ji nîsan bîst û hem şeş bû

Çiraê cumle îxwan î

5

Çi bilbil bû ji eş'aran

Çi nêrgiz bû li nav yaran

Dewaê me birîndaran

Ji bo me hudhuda sanî

⁴³⁵ Ev helbest di derbareyî Mela Silêmanê Tilloyî da hatiye nivîsandin.[Şêx Muşerref]

⁴³⁶ Cegerrîş yanê cegerbirîndar

⁴³⁷ Dal herfek ji elifbêya 'Erebî ye û tê maneya xarbûna ji ber sedemên xeman, derd û kulan.

6

Li Erdîşê li wî tozê
Di wî huzna şev û rojê
Li min kir mişlê newrozê
Li nav xelqê di Îranî

7

Li Zaxo hem di wî huznê
Bibûm nêzîk ji bo defnê
Suleymanê xweyî husnê
Li min kir 'îda qurbanî

8

Xudaya ey xweyê rehmê
Bike def'a evê zulmê
Bişîne nav biran fehmê
Bike îhya dil û canî

9

Xudaya pir dikim zarî
Di şibeħan û di êvarî
Suleyman bîne vê carî
Bi luţf û rehm û ihsanî

14. Kanê Gelo Keyfa Berê⁴³⁸

Mustef'îlun Mustef'îlun

1

Kanê gelo keyfa berê
Kanê civata şekkerî
Her yek tenê çû yek derê
Ax 'eskerî ax 'eskerî

2

Kanê gelo Bedra Munîr
Ev faqîlê her ca şehîr
Deryaê 'ilmê bênezîr
Ax 'eskerî ax 'eskerî

3

Kanê **Muşerref** pir zîya
Fexra kiram û ezkiya
Tehqîq û tedqîq jê xuya
Ax 'eskerî ax 'eskerî

4

Kanê Suleymanê delal
Kanê Yûsifê bi husn û cemal
Ew hudhuda mizgîn li bal
Ax 'eskerî ax 'eskerî

5

Ew bilbila şîrîn xeber
Ew tûtiya weqtê seher
Derman dikir qelb û ceger
Ax 'eskerî ax 'eskerî

⁴³⁸ Şêx Muşerref û hevalên wî Mela Bedreddîn, Mela Suleyman, Mela 'Ebdulhemîd û Mela Muhemmed di sala 1371/1951an da dibine leşkeriyê û ew jî bi vê kejejanê vê helbestê dinivîse.[Şêx Muşerref]

6

Kanê Mela ‘Ebdulhemîd
 Şahibdilê fikra sedîd
 Keyfa mufîd û mustefîd
 Ax ‘eskerî ax ‘eskerî

7

Ewladê gewsê uxrewî
 Quţbê zemanê Tillowî
 Behra ‘ulûmê me‘newî
 Ax ‘eskerî ax ‘eskerî

8

Kan ew zekiyê pir edeb
 ‘Alî şifet galî neseb
 Kurmamê sultanê ‘Ereb
 Ax ‘eskerî ax ‘eskerî

9

E‘enî bîhî Mihemmeden
 Şîrîn kelam nazik beden
 Şebra ecîllaê weten
 Ax ‘eskerî ax ‘eskerî

10

Wî ‘eskerî bê mirwetê
 Bûyî mudîrê firqetê
 Yek ca tu nakî şefqetê
 Ax ‘eskerî ax ‘eskerî

11

Çawan evan yar û biran
 Van fend û fanûs û çiran
 Ketne di destê amiran
 Ax ‘eskerî ax ‘eskerî

12

Ger tu bikî feşsa cihan
Hetta hidûdê Esfehan
Yek ca tu nakî şefqetê
Ax ‘eskerî ax ‘eskerî

13

Xelqê nehin zewq û sefa
Zahir bûye li wan xefa
Lewra dikin lewm û cefa
Ax ‘eskerî ax ‘eskerî

14

Ya Reb tu yî fettaḥê bab
Reḥma te qet nîne hesab
Qelb û ceger bûne kebab
*We ente bî'r-reḥmî*⁴³⁹ ḥerî

⁴³⁹ Û tu bi rehmê

15. Îro Li Min Xweş Bû Birîn

Mustef'îlun Mustef'îlun

1

Îro li min xweş bû birîn
Çik bûn çem û xûn û girîn
Derd û elem yekcar firîn
Lewra weha xweş xeberîn

2

Dinya tamam lew bûye tav
Gulçîçekan girtin xunav
Qaz û quling lê bûn belav
Van bilbilan lê qal û şer

3

Bû dengdenga bilbilan
Xweş tê kenava sorgulan
Bu xuşxuşa sahibdilan
Cahil hema lê fikirîn

4

Sosin li mêrgan zeyînîn
Nêrgiz li wan xweş xweş kenîn
Xweş bû gulek bağ û cenîn
Dost û evên têda çerîn

5

Mektûbekêmişlê nebat
Wek kehniya ava heyat
Îro di êvarê ku hat
Hat û ji Diyarbekra şirîn

6

Çendan tu mektûbek xweşî
Mişlê gulreng û geşî
Mektûba destmehweşî
Dost û evîn Şekkerîn

7

Bihna ewan dostan ji te tê
Çendan dinerim vê xetê
Winda dikem pîr ‘îlletê
Ji şoşbetê wek bifirîn

8

Mektûba Babê ‘Izzetê
Bêhed xweş û pîr lezzetê
Gelek bi te sebra me tê
Îro gelek em şakir in

9

Ya babê Îzzeddîn, Xuda
Zanî ji te nabim cuda
Ne li ser xetan ne li bin xetan
Bê tuca naşebirim

10

Pişî evan cumle qisan
Selamekî wek nergisan
Ey şahiya her meclisan
Ji bo te ra hem hazirin

11

Destan dibosim daima
Du‘an bikin her daima
Du‘a dikin def‘a geman
*Wellahu xeyr ‘l-ğafîrîn*⁴⁴⁰

⁴⁴⁰ Tu ‘efûkarê herî qenc î

12

Malê dibosim pir gelek

Wan destê nazîdar û belek

Dêjin ji vê zêde emek

Nabî ku çendan difekkirîn

16. Ya Zuryeta Xeyru'l-Enam⁴⁴¹

Mustef'ilun Mustef'ilun

1

Ya zuryeta xeyru'l-enam
Bişkoja mişbahu'z-zelam
Ey tûtiya şirîn kelam
Ehlen we sehlen merheba

2

Ey newgula pêxember
Şahînşeha *xeyru'l-beşer*
Wey hudhuda pir xweş xeber
Ehlen we sehlen merheba

3

Bihna di we xweştir bûye
Rengê di we geştir bûye
Miska di we reştir bûye
Ehlen we sehlen merheba

⁴⁴¹ Ev helbest ji bona Şêx Mihemmed Salihê Hêşetê yê Arwasî hatiye nivîsandin.[Şêx Muşerref]

17. Gelek Îro Cîgerrîş im⁴⁴²

Mefa'îlun Mefa'îlun

1

Gelek îro cîgerrîşim
Cefakêşim bela'eyşim
Kebabim ez li ser şîşim
Ku çû Şêx Xalidê Sanî

2

Dinalim pir fenaçalim
Du çav 'eynin bi xwe dalim
Kerr û lalim gelek şalim
Ji hecra Xalidê Sanî

3

Birîndarim tijî narim
De'îf û xeste û jarim
Giranbarim û bê karim
Ji bu'da Xalidê Sanî

⁴⁴² Ev helbest di sala 1406/1986an da bi mirina Şêx Xalidê Oxînê hatiye nivîsandin.[Şêx Muşerref]

Muxemmes

1. Ya Eba Selman⁴⁴³

Fa‘îlatun Fa‘îlatun Fa‘îlatun Fa‘îlun

1

Ya Eba Selman salamê mişlê çaya Binxetê
Ku bi ava Miksê çêbit da temam ket lezzetê
Pir şirîntir ji hingivînê şarihê da ‘îlletê
Xweş diket bêzehmetî li şûna tēbîbê hikmetê
Ah ser û patêk helan ji vê firqetê ah firqetê

2

Ya Eba Selman salamê nazik û pak û temîz
Herwekî xeddê ‘erûsan xûb û şîrîn û lezîz
Û şifetê wan qet nizanin sed mucaz û çil mucîz
Ez dikim teqdîm ji bona wî Eba ‘Ebdul‘ezîz
Ah ser û patêk helan ji vê firqetê ah firqetê

3

Ya Eba Selman dibosim her du destê şekkerîn
Ew du dest dermanê derdanin şifa ne ji bo birîn
Ji îhtiramê ‘işqê şewqa wan birayan em pirîn
Lew weha natebitin em ji xwe ra naşebirin
Ah ser û patêk helan ji vê firqetê ah firqetê

⁴⁴³ Ev helbest li Rûbarê di sala 1378/1958ê ji bo Mela Silêmanê kurê Mela Xelîlê Tilloyî hatiye nivîsandin.[Şêx Muşerref]

4

Ya Eba Selman Suleyman ey bira û ey çira
 Bo çi mektûban birê nakî ji bo dostan çira
*Hel tera innî erakum qeble mewî hel tera*⁴⁴⁴
 Yan evan derd û geman dê bibne qebrê bi xwe ra
 Ah ser û patêk helan ji vê firqetê ah firqetê

5

Ya Eba Selman Xweda zanî gelek bêlezetim
 Pir fenahalim gelek ba derd û êş û ‘illetim
 Kuşiyê derba cudabûnim esîrê firqetim
 Ger çi ba kêf û sefa û ehl û mal û şuhbetim
 Ah ser û patêk helan ji vê firqetê ah firqetê

6

Ya Eba Selman Xweda zanî gelek ez xeste me
 Hemnişînê min dewamî derd û êşan û gem e
 ‘Illeta min qet ne sefra û xûn û belgem e
*Ez cerîhê firqetim*⁴⁴⁵ muştaqê didara te me
 Ah ser û patêk helan ji vê firqetê ah firqetê

7

Ya Eba Selman eger binvîsim ez sed defteran
 Pir di wêdan ez xelaskem ez gelek reşkem pelan
 Ev dilê min dê bidet min sed hucûm û sed şeran
 Bêje ey lal û nezano bes neke ji van kewseran
 Ah ser û patêk helan ji vê firqetê ah firqetê

8

Ya Eba Selman ricakarî ji Rebbê ‘Alemê
 Ew ji bo me dîtin û şohbetkerem ket her demê
 Xweş biket cumle birînan def’e ket gemê
 Ma neket wek bilbilê şeyda wekî Zîn û Memê
 Ah ser û patêk helan ji vê firqetê ah firqetê

⁴⁴⁴Tu nabînî bêguman beriya mirinê ez te dibînim tu nabînî.

⁴⁴⁵Birîndarê xerîbiyê me.

Yekmalik

1. Wê Dema Dî Weqtê Mirinê⁴⁴⁶

Fa'îlatûn Fa'îlatûn Fa'îlatûn Fa'îlun

Wê dema dî weqtê mirinê rû li ser axê nihî
Ey birader ferqê naket Sanihî bî ya Nûhî

2. Vê Bizanin⁴⁴⁷

Fa'îlatûn Fa'îlatûn Fa'îlatûn Fa'îlun

Vê bizanin ê nezan bit jê tê bihnek pir genî
Ê ku zana jê difurî bihneka wek ya bihî

3. Ew Zikê Têr Ho Hijîr Bî⁴⁴⁸

Fa'îlatûn Fa'îlatûn Fa'îlatûn Fa'îlun

Ew zikê têr ho hijîr bî daima dê bit esîr
Korefehî herwek derîr bî carekê nabit emîr

⁴⁴⁶ Ev helbest ji bona Mela Heciyê Sanohî hatiye nivîsandin. Sanohî navê gundekî ye û ev gund gundekî mezin e û ji devera Xesxêrê ye. [Şêx Muşerref] Nûhî ji gundekî piçûk e û ew jî ji vê deverê ye. Ji bona van her du gundan gotineke ewha tê gotin li vê deverê: Mirin eger hat serê xwe danî li ser axê didanî û ferq naket mirov xelkê gundekî mezin bit wekî Sanohî yan xelkê gundekî piçûk bit wekî Nûhî.

⁴⁴⁷ Min ev helbest ji bona kurê xwe Nazimî nivîsandiye. [Şêx Muşerref]

⁴⁴⁸ Min ev helbest ji bona Muhemmed Salihê kurê Mela Muhemmedê Girafê nivîsandiye. [Şêx Muşerref]

4. Tû Gihane Sêv Xuyane⁴⁴⁹

Fa'îlatûn Fa'îlatûn Fa'îlatûn Fa'îlun

Tû gihane sêv xuyane vê bizane ey lebîb
Derdê zik derdek giran e pir gerîb e pir 'ecîb

5. Ew Feqiyê Ku Birêjînî⁴⁵⁰

Fa'îlatûn Fa'îlatûn Fa'îlatûn Fa'îlun

Ew feqiyê ku birêjînî li ser bejnê esans
Ew ji seyda şermê naket wî nehîne eşl û esas

6. Ferqa Însanî ji Heywan⁴⁵¹

Fa'îlatûn Fa'îlatûn Fa'îlatûn Fa'îlun

Ferqa însanî ji heywan xwendin e û edeb
Mirovê xwenda şîrîn e çi 'ecem bî çi 'ereb

7. Dilê Min⁴⁵²

Mefa'îlun Mefa'îlun Fe'ûlun

Dilê min çayekê mehbûb û taze
Li ser kehniya reza nîşev dixwaze

⁴⁴⁹ Ji bona Mela Ebdurreqîb

⁴⁵⁰ Ji bo feqiyekî xwe

⁴⁵¹ Ji bo feqiyekî xwe

⁴⁵² Min ev helbest ji bona Şêx Muhemmed Salihê Hêşetê nivîsandîye. [Şêx Muşerref]

ENCAM

Şêx Muşerrefê Xinûkî di serê sedsala XXan da hatiye dinyayê û di serê sedsala XXIan da wefat kiriye. Xinûkî li pişt xwe gelek berhemên watedar hiştine û bi taybetî jî dîwana wî ya bi çar zimanî ji bo Edebiyata Kurdî ya Klasîk gelek muhim e, lê belê heta vê demê zêde nehatiye naskirin. Me xwest ku em li ser vê berhemê bixebitin û bala lêkolîner û xoşewîstên edebiyatê bikişînin serê. Di vê xebatê da em bi tenê li ser helbestên Şêx Muşerrefê Xinûkî yên Kurmancî sekinîne û me vekolaye. Di xebata xwe da me transkîrîpsiyona helbestan çêkiriye, ji aliyê ruxsarî û naverokê va tehlîla wan çêkiriye. Piştî vekolîna me ya li ser helbestên Xinûkî yên Kurdî em gihêştin van encamên jêrîn:

1. Şêx Muşerref di sala 1926an da hatiye dinyayê û di sala 2008an da jî wefat kiriye. Seyda li pişt xwe gelek berhem hiştine, lê heta vê gavê berhemên wî bi awayekî rêkûpêk nehatine çapkirin û bi awayekî desxet di destê malbata wî da mane.
2. Xinûkî helbestên xwe bi tevahî di dîwaneke serbixwe da berhev nekirine û desxetên xwe li cem xwe veneşartine. Hinek helbestên wî ji aliyê heval û dostên wî va hatine berhevkirin. Hetanî vê gavê di destên me da du nusxeyên dîwanê hene û ev her du nusxe jî di bin qontrola muellîfî ra hatine derbazkirin. Gelek helbestên wî jî winda bûne.
3. Dîwan bi çar zimanan, yanê bi Erebî, Farisî, Kurdî û Tirkî hatiye nivîsandin. Helbestên Kurdî bi tevahî 78 lib in û cureyên wan jî qesîde, mesnewî, xezel, murebbe, muxemmes û yekmalik in.
4. Naveroka helbestan bi piranî tesewuf, ‘eşqa îlahî, nesîhetên der bareyî exlaq û xwendinê da ne.
5. Seyda kevneşopiya edebiyata klasîk berdewam kiriye û di helbestên xwe da gelek “mezmûn” bi kar anîne.
6. Di nav helbestan da misra an jî malikên bi Erebî yan jî bi Farisî hene. Ev jî nîşan dide ku Şêx çawa di warê zimanê Kurdî da pispor e her wisa di zimanê Erebî û Farisî da jî pispor e.
7. Haya muellîfî ji edebiyata Kurdî heye û Dîwana Melayê Cizîrî, helbestên Feqiyê Teyran, berhemên Ehmedê Xanî, Nehcu’l-Enama Mela Xelîlê Sêrtî û Dîwana Seyît Elî Findikî xwendine. Lewra mirov dema helbestên wî dixwîne û dinirxîne tesîra wan şairên ku navên wan derbaz bûn dibîne.
8. Xinûkî helbestên xwe bi kêşeya erûzê nivîsandiye û di bikaranîna qalibên erûzê da serkeftî ye lê di hinek helbestan da jî di kêşa erûzê da tevlihevî heye.
9. Şêx Muşerref di warê wergerê da jî gelek serkeftî ye, lewra wî helbesteke Mewlana Xalidê Şehrezorî wergerandiye Kurdî. Mirov dema vê wergerê dixwîne qet bêhna wergerê jê nayê.
10. Di helbestên xwe da ji bo feqîyan gelek nesîhetan dike û dixwaze bi rêya helbestê wan teşwîqî xwendinê bike.

ÇAVKANÎ

- ACAR, H. (2016), *Dîwana Şêx Ehmedê Feqîr (Metn û Lêkolîn)*, İstanbul: Weşanên Nûbiharê.
- AÇIKGÖZ, N. (2007), Türkçe ve Kürtçe Mem u Zin ile Fuzûlî'nin Leylî vü Mecnûn Mesnevisinin Mukayesesi, *Turkish Studies International Periodical For the Languages, Literature and History of Turkish or Turkic*, Volume 2/4 Fall.
- ADAK, A. (2013), *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*, İstanbul: Weşanên Nûbiharê.
- (2014) "Di Edebîyata Kurdî ya Klasîk da Mesnewîyên Leyla û Mecnûnê", *Wêje û Rexne*, hej. 3, rr. 99-119.
- (2016), "Şewqiyê Xanî li Pey Şopa Ehmedê Xanî: Berawirdkirinek li Ser Mulemma'ên Wan ên Çarzimanî", *Nûbihara Akademî*, Cild: 2, Jimar: 5, Sal: 3.
- ALGÜL, H. (1997), "Hamza", *Dîyanet İslam Ansiklopedis*, İstanbul: Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları.
- ASLANOĞLU, O. (2014), *Pervin-i İ'tisami Divanı'nun Tahlili*, Atatürk Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü (Têza Doxtorayê ya Neçapkirî).
- BEDLÎSÎ, Ş. (2007). *Şerefname, Dîroka Kurdistanê*, İstanbul: Weşanên Avestayê.
- BİRİŞİK, A. (2002), "Kur'an", *Diyanet İslam Ansiklopedisi DİA*, XXVI, Ankara: Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları.
- BORAN, A., TÜFEKÇİOĞLU, A., ERDAL, Z., (2006), "Siirt ve İlçelerindeki 2000 Yılı Yüzey Araştırması", *XIX. Araştırma Sonuçları Toplantısı*, I-II, Yay. Haz. Komisyon, Ankara: T.C. Kültür Bakanlığı Yayınları.
- BOZARSLAN, M. E. (2005), *Mem û Zîn*, İstanbul: Weşanên Deng.
- CEBECİOĞLU, E. (2009), *Tasavvuf Terimleri ve Deyimleri Sözlüğü*, İstanbul: İnka Yayınları.
- CÎHANÎ, P. (2010), *Mem û Zîn*, İstanbul: Weşanên Nûbiharê.
- CÎWAN, M. (1997). *Ahmedê Xanî (jîyan, berhem û bîr û bawerîyên wî)*, İstanbul: Doz.
- ÇAĞLAYAN, M. E. (2007), "Siirt ve Çevresindeki Medrese Eğitimi", *Uluslararası Siirt Sempozyumu*, İzmir.
- ÇİÇEK, M. H. (2007), "es-Si'irdî, Molla Halil b. Hüseyin b. Halid el-Ömerî", *Uluslararası Siirt Sempozyumu*, İzmir.
- (2016), *Doğu Medreselerinin Serencamı*, İstanbul: Beyan Yayınları.
- DEMİR, Ş. (2016), *Cumhuriyet Döneminde Siirt*, İstanbul: Düzey Yayınları.

- DEMİRCAN, A. (2018), *İhsan Sureyya Sırma Pervari'den Paris'e*, İstanbul: Beyan Yayınları.
- DÊREŞÎ, Seîd (2011). *Dîwana Feqîyê Teyran*, Dîyarbakır: Weşanên Lisê.
- DEVRİM. H. (1999), *Axis 2000 Ansiklopedik Sözlük*, I-XII, Ankara: Doğan Kitap.
- DİLÇİN, C. (2004), *Örneklerle Türk Şiir Bilgisi*, Ankara: TDK Yayınları,
- DURMUŞ, İ. (2003), “Leylâ ve Mecnûn”, *Diyanet İslam Ansiklopedisi*, İstanbul: Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları.
- EAGLETON, T. (2011). *Şiir Nasıl Okunur*, (çev. Kaya Genç), İstanbul: Agora kitaplığı.
- EBDULKERİM MUHAMMED el-MUDERRÎS (1983), *Ulemauna fî xîzmetî'l-îlîm ve 'd-dîn*, (nşr. Muhammed Alî el-Qeredaxî), Bexdad: Daru'l-Hurriye.
- EHMEDÊ XANÎ (1986), *Nûbar*, (Berhevkar, Zeynelabîdîn Kaya), Stockholm: Weşanên Roja Nû.
- EPÖZDEMİR, Ş. (2015). *Medreseyên Kurdistanê*, İstanbul: Weşanên Nûbiharê.
- ERGÜN, Z. (2014). *Bajar-Edebîyat û Cizîra Botan*, İstanbul: Weşanên Nûbiharê.
- ERPOLAT Mehmet Salih, (2007), “Tapu-Tahrir Defterlerine Göre XV. Yüzyılda Midyat”, *Makalelerle Mardin, Tarih-Coğrafya*, (Haz. İbrahim Özcoşar), İstanbul: Mardin Tarihi İhtisas Kütüphanesi Yayınları.
- FAYDA, Mustafa, “Bedir Gazvesi”, *Diyanet İslam Ansiklopedisi*, İstanbul: Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları.
- FERHAN, A. Z. (2011), “Êzidilik ve Êzidi Toplumu”, *Uluslararası Geçmişten Günümüze İdil Sempozyumu*, İstanbul.
- HAMİDULLAH, M., Avcı, C. (2012), “Uhud Gazvesi”, *Diyanet İslam Ansiklopedisi*, İstanbul: Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları.
- HATİBOĞLU, İ. (2009), Selman-ı Farisî, *Diyanet İslam Ansiklopedisi*, İstanbul: Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları.
- HESEN Enwerî, (1383), *Ferhengê Kîneyatê Suxen*, I-II, Tehran: Weşanên Kîtabxaneî Millî İnan.
- İBNU'L-ESİR, Alî bîn Muhammed bîn Abdülkerîm el-Cezerî bîn Abdolvâhîd eş-Şeybânî (2004), *el-Kamîl fî't-tarîx* Qahîre: Mektebetu't-tewîqiyye.
- EL-İMAM el-HAFİZ Ebî Mihemmed 'Ebdul'ezîz Bîn 'Ebdulwehîd el-Meqdîsî (2003), *Muxteşeru's-sîretî'n-nebîyyîe we sîretu eşhabîhî'l-'eş'ere*, (Tahqîq: Xalid b. Ebdurrehman b. Hemdî Sayî'), Riyad: Weşanên Daru'l-belensiyeyê.
- JABA, A. (2000). *Çîrokên Kurmancî*, Stockholm: Weşanên Çanda Nûjenê.
- KAPLAN, Y. (2013), *Günümüz Yezidiliği*, İstanbul: Weşanên Nûbiharê.
- KARAGÖZ, İ., Karaman F., Paçacı, İ., Canbulat, M., Gelişgen, A., Ural, İ. (2010), *Dini Kavramlar Sözlüğü*, Ankara: Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları.

- KAVAK A. (2009), “Mevlânâ Halid-i Bağdadî’nin Halifelerinden Şeyh Osman Siracuddin et-Tavîlî (v. 1283/1866) ve Biyâre Medresesi/Tekkesi”, *Atatürk Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi*, Sayı: 43, Erzurum.
- (2009), *Dîvân-ı Mevlânâ Halidi Bağdâdî Tam Metin*, Konya: Ensar Yayıncılık.
- Kazıcı, Z. (2016), *İslam Eğitim Tarihi*, İstanbul: MÜİF Vakfı Yayınları.
- KILAVUZ, A. S. (2013), *Zeynelabidîn, Diyanet İslam Ansiklopedisi*, İstanbul: Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları.
- Kur’ân-ı Kerim ve Açıklamalı Meali*, Ankara: Diyanet Vakfı Yayınları.
- KURTULUŞ, R., Pala, İ. (2006), “Mülemme”, *DİA*, İstanbul: Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları.
- KÜLEKÇİ, N. (1999), *Açıklamalar ve Örneklerle Edebi Sanatlar*, Ankara: Akçağ Yayınları.
- M. XALİT SADİNÎ., (2009). *Warê Feyyê Teyran; Muks û Werezoz, Kovara W*, hej.29.
- (2013), *Mela Huseynê Bateyî- (Jiyan, Berhem û Helbestên Wî)*, İstanbul: Weşanên Nûbiharê.
- (2014), *Feqîyê Teyran, Jîyan, Berhem û Helbestên Wî*, İstanbul: Weşanên Nûbiharê.
- M. XALİT SADİNÎ û TEHSÎN DOSKÎ (2013), *Şêx Muşerrefê Xinûkî û Şairên Malbata Wî*, Dihok: Çapxaneyê Parêzgeha Dihokê.
- MECDU’D-DÎN MUHEMMED BÎN YE’QÛB el- FÎRÛZ ABADÎ, (2008), *el- Qamûsu’l-Muhîf*, (Tahqîq, Enes b. Muhammed eş-Şamî we Zekerîya Cabir Ehmed, Qahîre: Darul’l-Hedîs.
- MELA EHMEDÊ ZIVINGÎ (2013), *Gerdeniya Gewherî Şerha Dîwana Melayê Cizîrî*, (Amadekarî û Wergera ji Erebi: Emîn Narozî), İstanbul: Weşanên Avestayê.
- MELAYÊ BATEYÎ, (2012), *Mewlûd*, (Amadekar Huseyn Şemrexî), İstanbul: Weşanên Nûbiharê.
- MELAYÊ CİZİRÎ, (?). *Dîwan*, İstanbul: Fırat Yayınları.
- (2007) *Dîwan*, Arif Zêrevan (Transkripsiyon). Hewlêr: Weşanên Arasê.
- MESÛD, Cemîl Reşîd (2017), *Kêş û Serwa di Hozana Kurdî da*, Dihok: Dezgehê Nalbend.
- MEWLÂNÂ CELÂLEDDÎN RÛMÎ (2007), *Mesnevî*, (amadekar: Adnan Karaismailoğlu), Ankara: Yeni Şafak.
- MUHEMMED b. MUKERREM (1360), *Lisanu’l-Arab*, (nşr. Abdullah Alî Kebîr, Muhammed Ahmed Hesbullah, Haşîm Muhammed eş-Şazilî), Qahîre: Daru’l-Mearîf.
- MUHEMMED MUXTAR UMER (1997), *el-Esmâu’l-Husna*, Qahire: en-Naşir: ‘Alemlu’l-Kutub.
- ONAY, T. (1992), *Eski Türk Edebiyatında Mazmunlar ve İzahı* (hzl. Cemâl Kurnaz), Ankara, Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları.
- ÖZ, M. “Muhammed el-Bakır”, İstanbul: Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları.

- ÖZERVARLI, M. S. (2013), “Hanî Şeyh Ahmed”, *DİA*, İstanbul: Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları.
- ÖZGÜDENLİ, O. G. (2003), “Maveraunnehir”, *DİA*, İstanbul: Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları.
- PALA, İ. (2013), *Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü*, İstanbul: Kapı Yayınları.
- SAGŖNİÇ, F. H. (2002). *Dîroka Wêjeya Kurdî*, İstanbul: Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê.
- SEÇKİN, B. S., (2005), *Başlangıçtan Günümüze Siirt Tarihi*, İstanbul: Siirtliler Derneği Yayınları.
- SEYÎD ELİYÊ FINDIKÎ, (2014), *Dîwana Seyîd Eliyê Findikî*, (Amadekar, Selman Dilovan-Huseyn Şemrexî), İstanbul: Weşanên Nûbiharê,
- SEZER, M. (2016). *Dîwançeya Seyfîyê Şoşî*, Teza Mastirê ya Neçapkirî. Mardin: Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî.
- SÖNMEZ, N. (2015), Hafız-ı Şirazi-Melayê Cizrî Karşılaştırması (Aşk, Gül, Bülbül, Rinde, Züht ve Dini Semboller Açısından), *Uluslararası Sosyal Araştırmalar Dergisi*, Cilt: 8, Sayı: 40, rr. 137-149.
- (2018), *Karşılaştırmalı Hitabet -Cahiliye Dönemi ile İslam'ın İlk Dönemi-*, İstanbul: Rağbet Yayınları.
- SÜMER, F. (1988), “Abbas”, *Dîyanet İslam Ansiklopedis*, İstanbul: Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları.
- TOSUN, N. (2017), *Altın Silsile*, Erciş Vakfı.
- TUNCEL, M. (2007), “Geçmişten Günümüze Siirt Şehri”, *Uluslararası Siirt Sempozyumu*”, İzmir.
- ULUDAĞ, S. (1991), *Tasvvuf Terimleri Sözlüğü*, İstanbul Marifet Yayınları.
- UZUN, M. (1995). *Antolojîya Edebîyata Kurdî*, İstanbul: Tüm Zamanlar Yayıncılık.
- ÜŞENMEZ, E. (2014), XVI. Yüzyıl Doğu Türkçesi ile Yazılmış Bir Kur'an Tefsiri: Tercüme-i Tefsir-i Yakubi Çerxi (H. 993/M. 1585), *Uluslararası Türkçe Eğitim Kültür Dergisi*, Sayı: 3/1 r. 167-190.
- el-XEŖÎB el-BEXDADÎ, Ebî Bekr Ehmed b. Elî b. Sabit b. Ehmed b. Mehrî (2003), *Tarîxu 'l-Enbiya*, (Tehqîq; Asya Kuleyban Elî el-Barîh), Beyrut: Daru'l-Kutubî'l-İlmîyye.
- YAYLACIOĞLU, S. A. (2009), *Fuzûlî ve Bâkî Divanının Karşılaştırılması*, İstanbul Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü, (Têza Doxtorayê ya Neçapkirî), İstanbul.
- YILDIRIM, K. (2010). *Ehmedê Xanî, Mem û Zîn, Çeviri ve Kavramsal Tahlil*, İstanbul: Weşanên Avestayê.
- (2014), *Ehmedê Xanî Külliyyatı IV Dîwan*, İstanbul: Weşanên Avestayê.
- YILDIRIM, N. (2012), *Fars Mitoloji Sözlüğü*, İstanbul: Fenomen Yayıncılık.

- YILDIZ, M. Z., SARAÇOĞLU, H. (2007), 19. Yüzyıldan Günümüze Siirt İlinin İdari ve Demografik Yapısında Meydana Gelen Değişimler, *Uluslararası Siirt Sempozyumu*”, İzmir.
- YILMAZÇELİK İ. (1995), *XIX. Yüzyılın İlk Yarısında Diyarbakır (1790-1840)*, Ankara: TDK Yayınları.
- ZİVİNGÎ, M. E. (2013). *Gerdenîya Gewherî (Şerha Dîwana Melayê Cizîrî)*, Emîn Narozi (wer.). İstanbul: Weşanên Avestayê.

ÎNDEKSA NAV Û CIHAN

A

Abid, 5, 103, 230, 234
Adem, 4, 20, 63, 66, 69, 71, 72, 140, 154,
227
Adiyan, 15
Akqoyunlu, 13
Arif, 5, 91, 98, 99, 140, 143, 159, 228, 292
Asûrî, 12
Ava Heyatê, 5, 92
Ayşe, 81

B

Baba Tahirê Uryan, 59
Bağê Weşletê, 93, 94, 125, 166
Bahauddîn, 21, 100, 101
Baqir, 96
Bedû's-Semawatî We'l-Erdî, 63
Bedra Munîr, 5, 92, 275
Behra Sor, 76, 133
Beqa, 5, 90
Berwarî, 13, 14, 17, 68, 145, 195, 267
Bexda, 15, 21, 98, 104
Beytuşebab, 14, 145
Bîstamî, 5, 96, 97
Bîzandî, 12
Botan, 2, 14, 15, 18, 23, 24, 139, 291

C

Ce'fer es-Şadiq, 96, 97
Cêbraîl, 4, 72, 73, 77, 78, 79, 112
Cehennem, 89
Celal, 64
Cemal, 5, 64, 95
Cennet, 49, 72, 88, 89, 112
Cumhûriyet, 16

Ç

Çatak, 14
Çiyayê Tûr, 76

D

Dicle, 14
Dih, 13, 14, 145
Dil, 5, 37, 77, 78, 93, 100, 109, 112, 117,
166, 209, 240, 248, 270
Dîwan, 22, 30, 33, 50, 52, 113, 290, 291,
292, 293, 294
Diyarbakir, 13, 144

E

Ebbasî, 12, 32
Ebdulehed, 5, 103, 230
Ebdulmutelîb, 70, 85
Ebdulxaliq Guçduwanî, 5, 98, 100
Ebû Ce'fer, 96
Ebu Cehil, 85

- Ebû Talib, 70, 82
 Ebabekir, 80, 81, 86, 95, 96
 Ehmed, 3, 31, 51, 59, 70, 72, 80, 207, 292, 294
 Elaeddîn 'Eṭṭar, 5, 100
 Elî, 4, 5, 30, 33, 72, 80, 82, 83, 84, 86, 95, 96, 97, 98, 99, 104, 122, 126, 139, 159, 169, 201, 219, 226, 227, 228, 254, 293, 294
 Elî Remetenî, 99
 Êlk, 14, 145
 Ellah, 4, 63, 64, 149, 205
 Emewî, 12, 59, 138
 Enqere, 14, 16
 Erebi, 1, 2, 9, 10, 15, 16, 20, 22, 23, 25, 26, 27, 28, 30, 37, 39, 42, 43, 50, 51, 52, 53, 56, 58, 61, 63, 64, 79, 88, 105, 119, 124, 148, 152, 153, 243, 273, 292
 Ermenî, 12
 Erûh, 13, 14, 145
 'Eşq, 56, 92, 94, 106, 119, 129, 204
 Eyûb, 4, 75
- F**
- Farisî, 1, 2, 9, 10, 20, 22, 23, 29, 42, 50, 51, 52, 55, 86, 132, 152, 159, 227, 291
 Farqîn, 13
 Fatima, 82, 84
 Fena, 5, 90
 Fermedî, 5, 97, 98
 Firewn, 76
- G**
- Garzan, 13, 14
 Ğeffar, 4, 68
 Ğefûr, 4, 68
- H**
- Habîl, 72
- Ḥ**
- Ḥebîbullah, 5, 70, 71, 92, 103, 157
- H**
- Hemze, 85
 Hesên, 4, 5, 18, 42, 82, 83, 84, 95, 96, 97, 111, 131, 142, 144, 145, 149, 159, 190, 227, 228
 Heskêf, 13
 Hewwa, 72
- Ḥ**
- Ḥeyu'l-Qeyyûm, 63
- H**
- HezretêUmer, 12, 82
 Hîndîstan, 21, 102, 103
 Hîtît, 12
 Hîzan, 13, 211
 Hûrî, 4, 12, 89
 Huseyîn, 84, 95, 96, 98, 104
- I**
- Îblîs, 71
 Îbn'l-Esîr, 16, 112
 Îbnu'l-'Îz Îsamîl Îbnî Rezzaz el-Cezerî, 16
 Îbrahîm, 10, 73, 75, 79, 86, 98, 104, 112, 140, 141, 147
 Îdrîs, 73
 Îlah, 64, 65
 Îlhanî, 13
 Îmamê Henefî, 96
 Îmamê Malik, 96, 98
 Îmamê Rebbanî, 5, 92, 102, 103, 229

Îsa, 4, 76, 77, 78, 96, 155, 209

Îsmâîl, 4, 13, 73, 96, 112, 142, 147

Îsmê E'zê, 57, 63, 227

K

Karaqoyûnlû, 13

Kelal, 5, 99, 100, 228

Kemaleddîn, 5, 41, 105, 159

Ken'an, 76

Kosedax, 13

Kufra, 14, 145

Kurd, 12, 13, 16, 18, 9, 25, 42, 44, 45, 50, 54, 56, 59, 123, 139, 144, 149

Kurdî, 1, 9, 10, 13, 15, 18, 20, 22, 23, 25, 27, 29, 31, 39, 42, 44, 48, 49, 50, 51, 52, 53, 54, 59, 62, 63, 64, 88, 89, 95, 104, 123, 139, 151, 152, 153, 159, 227, 290, 292, 293

Kurmancî, 15, 22, 57, 60, 292

Kurtalan, 14, 18

L

Luqman, 4, 78, 230, 261

M

Mecûsî, 96

Medan, 12

Medîne, 7, 70, 83, 84, 86, 113, 140, 141, 142, 146, 156, 169, 176, 191, 269

Medreseya Nîzamiyeyê, 15

Medyen, 76

Meħmûd Încîr Feğnewî, 5, 99

Mekke, 7, 70, 73, 80, 85, 86, 112, 113, 134, 140, 141, 142, 156

Melîk Şahê Sultanê Selçûqiyân, 12

Melîk Xelîl, 13

Merwanî, 12

Meryem, 77, 79

Mewlana Xalidê Bexdadî, 21, 95, 104, 105

Miks, 14, 145, 283

Misir, 14, 74, 76, 101, 261

Moxol, 13

Miħemmed, 5, 10, 15, 18, 20, 21, 43, 45, 48, 52, 64, 65, 66, 67, 68, 69, 70, 79, 80, 81, 85, 91, 92, 96, 97, 99, 100, 101, 102, 103, 104, 124, 140, 146, 151, 169, 173, 175, 182, 229, 230, 260, 292, 293, 4, 5, 70, 71, 72, 83, 91, 92, 95, 96, 102, 103, 104, 154, 159, 185, 195, 227, 230, 236, 246, 272, 291

Munacat, 70

Mustefa, 5, 21, 64, 70, 71, 105, 230, 272

N

Nîl, 76, 133

Nîzamu'l-Mulk, 15

Nûh, 4, 73, 135, 154

O

Umer, 4, 64, 65, 66, 67, 68, 69, 80, 81, 82, 86, 102

Osman, 4, 5, 7, 28, 80, 82, 83, 86, 104, 105, 132, 143, 151, 152, 230, 292

Osmanî, 12, 13, 14, 16, 21

P

Persan, 12, 149

Perwarî, 2, 13, 14, 145, 156

Pêxember, 4, 25, 44, 45, 47, 48, 63, 69, 70, 71, 72, 73, 74, 75, 76, 77, 78, 80, 81, 82, 83, 84, 85, 86, 87, 95, 99, 111, 112, 116, 117, 120, 128, 131, 135, 140, 141, 147

Q

Qabîl, 72

Quran, 4, 18, 25, 44, 45, 48, 63, 65, 66, 67,
69, 71, 74, 75, 77, 78, 79, 80, 81, 82, 83,
88, 89, 102, 104, 112, 120, 132, 133,
134, 135, 136, 137, 141, 155

R

Rebb, 4, 66

Rehîm, 63, 188

Rehman, 4, 63, 67, 269

Rîwgerî, 5, 98

Romayan, 12

S

Sasanî, 12, 95

Şebûr, 4, 68

Sefewi, 13, 142

Şehabî, 4, 80

Selçûqî, 12, 15

Selman, 4, 27, 33, 35, 37, 47, 65, 86, 87,
110, 120, 132, 140, 145, 159, 165, 227,
283, 284, 291, 293

Ş

Şemed, 4, 66, 67

S

Sêrt, 2, 7, 12, 13, 14, 16, 17, 18, 19, 20, 21,
52, 144, 145, 188

Seyda, 9, 10, 15, 33, 91, 218

Seyyîd Nûr, 5, 71, 103, 104, 230

Sir, 90

Sîrhîndê, 102

Sultanu'l-‘Arifîn, 96

Sûreya Îxlasê, 4, 80

Sûreya Tûrê, 4, 79, 80

Suryanî, 12

Ş

Şafi‘î, 15

Şahê Dewlewî, 5, 104, 230

Şamê, 21, 75, 84, 85, 86, 104, 142

Şaxê, 14, 145, 203

Şehrezorî, 21, 22, 57, 95, 104, 159, 227

Şekûr, 68

Şemseddîn, 5, 103

Şer‘iyye û Ewqaf Wekaletî, 16

Şerab, 91, 93, 94, 106, 107, 129, 130, 240,
263

Şêx, 2, 5, 9, 10, 14, 15, 17, 18, 19, 20, 21,
22, 23, 24, 25, 27, 29, 30, 31, 32, 33, 34,
42, 44, 45, 46, 48, 49, 50, 51, 52, 53, 54,
55, 56, 57, 58, 59, 60, 62, 63, 64, 66, 67,
68, 69, 70, 72, 73, 74, 76, 78, 80, 81, 82,
83, 84, 85, 86, 87, 89, 91, 92, 93, 95, 97,
98, 99, 100, 101, 103, 104, 105, 106,
109, 110, 111, 113, 114, 116, 117, 119,
121, 123, 128, 130, 131, 133, 139, 143,
144, 145, 151, 152, 153, 156, 157, 159,
161, 162, 168, 169, 173, 175, 182, 187,
192, 193, 194, 198, 201, 203, 204, 208,
209, 211, 212, 224, 226, 227, 230, 234,
237, 239, 243, 244, 245, 247, 250, 252,
254, 256, 259, 260, 262, 266, 267, 271,
275, 280, 281, 282, 288, 290, 292

Şêx Es‘ed, 15, 18, 271

Şêx Muşerref, 2, 9, 10, 14, 15, 17, 18, 19,
20, 21, 22, 23, 24, 25, 27, 29, 30, 31, 32,
33, 42, 44, 45, 46, 48, 49, 50, 51, 52, 53,
54, 55, 56, 57, 58, 59, 60, 62, 63, 69, 70,
72, 73, 74, 76, 78, 81, 83, 84, 86, 87, 89,
91, 92, 93, 95, 105, 106, 110, 111, 113,
114, 116, 117, 121, 123, 130, 131, 143,
144, 145, 151, 152, 153, 156, 159, 161,
169, 208, 209, 211, 224, 226, 227, 243,
244, 245, 252, 254, 256, 259, 275, 292

Şeytan, 71

Şirvan, 14, 145

Şîrwan, 13

Şît, 72

Şueyb, 76

Şukriyan, 15

T

Tebrîzê, 13

Tevhid-i Tedrisat, 16

Tewhîd, 4, 54, 70, 90

Tirkî, 1, 9, 20, 22, 42, 50, 52, 152

Tirkiye, 16, 132, 133

U

Ûrartû, 12

X

Xedîce, 70

Xinûk, 15, 184

Xinûkî, 2, 9, 10, 17, 21, 22, 23, 24, 27, 30, 31, 32, 33, 34, 37, 42, 44, 45, 46, 47, 48, 49, 50, 51, 52, 53, 54, 55, 56, 57, 58, 59, 60, 62, 65, 68, 69, 70, 72, 75, 79, 82, 84, 87, 88, 89, 92, 106, 112, 113, 114, 119, 127, 129, 132, 141, 143, 144, 146, 151, 152, 153, 181, 201, 292

Xace, 5, 88, 91, 97, 98, 99, 101, 102, 151, 228, 229

Xace Derwêş, 5, 101, 102, 229

Xace Ubeydullah Ehrrar, 5, 101

Xacegî Îmkenegî, 102

Xwedê, 4, 9, 18, 19, 20, 21, 23, 28, 36, 37, 43, 44, 45, 46, 47, 48, 49, 50, 55, 63, 64, 65, 66, 67, 68, 69, 70, 71, 72, 73, 74, 75, 76, 77, 78, 79, 80, 81, 82, 84, 85, 87, 88, 90, 91, 92, 93, 94, 95, 96, 97, 98, 99, 100, 101, 104, 106, 109, 111, 112, 119, 121, 122, 127, 129, 132, 133, 135, 138, 146, 147, 157, 161, 177, 178, 201, 254, 255, 260, 262

Y

Yaqûb, 76

Ye‘qûbê Çerxî, 101, 143, 159, 229

Yûsif, 4, 40, 74, 75, 76, 97, 98, 133, 154, 228

Yûsif Hemedanî, 5, 97, 98

Z

Zahid, 5, 101, 159

Zeynelabîdîn, 31, 95, 96, 291

Zok, 13, 14

Zu’l-Celal we’l-Îkram, 63

Z

Zulcelal, 4, 69, 91

Z

Zuleyxayê, 74, 133

استاد مخلص
 هذا ديوان العبد الفقير الحقير الكليل المستخرف
 البراءة المخلصي اهديته لصاحب الفضيلة قرة عيون
 انصاف المخلص خضر الهدى شيرى
 الرجوع عاىه واسكن الله له واهله
 اللهم صل على سيدنا محمد وعلى
 آل محمد الطيبين الطاهرين

بِسْمِ اللَّهِ الرَّحْمَنِ الرَّحِيمِ
 يَا رَسُولَ اللَّهِ تَرَى قَصْرَ دُرِّجًا حَاجِيَانِ
 يَا رَسُولَ اللَّهِ تَرَى حَقَّ دَرَكِهِ مَحْتَابِيَانِ
 هر دکت قصدا ته ی گنه مزین بی حد کبری
 هر نوی یاسید عالم هوارا عاصیان
 هر کسی غمگین و محزون دل کوه زل تزی
 وقت کو بگری رکا با نه دگفته شاهیان
 هر کسی دنیا فر ل طنک بوی بی حد اگر
 او بکت قصدا ته دی فی الحال خالص بی طنک
 او قصیر دست قالا بی دلیل و چاره بی
 دی روانه هسک بگری ای بجزا قبیان
 بی کوردل صوفی ژنهان دی بکت قصدا ته او
 لوتوی سرکهن بی شنه ژبوسر کهنیان

ن نوزده

Nusxeya Mela Xidir Heşerî Rûpela Yekem Nusxeya Mela Xidir Heşerî Rûpela Duyem

ن نوزده
 فی الحقیقت هر نوی روانیا روانه هیان
 فی ژنه مجرد بونه فی الحقیقت هر دو کون
 هژنه پهنا خوگرین مسک بسک حوریان
 حضرة آدم زجته درکتوی چاره بو
 یا محمد وی بلندگوت حق گرانده زاضیان
 هم بینانه زطوفان حضرة نوح بو خلاص
 هم به ژ آگر خلاص بو او رئیس انبیان
 حضرة یوسف ژنه او حسن بی حد گرتو
 حضرة موسی ژنه بو بخنر اسرائیلیان
 حضرة ایوب به خورل ژبوه وی عافیة
 حضرة عیسی به او بو مسیح بی زیان
 هم مدینانه ژبرا خلفان مقصود بو
 دکرن قصدا او ی جبریل وهم روحانیان

۳۰
 صد وکی و بیستقرانی کول درگاه تنه
 بوسه داروی دریه نغشی و گیلا نیان
 گردنی جه بولیکژوان وی دمی دی جه بی
 و صنه لنگون آیا بینا هیان
 پشت رب العالمین مدح ته گون در قیدم
 دی چه بیژن حادثان بی زبان وی بیان
 ذریاته درینک پاک و تمیز و طاهره
 هر یوان رحم دکت خالف لانس و جتیان
 جمله اصحاب نه حقا همدات امتن
 پر بال و روح جهاد کرون شهید و غازیان
 خاصه صدیق اکبر وی شه صاحب هدر
 حضرة فاروق فجاج عراق و شاهیان
 جامع قرآن ذی التورین پیر فضل و حیا
 حضرة کراره وی سرعسکر ایمانیان

حضرة علی

Nusxeya Mela Xidir Heşerî Rûpela Sêyem

Nusxeya Mela Xidir Heşerî Rûpela Çarem